



# BIRÎN

AHMEDÊ HEPO



PEYWEND

**BIRÎN**

*BIRÎN*

Ahmedê HEPO

Weşanên Peywend: 14 | roman: 3

Edîtorê Kitêbê: Remezan Alan

Sererastkirin û ferhengsazî: Umîd Demîrhan

Berg: Aysel Kazıcı Özalp

Rûpelsazî: Peywend

Sertifika No: 28947

ISBN: 978-605-85387-5-7

© Weşanên Peywend

Çapa Yekem: 2014, Stenbol

Çap:

Kayhan Matbaacılık

Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.

C Blok No: 244 Topkapı / İstanbul

Tel: 0212 576 00 66

**PEYWEND**

Kuloğlu Mah. Sadri Alışık Sk.

No: 16/51 Beyoğlu İSTANBUL

Tel: 0532 176 93 64 | [www.peywend.com](http://www.peywend.com)

E-Mail: [peywend@hotmail.com](mailto:peywend@hotmail.com)

[www.facebook.com/wesanxaneyapeywend](http://www.facebook.com/wesanxaneyapeywend)

# BIRÎN

---

AHMEDÊ HEPO

 PEYWEND



**Ahmedê Hepo**-Di sala 1934an de li gundê Şîranê (Qemerlî/Ermenistan) hatiye dinê. Di sala 1937an de tevî pêncî hezar kurdên misilman, malbata wî ji Ermenistanê koçberî Qırqızistanê dibe, lê malbata Hepo di 1942an de vedigere Azerbaycanê. Li vê derê, li navçeya Yêvlaxê dibistana amadehiyê diqedîne. Di sala 1964an de li Rewanê Enstîtuya Pedagojiyê diqedîne. Li wê derê heft salan di rojnameya *Riya Teze* de dixebite. Di beşa kurdî ya radyoya fermî ya Dewleta Azerbaycanê de serwêriyê dike û bi navê *Dengê Kurd* rojnameyeke kurdî derdixe. Ji azerî bo kurdî hin wergeran kiriye. Di warê roman, çîrok û folklorê de berhem dane. Ahmedê Hepo niha li Bakûyê dijî.

**Berhemên wî yên çapbûyî ev in:**

*Adar* (serpêhatî, 1965)

*Emîr Gul Vedide* (çîrok, 1975)

*Bawerî* (roman, 1990)

*Birîn* (roman, 1996)

*Karîbarên Gelê Kurd* (zargotin, 2000)

*Rêwiyê Bêmal* (bîranîn, 2007)

*Du Evîndar Du Gulle* (roman, werger, 2009)

*Xemildarên Jiyanê* (bîranîn, 2010)

## Di 80 saliya xwe de Ahmedê Hepo û “Birîn”a wî

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Azerbaycanê Ahmedê Hepo, sala 1934an li gundê Şîranê yê bi ser nehiya Qemerliyê ya Ermenistanê hatiye dunê. Zivistana sala 1937an tevî 50 hezar kurdên misilman, malbata wî ji Ermenistanê tê koçberkirin û ji aliyê Sovyetê ve li Qırqizistanê, li Kok Yanga Celalabadê tê bicihkirin. Sala 1942an malbat ji Qırqizistan vedigere Azerbaycanê. Sala 1959a dibistana amadehiyê li nehiya Yêvlaxê kuta dike û sala 1964an jî li Rewanê Enstîtuya Pedagojiyê diqedîne. Li wê derê bi rojnameya Riya Teze re pêwendiyê datîne û sala 1965an berhema wî ya *Adar* bi redaktoriya Sehîdê Îbo tê weşandin. Piştî ku heft salan di rojnameya Riya Teze de dixebite vedigere Azerbaycanê û hê hê jî li Bakûyê dijî. Ji sala 1993an vir ve ji beşa kurdî ya radyoya fermî ya Dewleta Azerbaycanê de serwêriyê dike û rojnameyeke kurdî ya bi navê Dengê Kurd diweşîne. Çend berhemen wî yên weşandî ev in: *Adar* (serpêhatî, 1965), *Emir Gul Vedide* (1975) li Rewanê, *Bawerî* (roman, 1990), *Birîn* (roman, 1996), *Karîbarên Gelê Kurd* (zargotin, 2000), *Hêsirên Xwînê* (serpêhatî-werger, 2002), *Rêwiyê Bêmal* (bîranîn-serpêhatî, 2007), *Xemildarên Jiyane* (bîranîn, 2010) li Bakûyê. Her wiha Ahmedê Hepo romana Suhrab Tahir a bi navê *Du Evîndar, Du Gulle* (2009) wergerandiye kurdî.

Ahmedê Hepo di berhemên xwe de zimanekî rewan bi kar tîne û rêbaza wî dişibihe dab û nêrîtên rojnameya Riya Teze. Ji aliyê din ve hema hema peyvên darijtî yên nû di berhemên wî de nayên dîtin.

Ev berhema li ber destê we, li gorî heyama xwe û bi zimanê deve- rekê, devera Elegezê hatiye hûnandin. Ji bo vê yekê jî me dest nedaye şewazê vegotina nivîskarî. Bi gotineke din, me dest nedaye avahiya zimanê berhemê; reseniya wê parastiye û bi rastnivîseke hemdem ji nû ve amade kiriye. Wekî numûne, me pêşdaçek li hevokan zêde nekirine; bilêvkirina peyvên neguherandiye û li gorî kurmanciya nivîskî ya berbelav zimanê romanê rojane nekiriye. Îcar li şûna mudaxeleyê, me ji bo asankirina zimanê wê di her rûpelê de jêrenivîs daxistine binê tekstan û ferhengokek jî li dawiyê daniye. Her wiha me zêdehiyên di wê heyamê de li pêş û paşiya romanê hatibûn nivîsandin jî parastine. Bi rastî destê me neçûyê ku em van tekstên edebî (dibe ku paşê bibin belgeyên dîrokî) ji berhemê biavêjin an jî biavêjin dawiya pirtûkê.

Ev roman ji bo kesên ku dixwazin têkevin nava cîhana wêjeya kurdên Azerbaycanê nimûneyeke gelekî baş e. Ji ber ku teksta romanê serdanpê bi jêrenivîsan ve hatiye xurtkirin, xwendevan dê bi asanî berhemên din jî fêm bike. Ev ferhengok ne ji ferhengên nivîskî, lêbelê bi alîkariya nivîskarî hatiye amadekirin. Lewre wateyên peyvên ne bi zanîna me, lê bi mebesta nivîskarî hatiye têkûzkirin.

Em hêvîdar in ku ev roman û romanên din ên Apê Ahmed, ne tenê ji bo wêjeya kurdî her wiha ji bo mijarên dengnasiya rêzimana kurdî jî bibin destekî alîkar.

**Umîd Demîrhan**

09.05.2014, Bazîd

## Giliyên Şêkirdariyê<sup>1</sup>

Merdtayî!<sup>2</sup> goveka<sup>3</sup> vî giliyî fire ye; lema jî “mêr, mêrê çê, mirov, însan, destvekirî, xêrxas, merîxas, bêtirs, bêxoftî<sup>4</sup>” hilçiniye nava xwe.

Ev gilî-gotin di jiyânê da nabine qîsmetê hemû kesî. Bona wê yekê pêwîst e esilê te hebe, xwedanê bihêna<sup>5</sup> bi rîçal bî<sup>6</sup>, yek jî xwîna cimcilandî<sup>7</sup>, dapalandî<sup>8</sup> û zelal di damarê te da bikişê.

Hinek zarok hatine dunê Xwedayê Mezin berê da dizane di jiyânê da ev celewê<sup>9</sup> mirovtiyê wê bibine risqê wî, lema jî dinuqîne<sup>10</sup> dilê dê-bavê, navekî usa li ewledê xwe ke, ku nav û kirin li hev bîn! Mîna Hadiyê Refo! Xwebêja<sup>11</sup> navê Hadî ew rîya rast kivşkirî, rêbiwarê<sup>12</sup> rîya

---

1 **şêkirdarî:** sipasdarî

2 **merdtayî:** merdî, merdtî

3 **govek:** 1. çenber, dayîre 2. bingeh 3. dorhêl

4 **bêxoftî:** bêtirsî, wêrekî

5 **bihên:** bêhn

6 **rîçal:** reh û rîşiyên rehekan \*\*\* **bihêna bi rîçal:** nefeseke xurt

7 **cimcilandî:** dawerivandî, saf

8 **dapalandî:** parzûnkirî

9 **celew:** cure

10 **nuqandin:** lê nîşandan, îlham kirin

11 **xwebêj:** wate

12 **rêbiwar:** rêwî

qenc e. Xîreta netewiyê, karkirina helal, bejin-bala tîtal<sup>1</sup>, navê Hadî, yê bi ziyaret, mal-malbeta Refoyê Nevo, Nevoyê Misto, Mistoyê Evdo ra nav-dengekî bilind, xemileke nûh anî.

Xwendevanên heja em hinekî paş da çûn û me navê bavpîrê Hadî Evdoyê camêr badilhewa<sup>2</sup> nekişand. Dibên, di salê padşahtiya Nî-kale<sup>3</sup> da navê Evdoyê camêr him wî alî Erez, him vî alî Erez di nava kurdan da bi şêkirdarî dihate kişandinê. Ew bibû piştovanê hejar, belengaz û bêkesan.

Ew xwîn-qinêtiya<sup>4</sup> comerdtyê, ku dilê camêrê Evdo ra dikişiya ewî da Misto, Misto da Nevo, Nevo jî da her sê kurê xwe Rizaq, Sevo, Refo. Van bira ev xwîn-qinêtiya bêxilt<sup>5</sup> derbazî nava ruhê bîst û pênc ewled-nevîyan kir. Lêbelê di nava wan da Xosrofê Rezaq, Hadiyê Refo û yên mayîn. Lema gotine:

*-Mala zêran xirab dibe,  
Mala mêran xirab nabe.*

Xosrof bi cul'etî<sup>6</sup>, mêrxasiya xwe va hate naskirinê; Hadî bi merdtî, helaliya xwe va hate kîvîşê.

Xwendevanên birûmet! Ev kitêba, ku we xwend beqî<sup>7</sup> keda (sponsorîya) ewledê kurd Hadiyê Refo ronahî dîtiye. Gava bona vê kirina xêrxazê qubbe<sup>8</sup> min Ahmedê Hepo, sipasiya xwe da Hadiyê Refo, ewî bi hişkûrî<sup>9</sup> got:

*-Mirovê, ku tenê bona xwe dijî, kevir ji wî kêrhatî ye.*

Ez hatime dunê bi dehan derb li min ketin, birîna jan da. Bona birîna min, ya te, ya wî, ya me, ya wana bicebire Yekîfî pêwîst e.

**Ahmedê Hepo**

- 
- 1 **tîtal:** -bejna- rîprast û dirêj
  - 2 **badilhewa:** bêsedem, beyhûde, beytu
  - 3 **Nîkale:** Nikola, Çar Nikolay
  - 4 **qinêti:** reha xîretê
  - 5 **bêxilt:** saf, xas
  - 6 **cul'etî/cur'etî:** wêrekî, lêhengî, cesaret
  - 7 **beqî:** teqez, welhasil
  - 8 **qubbe:** gewre, mezin
  - 9 **hişkûrî:** hişmendîya kûr

Xwendevanên hêja! Ev roman him qewimandinên<sup>1</sup> dîrokê ye, him ya efirandariyê<sup>2</sup> ye. Kevirên dîwarê wêya dîrokî ne, sîwaxa wêya dahênerînê<sup>3</sup> ya nitirandina<sup>4</sup> nivîskar e. Hevîrtirşkê “Birîn”ê dîrok e, hevîr hilhatin, nanpehtin behrê qelemê ye. Bi nêta me him bûyerên dîrokê, him efirandina torîvan<sup>5</sup> usa bi hev ra hatine rastinê, mirov dijwar wana ji hev cuda dike.

Yek sergovend e, yê mayîn govendgirtî, xemildar in. “Birîn” ji rojên nefîkirina<sup>6</sup> pareke gelê kurd dijene<sup>7</sup>, dibêje dibilîne. Çawa simtê<sup>8</sup> çiyayê bilind bêberf nabe, dîrok bê qewimandin, hevanîn<sup>9</sup> bê zêdekirin nabe. Werên em pêşa wedê<sup>10</sup> xuliqandina “Birîn”ê bigirin, bixwînin, ser kirinê reş vekin, herin derêne ber dergê rastiye.

**Azer-Neşr**

- 
- 1 **qewimandin:** serpêhatî, bûyerên pêkhatî  
2 **efirandari:** afirandêrî  
3 **dahênerîn:** pêkanîn, çêkirin û hilberandin  
4 **nitirandin:** neqîşandin  
5 **torîvan:** edebiyatzan  
6 **nefi kirin:** koçber kirin  
7 **jenîn:** 1. (dîwar) lê kirin 2. (mijar) lê gerîn, lê pirsîn 3. lê reşandin  
8 **simt:** lûtke  
9 **hevanîn:** lihevanîn, hûnandin  
10 **wede:** heyam, dem \*\*\***wedê xuliqandinê:** dem û heyama afirandin/  
nivîsandinê

## Çend Gilî

Ya Rebbî! Tu bi xwe şehed î, wekî min gellek şevên bêxew, rojên nerehet derbaz kiriye, ku ev kitêb ser hev da bê, bixuliqe!<sup>1</sup>

Ya Rebbî! Wekî min karibûye derdê gelê xwe hinekî şirove kim, sedemê birîna kûr bi qelemê bidime kivişê, usan e ez ber dergê te serbilind im, bal gelê xwe rûsipî me.

Ya Rebbî! Îdî bes e, birîna gelê min “birîna bêwelatiyê” bicebirîne.

Ya Rebbî! Tu rind dizanî emir-jyanê da mirovên bêpişt timê hatiye kutanê, mirovên bêwelat him berdest e, him bindest e.

Wekî ji min pirs kin: Kî ye merxasê romanê?

Ez ê bêjim: Ez, tu, ew, ewana, bavê min, bavê te, diya min, diya te, serpêhatiya Kelo, Rostem, Sedo, dayîka Seyran, Gevez, Rihan, beşekî gelê min, yên ku di nava çend sala da hate zêrandinê<sup>2</sup>, kelandinê, qelandinê!

**Torîvan**<sup>3</sup>

---

1 **xuliqîn:** afirîn, çêbûn, pêkhatin


2 **zêrandin:** êşandin, eziyetkirin

3 **torîvan:** edebnas, ango Ahmedê Hepo

*Rewayî -ulmdarê ulmê kîmyayê, yê dunê yî navdar, neftkarê Yekîtiya Rêspûblikên Sovêtê ye Sosiyalîstiyê yê bi siyanet<sup>2</sup>, akademîkê<sup>3</sup> Akademiya Qazaxistanê yî ulma, akademîkê kurda yî yekem û yê çend dewletên din Nadîrê Kerem Nadîrov dikim, ji ber ku rîya jiyana wî di nava xelegê salên nefîkirinê<sup>4</sup> ra derbaz bûye û gihîştîye hêlanên<sup>5</sup> ulmê bilind, him jî di romanê da kê-m-zêde derheqa wî da bi bedewî tê nitirandinê.*

- 
- 1 **rewa:** 1. seza, meşrû 2. layîq 3. diyarî \*\*\* **rewayî filan kesî:** diyarî ji bo filan kesî  
2 **siyanet:** rûmet, şeref  
3 **akademîk:** zanyar, akademîsyen  
4 **nefî kirin:** koçber kirin, surgûn kirin  
5 **hêlan:** ast, sewiye





## 1

Ew du roj bû, ku Kelo li mehîna “Mircan” digeriya. Vir da mehîn, wê da mehîn, çawa dibên, ewa bibû parî nan, bibû dû kişiyabû erşê esmîn.

Kelo der-dorê gund hev xist, paşê dakete newala bintara gund, ji wir derbaz bû, çû gelî, derkete sermîla, hilkişiya çiyayê fêza gund, berjêrî newala bû, gêdûka<sup>1</sup> nihêrî, ji hatiya, çûya pirsî, lê tu kesî tiştekî xêrê negot. Gewriya Kelo ziha bû, lêv ji çend ciya qelişî. Qudûm<sup>2</sup> lê şkestin, tab<sup>3</sup> jî nedikir cîkî bisekine.

Îdî ne şeva neferên malê şev bû, ne roja wan roj bû. Te qey digot, li malê şînê dest daye. Êvara sisiya qewm-lêzim, der-cîran beravî<sup>4</sup> mala Kelo bûn û her yekê weke zanebûna xwe nêt-meremê xwe ron kirin, gotin, bilandin<sup>5</sup>. Hinek ber dilê malxweyê malê da hatin û gotin: “Xwedê kerîm e”, “Xwedê yek e, derge hezar”, “îşev em hatine tengasiyê, sibê em ê bêne firayê”, paşê yekî got: ez ê sibê herim, filan derê binihêrim, yekî jî got, ez ê sibê hespê xwe siyar bim, herime wara, herime zozana. Kî dizane hemû tişt diqewime?..

---

1 **gêdûk**: çal û kort

2 **qudûm**: taqet, hêz

3 **tab**: sebr, hedûr

4 **berav bûn**: berhev bûn

5 **gotin-bilandin**: ji gelek aliyên ve niqaşkirin

De, hetanî wedekî<sup>1</sup> şevê beşdarbûya pirs hildan, danîn û bi hezar duwa<sup>2</sup>, bi hezar xêrxastina va hîştin, çûne malên xwe. Ewana çûnê şûnda dîsa êgir girte laşê Kelo, xwe da şewitî û xwe xwe ra dikire şer: “Tilî-peçî li min qop bin, diqewime min qeyd girênedan”, “Nayê bîra min malşewitî, min du gilê ser hev da lê da, yanê sisê”. Vê demê jina Kelo Gevez hate nezîkî mêr û got:

-Lo lo, qe xwe meperitîne, îdî şev ji nivê şevê derbaz bûye, rabe razê.

-Ka xewa min tê?

Gevezê nihêrî halê mêr pirr xirab e, ber dilê wî da hat û got:

-Lo lo, dibên mîna me, deveke yekî unda dibe. Xwedanê malê qe xema nake. Jinik jê ra dibêje: Lo lo, mal li me şewitiye, tu hê dixwî, vedixwî. Mêrik dibê: Jinik, min pê ra negihand newala “Dirêj” bi-nihêrim. Sibê ez ê herim, min ku deve li wir nedît, a şîn wê gavê ye. Naha rabe razê, lawik ê sibê herin, li zozanê bigerin, a li wir jî tunebe, îja em ê hê rûnên serê xwe bidine ber kulman.

Kelo bi kulzikî rabû têkeve nav cî, seyê derê malê kire ewteewt, paşê bû kûzekûza sê û derî hate kutanê.

Kelo li jinê, jinê li wî nihêrî. Ewî xwest ber bi dêrî here, şeqînî ji dêrî hat û du neferê kîtêlreş<sup>3</sup> der da ketine hundur. Wana bê selam, bê hewal pirsîn:

-Navê te Kelo ye?

-Belê.

-Paşnavê te Nemoyêv e?

-Belê.

-Bide pêşiya me.

-Çima?

-Kula canê te çima? Mehîne dişînî wî alî, hê serbarê ser da jî di-pirsî çima? Bide pêşiya me.

Duda Kelo birin, lê sê nefer man. Ji wana yek ber dêrî sekinî, dudu ketine mal. Cî-nivîn, balgî-doşek, emenî<sup>4</sup>-xalîçe, xurc-kîsik,

---

1 **wede:** wext, heyam, dem, zeman,

2 **duwa:** dua

3 **kîtêlreş:** kincreş

4 **emenî:** cureyekî ferşan e

çewal-têr, qet-kejî<sup>1</sup>, gore-tolaq<sup>2</sup>, stêr-fermeş<sup>3</sup>, fera-fotik<sup>4</sup>, stûn-kêran  
usa monik monik nihêrîn<sup>5</sup>, usa vejandin<sup>6</sup> çawa carina rûviyê birçî ji  
lana xwe derê, mirîşkekê bigire veçîrîne.

Paşê ewana hev ra derketine derva. Ketine tewle-gomê, maldizk<sup>7</sup>-  
kulînê, koz-hozê<sup>8</sup>, kolik-holik hev xistin. Nişkê va çavên yekî li gomê  
kîsikê stûnê da dardakirî ket û zû çû bi lepê xwe nihêrî, seh kir, wekî  
tişteki mîna qirmê tê da ye û bi şabûn li hevalan kire gazî:

-Werêne vira, min çek dîtiye!

Hetanî hevalê wî hatine bal wî, ewî bendikê devê bizmikê  
“hevrîngdang” a reng bi rengî, ku ser nexşê “Serberanî” hatibû hû-  
nanê qetand û bi zexm destê xwe kire hevrîngdangê, lê wî tirê çek  
vêbû, destê wî birîndar kir. Ewî destê xwe ji hevrîngdangê derxis-  
tinê, ji du-sê tiliyê wî xwînê dilop kir. Yekî bi desmala destê xwe va  
tiliyê wî pêçand, paşê bi fesal<sup>9</sup> “hevrîngdang” ji stûne hilda, her du  
kunc girt dawêşand. Hevrîngêk, çend derziyê qezazî<sup>10</sup>, bijûnek keti-  
ne erdê. Ewana ne ew bûn bikeniyana, ne ew bû posîde bin<sup>11</sup>. Ji wir  
derketin dalîn<sup>12</sup>, vedika sê<sup>13</sup>, durunga pêz<sup>14</sup> jî hev xistin. Lod, kadîn,

- 
- 1 **kejî:** cureyekî werisên ku ji mûyê bizinan ji du nex an jî sê nexan hûnandin  
tê hûnandin; dirêjahiya wê bi qasî 3-5 mêtroyan û berahiya wê bi qasî du tili  
an jî sê tiliyan e
  - 2 **tolaq:** cureyekî bandajên hûnayî ye ku ji gûzekan heta çokan li çîpê tê alandin
  - 3 **fermeş:** cureyekî têrên wekî xalîçeyan raçandî ye û nivînan dikinê
  - 4 **fera-fotik:** qasik-tasik
  - 5 **monik:** di mirov û daran de hene, di tiliyên mirovan sê de monik hene,  
di sê ciyan de qat dibin, ya daran jî tê de bişkuv hene \*\*\* **monik monik  
nihêrîn:** yeko yeko/qulik bi qulik nihêrîn
  - 6 **vejandin:** tesele kirin, kontrol kirin
  - 7 **maldizk:** mixbex
  - 8 **koz-hoz:** cihê berxan û hevşiyê pêz
  - 9 **bi fesal:** bî baldarî û diqat
  - 10 **derziya qezazî:** derziya stûr a ku pê lihêfan didirûn
  - 11 **posîde bûn:** xemgîn bûn, bi ber xwe ketin
  - 12 **dalîn:** cihê kolandî ye ji bo xwarin û vexwarina kûçikan; savêr
  - 13 **vedika sê:** kolika sê
  - 14 **durunga pêz:** cihê ku pez lê tê em û alifkirin

qelexa kerma<sup>1</sup> vejandin, derketine banê xênî qulqulî kirin. Welleh, xwedanê malê qe nizanibû ewana li çi digerin, wan bêînsafana jî li çi digeriyan negotin, tu tişt nedîtin û mîna merivên sûckar derketin çûn. Hê bû hewariya kevaniya malê, hê zaran deng dane hev, hê bû îskeîska Nadoyê biçûk.

Şîn-girî, hewar-gazî hêdî hêdî ji vê mala gund derbazî mala dinê bu. Merivên gava dinê hatî, naha hatine hewariyê. Hineka dipirsîn:

-Lê lê, Gevezê, wana çi gotin? Wana çi pirsîn? Çima Kelo birin?

-Welleh, billeh, -ewê bi şîn-girî got, - min tişteke fem nekir. Her min fem kir gotin, wekî te hesp derbazî wî alî kiriye.

-Erê, -yekî bi hêrs got, - em bêjin hema “Mircan” derbazî wî alî bûye, îja vir da çi heye? Heywana Xwedê ye, çûye, çûye...

-Kî zane, -yekî mayîn pêş da hat, - diqewime tişteke heye. Eva dewleta Sovêtê ye, dibên kêwirîşka<sup>2</sup> bi erebê digire.

Ser vê pirsê ewqas gilî-gotin hatine vejandinê, ewqas rê-dirb hatine kişandinê, lê de tu ware tu kesî ya rast nizanibû.

Ere, mêran digotin, dibilandin, çend jinan hêsir dibarandin, keç-bûkên cîrana navmal ser hev da dianîn. Xortekî, duda ciyê stêrê hilşiyayî, keştî<sup>3</sup> çêdikirin.

...Bu reqereqa deriyan, bû şiqeşiqa miftan derîk<sup>4</sup>, dudû, sisê pey hev hatine vekirinê û Kelo birin avîtine cîkî tarî yî biçûk. Derî ser da hate girtinê. Ewî qe nizanibû ew li kîjan dunyayê ye. Hinekî xwe vir da, wê da hejand, nihêrî cîkî teng da ye, ne berayî heye, ne dirêjayî. Ew hetanî wextekî ser piyan sekinî, çok lê qerimîn, xwest rûnê, lê... Xwest qulefîskî xwe cî ke, lê hey hay...

Kelo hema ser piyan çavên xwe girt, kete mitala; “Ya Rebî, ez xwedanê çi sûcî me? Min çi xirabî kiriye? Rê da ji min pirsîn, ku min ‘Mircan’ biriye derbazî wî alî kiriye. Hesp vira naçêre, wî alî diçêre... Qe tişteki fem nakim?”

1 **qelexa kerma:** qûçê sergînan

2 **kêwirîşk:** kerguh, kîroşk

3 **keştî:** şkestî

4 **derîk:** deriyek

Te tirê ew û mitale destepîçolkî hev bûne<sup>1</sup>. Ewî ev dunya ronik<sup>2</sup> dibire dunya tarî, ji wir vedigerî goristanê, ewî dixwest derê rona-hiyê, lê tarî ser da dibarî. Kelo dixwest kefenê xwe biqelêşe derê, lê nikaribû. Xudaneke<sup>3</sup> zîpik zîpikî hate eniyê, dev-lêvan kef dan. Hate bîrê, wekî mirî dibine goristanê gişk ji ser merzel vegeriyane şûnda, mirî dixweze rabe, dibên serê wî kevirê serkêlkê dikeve û xwe xwe ra dibêje: “Wey lo, yê mirî ez im”. A, vî halê wî yî ne mir, ne jiyînê da reqînî ji dêrî hat û dengê xof hate wî:

-Nemoyêv, derê!

Kelo hê pêşîra “hevalê xwe mitala<sup>4</sup>” berda, ew deng dîsa hate wekilandinê<sup>5</sup>:

-Nemoyêv, derê!

Ewî hêdî hêdî da gava<sup>6</sup>, derkete derva. Çav reşeve hatin, hat bi-keve, bi halekî xwe ser hev da anî. Lê para va<sup>7</sup> yekî ew dehft da û got:

-Bicehime, here, zû ke! Hela li ku ye, çav ên li te derên<sup>8</sup>!

Yekî li pêşiyê, yekî li paşiyê ew sivdereke<sup>9</sup> teng ra birin, li ber derîkî sekinîn. Derî vekirin, ew def dane hundur. Derî girtin.

Kelo nihêrî du merî rûniştine. Yek ahil<sup>10</sup> e, yek emir da 30-35 salî ye. Yê ahil got:

-A, were ser ve rûniştanokê<sup>11</sup> rûnê.

Kelo hat hêdfika ciyê kivşkirî rûnişt û tê derxist, wekî rûniştanok ne ji daran e.

-Em ê, -yê ahil dîsa xwe mukur hat<sup>12</sup>, -pirsa bidine te. Wekî tu rast bersiva bidî, em ê te berdin, na, wey halê te!

---

1 **destepîçolkî hev bûn:** bi dest û neynûkan êrişî hev kirin

2 **ronik:** ronî

3 **xudan:** xwihdan

4 **mitale:** fikir û raman

5 **wekilandin:** dubarekirin

6 **dan gava:** gav kirin, zû meşin

7 **para va:** ji pişt ve

8 **çav ên li te derên:** çavên te yê derkevin

9 **sivder:** koridor

10 **ahil:** mirovê bitemen, ehil, zana

11 **rûniştanok:** rûnişte

12 **mukur hatin:** îtraf kirin \*\*\* **xwe mukur hat:** her tişt rast got, her tişt hilda stuyê xwe, tişteke veneşart

-Kerem kin.

-Cara ewilîn bêje me binêm xênî ji<sup>1</sup> kurdî tu kîjan zimana dizanî?

Ji wan zimana kîjanî rind dizanî?

-Xênî kurdî tirkî û ermenîkî dizanim, lê tirkî daha rind dizanim?

-Lê çima tirkî dizanî?

-Zarotî û xortaniya min li Tirkîyayê derbaz bûye.

-De, wekî usan e ez ê bi tirkî ji te pirs kim. Tu razî yî?

-Belê.

Ewî ev pirsana bi ermenîkî didane Kelo, ewî dinê jî dinivîsî.

-De were vira qol ke.<sup>2</sup>

-Min qe nexwendiyê.

-Tiliya xwe vê hubirê<sup>3</sup> da ke û dayne vê derê.

Kelo tiliya xwe ye<sup>4</sup> mezin hubirê da kir û danî ser wî kaxizê ber wana. Paşê, wana dîsa navê wî, paşnavê wî, kurê kê ye, li ku û çendê salê hatiye dunê, pirsîn.

Nişkê va Kelo pirsî:

-Bibaxşînîn, hûn kî ne? Çima we ez girtime?

Ewana bi hev kenîyan, dîsa ewî ahil got:

-Em xebatkarê NKVD ne (Komîsariyata Gel ya Karê Hundur). Lê bersiva pirsê te ye<sup>5</sup> duda, gotî tu bi xwe bidî.

Ëvar da, Kelo wî tirê<sup>6</sup>, ew anîne mîlîsiyayê<sup>7</sup>, lê naha hê çok li wî şkestin, hê ricafekê ji sêrî hetanî piya ew hingavt<sup>8</sup>. Reng lê sipîçolkî<sup>9</sup> bû.

Ewî ahil ji ciyê xwe rabû, hat pêşberî wî sekinî û destekî xwe da ser milê Kelo û ew pêş da, paş da hejand. Kelo ji vê yekê hinekî ser hişê xwe da hat.

---

1 xênî ji: ji bilî, xêncî

2 qol kirin: şanên kirin, îmze kirin

3 hubir: boyaxa nivîsandinê, murekeb

4 ye: ev qertafa raveber, di kurdî ya Qefqazê de carna di wateya yekjimar a mê de wek "ya", carna ji li gor peywendê di wateya pirjimar de wek "yên" tê bikaranîn.

5 ye: ya.

6 wî tirê: qey wî, wî we ye

7 mîlîsiya: bazgeha ewlehiyê, qereqol

8 hingavtin: girtin nava xwe, dor lê girtin

9 sipîçolkî: rengê spî û gewr tevlihevî

-Ewî ahil tirkî pak zanibû, lê car cara giliyê rûsî, ermenîkî tevî axaftina xwe dikir. Pirsra wî ye ewlîn ev bû:

-San mehkemeye duşdun mu?<sup>1</sup>

Kelo rind fem nekir, ew çi dipirse, lema bi tirkî got:

-Anlamadım<sup>2</sup>.

Ewî mitale kir, wêkî ew pirsê aha bide Kelo, wê daha rind fem ke, lema jî bi vî awayî pirsî:

-San sûda duşdun mu?<sup>3</sup>

Kelo wê demê kete mitala û xwe xwe ra got: “Digotin, wekî merivên wê îdarê hemû tiştî dizanin min bawer nedikir. Lê ewana ji ku dizanin ez zarotiyê ketime “şîr” û lema got:

-Belê.

Wana çavên hev nihêrîn, te tirê şa bûn û pirsîn:

-Li ku? Çendê salê? Bona çi?

-Ez î 6-7 salî bûm. li zozana, konê me bintara milekî bû. Me, zarên<sup>4</sup> zomê, binê elbeke kevin xwe ra der-dorê wê kutabû, kiribû kişikok. Carekê ez “kişikok”ê siyar bûm, zarekê, duda ez berk<sup>5</sup> dehf dam. Ez jor da usa hatim ji konê me derbaz bûm, çûm beroşa şîr e<sup>6</sup> ser agir ketim. Şîr ser min da hilşiya<sup>7</sup>, a ev destê min î çepê ji enîşkê wê da şewitî. Şewata şîr gellekî bi şewat e bawer bikî, hetanî naha ew ji bîra min derneketiye. Wekî hûn bawer nakin, dikarin binêhêrin.

Bû pîrçe pîrça<sup>8</sup> yê ahil, keniya. Paşê ewî ev gotinê Kelo hevalê xwe ra wergerand, îcar jî her du hev ra kenyan, lê xort rabû şîleke<sup>9</sup> usa Kelo xist, agir ji ber çavên wî firî û ser wî da qîriya:

-Tu me dewsa nezana datînî? Hê binê<sup>10</sup> kurdê bêfem yê serê çiya, çawa xwe dewsa nezana datîne?

1 -San mehkemeye duşdun mu?: tu ketiyî derê dadgehan û hatiya darizandin

2 -Anlamadım: ez tê negihîştim, min fem nekir

3 -San sûda duşdun mu?: tu ketiyî nava şîr

4 zar: zarok

5 berk: sext, zexm, xurt

6 e: a/ya.

7 hilşîn: rijîn

8 pîrçe pîrq: hîrehîr, cureyekî kenê bideng

9 şîle: şeqam, sîle

10 hê binê: îcar binêre



Pey wê yekê ra seqirtiyê<sup>1</sup> ode hilda. Ji vê yekê te hew dizanibû Kelo ciyê xwe da bûye risas, ew xitimî, hat mîna ewrê bi ba-bagerê va kimkimî<sup>2</sup> ser van nemerda da bihuruje<sup>3</sup>, mina birûskê birûsk vede, lê hey way...

Kelo yekî bejin-nîvçe, tijî bû. Dêmê qemer, eniya kever e ber, simêla reş e palikî<sup>4</sup> mîna sê renga li hev dihat. Meriya ew dîtîne çavên xwe ji navmîla pehn, dest-piyên gir nedikişand. Ew wê da hatîne tu dibûyî heyr-hejmeke<sup>5</sup> kincê xwekirî, papaxê<sup>6</sup> sêrî, bejin-bala tîtal<sup>7</sup>. Rabûna wî bi mêranî, rûniştina wî bi axatî, axaftina wî bi camêrî bû. Yên ha ra gel dibê:

- Kirane<sup>8</sup>, camêr, mêrê çê.

Berê da mala wan ra badilhewa<sup>9</sup> negotîne, mala mêra. Ey dunyayê! Mala mêra jî xirab dibe. Naha ev kirane, ev camêr, ev mêrê rûsipî yê êlê ber van duruza<sup>10</sup> qunciliye ser hev<sup>11</sup>.

Ya Rebbî! Xwedê neke qest<sup>12</sup> heqiyê, neheqiyê, yek jî zordestiyê li hev bialîne, bipîçilikîne!

-Çi ye? - ewî ahil pirsî, - tu çima ketî mitalan. Çima usa posîde bûyî?

Kelo hêdî hêdî serê xwe bilind kir, bi avrûke mirinê<sup>13</sup> li rûyê her duyan nihêrî û kêlimî<sup>14</sup>:

-Mêr jî mêra qe ha dikute. Destê min e<sup>15</sup> girêdayî nin, ew jî min dikute. Dibêm, xwezila ew li rasta bintara Çiyayê Agiriyê rastî min

---

1 **seqirtî**: bêdengî

2 **kimkimî**: mişt tijî

3 **hurujîn**: baraneke xurt reşandin

4 **simêlpalik**: simbêlpoşe

5 **heyr-hejmeke**: heyran û hewesdar

6 **papax**: cureyekî kuman e

7 **tîtal**: -bejna- rîprast û dirêj

8 **kirane**: 1. mêrê bijarte 2. mezin, gir, gewre

9 **badilhewa**: bêsedem, beredayî, beytu

10 **duruz**: nebaş

11 **quncilîn ser hev**: xwe kir gopik, top kir, her wekî qolincî bibe xwe guvaşt.

12 **qest**: 1. mexsûsen, bi zanatî 2. bi henek 3. bi derewî

13 **avrûke mirinê**: bi awireke mîna derba kuştinê

14 **kêlimîn**: axivîn, gotin

15 **e/ye**: ê/yê, di kurdiya Qefqazê de qertafa raveber a nêr wisa tê bikaranîn.

bihata şiveke bi cî<sup>1</sup> bidana destê vî xortî, çirpîke<sup>2</sup> germeşoyê<sup>3</sup> jî bidana min. Çiqas merivên wan dera hebû bihatana lênihêrandinê. De, we bidîta min çawa ew kêlek kêlek weldigerand<sup>4</sup>, min çawa parxanên wî nerm dikir. Xwedê min nekuje, wê rojê têke para min, paşê mirin emirê Xwedê ye.

Xorto dîsa xwest zora xwe nîşanî Kelo ke, lê hevalê wî nehîşt û bi rûsî got, wekî hê hinekî sebir ke.

-Em dixwezin bizanibin, - ewî ahil pirsî, - tu qe hatî girtinê.

-Na. Welleh na!

-Pak<sup>5</sup>. Bêje me binê, te çawa û çima mehîna xwe derbazî wî alî kiriye?

-Welleh, billeh ez haj ji tiştêkî tuneme. Eva çend roj e ez nizanîm "Mircan" li ku ye? Wê rojê hespê siyar bûm, çûme sûka Qemeriyê. Min go, belkî çend miya bikirim. Sûka min reş biqemile<sup>6</sup>, çawa qemilî. De sûk e, min ra li hev nehat tiştêkî bikirim. Berêvarê vegeirîm. Min rê va mehîna hinekî da beza, wekî zû bigihîjme mal, nekevime tariyê. De ro çû ava gihîştme mal. Hespê peya bûm, zîne wê hilda. Nihêrî ewê xuy daye. Min anî, berzînê<sup>7</sup> bi gupikî<sup>8</sup> danî ser piştê "Mircanê" û bi teng şidand, ew qeyd kir, berda. Min go, hinekî şûnda ez ê herim, hespê bînim û berzîn vekim. Hinekî şûnda çûm, îdî mehîna tunebû, ku tunebû.

-Tu were me ra çîroka nebêje! Her tişt bi me eyan e. Yanê<sup>9</sup> na, em ê usa bikin dewata diya te têkeve bîra te! Eva yek. Ya duda, bila gunê te ewledên te, jina te bê!

-Ez bi erd-esman kim, min çawa got, hema usan e.

1 **bi cî:** mehkem, qahîm

2 **çirpîke/çirpiyek:** şivika ter

3 **germeşo:** cureyekî darên ku zû bi zû naşikê

4 **welgerandin:** wergerandin, zivirandin, fetilandin

5 **pak:** baş

6 **qemilîn:** 1. reng lê qemer bû 2. kizirîn \*\*\* **Sûka min reş biqemile:** bazara min hesret here devê kulê

7 **berzîn:** cilika bin zîne hespê

8 **bi gupikî:** bi gulik

9 **yanê:** an jî

-Erê, naha em ê erd-esman nîşanî te kin; usa bikin hestûyê te li erdê, ruhê te jî li esmîn xwe ra cî bivîne!<sup>1</sup>

Pey vê gotinê ra du meriyên mîna du celata derî vekirin. Hetanî her du pîrskar<sup>2</sup> dêrî va derketin, dengê Kelo ew derana hingavt.

Wedekî şevê Kelo ser hişê xwe da hat. Ji tilî-peçiya girtî hetanî porê serê wî diêşyan. Xwest ji ser piştê welgere ser vê kêlekê, wê kêlekê, lê lipitandin<sup>3</sup> bi wî nebû. Bi halekî giran destê xwe li serê xwe gerand. Serî lê gilê gilê bû. Xwest lêvên xwe bicû, lê dêv da tûk zaha bibû, Ziman werimî bû. Hêdî hêdî jan ser janê da dihat, êş li êşê zêde dibû.

Ew çiqasî hatibû kutanê her wana zanibû. Her tiştêk dihate bîra wî, yên ku derb ser derba wî dixistin û dipirsîn:

-Bêje binê, tu kê ra hatî girêdanê? Te hesp çawa, çi wextî derbazî wî alî kiriye?

Sibetirê, danê nivro teqînî ji dêrî hat, tevzî<sup>4</sup> canê Kelo ra çû, wî tirê<sup>5</sup> dîsa hatine wî bivin û ciyê sekinî<sup>6</sup> bikutin, kêlek kêlek welgerînin.

Lê îcar yekî navsere tasek, şerbikek û nava rojnamê da tiştêk danî ber wî û piyê xwe va niçande Kelo, got:

-Rabe, kulê bixwe!<sup>7</sup>

Kelo bi destekî ricaf şerbik hilda, bi dilekî şewat av vexwer. Av vexwerinê şûnda bedena wî ye êvar da alav, kozî girtî hinekî vêsiya.<sup>8</sup> “Xwezila -ewî xwe xwe ra got,- vê demê min ser kaniya gundê me, her du çokên xwe bikuta erdê, devê xwe bikuta kaniyê, tere tere av vexwera, paşê mirin emirê Xwedê bû”.

Paşê te hew zanibû ronahî hate ber çavan û hêdî hêdî qewimandinê qewimî hilxist-daxist<sup>9</sup> û tu re tê ra nedît. Tenê xwe xwe ra got:

---

1 **bivîne:** bibîne

2 **pîrskar:** kesê ku pîrsan ji tawanbaran dike

3 **lipitandin:** lebat, bizav, hereket

4 **tevzî:** êş û janên zirav ên wekî elektrîkê di laşê mirovan re derbas dibe

5 **wî tirê:** wî digot qey, ji wî re wisa dihat

6 **ciyê sekinî:** bêsedem, li ser tiştêkî tune yî

7 **kulê bixwe:** yanê bijehr, bikerife

8 **vêsîn:** rehet bûn, rawestîn

9 **hilxistin-daxistin:** 1. hildan-danîn 2. bilind kirin-nizm kirin

“Lema kal-bavan gotine, Xwedê meriv ji şeran, ji buxdanan<sup>1</sup> biparêze. Xwedê qebûl neke, ez çawa rabim bêjim, buxdanê ser min da dirêjînin, rast in”.

Hinekî şûnda zivirî li tasê û nav rojnamê nihêrî. Nav rojnamê da sê pirtî nan bû, tasê da jî hine ava gewir û du-sê kartol bûn. Lema gotine: “Dixwezî jî ev e, naxwezî jî”.

---

1     **buxdan:** iftira

## 2

Eva çendek bû Kelo îdî nedidane hewaldanê<sup>1</sup>. Roje sê cara teqînî ji dêrî dihat, ew derdixistine derva, ser desta vedigerandine hundur.

Berbangekê hatin, dîsa destên wî kirine qeydê û birin cem wan her du meriyan. Ew dîsa li “çiyê” xwe rûnişt.

-Em bawer in, - ewî ahil got, - îcar tu yê ya rast bêji.

-Welleh, billeh, ez qe nizanim sûcê min çi ye? Hûn çi ji min dixwezin? Ez merivekî nexwendî, kurdekî serê çiya me.

-Pak. Em ê ya sereke te ra bêjin. Em rind dizanin, wekî eva çend cara tu mehîna xwe palan<sup>2</sup> dikî, tiştê dikî nav û derbazî wî alî dikî. Bêje me binê nava palîn da çi dişînî?

-Lo, mala min bişewite, ser mala xiraba. Min tu wexta palan nedaye ser piştê mehîna kihêl! Palan bona godirêja, bona heywanê barbir e.

-Pak, pak! Tu ya sereke bêje.

-Wekî dinê ez tiştêkî nizanim.

-Çawa nizanî? - çêkîst<sup>3</sup> bi dengêkî bilind got, - Ez dîsa dibêm, me ra hemû tişt eyan e, tu bi xwe me ra mukur were, ka binê nava palan da çi diçe, çi tê?

---

1 **hewaldan:** axaftin, xeberdan

2 **palan:** kurtan

3 **çêkîst:** (bi rûsî ye) karmendên ewlehiyê yên dewletê

Ewî ha gotinê Kelo zor da destê xwe, lê lê bû<sup>1</sup> qeydê biqetîne. Wekî qeyd biqetîya îdî Kelo tu tiştî nedinihêrî, wê ew bida ber kulma û bigota: “Lo, nemerivê kurê nemeriv, ne min got palan boy çi ye? Çima femê te tune? Canim, cil ku, xalçe ku, zêr ku, ziv ku, lê ...” Lê Kelo temul nekir<sup>2</sup> got:

-Di riya Xwedê<sup>3</sup>, navê pêlîn nekşîne. Meselen ez dinêhêrim evî xortî şel<sup>4</sup> xwe kiriye, rabim bêjim, na, ewî dêre xwe kiriye, qe usa dibe? Şel ku, dêre ku?

Çekîstê ahal ber xwe da vebîşirî, lê zû rûyê xwe tirş kir, gotinê Kelo veqerande hevalê xwe. Ew ji hêrs ket, lê lê bû rabe Kelo bide ber peyîna, lê zêfta xwe anî.

-De pak! Pak! Em mîna kefa destê xwe dizanin, wekî kaxezê bi nivîsar, ewreqê lazim didine te. Tu jî, nizanîm, berzîn e, palan e, vedireşînî, wan kaxez û ewreqa dikî nav, didirûyî, paşê hespê dibî, derbazî wî alî dikî. Paşê kurapên te ye<sup>5</sup> wî alî, wan tiştê te ji vir şandî hildidin û çeka dikine nava palîn dişînine vî alî. Em vê yekê rind dizanin. Ev gişk mîna ava zêlal me ra zelal e. Naha ya rast bêje?

Kelo zûr bibû<sup>6</sup> li wan dinihêrî. Çi bike, çi bêje: “Erê hûn çi dibêjin, rast e”.

-De, hûn rind zanin, derewî ne şanê mêra ye. Ez çawa rabim maqûlê mîna we ra derewan bikim? Welleh, billeh, bi Quran, bi ziyaret, çi ku we got gişk derew e. Hespa bin min ne dêl e bişînime wir, vir.

Ji wê gotina Kelo çav li wan sor bûn, ji hêrsa nizanibûn çi bikirana. Yekî dest avîte zengil.

Du meriyê gapêran<sup>7</sup> e<sup>8</sup> usa dêrî da ketine hundur, merî ji wana zendegirtî dibû<sup>9</sup>.

1 **lê lê bû:** hema hema dikir ku

2 **temul nekir:** tehemul nekir

3 **di riya Xwedê:** bide xatirê Xwedê

4 **şel:** şal

5 **ye: yê**

6 **zûr bûn:** 1. bêyî çavê xwe biqirpîne li tişteki nihêrin 2. **zûr bûn:** demeke dirêj mehtel mehtel li tişteki nihêrin

7 **gapêran:** mirovê qerase, kesê wekî gayekî

8 **e:** ê

9 **zendegirtî bûn/man:** mehtel man, ecêb man

Ewana rabûn dêrî va derên, ewî ahil bi hêrs got:

-Çiyê we heye feyda kin'?

Dîsa bû ofeof, axeaxa Kelo. Xênî ji kulma, şîla, peyîna wana tiştên mayîn jî feydandin<sup>2</sup>. Lê hemû tişt bêfeyde bû. Her carekê Kelo bi nalenal got:

-Beîsafno, Xwedê jî yek e, giliyê rast jî.

Ew çendek bû halê Kelo ev bû. Hê birînên do, yên pêr necerîbûn, disa derb bi ser derba da dihate lêdanê. Paşê hine ava sar ser da dikirin û dianîn diavîtine quncikê tarî.

Îro jî usa kirin. Weşekî şevê<sup>3</sup> ser xwe da hat, îcar ew daha gellekî ser hev da hatibû hûr-xaşkirinê. Destê xwe bi fesal dirêj kir û şerbikê avê hilda ser xwe da kir. Av vexwerinê şûnda çav reşeve hatin, êşeke derbkuştinê girte eniyê, hat ku biqîre, hewar-gaziyê daxe, lê li kê? Destê xwe va eniya xwe mizda, nişkê va xwînê ji poz ji vir dera hanê avît. Xwîna reş li erdê bû telte telteyî<sup>4</sup>. Hê bîna wî hate ber. Ser piştê vezeziya, çavên xwe girt û kete mitala: Çû derkete gund, malbeta xwe anî ber çavan. Belengaza Gevezê, wê çawa zarokan xweyî ke? Îja<sup>5</sup> serbarê ser da ew e duhal e. Hema vê demê nişkê va dengê zaran bi hev ra li wî tesele bû<sup>6</sup>.

-Bavo, tu li ku yî?

Ji wê pirsê ew veciniqî, tevzî laşê wî ra çû. Ewî bi xwestineke nebîniya<sup>7</sup> va destê xwe kişande serê wan û nuxuriyê<sup>8</sup> xwe Evdile, Enver, keça xwe ye<sup>9</sup> delal Bedîcan bal xwe da rûniştandinê, Nadoyê sê salî danî ser çoka çepê û berbirî wan bû:

---

1 **feyda kirin:** bi kar anîn

2 **feydandin:** bi kar anîn

3 **weşekî şevê:** heyameke kurt a şevê

4 **telte telteyî:** (ji bo tiştê avî) kom bi kom an jî tebeqe bi tebeqe cemidî û hişk bûye

5 **îja:** îcar

6 **tesele bûn:** hatin bihîstin \*\*\* **dengê zaran bi hev ra li wî tesele bû:** nişkê va te digot qey dengê zarokan bi hev re dibihîze

7 **nebîniyayî:** bûyerên ecêb, yên qe nebûyî, yên ku qe kesî nedîtîye-nebihîstîye

8 **nuxurî:** zarokê/zaroka yekem ê/a dê û bavan

9 **ye:** ya.

-“Lawino, tê kivşê ya min ji neheqiyê hatiye, ji vir wê da tirba sar e. De hûn ê mezin bin, her yek we yê bibe mêrkî<sup>1</sup> çê, miqatî diya xwe, xûşka xwe bin. Wekî<sup>2</sup> dayika we ra kurek bibe, navê wî dayînin Kelo. Keloyê kurê Kelo. Navê min, bîr nekin”.

Hema bi van mitala va ew kete xewê. Xewa wî gellekî nekişand. Zû hişyar bû. Ji ser piştê vegeriya ser kêleka rastê. Çavên xwe girt, wekî dîsa têkeve xewê, lê îdî xew lê bû kûvî<sup>3</sup>.

Ewî ew rêzgiliyên<sup>4</sup> vê sibê dergevan wî ra gotî, xwe xwe ra wekiland:

“Yeki bejinbilind pirsra te kir?”

“-Erê, -ew xwe xwe ra kete axavtinê,- ew ese<sup>5</sup> Sedo bûye. Kulê tu mala mêra nekevî, binê dunê da mêrê çawa hene! Erd û esman<sup>6</sup>, birên min jî, ew jî bêne bal min, ez ê tema<sup>7</sup> mala xwe, namûsa xwe bispêrime wî”.

Êmeke<sup>8</sup> dinê mitala dîsa ew da pey xwe bir derxiste wî aliyê Erez û ew dilê xwe da “Mircan”ê ra kete gilî-gotina: “Xwezila naha, ez hêdî hêdî ber bi te bihatama. Ez dizanim tu çav min ketinê tu yê ciyê xwe da bisekinî. Min tu bigirtayî, çavên te mizda, paşê maç kira û bigota:

“Lê lê, bextreşê, bêftbar, tu çima bûyî qesasê serê min? Ne min hema carekê qamçîk<sup>9</sup> te xistiye. Lê te, hela binê, bi kirina xwe çi aniye serê min. Rojê sê cara tîn min dibin, xût<sup>10</sup> wan pirsên mîna hev didine min. Rastiyê va qayîl nabin, min didine ber kulman, ber peyîna, ez çi zanim, çi dikin, çi nakin?

Lê ya here şewat, ya here bi merez ew e, ku berzînê te ra dibêjin

---

1 **mêrkî:** mêrekî

2 **wekî:** heke, eger (carinan wiha hatiye bikaranîn, carinan jî di wateya /mina/yê de)

3 **kûvî:** ajalê nekedikirî yê çol û pesaran \*\*\* **xew lê bû kûvî:** xew lê herimî

4 **rêzgilî:** hevok

5 **esse:** bêgilî, teqez, mutleq

6 **erd û esman:** bi erd û esman (wekî sond)

7 **teme:** tembîh

8 **êm:** dem, kêlî

9 **qamçîk:** qamçiyek

10 **xût:** hema



palan. Ewana qest usa dibêjin, dibên bila kizika min derê<sup>1</sup>, ez xwe da bihelim, mîna qelîneka sêlê da biqelim, mîna goşt beroşê da bikelim. Ewana çi zanin, wekî par na, pêrar min kula dilê xwe ra liva<sup>2</sup> bijare, bire bal livajen<sup>3</sup>. Ewî liva jend, têtêlî kir. Min bi van destan va liva weke hev raxiste ser palazê û bi van piyan va kuta, welgerande ser hev. Heft cara berayî, heft cara dirêjayî pîva, çendî çend cara qalinnayê, ziraviyê nihêrî. Ew bû berzînekî ser berzîna ra. Paşê min dora wî, her çar alî mîna qeytanekê, beraya du tiliya qayîş kişandê. Heft qotazê<sup>4</sup> bi heftreng aliyê pêşîn da dar da kir. Morîke çava, keviyekî biçûk î gilover î hêşîn kire nava her qotazekê. Min go, bila morî hespa kihel ji çavên nepaka xweyî ke; kevirê hêşîn rengê erşê ezmîn e, ji wir wê da mala Xwedê ye, bila Xwedê te ji hemû qeziya biparêze.

Erê, “Mircan” ê giliye min nîvcî ma. Lê lê, “Mircan”ê, naha li welêt jî şev e. Tu ro da kula dilê xwe ra mêrgan, çayîr-çîmana têtêrê çêriyayî, daketî cewa<sup>5</sup> bintara gund av vexweriye. Naha te xwe daye ber zinarê fêza gund, yanê jî daketî jêrê, xwe kutaye dareke biyê û hema mîna min ser pê çavên xwe girtiye. Lê firqûya<sup>6</sup> min û te ew e, tu şîrîn şîrîn ketî xewê. A, ya min tiştêkî mayîn e. Ez him kutame, him gupegupa dilê min e, him jî janê avîtiye bedena min û ew mîna agir-alavekê vêdikeve.

“Mircan”ê, delalê, tîrsa min ne girtingeh e, ne tîbûn-birçîbûn e, tîrsa min ew tîrs e, wekî yekî xerîb te bigire, te siyar be. Ez rind dizanim tu bin nezana da namesî. Welleh, billeh ew ê qamçiya ser qamçiya te xe, bêje:

-Yabiyê<sup>7</sup>, mîratê, bêxweyê, de bilivite!<sup>8</sup>

Ax, dayê dêranê, bêxwedîtî çi derdekî giran î bê dû-derman e.

1 **bila kizika min derê**: hêrsa min were û bitengijim

2 **liva**: hiriya berxa

3 **livajen**: pişekarê ku kulavan çêdike

4 **qotaz**: gulpiq û gulikên berzîn û sîrebendê

5 **cew**: cihoka avê

6 **firqû**: firqî, ferqiyet

7 **yabî**: ne kihêl; hesp û mehînen şevêder ên ku xisletên hespan wînda dikin û wekî keran dibin; êdî bi hêsani tên girtin, sîwarbûn û barkirin

8 **livitîn**: libitîn, hereket kirin, di ciyê xwe de nesekinîn

Xofa ser xofê, birîna ser birînê ew e, rastî jî ew kesê hew bizanibe tu yabî yî û bigire dêlbijîna te bibire, bijî û tûncika te kur ke!”

Ew ji van giliyan veciniqî, lerizî! Hinekî şûnda kela dilê wî rabû û ber xwe da çend dilok got:

*Hatiye nava mala tût-qeysî,  
Min feqîrî ne kirî, ne pirsî.  
Mircanê delalê, tu pey min ra,  
Zengûya nede hemû kesî.*

*Îdî şev e, kekê min ji sebirê nexê,  
Kekê min him dinale, him dikuxe.  
Sebirê, were ber serê wî rûnê,  
Tase ava sar bide, bila vexwe.*

Vê şûnda te hew dizanibû bîna wî hate ber wî û dîsa xwe xwe ra got: “Rastî sebir tiştêkî pak e. Mala Xwedê bi sebirê hatiye avakirinê. Çima beytê şînê dibêjim? Kî dizane sibê wê çi biqewime? Lê kanê kilamên siyara? Lê kanê kilamên mêrxasan? Paşê ewî bendeke kilama siyaran xwe ra got, lê dîsa “Mircan” hate ber çavan û ew dîsa dilê xwe da berbirî wê bû: “Binê, tu carina dikevî xewna min. Xuzila, min bizanibûya, qe ez jî dikevime xewna te? De, xuzil min tu bigirtayî, hêdî hêdî tu destkêş kirayî hetanî ber Erez. Li wir te siyar bûma, derbazî vî alî bibûyama û rasterast biajota, bihatama û ber derê vê kanbaxê bisekinîyama. Min berzînê te nîşanî van necamêrana bikira û bi dilekî na, bi hezar dilî bigota:

-Hûn divînin eva ne palan e, eva berzîn e! Li berzîn jî qul-bêjî tune! Ji kaş-bavan maye, wekî mêrê çê, hespa kihêl, zînê bipergar, çeka rind bona nav-namûsê, bona oxirmê² giran hatine dunê. Ne ku bona fen-fêlan!

---

1 **qul-bêjî:** kunên piçûk û mezin

2 **oxirme:** 1. rê, dirb 2. bobelat, karesat \*\*\* **rojên oxirmên giran:** rojên dijwarî û tengasiyê

Îdî kew ketibû sibê<sup>1</sup>. Kelo ji mitala westiya; ji piya hetanî sêrî beden tevîzî û ew kete xewa nemir-nejiyînê.

Ew heftiya duda bû Keloyê belengaz li quncikê tarî da roj pey roja derbaz dikir.

Girtî gişk derdixistine hewşa kelê gera sibê. Girtiyan dorekê fitil kiribûn yek wê da hat.

Serkarê girtiyan emir kir:

-Ciyê xwe da bisekinin!

Gişk mîna eskerê werzandî<sup>2</sup> pey hev sekinîn. Yê hatî çî got, çî negot, serkarê girtiyan bi dengêkî bilind got:

-Namoyêv Kelo, pêş da werê!

Kelo hat hinberî wana sekinî.

-Bide pêşiya vî hevalî, -serkarê girtiyan got,- here!

Kelo zivirî posîde posîde girtiyan nihêrî.

-Warê, - wî hevalê hatî got, - bide pey min, tu qey dibêjî şuxulê te yê pak be.

Ewî da pêşiyê, Kelo da pey û hatin ji deriyê her car ra derbaz bûn. Te tirê Kelo hê bihîst, wekî ewî çî got û dil da ber dilê xwe: “Lê çima timê birinê duda ez dibirim, him jî destgirêdayî” A îja şidiyayî şidiyayî da gava.

Ewana ber derîkî sekinîn. Kelo xwe xwe ra got: “Ev çî derîkî ecêb e, reş kişandine, dorê jî te tirê bişkoke sipî lê dirûne”.

Demekî kurt derbaz bû, alîkî dêrî derva, alîkî hundur va vebû û gotine Kelo, wekî derbaz be.

Kelo derbazî hundur bû, hema ber dêrî ciyê xwe da tevîzî, lipitan-din bi wî nebû. Sewa her sê meriyên li wir, mezinaya odê, wêneyên dîwêr da dardakirî ew hingavtin. Wana ev halê Kelo rind derz kirin<sup>3</sup> û lema jî yek ji wana rabû ber bi wî hat û destê xwe dirêj kir, got:

-Warê vira rûnê!

Kelo rûnişt û seraser tê derxist, wekî rûniştinok jî ne ew rûniştinok e, merî jî ne ew merî ye, ode jî ne ew ode ye, bi gilîkî hemû tişt nû

1 **kew ketibû sibê:** berê asoyê spîtayî ketibûyê

2 **werzandî:** perwerdekirî

3 **derz kirin:** fehm kirin

ye. Ewî bi carekê va xwe unda kir. Tirsê-xofê ew hilda û ber dilê xwe ra derbaz kir, wekî wê wî bişînine riya çûyîn-nehatê. Go, xwuzula<sup>1</sup> min cara kutasiyê<sup>2</sup> Nadoyê xwe yî tîfal bidîta û teme bida apê, xalê çavên wan li ser wî be, miqatî zara bin. Nado yî gellekî jîr e.

Kelo hê bi van mitalan va dixeriqî, yek ji wana hat pêşberî wî rûnişt û got:

-Namoyêv, hespa te do na, pêr vegeyriyaye. Wê naha te bivine xanîkî. Li wira çend palan hene, tu yê palanê hespa xwe nas bikî?

Kelo bi avrûke kuştinê wî nihêrî û got:

-Heval, min tu wexta palan nedaye piştta mehîna xwe. Ew ne...

Vê demê ewana her sêk<sup>3</sup> bi hev ra kenîyan û dîsa ewî pêşberî wî rûniştî kêlimî:

-Rastî me ra gotine, wekî wedê dibêjin palan tu hêrs dikevî. De, em merivê xwendî ne bona me palan, berzîn yek e. Tişt nabe, van hevalan ra here (ewî destê xwe dirêjî du hevala kir), te ku berzîne hespa xwe nas kir, wê careke dinê te bîne vira, paşê em ê xeber din.

Kelo birine xanîkî binerd. Li wira çend palan, çend berzîn, pey hev danîbûn. Yekî gote Kelo:

-Rind binêhêre, binê tu yê berzîne hespa xwe nas bikî?

Kelo pêş da hat, ser palan û berzîna ra sekinî, çavên xwe li wan gerand, lê berzîne wî gotî nava wana da tunebû.

Ew vegeyriyê wana, ku welleh berzîne hespa wî vir tune, lê nihêrî kunê da berzînekî dinê jî heye. Dûr va berzîne hespa xwe nas kir.

Bi destekî ricaf, lê bi şabûneke nêbînayî va berzîn hilda, ber xwe va kir, ricafî, te tirê ew kirine qeşexanê<sup>4</sup>; çend deqîqa şûnda bi destê xwe va yeko yek qotazan nihêrî, dîsa mîna zareke hizkirî berzîn ber xwe va kir û ber xwe da got: “Ê, min tu bi van tilî-pêçiya çêkirî, wekî bivî qesasê serê min? Lê xweyê te kanê? Ewa çima min ra bêbext derket?”

---

1 **xwuzula:** xwezila

2 **kutasi:** dawî \*\*\* **cara kutasiyê:** cara dawîn

3 **her sêk:** her sê

4 **qeşexane:** qeşaxane, bûzxane

Ji wan mirovan yek nêzikî Kelo bû û got:

-Namoyêv, îdî çî bûye bûye berzîn hilde, em herin.

Ewana dîsa hatine oda gava dinê. Gişk rûniştin. Ji nava wan yekî bejinbilind î jarik rabû û got:

-Namoyêv, tu gotî bibaxşînî. Emir da şaşî dibe. Rabe berzîn hilde, hespa xwe siyar be, here mala xwe. Lê miqatî hespê be, bila dîsa derbazî wî alî nebe.

Ve demê ewî dinê xwe mukur hat:

-Hindik maye, ew bixweze jî, nexweze jî, îdî hespa wî wê nikaribe derbazî wî alî be.

Kelo qe nûqî<sup>1</sup> nêta<sup>2</sup> van giliya nebû. Lê nava van giliyan da rêke ne bi oxir dirêj dibû! Dewrê, zemîn wê çiyakî giran ser kurdan da bihedimanda<sup>3</sup>. Birîn ser birînê da bihaniya. Dibên, derd jî heye, derman jî. Lê birîn hene, ne dû<sup>4</sup>, ne derman dicebirîne.

---

1 **nûqî avê an jî tişteki bûn:** ketin kûrahiya wê/wî, noq bûn

2 **nêt:** 1. fikir û raman 2. wate

3 **hedimandin:** rûxandin, tep kirin

4 **dû:** derman

### 3

Dawiya payîza dereng bû. Li çiyayên pêşberî gundên kurdan berfa ewilîn lê kiribû. Gundiyên zû va karê zivistanê kiribûn. Wana rind zanibû zivistana van dera çawa tê, çawa diçe!

Kal, pîren xwedanên gewlezên<sup>1</sup> salan, ku li her germayî-hênikayî, sur-serma van dera rûyên xwe, por-guliyên xwe sipî kiribûn, rind dizanibûn pey heftiya dinê hewa wê çawa be. Ewana îdî bibûne heval-hogirê tebiyete. Te qey digot rozgarên<sup>2</sup> salê pêş da dihatin, guhên wan da dikirine piçepiç<sup>3</sup>, şehdetiya hatin û çûyîna xwe didan.

Te hew dinihêrî pîrika Seyrê, yanê kalikê Heso berbangê, berî gişka radibe, xwe dide ser riya fêza gund û teme dide şivan, gavan, rêwiyan riya dûr:

-Lawo, birao, qe hişê min îro ji van ewrana nabire, sivik xwe neke<sup>4</sup>!

Yanê jî digot:

-Îro keriyî pêz bernede beroja, te hew nihêrî zîpikê lê da. Pêz daxê gêlî, xwe dûrî şikevta negire.

---

1 **gewlez/gelwaz/gewlaz:** 1. bendê ku dendikên gûzan, hêjîr û hwd. li ser têne raxistin 2. (mecazî) tecrube

2 **rozgar/rojgar:** çerxa demê

3 **piçepiç:** pistepist

4 **sivik xwe neke:** kincên zirav û sivik li xwe neke

Şivan, gavan, rêwiyên riya dûr ji gilî-gotin, tema pîrika Seyrê, kalikê Hesodernediketin. Hinek ji riya xwe vedigerîne mal û hê bitivdîr derdiketine ser oxirê; yanê jî tu dera da nedîçûn.

Bîra wan da gellek rojên bi şayî-şîn, rojên reş-sipî mabûn. Lê wana nizanibû rojek ê bê, ne ku wê bîra wan tenê da bimîne û ew ê wê rojê, wê salê xwe ra bibine axa sar; feqet ew rojê, ew salê bibe teniya zemanekî û tu demî ji bîra biçûk-mezinan dernayê. Ew rojê, ew salê bibine belgekî<sup>1</sup> dîroka kurdan.

Belê, roj hene bi şayî, roj hene bi hewar-gazî, bi şîn tîn. Roj hene dibine dîrok. Rojên dîrokê ye usa hene ewana sal bi sal mîna cejnekê tîne derbazkirinê, lê roj hene mîna roja qetilkariyê<sup>2</sup> tê bîranînê. Ew roj dibine birîn û dikevîne dilê gel. Dû-dermanê rojên usa zû zû dest nakeve. Dermanê rojên usa bi hezar qurbana va tê serê xwe. Wî dermanî ra dibêjin: Azayî!

Rojên payîza sala 1937a ser pareke gelê kurdan da mîna ewrekî reş hat, pêşiyê kire guregur, paşê ba-bager anî, dawiyê da ewana dane ber zîpika wede, şîpûka zemîn, çawa dibêjin, ji vî serê dunê ewana birin derxistine serê dinê.

Aha, rojekê eskerên bi nişana sor ketine gundên kurdan, dadane<sup>3</sup> malên giran, giran hîştin, sivik bar kirin, pey hev çend êşalonê rê kirin. Çend roja şûnda li bajarekî giran êşalon<sup>4</sup>, vagonê barbir ji hev qetandin, hinek ber bi rastê, hinek ber bi çepê verê kirin<sup>5</sup>.

Mala Kelo tevî çendî çend mala ber bi rastê rast kirin. Ewana rê anîn, anîn û êvareke tarî li ber behra Xezere hêwirandin. Li vira mala koç kutane koçên hev. Kulê tu mala neyara kebî, dora wana usa birîbûn, yekî nikaribû gavekî vir da, wê da biavêje.

Hay dewranê tu kor bî! Merî jî qe destê mêra aha dide ber rûyê wana, merî jî ciyê sekinî mêra ji mêrantiyê dixel!

1 belg: 1. rûpel 2. belge 3. nişan

2 qetilkari: qetliyam, komkuji

3 dadane malên giran: avêtin ser malên mezin û êriş birin ser

4 êşalon: çend selikên hev ve girêdayî; rêzevagonên barbir

5 verê kirin: şandin

Apê Sedo, kalikê Heso, Keloyê camêr, Deloyê bi heytehût<sup>1</sup>, Husoyê dayî, stendî û yên mayîn belengaz bibûn, te hew zanibû her yek bûye gulokeke reş e li hev alandî û avîtine quncekî tarî. Hemûya rojê vir da, wê da gav didan, rûyê hev diniherîn, lê tu rêk, tu dirbek verevurt nedikirin<sup>2</sup>. Bawer bikî te vê demê bigota wana, wekî azaya we ser miçiqandina vê behrê ye, her yek wê bibûya hûtê binê behrê û behr bimiçiqandina û rêke fire ber gel vekira.

Lê ax, wex ...

Tenê wana teme dida zaran, wekî ava behrê venexwin, ewe şor e. Lê Sano, Xidir, Gulîzerê, Sefo û yên mayîn dizînkê va ava behrê hinekî tehm kiribûn, hineka kulma xwe tijî kiribû vexweribûn, digotin, çawa yanê av şor e, qe av jî şor dibe. Ne ewana ava kaniyê jî, ava baranê jî vexweribûn, lê qe çima şor nîbû?

Sê roj, sê şevan şûnda berêvarê koç dîsa koç kirin, îcar malê hineka bar kirin bin erdê, malê hineka bar kirin ser erdê. Kurdên emirê xwe da gemî nedîtî qatê yekê ra digotin: "ser erdê", yên dinê ra "bin erdê".

Tariyê erd, esman û behr hingavtinê gemiyê kire borebor, pêlê behrê qevz kir, te hew dizanibû ewa ji dunya ronahî rê ket, kete dunya tarî. Şeva erşê esmîn, tariya behrê li hev piçilikîn<sup>3</sup>, merivên emirê xwe da behr, gemî nedîtî dibiziyan<sup>4</sup>. Demeke şevê wêlîwêlîke<sup>5</sup> usa kete nava jinan, qîreqîreke usa kete nava zaran, ax, offîneke usa hate ser mêran te hew dizanî dewir-zeman ser hev da weldigere. Hinek kêlek kêlek ser hev da weldigeriyan. Hinek vedireşiyên, hineka ava xalî ji dêv dihat, hineka xwe nikaribûn ser destavê ra bigihînin, binê xwe şil dikirin.

Hetanî gaveke şevê, çawa behrê pêl dida ser pêla, a usa li wan gewimîbû: yekî dixwest alîkariyê bide yekî, ew bi xwe jor da dihat.

Bavo tu kor bî, ev çî hal, ev çî hewal e, ev çî şîpûk<sup>6</sup> bû!

- 
- 1 **heytehût**: heytehol, qelebalix
  - 2 **verevurt kirin**: 1. berawird kirin 2. tesele kirin, kontrol kirin 3. çareser kirin
  - 3 **piçilikîn**: alîn, geriyan \*\*\* **li hev piçilikîn**: li hev geriyan, li hev aliyên
  - 4 **bizîn**: bizdîn, tirsîn, ji hal ketin, reng lê çûn
  - 5 **wêlîwêlî**: wêlewêl
  - 6 **şîpûk**: bobelat, keresat, felaket, belengazî, xirabî



Zemano, tu bela bî, ev çî agir-alav e! Xwedao, Tu bi Xwe avekê ser vî agirî da birêşînî! Na welleh, av bi xwe jî bûye agirekî, van hêsrana dişewitîne, diperitîne, dikelîne!

Dibên, ruhustîne meriva Ezrêhîl e. Ew mirovan dike bin qeziyayê; yekî çêm da dide rodanê, yekî çiyê da dide holkirinê, yekî ji ser hespê diavêje, yekî çiyê sekinî pirtî gewriyê da dihêle, yekî dide satircem-kirinê<sup>1</sup>, zû, yanê dereng dûmeka<sup>2</sup> mêriv duqusidîne<sup>3</sup>.

Lê ew qe nakeve bîra însanê<sup>4</sup>, lema jî rojekê ji Ezrêhîl dipirsin:

-Ruhustîno, ruhê hemû benda tu distînî, lê tu qe nakevî bîra tu kesî, hezarekî carekê nifira li te dikin. Ev çî sur e?

Go:

-Belê usa ne. Ez ruhê her merîkî bi rêkê, bi hezar delk-dolava<sup>5</sup> di-dime ber meqesê, lema jî kê m kê m dikevime bîra însanê. Nifirkirinê, dibêjin: Çemo, tu bimiçiqî; hespo, piyê te bişkê; çiyayo, tu hilweşeyî; pariyo, tu jehrdada<sup>6</sup> bî!

Naha Stalîn û merivên dora wî bi destî NKVD bûne Ezrêhîl, ruhustîne merivan. Ew kê dixweze bi destî wana rehet ji nav dide hildanê. Gel dide qirê, lê ew jî, mîna Ezrêhîl nakeve bîra tu kesî. Tu kesekî nizanibû, wekî NKVD bi ruhê Stalîn va hatiye pêçandinê, astarê wan ew e. Beriya dewir-zeman da gellek zeftkar û hukumdarên birc, qesr bi xwînê va dane mewicandinê<sup>7</sup>. Binihêre binê gel beyt-serhatiya “Mem û Zîn”ê da nîgara<sup>8</sup> wezîrê welatê Muxurezemîn Bekoyê Ewanî çawa nitirandiye. Bekoyê Ewanî hîn bûye, wekî her ro xwînê bide rêtinê; roja ku ew beqeqomsiyê<sup>9</sup> dike, roja ku dibe sebebê mirina mirovekî wê şevê rehet radizê. Ew her êvar ji qesirê vegefnê mal, bi şabûn kevirekî biçûk î reş dide keçika xwe û dibêje:

1 **satircem:** cureyekî zikêşa giran e ku carinan mirovan dikuje jî

2 **dûmek:** nesl, zuriyet

3 **qusidandin:** kok qelandin, ji holê rakirin

4 **însanê:** mirovahî

5 **delk-dolav:** dek û dolab, fend û fût

6 **jehrdadayî:** jehrkirî

7 **mewicandin:** tê de gevizandin, tê de gut kirin

8 **nîgar:** wêneyê bi dest çêkirî, xêzkirî

9 **beqeqomsî (beqeqomsî):** kesê mirovan berdide hev, gili-gotinê derew dike, vizek û durû

-Bibe, biavêje ser wan kevirên dinê, rind xweyî ke.

Carina Bekoyê Ewanî mal da tenê manê, yanê jî roja tişteki xirab nekiribe, wan kevirên reş hildişîne ber xwe, mîna tişteki hêja pê ra kêfxweş dibe û xwe xwe ra beşeve tê<sup>1</sup> dibêje:

-Eva Heso ye, eva Delo ye, eva Çekan e, eva Mem e, eva Zîn e û hwd.

Her kevirêki destê wî ruhê bendekî ye, mirazê evîndarên bextreş in.

Her kevirêki reş nîşana kaf-kuna<sup>2</sup> malbeteke bi tifaq e, maleke rengîn e. Lê îro ew gişk bi destê Beko li perrê merzel in. Her kevirêki reş jimara çendî çend sêwiyên ber diwaran in! Beko ev kevirana danê destê xwe, ew ruhberê, ku neheq şandiye dunya tarî, têne ber çavên wî. Ew wê demê hemû tiştî bîr dike û hew dizane ew zêndî bûye ruhberêki, pêşberî wî sekiniye û mîna merivê hejpeketî zû ji ciyê xwe radibe, bi destên ricaf dêrî, roderan digire, usa dike ronahiya weke derzîkê nekeve hundur û her du desta diavêje “qirika” wî bendeyî, dest pê dike wî dixeniqîne. Ew û bendeyê goristanê tariyê da destpîçolkî hev dibin, usa dibe xwîdan ser wî ra diavêje, xirexir wî dikeve, gewriya wî, dev, lêv kef dide, diwaste, dikesire, kutasiyê helehel pê dikeve, wî tirê ewî tase xwîn vexwariye, kêfxaş dibe û hê diçe ser kursiyê wezirtiyê rûdinê, hêja qetilê ser qetilê da tîne.

Çima usa ne? Ji ber ku hevîrtirşkê hevîrê nanê merivên aha bi xwîna merivayê va hatiye strandinê. Hevîr hilatinê, ewana firnax dibin<sup>3</sup>, giliyê mirinê dibe pizika ser zimanê wan, bi pênuşa destê xwe va hukmê mirinê dinivîsîn û dibêjin: “Hemû tişt ya me ye, hemû mirov qûlê<sup>4</sup> me ye”.

Lê ewana hema tenê carekê ji “erşê” esmîn dakevine nava gel û evê bûyerê bibihîzin, usa xwe nemirî hesab nakin!

“Go, rojekê kurê padşahkî li hebûna der-dora, xezina zêra, xulamê ber desta nihêrî û ji bavê pirsî: “Bavo, ev hebûn, ev xezine, ev meriv, ev kerî, garan, revoyê hespan, ev erd, ev erş gişk ya me ye? Bavê li kur mêze kir got:

1 **beşeve hatin:** vebişirîn

2 **kaf-kun kirin:** wêran kirin, kevir li ser kêvir nehiştin

3 **firnax bûn:** şanaz bûn

4 **qûl:** kul, kole

-Na, lawo, ev wede, ev dewir ya me ye”.

Beko jî aha, Çingîzخان jî ha, Hîtîlêr jî aha, Stalîn jî aha, Seddam jî aha ...

Bal merivên aha rastî-nerastî, heqî-neheqî, şev-ro, sipî-reşayî ser teşîkê tê rastinê, dibe tev hev, ro-robariya<sup>1</sup> wan yek e. Bi destî wan xwîn hatine rêtinê, xwîna rêtî pijikîne ser wana, paşê ew xwîn dilop dilop ketine firşikê<sup>2</sup> wana, ew fire dibe û ewana dilê xwe da vedigerin dibine merivên nemirî. Tiştêk nakeve bîra wana, tenê ber çavên wan telte telte xwîn tê kivşê, ewana dixwezin ew xwîn mîna qeşakê qalim qalim<sup>3</sup> hev bigire, bibe pireke bê serobino, ewana jî ser ra gavan kin, herin, bên.

Vê gavê te hew zanibû erd qelişî, kalekî ridansipî<sup>4</sup> derket, şûr dêst da, ser wede-zemîn da kire qîrînî: “Ez Kulik im, hinekî jî guh bide min: “Eva jiyîna kurdan ya naha ne jiyîn e, ne mirin e! Eva şipûk e! Eva qîra pareke gelê kurd e! Neyarê kurdan dîrokê da gellek cara xwestine dûmeka wan aha biqusînin<sup>5</sup>. Bobelîskê aha dor bi dor hatiye serê kurdan. Bila neyarên kurdan rind bizanibin, wekî gava Kela Dimdimê zeft kirin, hatin rikinê kurdan carekê va biqetînin. Berî teqandina kelê balîndekî hat jineke duhal<sup>6</sup> bilind kir, danî ser dîwarê kelayê. Kela teqandinê, bayê kelayê ewa wê da, avîte dûredûr. Jinik welidî, dîsa kurdan dunê xemilandin”.

Sibe li kurdan gemiyê da ron bûnê, dûr va çiya hatine xanêkirinê<sup>7</sup>. Çiya bona kurdan mîna ziyaretan e. Dibên, wedê kurd hînî sondxwerinê bûne, bi hev ra bi du sonda sond xwerine: yek Ro, yek jî Çiya.

Dîroka kurdan da tiştêk eyan e, tiştêk gellekî zelal e. Ew jî ew e, wekî çiqasî ew rastî zulmê, rastî rojên reş hatiye ewqasî xwe nas kiriye. Bona zulm û rojên reş bêne pêpeskirinê<sup>8</sup> kurdan çek hildane,

- 
- 1 **ro-robarî:** 1. serencam 2. encama hesabekî matematikê
  - 2 **firşik:** kîsê ziravkê
  - 3 **qalim:** qalind, stûr
  - 4 **ridansipî:** rihspî
  - 5 **qusandin:** 1. qut kirin, birîn 2. kok qelandin, jî holê rakirin
  - 6 **duhal:** ducanî, giran, hemile
  - 7 **xanêkirin:** xuyakirin
  - 8 **pêpes kirin:** binpê kirin, pê lê kirin

kihêla siyar bûne, pişta xwe kutane çiya. Çima? Te tirê kurd hemû dunê geriyane, westiyane, wekî rastî sê bilindaya bên. Yek Heqîqet, yek Bawerî, yek jî Saxlemî.

Paşê kalekî ridansipî yî mîna berfê ji şikeftê derdikeve, bi gopalê destê xwe erdê dixê, kurdan dora xwe beşter dîke<sup>1</sup> û bi şewirdarî dibêje:

-Min buhust buhust dunê hev xist, dewran derbaz kir. Çi ku hûn lê digeriyar, ez jî lê digerim. Min ew sê tiştê bilindayê: Heqîqet, Bawerî û Saxlemî li çiyar dît.

Ey kurdino, berê xwe bidine çiyar, pişta xwe bikutine wana. Kevir-zinaran xwe ra têkine çarmedor<sup>2</sup>, şikeft, zeran<sup>3</sup> xwe ra têkine avayî. Dûmana wê xwe ra bikine lihêf, binrex<sup>4</sup>, kevirê wê bikine balgî. Ava wê şîrê dê ra tevayî vexwin, hewa wê hê zarotiyê da daqurtûnîn, bi hebûna wê debara xwe bikin. We jêrê, bintara çiyar, ajotin, çandinîkirinê hinek axa çiyar bibin, wan dera bireşîn, bila xêr-bereket pêş da bê. We bajar ser hev da anînê berê qesirê mezin ber bi çiya bikin, hîmê<sup>5</sup> gundan dûrî çiya daneynin.

Çima? Dûmeka dunyayê dirêj e. Merivayê wê ra gav daye, wekî zulmê, qetilkariyê pêpes ke, wê dirêjayê qevz ke, bigihîjê wan bilindaya. Lê merivayê nizanibûye, ku ser şîrîta vê dirêjayê heqî, rastî, derewî, saxlemî, nexweşî hatine raxistinê. Ev şîrîta bêserobin e. Merivayî çiqasî serkariyê bike, çiqasî biçerçîre<sup>6</sup> nikare ji vî serê dirêjayê ra derbazî serê dinê bibe. Çawa eyan e erdê dunyayê gilover e. Ji nava wê guloveriyê ra ew şîrît du aliya ra aliyê rastê, aliyê çepê ra derbaz dibe. Aliyê rastê ra heqîqet, bawerî, saxlemî, aliyê çepê ra neheqî, derewî, nexweşî derbaz dibe. Aliyê wê şîrîte yî rastê tê çiyar diale. Çiya nahêle ew aliyê şîrîte yê rastê ji wî wê da derbaz be. Lê aliyê şîrîte yî çepê li tu çiya naale, loma jî ewê dunê hingavtiye.

1 **beşter:** beşdar, kesên kombûyî

2 **çarmedor:** çeper, çit û sûra dorê

3 **zer:** kendal

4 **binrex:** raxistina binî, ferş

5 **hîm:** xîm, esas, bingeh

6 **çerçîrîn:** xebitîn, têkoşîn

Kurdno, rind bizanibin! Ev zinar û kevirên çiya, ji şahan, padişahan, înpêtoran nermtir e. Dema ewana bona text-tacê xwe xayî kin, dewsa avê xwînê didine rêtinê, wê gavê meriv berê xwe dide çiyar. Çiya wana dike nava hemêza xwe û ji zulma reş xilaz dike.

A, ji wê şewirê şunda, pey wê rojê ra kurdan qurne<sup>1</sup> bi qurne xwe bi çiya girtine. Bona dijmin alt ke<sup>2</sup> pišta xwe kutaye pišta çiya, mizgevt, şikeft xwe ra kiriye sitar, dûman, xwe ra kiriye cî-nivîn. Avên wê ye zelal, hewa wê ye sar, sert bûye dû-derman. Van gişka ra tevayî tu hew dizanî misqal misqal, hebik hebik kevir firîne, ketine nava ruhên kurdan û ew ji mîna zinara ber şipûka qurna qels nebûye, nehatiye hûr-xaşkirinê. Mîna çiyar kubar, qayîm bûye. Paşê sal bûnê gewlezê qurna! Çiyar mêranî, mêrxasiya kurdan dibîne hê Çiya û Kurd dibine destebirake hev.

Kî çî dibêje, bila bêje, kurd û çiya cewî ne.

Kurd bi kirina xwe va, çiya bi hebûn, bilindaya xwe va hatiye naskirinê. Lê carina yek bi destî şipûka tebiyetê hilweşiyaye, yek gava dujmin erişt ser wan kirinê mixenetê<sup>3</sup> hundur destekî va serê hespa neyara girtiye, destekî va jî zengûya zîn û lema jî ew alt bûye.

Vê berbanga sibê ya heşir-meşirê Sedo çiya dîtîne mîna zara şa bû. Dilê xwe da got: “Şukur hêsîr ji xezabê xilaz bû” û dakete qatê jêrê mîna mizgînîke bi xêrê got:

-Kelo, bira, îdî behr xelaz dibe, dûr va çiya têne kivşê!

Kelo tiştêk negot û wana dane pey hev derketine jorê.

Beşera<sup>4</sup> wî jî xweş bû. Ev behsa bi xêr-xweşî bû berbîna<sup>5</sup> biçûkmezina.

Ew kesên êvar da nikaribûn serê xwe hilbirin<sup>6</sup>, ev behs bihîstinê, çawa dibên, ruh ber ruhê wan da hat û derketine qatê jorîn. Him

1 **qurne:** sedsal

2 **alt kirin:** mexlûb kirin

3 **mixenet/minexet:** xayîntî, xedarî

4 **beşer:** 1. rû, çehre 2. mehde

5 **berbîn:** tiştê ku bêhna mirovan vedike

6 **hilbirin:** bilind kirin

çav çiya ketin, him jî hewa şebeqê<sup>1</sup> li dêmê wan ket, ewana xwe da hatin. Hinekî şûnda bawer bikî gişk derketine qatê jorê. Lê Sedo dinihêrî hinek hê ser hişê xwe da nehatine, bîna wan diçike, nişkê va bi dengêkî bilind berbirî<sup>2</sup> Kelo bû:

-Kelo, bira, tê bîra te, gava em zar bûn, malên me diçûne bereka<sup>3</sup> Agiriyê zozana. Kalikê êlê-obê em zar beravî dora xwe dikir û hînî govenda, “Çiya û Meriv” a dikir. Deste zar dibûne “Çiya”, deste dibûne “Meriv”.

Naha ez bibime “Çiya”, tu hibe “Meriv”, ez ê bêjim tu li min ve-gerîne.

Kelo derz kir, wekî Sedo dixweze bi kirina xwe va rê kin ke, vî halê dijwar êmekî ji bîra meriva derxe.

-Sedo, bira, xwezil wan roja, -Kelo got, - erê, rind tê bîra min. De, tu bêje, ez li te vegerim.

Çiya gote çiya:

-Ka bendê van çiya?

Go: - Berfê, baranê dayê,

Revîn ketine xaniya.

Çiya gote çiya:

Ka koçerê van çiya?

Go: - Malên xwe bar kirine, çûne gundan.

Çiya gote çiya:

Çiya bê mij, dûman nabe,

Malbet bê mezin, êl bê serkar nabe.

Go: - Belê, usan e, nabe, nabe.

Evê hevvegerandinê êpêcekî kişand. Wana bi miqamekî usa deng dane dengê hev, qaydê wê kete çokê hineka. Xewar gişk heşiyar bibûn.

Îdî gemî gihîşte berrê<sup>4</sup> behrê. Dîsa “mal” li dev behrê pê da pê da “cî-war” kirin. Serkar, rêdarê<sup>5</sup> nefîkiran yekî bejinbilind î çûr bû.

---

1 **şebq:** serê sibê, şefeq

2 **berbirî yekî bûn:** berê xwe dan wî û pê re axivîn

3 **berek:** dever

4 **berr:** bejahî, erd

5 **rêdar:** rêvebir, berpirsiyar

Meriya qe nizanibû ew çî millet e. Him bi rûsî, him bi zimanê gelê kavkaziya dizanibû.

Du-sê seheta şûnda, ewî mezinêkî her malekê dora xwe civand û got:

-Hevalno, hûnê du-sê roja vira bimînin, hetanî poyêz<sup>1</sup> hat. Bi poyêzê va em ê we bivin derxine cîkî “oçen xoroşo” (zef rind).

Ji kurdan tu kesî navê wî nizanibû. Eskeran berî hildana navê serkarê xwe digotin: Tovarîş (heval). Îdî ev gilî kete devê kurdan û kî berbirî wî dibûn, digotin: “Tovarîş”. Lê kurdan nizanibûn, wekî ew “Tovarîş” xebatkarê NKVD bû. Paşnavê wî Îsayêv bû. Kurdan nizanibû ew zulmkarekî çawa bû? Ewî xênî ji rûsî, ermenîkî, tirkî, gurgîkî zanibû, hê serbarê ser da jî kurdî pak fêm dikir.

Xênî ji Tovarîş 9-10 eskerê bi çek danîbûne ser nefîkiran. Wana nedihîştin yek gavekê vir da, wê da bavêje.

Dema li Bakûyê, li dev behrê çend rojan manê, rojekê Kelo nêzîkî Tovarîş bû û got:

-Tovarîş, tu destûrê bide, em dû-sê kes herin sûkê, hinek tişt bi- kirin, zar ji dest diçin.

Ewî êpêcekî mitale kir û got:

-Tenê destûra du meriva didim. Yekî jî hilde here.

Kelo, Sedo karê xwe kirin, sê esker jî wan ra çûne sûkê.

Rê va, li sûkê eskeran zû zû digotin:

-Nêlzya!

Wextê, paş da ji sûkê vejeriyanê Sedo gote Kelo:

-Bira, bihêle ez tifinga destê vî eskerê çûr bistînim, yekê berê eniya wî dim û bêjim: “Nêlzya”.

-Na, -Kelo bersiva wî da, - hela bihêle ka binên<sup>2</sup> çî tê serê me. Paşê jî ev esker çî kare ye<sup>3</sup>. Teme usa dane wî. Av ji jor da şelû dibê.

-Çî tu dibêjî meslihet e, zanim bextê min ne ew bext e.

Naha jî ew esker vir da, wê da diçûn, dihatin, dîsa mezin, biçûka ra digotin:

1 **poyêz:** (bi rûsî ye) şimendîfer, trê

2 **binên:** binêrin

3 **çî kare ye:** çawa ye, çito meriv e/tişt e

-Nêlzya!

Vê demê ji eskera yekî yê mayîn ra got, wekî bicivine ber xaniyê sipî, Tovarîş gazî dike.

Ew neh-deh esker beşter bûnê şûnda, ewî teme da wana, çi bikin, çi nekin paşê got:

-Herin, ji her malekê mêrekî waynîne<sup>1</sup> vira, wana ra jî gep kim<sup>2</sup>, paşê ez ê herime bajêr.

Êmê çend deqîqa şûnda mêrên kirane, çok lê şikestî, rengxitimî beravî bal xaniyê sipî bûn.

Tovarîş mîna qitîkê kullê<sup>3</sup> wê da hat, pêşberî camêra sekinî û kêlimî:

-Hûn ê çend roja li vira bimînin, tu kesek derekê da neçe.

Lê vê demê kesek tunebû, wî ra bigota: “lo, mala te kavila kulê bê! Ka rê-dirb heye em ê ku da herin? Para va behra bêserobin e, pêş da rêke mîna şiverê ye, ew ku da diçe Xwedê dizane?”

-Ez ê naha herime bajêr, -ewî ser gotinên xwe da zêde kir, - we ra nan û avê bişînim.

Gava Tovarîş got, wekî ez ê avê bişînim, mêra rûyê hev nihêrîn, canim ev çi dibêje? Te hew zanibû Tovarîş nêta van camêra fehîm kir û dîsa xwe mukur hat:

-Vira ava vexwerinê tune. Avê bi maşînê tînin. Tişt nabe. Dijwariya we, ya du-sê rojan e!

Vê demê maşînek wê da hat ber xaniyê sipî sekinî. Tovarîş xatirê xwe ji eskeran xwest u maşînê siyar bû çû.

Ew çûnê şûnda her kes hate ber “koça” xwe û ketine heyra pirsê: “Gelo, li wan dera çima ava vexwerinê tune? Lê ev çiya çi çiyân e? Çiya bê av nabin?”

Tu kesî bersiva van pirsê neda ... Ro jî hêdî hêdî li wan diçû ava. Êpêcekî şûnda tariyê erd hingavt. Dest bi gujeguja bê bû, pêlên behrê ser hev da avîtin. “Koçberê” zulmê ketibûne nava tarî-tarîstanê. Hinek birçî bûn, hinek tî. Hinek serî lê diêşiyân, hineka bedena wana

---

1 waynîn: anîn

2 gep kirin: axaftin

3 qitîkê kullê: bela, kareset, ne bi xêr



diziqitiya<sup>1</sup>. Qîjeqîja zaran, wiyewiya dayîkan, axeaxa kalan-pîran, ofeofa ahalan bû. Te tirê tebiyet reş xemilî bû, bendê wê jî şîn dikir.

Bi halekî dijwar jina devê fermeşa<sup>2</sup> vekirin, kulav raxistin, cî-nivîn danîn, wekî zaran bidine paldanê, xwe jî demekê şûnda razên, ranezên, kesek nizane.

Nişkê va ronahî hate xanêkirinê. Te hew zanibû zulmet<sup>3</sup> tîştîşî bûye<sup>4</sup>, tûrêjên tavê dixweze xwe bavêje ser kurdên nefikirî.

Biçûk-mezina çavên xwe kutane wê ronahiyê. Hinekî şûnda dengê maşînekê hate bihîstinê û her ku diçû ronahî ber bi wan dihat. Gişk şa dibûn ... Lê wekî te ji yekî bipirsiya:

-Tu çima şa dibî? - yeqîn wê zûr bibûya rûyê te binihêriya.

Ê, dunê da çi hebûye, çi tunebûye? Çi qewimiye, çi neqewimiye? Hingî merivayî xuluqiye çi hatiye serê wî, çi nehatiye? Mirov zîndanê da, çelem<sup>5</sup> dest-piya da, rind zanibûye sibê wê bên, wî bibin û celadê serê wî bi heqî, neheqî lê de, lê teqînî ji derî hatinê bawerî tijî dilê wî bûye. Mirov nava tarî û herîreşkê<sup>6</sup> da ew çend roj bêgav maye, bîna wî hatiye-çûye, dûr va ronahî ditinê hêz hatiye wî, dunê ber çavên wî sor qemiliye.

Gel bi salan tî, birçî, tehzî, serqot, pêxas, nava xelayê, nava zulma hukumdaran da, mîna tişteki di nava xwînê da bimewicînî usa hatiye mewicandinê, rabûye text-tacê vî padişahî, wî hukumdarî hûr-xaş kiriye, wî hew zanibûye îdî ew derkete firayê, azayê û hetavî<sup>7</sup> yê derê her yekî bikute. Lê hey dunyayê, tu çiqasî bi telik-tolav î<sup>8</sup>. Kanê ew mirov serederiyê<sup>9</sup> ji te derxe, te vejene, nûqî binê behra te be û bizanibe çi heye, çi tune?

1 **ziqitîn:** êş û jan lê rabûn

2 **fermeş:** cureyekî têrên wekî xaliçeyan raçandî ye û nivînan dikinê

3 **zulmet:** şeverêş

4 **tîştîşî bûn:** qelişîn, derizîn

5 **çelem:** kelemçe

6 **herîreşk:** cihê bi av û herî

7 **hetabî / hetavî:** xweşbextî, serfirazî, békederî, huzûr

8 **telik-tolav/delk-dolav:** dek û dolab

9 **serederî:** çareserî, karîn \*\*\* **serederî jê derxistin:** çareser kirin, pê karîn

Maşîne hat ber avayê sipî sekinî, paşê ajote nezîkî “koçên” koç-bera.

Eskeran hatin gotin:

-Nan anîne, bila ji her malekê yek bê, nanê para xwe bistîne.

Gelleka pirsîn:

-Lê av? Lê ava vexwerinê?

-Avê wê sibê bînin.

Derdê avê gişk hildan ...

Zarokan tî da ava behrê vedixwerin...

Hey Xwedêyo, tu vê zulmê qebûl neke! Her malekê nanek, nannîvek stend. Lê kanê barê êr? Lê kanê teyşt, hevîrtirşk, bûken zendzer? Çok bikutine erdê hêvîr bistrên. Ser teyştê pipêçînin, heta hevîr hilê, qirşika-kerma amede kin, ewana binihêrin îdî wede ye, hevîr hila-tiye, tendûran dadin. Paşê yek xwe bikute vî alî tendûrê, yek xwe bikute vî alî, yek bi kerdeneke va hêvîr veke, ya dinê hilde tendûrê xe û nanê loş bide ser hev. Nanê mehekê, duda carekê va dipeht. Yek wê da hatinê, xar be nanekî germ hilde, here maldizkê; destê xwe têke eyarê pêniîr, hinekî derxe, qûçekî<sup>1</sup> te gotî çêke, bixwe, hetanî sibê ...

Wê şevê mezin ji derd-kula, biçûk ji tîbûna ranezan. Berbangê, gava kew ketibû sibê, hesîrê ber behre ketibûne xewê. Lê çend zarên pênc-heft salî dizînkê va xwe gihandine behrê, av vexwerin û dîsa hêdîka hatin ketine ciyê xwe.

Danê evarê maşînek wê da hat, gotin ew maşîna av aniyê<sup>2</sup> ye.

Çawa dibên “bineliyên”<sup>3</sup> koçber qe serederî ji tiştêkî dervedixistin<sup>4</sup>. Maşîne ber avayê sipî sekinînê şûnda, avtoajo<sup>5</sup> derkete ser maşînê. Jinên li stansiyê<sup>6</sup> karkirî elb, beroş anîn, ewî bi kodeke mezin va fera-fotik, derdanên<sup>7</sup> wan tijî av kir.

1 **qûç:** hop, balûle \*\*\* **qûçekî te gotî:** hopekî bi dilê te

2 **maşîna av aniyê:** erebeya av anînê

3 **binelî:** niştetih, gelhe, mirovên li gund, bajerekî dijîn

4 **serederî ji tiştêkî derxistin:** pê karîn, çareser kirin

5 **avtoajo:** ajovan

6 **stansiya:** rawestgeh, istasyon

7 **derdan:** tiştê ku tiştên avî dikevin hundir elbik, bîdon, bermîi, vêdrok

Zarên nefkiriya usa dora maşînê girtin, usa li avê hatine hewarê, te qey digot, bexê kelî ne<sup>1</sup> çav xoyê ketine, kalekala wan in, lê devê wan nagihîje tu tiştî. Qîreqîra avtoajo bû, digot wê da bisekinin, ez peşiyê avê bidime karkaran<sup>2</sup>, paşê bidime we. Lema gotine “Zikê têr, haj zikê birçî tune”. Çend zar ketibûne bin maşînê, destê xwe dabûne ber dilopên ava jor da hatî. Hema dilopek, dudu ser kulma wan da hatinê, ew zû dibirine devê xwe. O, wax, ax, of, dunyayê!

Mêr, jinên hêsîra dora maşînê çit girtin. Sedo, Heso, Şevo, Delo, Kelo mîna çiyar rex hev sekinîbûn. Reng, xweliya van çiya çiqasî sor dikir, dêmê van camêra ewqasî reş qemilîbû.

-Zemano, -Sedo kêlimî, -bihedimî?! Ev çi ye tu tînî serê me!

-Birao, -Kelo usa bi şîrîn got, te hew zanibû ew berbirî tifalekî dibe, -kolozê<sup>4</sup> xwe rast ke, te xar daye serê xwe.

-Na birao, mîn xar daneniye, kê xar kiriye Xwedê dizane.

-Tişt nabe, usa ser hev da nequncile, bila dujmin bi me nekene.

-Bila ser zemîn bikene.

Heta wana aha nava hev da digotin, dibilandin av hate pare-vekirinê. Paşê ewana pîl kutane pîlê hev, ketine nava “rêz mala”. Hal-hewalê malbeta vê “malê” dipirsîn, derbazî ber “maleke” dinê dibûn. Li ber koçekê Kelo berbirî dayîkekê bû:

-Çi ye, çi bûye? Kanê kofiya te? Jina çê, rewşa dunê ye!

-Çi bikim, birao, mîrata vê gemiyê mîna hêleşana zara<sup>5</sup> em usa vir da, wê da hejandine, qe nizanim kofiya min ku maye.

-Xûşkê, -Sedo got, -tişt nabê, gotî em gişk ber vê hêlaşana dewra pûç daha şidiyayî bisekinîn.

Ewana malan geriyan, her kîjan bingeyî disekinîn biçûk-mezin ber wan da radibûn. Hineka ew camêrana nas dikir, hineka nas ne-dikir.

Wana kêf-halê hev dipirsîn û ser da zêde dikirin:

1 **kelî:** heywanên ku ji zû ve xwê nexwarine

2 **karkar:** karker, xebatkar

3 **hedimîn:** rûxîn

4 **koloz:** cureyekî kumên mêran e

5 **hêleşana zara:** landika zarokan

-Gelo, em ê çend roja li vira bimînin?

Bersiva wan jî bi kurt ev bû:

-Xwedê dizane.

Evê malgerê<sup>1</sup> êpêcekî kişand. Hal-hewalê gişka yek bû. Lê hinek dayîk daha pir bi posîde bûn. Wana digot, wekî zikê zara werimiye, ava reş ji devê wana te. Ev derdkêşana ber dilê wan da dihatin, teme didan, wekî zaran nehêlin ava behrê vexwin.

Rojên aha tu hew dizanî naçine ava. Rojên aha dişêwîne<sup>2</sup> sala. Ew sê roj bûn, ew sê “sal bûn” nefikir, koçber, hêsîr devê behrê hêwirandibûn<sup>3</sup>.

Hêwirdaro<sup>4</sup>! Mala te ser behrê keve! Behr pêl de ser ra derbaz be! Te çima bi hezaran va kal-pîr, jin-zar kiriye nava çarmedora dor bi esker? Te çima destên bokeberana<sup>5</sup>, rîdanspiyên êlan, oban, kiriye çeleman, qeyd kiriye?

Şev bû. Şeveke usa ye tarî bû, meriya nikaribû gavên xwe bavêje.

Te hewa nihêrînê usa dihate kivşê, wekî perdeke reş e mezin kişandine ser serê te, te erdê dinihêrî şevereşê hemû der-dor nava tariya xwe da pêça bû. Nava vê şevereşê da tenê û tenê dengê pêlên behrê dihate bihîstinê. Hinek sewgirtî<sup>6</sup> bibûn. Wana hew dizanibû, ewana ne ser erdê ne, lê bin erdê ne û ew pêlana ser wan ra tîn-diçin. Hineka ji wan tirê ewana îdî nûqî binê behrê bûne. Dengê pêlên behrê bibû xofa mirinê. Nava vê şipûkê da nişkê va dengek jî hate bihîstinê. Qîreqîra jinekê dihat.

Evî dengî, evê qîreqîrê nava gelleka da sewa<sup>7</sup> mirinê daha jî zêde dikir. Ne dihate têderxistinê ew deng ji kîjan alî tê. Ev qîreqîj tev pêlê behrê bibû û mîna firtonekekê him li vir, him li wir, him li dera hanê bû.

---

1 **malger:** gera nava malan

2 **şêwîn:** şibihîn

3 **hêwirandin:** cihkirin, sitirandin

4 **hêwirdar:** kesê ku hinek mirov li cihekî bi cih kirine

5 **bokeberan:** 1. beranê bijarte 2. (mecazî) xasmêr

6 **sewgirtî:** sehmgirtî, tirsiyayî

7 **sew:** tirs, sehm

Ji vê sewgirtinê zêwezêw<sup>1</sup> ketibû nava “bineliyên” vira. Yekî gazî yekî mayîn kir:

-Lawo, ew çi deng e?

-Dengê kulfetekê ye.

Hinekî şûnda dîsa hate bihîstinê:

-Dibên, bûkek diwelide.

Ji vê gotinê tirs-xofa dilê keç-bûkan pir bû. Çendan lihêv kişandi-ne ser serê xwe û xwe xwe ra gotin: “Yeqîn Elk<sup>2</sup> wê dibe”; Paşê dengê du-sê mêran tevî qîreqîra bûkê bû: “Hewar, hey hewar! Cino, wê da here! Kelbo<sup>3</sup>, destê xwe ji zeriya delal bikişîne!”

Êmek derbaz bû. Dengê zarokê hewar-gazî, zarezar, heşir-meşira şevê hingavte nava xwe û zelal hate bihîstinê. Te hew dizanibû îdî dengê zarokê nahêle pêlê behrê ser hev ra herin-bên, tenê ew deng li koçberên zulmê tesele dibû.

Erê, wekî naha ev bûk li cî-warê xwe bûya, derê malê, ser banîyê xênî agir ê bihata vexistinê, gulle yê bihata avîtinê, sa wê bikira ewte ewt, gund ê hişyar bûya, hatî-çûyî rê nedidane hev. Berbangê jinên gund, yek ji yekê paş da nedima, wê zehdê<sup>4</sup> bûkê ra bihaniyana û hev ra biketana şêr:

-Jajerûna min pehtî rind e!

Lê naha ...

Ho, dewran-zemano, tu hilweşî! Te çima çerxa xwe daye destê xwînmêta<sup>5</sup>! Ewana çarxa te paşopêl kirine.

Wê şevê tu mirovekî bijang nedane ser hev. Kew ketinê sibê hinek merî beravî dora binga<sup>6</sup> wê malê bûn. Revena bûkê ne deng bû, ne hes, car-caran zarokê dikire viqeviq. Seqirtiyê nava beşterbûya hingavtibû. Xezûrê bûkê yekî kirane bû. Serê wî ber da li vî, li wî

1 **zêwezêw**: deng hawar û gaziyan

2 **Elk**: di mîtolojiya kurdan de cin û periyeke ku dil û hinavên jinên raketî (welidî) direvine û lewre dimirin; heke jin dema zarokanîne tişteki bixwe elk nikare xwe bigihîne

3 **kelbo**: sego, kûçiko

4 **zehd**: diyariya ji bo jina welidî

5 **xwînmêt**: xwînmij

6 **binge**: bingeh, war

dinihêrî. Demeke xurt aha derbaz bû. Ewî hêdîka serê xwe bilind kir û got:

-Kelo, emir jî mîna pêlê vê behrê ye. Kesek nizane ewê te bide ber xwe ku da bibe? Xwedê me ra aha xwestiye. Pêş da werê, navekî li vî kurî ke.

Ji vê gotinê Kelo kete mitala, carekê, duda serê xwe hilbirî merivên dora xwe mêze kir, axîneke kûr ji dil kişand û got:

-Navê kurik datînim Bahoz.

Ewî gilî kela girî tijî dilê jinan kir, hêz da çokên mêran. Hinek vegerîn behrê nihêrîn. Li behrê bahoz rabibû û pêlên behrê dabû ber xwe, dibir.

Rojekê danê nîvro, çawa çîrokan da dibên, bû roja heşir-meşirê ... Çendî çend avtoyê barbir wê da hatin. Ewana nezîkî ber barê hesîra bûnê, wan maşîna xubar-dûmaneke usa rakiribûn, merî ecêb mabû. Zaran ser hev, ser hev ji mezina dipirsîn:

-Ev çi dûmaneke sor e? Çima dûman aha dibe?

“Xwezila” Xwedê serê we, kê vê dema mirin-jîyanê da rûnê û we ra şirove ke. Şirove ke, wekî ev dûman ne ew dûmana çiyayê zozanên Agiriyê, Qizilziyaretê, Egrîceyê. Te hew dinihêrî hêdî hêdî tav dize-riqîne, ew tîrêjên xwe davêje ser oban, guharan, mexelan, dûr va kevir-zinar zer dikirin. Obe hişyar dibe. Dibe holehola şivan-gavanoan. Berxvan dikeve pêşiya berxan bilûrê lê dide, berxa ji guharê radike. Hesp dikine hîrehîr. Kelb dikine ewte ewt, oreora çêlekên nûhzayî tevî dengê ruhberê van dera dibe, dibe miqamekî herî delal û te tirê topik<sup>1</sup>, kevir, şkevt, ketine deste çiyayê bilind û hûrik govend diçin. Her yek ketiye qametê xwe. Lê nişkê va te hew nihêrî dûman hat, mîna xêliya bûke, xemla xwe avîte der-dora, erd-esman hilçande<sup>2</sup> nava xwe. Dûr va tiştek nayê kivşê. Dengê cuda cuda guhê te da tê. Hinekî şûnda çiya nerm nerm rişiyê xemla dûmanê dikişîne; hemû der-dor mîna bejin-bala bûkên kincên reng xwekirî tê xanê, tu hew dizanî çiya jî bûye kofiya bûkê ye dor bi zer.

1 **topik:** gir, kêrt, bilindayî

2 **hilçandin:** girtin nava xwe

Biçûk-mezinê hesîrê îro bîn-bûxsa<sup>1</sup> dûmana wan çiyayî rind dizanibûn. Lê wana îro tiştê derz nedikirin, ew jî ew bû, wekî dûmana wan dîtî xuliqandina Xaliqê Jorîn bû. Lê ev dûmana îro ya bi destê merivê durz hatiye hevstrandinê<sup>2</sup>.

Ey kurdno! Ew dûmana we dîtî hatinê, çûnê dibû melhema dila, dermanê birîndaran. Ewê dûmanê bi hatin-çûna xwe va keser ji dilan derdixist, ruh dida ber ruhê ruhdaran. Lê ev dûman, ev xumar<sup>3</sup> ya mirinê ye. Ev dûman jî ber çerxa zemîn dertê, ev dûman jî ber tekera dîrokê qiloz dibe<sup>4</sup>. Ew mîna teniya sêlê rûyê te va dizeliqe, paşê sê sabûnê reqê<sup>5</sup> hilde bişo, yek e, naçe ku naçe. Ev toz dibe tev qûma sorik, dibe tev kevirokê sorik usa li hev têne sitrandinê, dibine hebê gilover. Hebeke usa têkeve bedena te, hetanî tu sax bî nalîn, zarîna te nayê birînê. Tenê û tenê li axa sar birîna li te kefi rehet dibe.

Kê rûnişta van tîfalan ra bigota: Hûn ser behra Xezerê ra derbaz bûne, hatine bendera nêzîkî bajarê Krasnovodskê. Sed û pêncî salî zêdetir e, wextê hîmê vî bajarî danîne, dîtî avan van dere sor e, lema jî navê bajêr bi rûsî danîn Krasnovodskî (Avasor).

Ji bajêr ber bi bendera behrê tenê rêk hebû. Ew rê di beriya çiya, topikên sor ra derbaz dibû. Rê bi qûm, kestekên<sup>6</sup> sor va hatibû hilçandinê, wergirtinê.

Ev derana timê bi ba bûn. Merfêk peya wê rê ra derbazbûnê pey xwe zivirînê, nihêrînê, dewsa piyê wî îdî nedihate kivşê. Lê îro bi dehan maşînên giran e<sup>7</sup> barbir wê rê ra derbazbûnê, hatinê toz, xubar tev hev dibûn, çav çava nedidît. Maşîna kutasiyê<sup>8</sup> şûnda, êpêcekî derbazbûnê, “dûman” kişiya û eskeran barên mala dane barkirinê.

1 **bîn-buxs**: bêhn û bû

2 **hevstrandin**: li hev strandin, çêkirin û hasil kirin

3 **xumar**: 1. xewa giran 2. xewa sermestiyê

4 **qiloz bûn**: bilind bûn

5 **sabûna reqê**: sabûna ku devê ambalaja wê venebûye

6 **kestek**: bi qasî kerpîçekî heriya hişk; kerseng

7 **e**: di vê metnê de û di nav kurdên Qefqazê de ev qertafa ravekî li gor peywendê carna wateya qertafa raveber a nêr “ê/yê”, carna jî ya pirjimar “ên/yên” digre.

8 **kutasi**: dawîn

Sê-çar mal maşînekê bar kirin, neferên malên barkirî li ser bara dane rûniştandinê, çend esker maşîna pâşîn, yek-dudu maşîna navîn, hinêk maşîna kutasiyê çek li desta, siyarbûnê şûnda “kewran”<sup>1</sup> rê ket. Qe sehetekê nekişand maşînen barbir gihîştine bajêrê Krasnovodskê, riya hesin. Her maşîneke barbir ber vagoneke barbir sekinî, dîsa eskeran mîna gurê çiya bigihîje berxê, a usa gihîştine zaran, jinan kel-mela ra tevayî, avîtine vagona. Kîjan vagon bar dikirin, para va derî dixitimandin, dadidan.

Demeke xurt derbaz bû. Bar û meriv hatine barkirinê û poyêz rê ket. Ku da? Lê vê gavê yên ku ewreqê nefîkirîne navandine xwe ra birca belek da rûniştine, îstekana çayê, yanê kasa şeravê ber, gulp gulp vedixwin û nexşeya dunyayê dane ber xwe dinihêrin. Dinihêrin kîjan welatî, kîjan bajarî kaf-kûn kin, rikina kîjan mîletî, gelî bidine ber bivir, jê kin bihedimînin.

Her tenê ew teleqreşana dizanin, wekî berê vî hêsîrî dane ku?

---

1 **kewran:** karwan



#### 4

Ew çendek bû malbetên nefikirî “cî-war” bibûn. Çawa dibên, wana dest-piyê xwe dabûne hev, lê li derva ba-bager, hundur da nerehet bûn, dilê wan sar, mîna qeşê bû.

Nêzîkî pêncî malê nefikirî li awîlekê<sup>1</sup> hatibûne bingekirinê<sup>2</sup>. Ji wan mala gellek hema ji gundekî bûn, lê hinek ji wir, ji vir bûn. Nava vî wedeyê kin da ewana usa ketibûne kirasekî, te qey digot gişk ji malbetekê ne.

Maleke nenas bibû cîranê mala Kelo. Malbeta Feto ne ewqasî giran bû. Ew, jina wî Rihan û kur, keçikek bû.

Feto û Rihan gellekî qincilîbûne<sup>3</sup> ser hev. Ofeof, axeaxa Feto nedihate birînê, berê çavên Rihanê jî ziha nedibûn. Gellekan nedizanîn derdê wan î ser derda ra heye, lema digotin:

-Hela di rîya Xwedê da be, evana çima aha dikin? Tu qey dibêjî, ewana hatine nefikirinê, em bi xweşiya xwe hatine. Tu hew zanî tenê mal-halê wan ji wan stendine, îdî nizanin, wekî em jî xwedanê birca belek bûne.

Ev gilî-gotin ber guhê Feto ketibûn, lema êvarekê gote kur:

---

1 **awîl/awûl:** hemû deverên paşvemayî, herêma ku şaristanî neçûyê

2 **binge kirin:** bi cih kirin

3 **qincilîn:** 1. bi ser hev da qat bûn 2. (wekî ku êşek lê rabûye) destê xwe ber hev re birin

-Lawo, Sebrî, here mala apê Kelo, bêje, bavê min dibê, bila ew Gevezê va zehmet bikşînin bêne mala me.

Kur çûnê şûnda Rihanê rabû devê fermaşê vekir, kincê bêmirazî nava qedekê reş da pêçayî anî, danî ser palaza nava malê raxistî. Alîkî jinê çok veda, alîkî mêr. Rihanê dest bi şîne kir, gerand, dilok avîte ser kur. Mêr jî mîna zaro kire îskeîsk.

Kelo jinê va gihîştine ber şêmîkê, dengê girî, benda şînê li wan tesele bû:

*De lo lo, lo lo, lo lo ...  
De lo lo, Feyzo lawo,  
Feyzo, lawo, ne min têr dîto,  
Ne min dêranê têr bînao,  
Henika sê roja li destano.  
Bûka serxêlî ber perdê mawo,  
Danê vê baharê em hêsîr mano.*

Cîran der da ketine hundur, çav qewimandina nava malê ketinê eceb man. Gevezê bi kizinî got:

-Pî, Xwedê xêr ke! Ev çi hewal e? Ev çi şîn e? Ev çi kinc in?

Ewê aha got, lê qe hîviya bersiva wê nesekinî û wê jî kêleka Rihanê çok veda, yekê gerand, yekê lê vegerand.

Dibên, erd-esman derd-kulan, şînê hîlnade, ji xwe wê da dev dide li mirovan dike hewar-gazî. Lewra hinekî şûnda mala Feto bi meriva va kimkimî, îdî cî tunebû rûniştana.

Beşterbûyî him zendegirtî mabûn, ku ev çi şîn e, ev çi girî ye, yê mirî kî ye, ewî çi mêrxasî kiriye, wekî dayîkê du guliye xwe jê kiriye û kincê rehmetlêbûyî va dirûye, him jî dixwestin zû ser giliya va vebin. Lê jin, bûken hatî usa deng dabûne dengê hev, usa kilamê şînê li hev vedigerandin, ji bîn-buxsa wana, ji hewar-gaziya wana germayê mal hildabû, te hew dizanibû lerze ketiye der-dorâ avayê binerd, leqem<sup>1</sup> ketiye qeşa, berfa dora malê dihele, wext-wede, dewr-zemîn perda

---

1 **leqem ketin tişteki:** livîn, qeş û derz pê ketin

derd-kula kişandibû rûyê wana. Hinek dinaliyan, hinek dikaliyan, hinek digiriyan, hinek di xwe da dikizîriyan, hinek posîde posîde sekinîbûn, hinekan stûye xwe xar kiribûn. Baîso<sup>1</sup>, sûckaro, mala te kavila kulê be! Xwedê bêdera te bide ber ba-bobelîskê, hebek nemîne, ku bavejî ber diranê xwe! Kedê bikî, je nexwîeyî! Gor bi gor bî!

Kelo nihêrî aha nabe, jin-bûk ji dest diçin, jinek-dudu xeriqîn û lema got:

-Dê, xûşkên min, bes e! Bila Xwedê sebirê bide me gişka! Heta naha bi girî tu tiştê nehatiye serê xwe! Girî dewsa tiştêkî nagire! Warên em gişk xwe kerr kin, bila xwedanê malê derdê xwe bêje. Te derdê xwe, mereza dilê xwe hineka ra qalkirinê, tu hew dizanî birîna te dereve bûye<sup>2</sup> û barê giran ji ser te tê hildanê, tu sivik bûyî. Eva yek. Ya duda ewe pêwîst e em gişk derd-kulê hev bizanibin. Em teyrê ji refê xwe qetiyayî, yê perşkestî ne, gotî her yek me bicedîne<sup>3</sup> baskê şikestî bicebirîne. Wekî usa nebe rengê me xerîba nayê guhastinê. Rengê xerîban dûr va tê kivşê.

Kelo fikira xwe nîvcî hîşt, bin çavan va gişk mêze kir, dît hemû hîviya dûmayîna gotinên wî ne.

-Keloyê bira rast dibêje, -Sedo pêş da hat got,- gotî<sup>4</sup> em tevayî perda xerîbiyê biqelêşin, kevirê zemîn î giran, ku îro li pişta me ye, bi hev ra hev ra bavêjin, yanê na, wextekî em ê binihêrin pişta me kûz bûye<sup>5</sup>, devê me gihîştîye erdê. Paşê dijmin ê bi dil me bikene.

Ewî dît halê Rihanê xirab e, sipîçolkî bûye, gote jina xwe:

-Lê lê, rabe têkeve bin milê Rihanê, ewê derxe derva, bila hewa li wê de, hine av bidinê.

Hê gilî devê wî derneketibû, çend jin ketine bin milê Rihanê, ewa derxistine derva. Av pê da kirin, ewê ser çavê xwe şûşt, av danê, bîna wê êpêcekî hate ber wê.

1 **baîs:** sedemkar, çî erênî çî neyinî be kesê ku bûye sedema bûyerekê

2 **dereve bûn:** 1. (birîn) vebûn û derbûn, xwîn an jî kêma jê kişiyên 2. (axaftin) serê giliyan vekirin

3 **cedandin:** 1. hewl dan 2. kudandin, berdewam kirin \*\*\* **bicedîne:** bikudîne, berdewam bike

4 **gotî:** divê, pêwîst e

5 **kûz bûn:** xûz bûn, xwar bûn, hotik bûn

Dîsa gişk hatin ker-lal ciyê xwe da rûniştin. Kelo got:

-Ez ê tiştêkî jî bêjim, paşê bila Feto kerema xwe meselê me ra bi hûrgilî ke<sup>1</sup>.

-Hûn dizanin çima çiya usa kubar kubar bi qurna ciyê xwe da disekinin, ji ber ku ewana ji vulkanan, ji bobelîskan bijîqîne, belayî erşê ezmîn bûne, lê jor da hatinê, ser hev da civiyanê mîna meqledûzê<sup>2</sup> hev girtine û paşê hêza tu tiştî negihîştîye wana. Dujmin em belabela kirine, wekî careke dinê em ser hişê xwe da neyên. Dujminê me kurdan gellek in, bona bi me bikaribin, me kerî kerî dikin, paşê çok vedidin dixwin. Gotî îro her yek me bibe zinarekî Çiyayê Agiriyê, pişt bikute piştê hev, bila dost dost be, dujmin kor be!

Van gilî-gotinê bi şîret dilên beşterbûyan tijî baweriya sibê kir. Ber çavên wana nava tariyê da ronahiyê şewq veda. Hinekî bîna wana fire bû. Jiyan ser şayê-şîne, ser qencî-xirabiyê hatiye ava ... Gava dinê di vê malê da şîn-girî bû, naha seqirtî ye.

Te hew zanibû gişk aliyê Feto dinihêrin, hîviyê ne ew kula dilê xwe dereve ke. Ewî ev yek rind derz kir, ji ciyê rûniştî rabû û got:

-Min efû kin, ez bêtewşe rûniştine.

-Tişt nabe, -hineka hev ra hev ra gotin, - paşî pêşiya meclîsê yek e.

Lê ewî ciyê xwe guhast, usa rûnişt berê wî kete hemûya.

-Min ra dijwar e, weke mirinê giran e, -Feto kêlimî,- bobelata li mala me qesidî<sup>3</sup> şirove kim. Lê zû, yanê dereng, pêwîst e em jî bin vî barê giran derên.

Mesele aha bûye, ciyê sekinî xwîn pişikî<sup>4</sup> ocaxa min. Îsal malên me li zozana bû. Rojeke nebixêr min karê xwe kir herime aranê<sup>5</sup>. Pêş xwe va nuxuriyê xwe, xortê destbihene -Feyzo- şande bajonê<sup>6</sup>, ber garana dêwêr. Hema serê sêrî da bêjim Feyzo Feyzoyê rast bû. Xwedê him bejîn-bal, him keremet, merîfet dabûyê. Ewî li Rewanê têxnîkû-

1 **hûrgilî kirin:** bi berfirehî şirove kirin

2 **meqledûz:** miqnatîz

3 **qesidîn:** 1. rastî hev hatin 2. hev hemêz kirin 3. tev li hev bûn

4 **pişikîn:** bijinîn, rijîn û lê gerîn

5 **aran:** cihê ku ne zozan e, sermiyan

6 **bajon:** çol

ma<sup>1</sup> kurdî da dixwend. Carekê ez çûme Têxnîkûmê, dîrêktorê<sup>2</sup> wê Erebe Şemo gote min: “Ewledê te çito ewled e? Xwedê zanebûneke kûr dayê, tu miqatî wî be, bila têxnîkûmê xilaz ke, ez ê wî bişîname xwendina daha bilind.” Ez kor bim, sed car kor bim, min rind miqatî li wî nekir.

Kela Feto tijî bû, lê zefta xwe anî, axaftina xwe pêş da bir:

-Bila dê-xûşkê min bibaxşînin, danê sibê boxek ji garana dewarê ermeniya vediqete tê nava garana me. Hinekî şûnda du ermenî, yekî ahil, yekî cahal<sup>3</sup> tênê bal Feyzo. Ermeniyê ahil, navê wî Aşot bûye, navê wî erdê be, çawa erdê bû, dibê: “Lo lo, sewalê kurdan boxê me hatiye nava jin, keç-bûkê we? Lê tu çima nabêjî boxe li vir e? Em boxe digerin.” Ez kor bim Feyzo ji van giliya disilike<sup>4</sup>, harehejî dibe<sup>5</sup>, lê dîsa bi sebir dibêje: “Kirîvê Aşot, şerm e, tu têra xwe mezin bûyî, ev çi gilî ne tu dibêjî. Erê, boxê we hatiye nava garana me. A, wa ye!” Aşotê gorbegor<sup>6</sup> dinihêre boxe pey çêlekekê ketiye. Ew destên xwe hev dixê, dikene û dîsa bi merez dibêje: “Ewê hanê diya te ye! Welleh min diya te dîtiye, ewe rindik e, boxê ermeniya jî dizane çi dike!” Ji vê gepkirinê Feyzo dilerize, xwîn bi zexm davêje serê wî, hêdî hêdî ber bi kelbê haram tê û dibêje: “Tu qe şerm nakî, namirî! Ew çi gevezetî ye tu dikî?” Aşot mala xwe dişewitîne, tu qey dibêjî xwînê ew girtîbûye, dibê: “Îo lo, kurdê bêfehmo, were, were guhê te da bêjim!” Aşot usa qure qure ber bi Feyzo tê, tu hew dizanî ew fil e, lê yê pêşberî wî mêş e. Ewana pêşberî hev sekinînê, îdî tu tişt ber çavên Feyzo nayê xanê; ew bi ecele dest dabêje kalanê kêleka xwe hoşeriyê<sup>7</sup> dikşîne. Elbê ra<sup>8</sup> hoşeriyê qirika Aşot ra derbaz dike, dikşîne, cake<sup>9</sup> lê dide. Ermenî vir da, wê da dilitime<sup>10</sup>, dikeve erdê, xwîn a,

1 **Têxnîkûm:** Teknikum, dibistana amadehiyê, liseya pişeyî

2 **dîrêktor:** gerînende, mudîr

3 **cahal:** ciwan, cahil

4 **silikîn:** sil bûn, tengjîn

5 **harehejî bûn:** dîn û har bûn

6 **gorbegor:** lehnet li gora wî were

7 **hoşerî:** xencer

8 **elbê ra:** pê re, wê gavê, bêmuht

9 **cake:** careke din

10 **litimîn:** milmilîn, pirpitîn, hejîn

ji vir dera hanê davêje. Ermeniyê dinê ev ecêb ber çavên xwe dîtîne ber bi obê direve, hewariyê dadixe. Şivanên keriyên pezên ermeniya nêzîkî wan bûye. Ewana mîna gurên çiya dora Feyzo digirin. Bi şivên destê xwe va êrişî Feyzo dikin. Dema yê pêşîn şivê bilind dike, jor da bîne serê wî, Feyzo dest davêje şivê ji wî distîne û elbê ra potê xwe derdixe, zenda xwe dialîne. Vê şûnda Feyzo mîna balindekî carina quloz dibe, carina te tirê dimelise. Ew quloz bûnê derba neyara dixwe, xarbûnê, çok kutanê erdê, gûzikê wan dide ber şiva. Him jî usa dike derbê wan bêderb dimînin, nahêle zêde li wî keve. Şivanên ermeniyê yek, dudu ji derbê rehmetlêbûyî diqunciline ser hev, yek, dudu dikine ofeof, dikevîne halê xwe û Feyzo ji nav xelega wan dertê. Li vira bîn li Feto çikiya. Bûkekê ev yeka tê derxist û rabû şerbik tijî av kir û rabe wî kir. Ewî şerbik ji destê bûkê girt, bi bînekê av vexwer. Dora xwe nihêrî, dît çavên her merîkî da bersiva çend pirsan heye. Ewana dixwezî ser van pirsan zû bê vekirinê. Lê hineka derz nedikir, ku her gilîkî derheqa kurda dibe bisteke sor dilê bavê dax dike. Bejin-bala kur, kirina wî tê ber çavan, zarê wî yî kuncî kuncî, şêr gotina wî, kilam stirandina wî dihate guhê bavê; bav ji halekî dikete halekî, carina tevzî bedena wî ra diçû, te tirê hinek wî didine ber qema. Xwîna wî dilop dilop tê erde gol dibe, lê tu kes nabîne.

-Bavo tu kor bî, -Feto dûmayîn da serhatiya kur, - hêna bêmirazî ji nava şivanan dertê, dinihêre hespek hinekî ji wî wê da tewilandine, ew xwe şaş nake ber bi hespê direve. Xwe digihîne tewla hespê, hoşeriyê va tewlê jê dike, dixaweze hespê siyar be, seyên obê para va wî digirin. Hesp diherike, lê ew tewlê<sup>1</sup> ji destê xwe bernade. Ew erdê ra tê xişikandinê<sup>2</sup>. Hesp pêş da wî dikişîne, kelb para va wî vediçirin, nişkê va yek keviyekî va dide serê comerdê min.

Çend jinê beşterbûyî hev ra deng dane hev:

-Ax, ax!

Lê daykê xwe zeft nekir, mîna ewrê baharê çawa baranê direşî-ne a, usa hêsir barand, gerand. Jinan dîsa deng dane dengê hev,

1 **tewî:** kap û werisê ku li derva dlavêjin stûyê hespan da ku biçêrin û neçin cihekî din

2 **xişikandin:** wekî maran bi erdê re kaş kirin; xijikandin

bû hewêrze<sup>1</sup>, dengê kulamên şînê pey hev rêz bûn, qube qube ser gundê biçûk ra derbaz bûn, li kevir-zinarê pêşberî gund ketin, bû guregura erd-esmîn. Merî ji vê yekê zendegirtî man. Hinekî şûnda jinan jî dengê xwe birîn, tebiyet jî hate rehmê.

Dîsa seqirtiyê mal, der-dor hilda. Kelo kete milê Feto û got:

-Canim, sebira xwe bînin. Aha nabe! Rabe em derêne derva, bila hinekî hewa te xe.

Ewana rabûn derketine derva, merivên hundur hev ra ketine gilî-gotina. Mêr ji derva vegeînê, Kelo got:

-Hela rabin derêne derva, dûredûr binihêrin, binihêrin vê şeva zivistanê çawa stêrkan şemal dane. Ez usa dişêvinim ew stêrkê me kurdan in. Zû yanê dereng stêrkên me kurdan wê birq vedin.

Paşê ew berbirî Feto bû:

-Bira, beşterbûya nava nerehetbûnê da xayî neke, bobeleta hatiye serê we, ew qeziya me hemûyan e. Gund da çend mal hene xerîb in, em hev nas nakin, hinek ji Nexciwanê ne. Lê rastiye bêjî em gişk xerîb in, feqet gotî tiştek bê zelalkirinê. Pewîst e em derd-kulê her malbetekê bizanibin. Gotine: “Em ne ji malekê ne, lê ji halekî ne”. Feto bira, te qenc kiriye îşev em beravî mala xwe kiriye. Kerem ke, dûmayînê bide serhatiya wê roja reş.

-Erê, bav lê kor be, -Feto dîsa dom kir, - tewla hespê ji destê wî dertê. Şivan, gavanê ermeniya hildişêne ser wî. Hewêrze dikeve oba ermeniya, biçûk-mezin çî dikeve destê wan hildidin û erişî bêmiraz dikin. Kî wê da te, dibên: “Tivêk, tivêk” (“lê din, lê din”).

Oba me hinekî dûr bû, hetanî em pê hesiyan, hetanî me xwe ciyê cî ra gîhand, dereke Feyzo silamet tunebû. Ermenî pê hesiyan ku kurd wê da ten, herek derekê da revîn.

Îdî çî serê we biêşînim, me Feyzo anî obê, çûne pey doxtir. Pey wê qewimandinê ra Feyzo bû mêvanê me şevêkê. Me ew anî li merzelê gund defin kir. Naha pirseke dinê heye ewê jî bêjim. Şeva ku sibetirê wê me gund gundîtî nefî kin Rihan xwe merzel ra digihîne.

Feto xwe kerr kir, çavên xwe beşterbûya gerand ser gotinên xwe da zêde kir:

---

1 **hewêrze:** hawarî, gazî û qijevîj

-Welleh, îdî ez nikarim derdê xwe derkim, bila Rihan bi xwe bêje.

Rihan Rihana rast bû. Xwedê qelema xwe kişandibû bejin-bala wê. Bejine nîvçe, dêmfî sor, çav gilover, bijang weke tilîkê ber e rêş bûn. Lê kê ewa bûktyê da dîtîbû, te bawer nedikir ew kes hetanî dawiya emirê xwe bedewiya wê ji bîra xwe derxe. Kofiya zer a danê serê xwe, kurtikê bi xiştî<sup>1</sup>, mêzer<sup>2</sup>, dêrên dor bi qeytana sor, gevez, qîçîk<sup>3</sup> xwekirinê, wê da hatinê, bedewiya wê, tevî kincê bejin-bal wê dibû û te bi heyr-hejmekar ewa mêze dikir. Te hew zanibû pêşberî te wênekî nedîtî ye, kê kişar: diye kesek nizane.

Rihan bi xesiyetê xwe va, bi kirina xwe va mêranî bû, lê de tu ware mirina Feyzo ewa çilmisandibû.

Rihanê timê digot: “Nefkîrîna me dijwarî ye, hebûna ji me stendî qîrêja destan e. Ev gişk ê zû-dereng wê bên ciyê xwe bigirin. Ra<sup>4</sup> mirinê nabe”. Ewê aha jî digot: “Mîrin ji zelûliyê girantir e. Kal-bava aha gotiye, wekî merivê ku dikeve zelûliyê, bicedîne wê jî wî halî derê û hemû dijwariya bi kirina xwe va qevz ke, paşê bavêje bin piyê xwe û ser ra derbaz be”. Çavên gişka li Rihanê bû, ka binê ew ê çi bêje.

Ewê bi mêranî çok veda, hêsirên ber çavên xwe paqîş kir, ji kezevê kûr kûr rihast<sup>5</sup> û bêhnijî.

Gevez kêleka wê rûniştîbû, ewê bi destekî nerm piştta wê xist, got: -Xûşkê, sebir bike, tu bîna xwe fire ke. Dêrdê xwe me ra bêje, bila barê derd-kula li te sivik be.

Rihanê dîsa li gişka mêze kir û paşê derdê xwe da der:

-Birîna min mehrûmê hê germ e. Eva sê meh, sê roj in bêmirazî bûye xwerê axa sar. Hêna em li welat bûn, ez sê ro carekê diçûme ser tîrba wî, têr têr digiriyam, te hew zanibû birînê min dicebirin. Şeva jî min berê xwe ber bi merzel dikir; tîrba bêmirazê xwe bi hiş-sewdayê xwe dihanî dikire nava cî-nivînê xwe, ew hemêz dikir, Xwedê dizane diketime xewê, yanê na! Roja ku merivên dîwanê hatinê gundê me

1 **xiştî**: xişirên cil û bergan

2 **mêzer**: cureyekî pêşmalên ku jin bi ser tûmanê xwe de li pêş xwe girê didin

3 **qîçîk**: rengê zer ê leymûnê

4 **ra bûn**: ray jê bûn, çareser bûn

5 **rihastin**: rahiştin, dest pê kirin



û elam kirin, wekî wê me nefî kin, min şev nîvê şevê xwe gîhande merzel. De, kula dilê xwe ra têtetêr giriyam. Paşê rabûme ser xwe, min dest avîte kevirê serkêlka delalê xwe. Dest li min ricifîn, beden li min req bû, paşê xwîdaneke sar hate min. Min xwe xwe ra got: “Kulê tu têkevî mala bavê Rihana Eslan, ne bavê min î rehmaletêbûyî ga dida stûyê xwe. Min eşheda xwe anî, careke dinê gihîştîme kevirê serkêlkê. Min ew derxist, sê kulm xweliya merzel hilda û nava qedekê reş da pêça, hilda, vegeirîme mal. Bintara malê eskerê dora gund girtî bi min hesiyan. Min “tirba” bêmiraz danî nava kola<sup>1</sup>, eskerê nêzîkî min bû, pirsî:

-Jinikê, tu çi digerî?

Min got:

-Ez stêrka merivên nepak digerim, dixwezim bizanibim binêm, ew ê çi wextî jor da birijin!

Hişê wî ji min nebiri, nizam bintara gund çi qewimîbû, eskera gazî hev dikir. Evî ez hiştîm, pêberjêr<sup>2</sup> revî. Min elbê ra “tirb” hilda, anî kire fermeşê, nava nivîn da veşart.

Çavên Rihanê ye tasinî<sup>3</sup> tijî hêsir bûn, qirîk kete gewriyê. Bûkekê misîn tijî av kir, teşt hilda, anî ber Rihanê danî, ewê av lê kir, jineke 30-35 salî destê Rihanê şûşt, bi kulma xwe hine av dêmê wê xist û bi desmalê va paqîş kir.

-Xûşkê, -Seyran hate rûyê wê û bi kesereke kûr got, -lê ez dêran çawa bikim?

*Hilintir, ha hilintir;*

*Derd ji derdan bilindtir.*

Rê va, ji kambaxa behrê derbazbûnê şûnda, kurê sê salî ji min stendin, min ew unda kir. Dêrê min kur e; xwestina dilê min dûr e.

-Çawa stendin?

---

1 **kol:** koma darên diriyê û çêreyê

2 **pêberjêr:** ber bi jêrê

3 **tasinî:** mîna tasan

Te hew dizanibû Rihana dêran wê demê derdê xwe bîr kir û kete xemxuriya wê.

-E, xûşkê, qe nepirse, ew derd derdekî ser derda ra ne, ne tê hildanê, ne tê danînê. Ez ku qal kim welleh agir ê min keve, ez ê bişewitim. Ez ber şewata xwe nakebim ...

-Xûşkê, -mêrê Seyranê got,- em îro hatine bibine şîrîkê derdê malbeta we. Bila saxî be, rojekê jî hûn ê kula dilê me ra bibine nas.

Vê demê Feto xwe xwe ra got: "Canim em çima van camêra, van xanim-xatûna diêşînîn? Derdê her merîkî li vira ji derdê me girantir e. Ka ya serêke bêjim" Lema aha got:

-Bi gilîkî, me kevîrê serkêlka bêmirazî, xweliya ji tirba wî aniye, naha pêwîst e ew li merzel bê definkirinê. Merzelê me jî tune, merî qe nizane bi riya Xwedê vê yekê çawa bike?

Xortekî bejinbilind, bi merîfet rabû, got:

-Rehima, Xwedê li Feyzo be, melle Hecî Sadiq apê min e, ew li gundê fêza me dimîne. Kingê pewîst be ez ê herime pey wî, bila bê, riya Xwedê çawan e, usa bikin.

Lê li vî gundê nuh hê merzel tunebû. Rispiyan, porsipiyan biryar kirin, zûtirekî cîkî bona merzel kiviş kin.

Şev ji şevê derbaz bibû. Kul ji kulê, merez ji merezê derbaz nedibû. Tarî ji tariyê diqetî, kew dikete sibê.

Gişka malbeta Feto ra xêrxwezî xwestin, derî va derketin.

Êvarekê Kelo bi Sedo şewirî û got:

-Qara' gund ketiye stûyê min û te; gotî binelî têkevîne kirasê hev. Ez û tu rûspîtiyê nekin gelê gund wê ji destê xwe here. Îro Rihanê peşiya min birî, wekî Kelo bira, mezintayê bikin, me ji şînê derxin. Ewa dixweze em bi edet bibin serkêlka kurê wê li merzel binikînîn<sup>2</sup>.

-Bira, -berî her tiştî Sedo got,- were em gazî çend mêran, çend porsipiyan bikin, herin ciyê merzel bibijêrin, kiviş kin û roja pencşemiyê, tirbê bidine kolanê.

Ewana hev qayîl bûn. Sibetirê sê-çar mêr, jin ji gund derketin, wekî cîkî bona merzel kiviş kin.

1 qar: xeyd, berpirsiyarî

2 nikandin: çikandin

Gunde nûh di newalekê da cî-war bibû. Pêberjêr çiqasî çavên te dibire, ewqasî rast bû, hevraz dûredûr çiya dihate kivşê. Li bintara gund goleke mezin hebû. Hê bineliyê van derana nizanibûn, ew gol ê çiqasî destê wan bigire, wana ji xelayê, birçîbûnê xilas ke. Wana nizanibûn golê da masî tijî ne. Golê wê da newaleke kûr hebû. Paşwextê ew newal ê bibe bajona heywanê gund. Nava newalê ra çemekî biçûk dikişiya.

Wî alî kolxozeke mezin hebû û ev gundê kurda yî nûh tevî wê bû. Hinek kurd, usa jî Kelo, li wir ketibûne ser xebatê. Vira him tirî, sêv dihatine bêcerkirinê<sup>1</sup>, him heywanet xayîkirinê va mijûl dibûn.

Risipî, porsipî-şewirdar hinekî, hetanî newalê pêberjêr çûn; der, dora nihêrîn, verevurt kirin, hildan-danîn, bona merzel cîkî qayîl nedîtîn. Cî hebûn rind bûn, lê der-dor bi lîlav<sup>2</sup>, hezek<sup>3</sup> bû. Paşê jî ewana bi hev şewirîn, wêkî sal ê derbaz bin, gund ê mezin bin, diqewime bên bigihijine hev, nava her du gundan da merzel nayê avîtînê.

Ewana ser newalê sekinîn û der-dorê xwe nihêrîn. Rihana belengaz nava wan da bû. Ewê berê xwe hevraz kir û te tirê wê tişteki giranbaha dît û bi şabûn got:

-Xûşk, birano, werên em hevraz, ber bi çiya herin!

Gişka vegeerî dûredûr çiya mêze kirin û hev ra tu gilî negotin, berê xwe dane wana. Hatin ji gund derbaz bûn. Sekinîn li çiya nihêrînê te qey digot, wekî ewana hinekî jî pêş da herin, destê xwe dirêj kin, destê wan ê bigihîje serê çiya. Lê pâş da çûnê, te tirê çiya paş da vedikişe.

Ewana êpêcekî çûn, zivirîn piş xwe va nihêrîn û dîtîn vir nîbe koçekê ji gund dûr ketine. Sekinîn. Dîtîn vira cîkî fire heye, weke meydanêke şer e. Lê şewirdaran mitala wê yekê kirin, wekî jor da baran, sêlavê bê, wê vê derê bigire.

Vir da wê da çûn, hatin û xêr-xaşîkê tebiyetê ye usa ber çavên xwe dîtîn, heyr-hejmekar man. Dihate xanêkirinê jor da av, sêlavê hetanî

1 **bêcerkirin:** (sewze û mêwe) reşandin û çandin

2 **lîlav:** cihê bi av û herî

3 **hezek:** cihê avî yê ku erozyon dikevê

wî ciyî bi sala erd daye ber xwe, xwe ra erqeke<sup>1</sup> fire çêkiriye, paşê ew bûye du tîşa. Tîşek vî alî, yek wî alî ra derbaz dibe û çiqas av, sêlav bê vê derê nagire. Wana biryar kirin, vira têkine ciyê merzel. Him ew hinekî dûrî gund e, him himberî çiya ye, him jî tebiyetê çarmedora wê derê bi destê xwe kişandiye.

Ewana li wira rûniştin, bîna xwe stendin. Nişkê va Rihan sîtê<sup>2</sup> dilokên şînê got:

*Lê lê, ro derketiye ji mizgevtê,  
Tavê daye ser şirikê sehetê.  
Heçî kesê destê min destê  
Ewledê min xe, wê her cinetê.*

*Mala me jî, mala we jî,  
Reşandiye kundurê bejî.  
Xwezila bigotana lawê te wê da tê,  
Bila melle bê ser min jî.*

Mêr posîde bûn, kela jina rabû giriyan. Paşê biryar kirin roja pêncşemê, danê sibê lawikan bişînîn bên tirbê bikolin, danê nîvro serkêlka Feyzo bînin, vira binikînîn.

Roja pêncşemê, danê nîvro derê mala Feto êpêce merî berav bi-bûn. Melle hundur da, li xaniyê binerda, çawa dibên, dizînga va fatîhek xwend û ji mal derketin. Wan sala tu kesî eşkere mellefî nedikir, ji ber ku ew digirtin. Digotin melle timê miqabilî kirina Yekîtiya Sovêtê ye.

Serkêlk kiribûne nava qedekî reş, li hewşê danîbûne ser texte. Êmekî şûnda çend kesan texte, hildan ber bi merzel rê ketin, merivên beşterbûyî dane pay wana. Lê jinan usa deng dane dengê hev, usa dest bi şînê kirin, te hew zanibû mêrxasê êlê hema hêcka<sup>3</sup> miriye, hineka hewarî aniye. Lê çi bikirana? Yek bi derdê dê-bavê, yek bi der-

1 **erq:** herq, cihoka mezin

2 **sîtê:** sitî, xanim

3 **hêcka:** çend kêlî/xulek berî niha, demeke gelekî kurt

dê ewled, yek bi derdê xûşk-birê, yek bi derdê mêr, gişk bi hev ra bi zulima dîtî dinaliyan... Lê ro-robara van gişka ew xerîbî bû. Xerîbiyê nava dilê her yekê da usa kozî veda bû, usa vêdiket, qe wana xwe jî nizanibîln, wekî dûyê şewata wan dikişe erşê esmîn.

Ewana gihîştine merzel Sedoyê camêr hêdîka serkêlk danî ser xweliya axa vedayî. Gişka dora tirbê çît girtin. Melle dîsa fatîhek xwend. Tirb nîvî zêdetir tijî bûnê, serkêlk nikandin.

Rihanê ji paşila xwe, desmala ser desta tiştêkî pêçayî derxist û got:

-Eva xweliya tirba Feyzoyê min e.

Ewê aha got, hej bi wê ket, hat bikeve, parra va ewa girtin. Melle pêçek ji wê stend, desmal vekir û ew xwelî kire nava kefen, danî tirbê. Paşê lawika tirb bi xweliya vedayî va tijî kirin. Hinekan mîna zaran kirine îskeîsk, hinekan bi desmalê kerreker hêsirê xwe paqîş dikirin. Vê demê melle Hecî berê xwe ber bi çiya kir, her du destê xwe bilindî hewa kir û got:

-Xaliqo, Tu vê zulmê qebûl meke! Çiyano, hûn bibine şehedê vê kira nekirî! Şipûka wê ser malxiraba da bê!

Paşê ewî gote lawika, elbek av bînin. Lawikekî elbek av anî. Bi gotina melle av li tirbê reşandin. Ew dîsa kêlimî:

-Gelî hazira, Xwedê sebirê bide we gişkan. Bila bîna we mîna vê avê zelal be! Kî hatiye ser merzel Xwedê ji dê-bavê wan razîbe! Naha guh bidine Rostem binê ew çî dibê.

Rostem yekî 30-35 salî bû. Dihate kivişê ew yekî ser xwe ye. Ew gavekê-duda ji nava beşterbûya paş da vekîşiya, usa kir berê wî tê-keve hemûya ... Her du destê xwe da ser hev, bi rengêkî xitimî, bi dengêkî lerizî got:

-Rehma Xwedê li Feyzo be! Rehma Xwedê li miriyên gişka be! Vira em gişk xerîb in. Hinek me qe hev nas nakin. Herek me ji gundekî, ji nehîkê anîne. Lê çawa pêşiyê me gotine, gotî em pey kaşa hev herin têkevîne xemxuriya hev, him hev nas kin. Edetekî me kurda yî herî rind heye. Qeziyayê, şînê li malekê destdanê, gotî der-cîran alîkariyê

---

1 **kira nekirî:** kirina heta niha nehatiye kirin

bidine wê malbetê. Îro me anî ruhê Feyzoyê rehmêtlêbûyî vira defin kir. Mirin heq e, lê bila wede da ev ax bibe para her mirovekî.

Ewî xwe kerr kir, lêvê xwe cûn<sup>1</sup>, îdî kela girî nedihîşt ew bipeyive. Lê ewî xwe ser hev da anî û dîsa got:

-Bila bavê Feyzo, min bibaxşîne, hûn gişk min efû kin, aha gişk, bi koma xwe va kerem kin, em herine mala min. Bi dayîna zemîn min karê xwe jî kiriye. Lê ya sereke ew nîn e, ya sereke warêne mala min, bi derdê malbeta min jî bihesin. Paşê ewî destê xwe ber bi çiya kir û dîsa domand:

-Wekî derdê xwe vî çiyayî ra bêjim, qe çiya vî derdî hilnade! Na-kişîne! Yeqîn hinek kevir ê bîteqin, bihedimin û ser hev da bên.

Rostem aha got, xwe ker kir, pişta xwe merivan da kir û hêsirê xwe paqîş kir û bi Kelogirî zivirî berê xwe da ahilan:

-Gelî rispiya, giliyê min erdê nexin. Îro bibine şîrîkên derdê mala min!

Melle Hecî ji serkêlka tirbê vekîşiya û got:

-Berê da bona gund bibe gundê şên sê qewil pêwîst e: Avayên bi pergar, riya fire, yek jî merzel. Me îro hîmê “mala qiyamete” danî. Saxî be qewilê dinê ra jî Xwedê kerîm e. Lê xênî ji van qewla, qewlekî herî mezin ew e: gotî her biçûkê gund jî bizanibe ev mala kê ye, lê mezin jî gotî bizanibin derd-kulê wê malê çi ye, ew xwedanê çi xesiyetî<sup>2</sup> ye, şeva wî çawa tê, roja wî çawa derbaz dibe. Him bona vê yekê, him jî Xwedê rûye Rostem sipî ke, wekî di riya kal-bava da diçe. Edetê me da ew yek heye, wekî derdê her gundî, her kes ya xwe hesab dike. Werên em gişk destûrê ji Feto bistînin û herine mala Rostem.

Gişk hîviya bersiva Feto bûn.

-Ape Hecî, kekê Kelo, Sedo destûr, destûra we ye!

-Xwedê, -Sedoye risipî got, -rûye te sipî ke, şîrê te helal be. De, wekî usa ne em herine mala Rostem.

Rast e, ketibû zivistanê, lê hê berf nebarîbû, erdî reş bû, sermayê îdî dabû ser germayê. Lê îro hinekî germ bû.

1 cûn: cûtin

2 xesiyet: xislet, xeyset

Gişk ji ser merzel hatine mala Rostem. Mala wî ji mala hemûyan dûrtir bû. Ji ber ku ew mehekê dereng anîbûne vira. Hemû binerdê vê awîlê hatibûne girtinê, tewla revoyê hespê kolxozê bintara gund bû, li wir binerdek vala bû. Malbeta Rostem li wir cî-war bibû. Meniya dereng anîna mala wî jî kesî nizanibû. Li hewşê konekî reş î danzdeh stûnê hatibû vegirtinê. Dora kon bi çîta va hatibû dorgirtinê. Hemû ser vê yekê heyr-hejmeke man. Çend jinên navsere bi hesretî destê xwe li çîta, hebina<sup>1</sup> gerandin û kela wan tijî bû. Yekê ya mayîn ra got:

-Min dêranê, ev kon dîtinê, min hew zanibû, eva konê mala bavê min e li bereka Agiriye hatiye vegirtinê. Lê kanê keç-bûkên ku dikirine şingeşing, diçûn-dihatin? Lê kanê beroşên ser kuçikan? Lê kanê kaniyên bintara kon? Hespên dora kaniyê tewilandî?<sup>2</sup> Qe ewte ewta sa, kalîna berxan, oreora golikan guhê min da nayê?

Ewê dixwest hê gellekî bidomîne, kula dilê xwe vejene, lê xeriqî, xirexir kete gewriyê, bîna wê çikiya, dêm lê sipîçolkî bû, hat bikeve, jinekê dest avîte wê û ewa girt. Ewa birin kon da dane rûniştandinê.

Kon da kulav hatibûne raxistinê, balgi pê da pê da hatibûne danîne. Emenîk di kon da hatibû dardakirinê, desmaleke reş di ser da hatibû giredanê. Pêşiyê rûsîpiya solên xwe derxistin, çûn fêzê rûniştin, paşê jinên navsere pê da pê da rûniştin. Gavekê şûnda ew jinik ser hişê xwe da hat.

Kelo çavên xwe vir da, wê da gerand û got:

-Şikir ve rojê ra!

Nehate fehmkirinê ew şikirbûna xwe bi çi tîne? Nefkirinê, nexweşiyê, tîbûn-birçîbûnê, deroderbûnê, pîrekirinê<sup>3</sup>? Hewalê jinikê?

Na! Ev gişk zû va bibûne birîneke serteşî û şev-roj dilê wî digivişand. Ewî ev yek derz kir û lema got:

-Gelî xûşk-bira, ez şikirbûna xwe wê yekê tînim, wekî çi bobelat tê serên kurdan bila bê, lê ew nikare reng, rewşa kurdî unda bike, biçilmisîne. Wê hingê kurd daha kûr singê konê xwe erdê da dikute, hebin qayîm qayîm dikişîne. A, îro li besta Qazaxistanê konê bêsero-

1 **hebin:** bendên kon bi singên dorê ve girêdidin

2 **tewilandin:** ji bo biçêre ajal li derve girêdan

3 **pîre kirin:** parparî kirin, parçe kirin

bin hatiye vegirtinê, berpâlê me balgî hatine danînê, derva semevar qilpeqilpe, dikele.

Ji van giliyana gişk kêfxweş bûn. Kelo ev yeka tê derxist, ev çoka xwe hilda, ya dinê kuta ser kulêv û dîsa dûmayîn da nêtên xwe:

-Gelî keç-bûkan, dayîk-xûşkan, ez ji we hîvî dikim, rikî zemîn ra kurtikan xwe kin, morî-mircana, xizêman xwe da kin, kofî-kitana bidine serê xwe... Hûn gişk rind bizanibin, wekî jinên kurdan posîde bin, bizanibin mêr qir bûne.

Evan giliyan ruh ber ruhê beşterbûya da anî, sorayê avîte rûye hemûyan. Destexan<sup>1</sup> anîn, raxistin, hemûyan bi tehm stekane<sup>2</sup> çaya semevarê vexwerin. Avsîreke bi tehm hatibû pehtinê. Nan xwerinê şûnda, destexan hate hildanê. Sedoye camêr got:

-Rostemo, lawo, naha tu û kevaniya malê pêş da werên; a vira, pêşberî gişkan rûnên û derdên xwe qal kin.

Rostem û jina wî Xanê kêleka hev rûniştin. Rostem aha dest bi şewata dilê xwe kir:

-Malbeta min pênc kes in. Ez, jin û sê zar. Du kur û keçeke min heye. Ya mezin Gulîzera me ye. De çawa hûn dizanin, mal û hêsîrên kurdan li bajarê Tîblîsê pareve kirine ser du paran, hinek rêkê ra anîn derxistine ber behra Xezerê, lê hinek bi riya daha dûr va, mehekê gellektir Rusiyayê ra dane fitilandinê, hev zivirandin û anîn derxistine van derana. Rojên em ketine axa Rusiyayê, dan bi dan halê me yî nemir-nejîyînê daha jî dijwar dibû. Her tişt wê da, sermê, şextê<sup>3</sup> hetika me biribû. "Malê da" çi hebû me dlavîte ser zaran, lê dîsa ewana diricifîn. Nizam çima em li bestekê sê roja man. Berfê diavîte bejna mêriv. Eskerê ser vagona me şev dihat "mala" me da pal dida. Dihate kîvşê ew yekî çavşor<sup>4</sup> bû. Keça min Gulîzerê gore dihûna, ewî carina nexşê gorê dikire menî bi wê ra Xwedê giravî şa dibû, carina pijîk<sup>5</sup> didane destê xwe pê ra dilîst. Çavên min ji wî nedibirî. Şevêkê

1 **destexan:** sifre

2 **stekan:** îskan

3 **şexte:** zîpika gur a ku piranî zirarê dide giya û daran

4 **çavşor:** kesê ku çav berdide jinên xelqê

5 **pijîk:** 1. şîşikên goreyan 2. dilopên baranê yên hûrehûr



nişkê va bû gûrîna Gulîzerê, paşê mîna heywana bû oreora esker.

Li vira ewî xwe kerr kir, li beşterbûya nihêrî, paşê serê xwe kire ber xwe û bi şermoke, bi dengekî ricav got:

-Bixefirînîn, qewimandin çawa bûye gotî usa bêjim.

-Erê, bira, -Kelo got,- usa bêje çawa heye, ne kême ke, ne zêde ke. Tu çima şerm dikî, bila dewran şerm ke.

-Tu nebê, -Rostem giliyê xwe pêş da bir,- esker xwestiye dest bi-avêje keçikê. Ewa jî vir da, wê da tariyê da destê xwe digerîne, ji gorê pîjîkekî dikişîne, qas-quduretê<sup>1</sup> Xwedê ra çavên wî da diniçikîne<sup>2</sup>.

Me serê çira neftê vêxist. Porê Gulîzerê hatibû veçirandinê, li gerdena wê ciyê gezan hebûn. Çavên esker jî rijiyabû. Vê şûnda xêrxweşî ser we da barî, kevir-kuçik ser me da. Alîkî da lawika dixwest esker bikujin, alîkî jî merivên dîwanê hilşiyane ser me. Bû qîreqîr, qûjeqûja jin-zaran, hewar-gaziya mirovên vagonê, lê nehîştin merivek bê bibe şîrîkê derdê me. Derên vagonan para va usa xirpandibûn<sup>3</sup> qe felekê jî nikaribû vekira. Demekê şûnda maşîneke barbir anîn, “mala” me ji mala qetandin, bar kirin anîne avaneke<sup>4</sup> biçûk, xanîkî da em cî-war kirin, du eskerê biçek danîne ser me û ez, Gulîzer hildan birin. Esker digot, wekî Xwedê giravî min çavên wî rijandiye. Çend rojan em tev xayî kirin, li ser me tiştê nepeyîtandin<sup>5</sup>. Em du heftiya li wê avanê man. Em biçûk, mezin dane axavtinê. Dewsa tiliyê esker hildan. Eyan kirin dewsa tiliye wî, diranê wî li beden, rû, gerdena keçikê heye, Welleh, tiştêkî em xilas kirin, gotî bêjim. Dibên: “Pîrsê, qursê etbû<sup>6</sup> tune”.

Ew bêhnijî. Hinekan hev ra hev ra gotin: “A, ewqasî jî rast. Mala Xwedê ser rastiye ye”.

Xwedaneke zipîk zipîk xwe avîtibû eniya Rostem. Ewî desmal ji beriya xwe derxist, enî, rûyê xwe paqîş kir û domand:

- 
- 1 **qas-quduret:** hêz û karin
  - 2 **niçikandin:** çikilandin, tê de çikandin
  - 3 **xirpandin:** mehkem kilî kirin, kîp girêdan
  - 4 **avan:** avahî
  - 5 **peyîtandin:** îsbat kirin
  - 6 **etbû/etbî:** lome, eyb, şerm

-Esker dest avîtîbû hevalkirasê keçikê tîjtîjî kiribû<sup>1</sup>. Ewê yekê em xilas kirin. Vê şûnda dîsa em bar kirin, anîn derxistine vira. Pey wê yekê ra Gulîzer tirsiyaye, zarinciye<sup>2</sup> nava cî da ye.

Hate zanînê, wekî Rostem pey qalkirina vê qewimandina netê<sup>3</sup> ra çawa dibên barekî giran ji ser wî hate hildanê. Hê jî seqirtiyê kon hingavtibû. Usa dihate hezirkirinê<sup>4</sup>, wekî ev merivên vira gişk ciyê xwe da qerisîne.

Hevekî şûnda. Rostem bi xwe ev seqirtî teriband<sup>5</sup>:

Naha malbeta min xerîbê xerîban e. Em mîna teyrê ji refê xwe qetiyayî ne. Ez nizanîm malên birên min, qewm-lêzîm ku da birine, li ku ne?

-Lawo, em gişk xerîbê dewrê ne.

-Bira, - xortekî pirsî, - tu ji kîjan qebîlê yî?

-Binê çî hatiye serê me kurdan? Welatê me nava çend welata da hatiye parevekirinê? Zimanê me bûye çend kerîya: kurmancî, soranî, mukurî... Em ser du ola cuda kirine. Bi deha va jî navên qebîlan li me kirine. Naha werên em wan kirinên reş bijmirin û binihêrin ewana çî bi çî nin? Parevekirina welêt zulm e, cudabûna olê û zarava bela ye, pîrrqebîletî pîrepîrkirin e. Ev gişk bobelata gelê kurd e.

Rostem usa dixafî hineka hev ra kerreker gotin, ku tu hew dizanî ew dersdar e. Lê rastî kesî nizanibû Rostem him Têxnîkûma kurda ye Pişkavkazê, him jî bi zimanê rûsî qursa dersdariyê ye du sala kuta kiriye. Ew yekî xwendî ye.

-Naha, -Rostem berê xwe wî xortî da kir got,- ez bersiva xortê delal bidim. Qebîla me ra dibêjin “Bilxika”.

-Keko, -ewî xortî dîsa got,- bilxika birine komela Qırqîstanê. Keçeke wan bûk e mala me ye. Lema dizanim.

-Rostem, bira, -Kelo kêlimî,- bila mala te şên be, wekî te ev kirina bûyî me ra qal kir. Dibên em ne ji malekê ne, lê ji halekî ne. Xwedê

---

1 **tîj tîjî kirin:** parçe parçeyî kirin, dirandin, zival zivalî kirin

2 **zarincîn:** ji ber êşekê ketin nava nivînan û rabûn pê nebûn

3 **netê:** nedurist, çewt û neyînî

4 **hezir kirin:** hizir kirin, hesab kirin

5 **teribandin:** xera kirin, betal kirin

hez bike Gulîzer ê pak be û em ê rojekê vî konê danzdeh stûnî da dewata wê bikin.

-Erê, ez bi Xwedê xwe usan e, -Gevezê got,- min çû Gulîzerê nihêrî. Ewa yeke bêhempa ye, bedewa dunê ye. Hinekî tirsiyaye, wekî dinê tişteki wê tune... Vê gavê bû kûrekûra Xanê. Seyran ji nava jinan rabû hate rex wê rûnişt û got:

-Şikir, qe tişteki nebûye. Lê ez mehrûm çawa bikim, rê va kurê min î biçûk Sanoyê min î sê salî ji me stendin.

Erê, Xanê carekê jî derheqa vê yekê da bihîstibû. Ewê wê gavê hêsirê ber çavên xwe vemiland<sup>1</sup> û zûr bû Seyranê nihêrî. Û te hew dizanibû ewa dixweze bêje: “Kî dizane derdê min gellek e, yanê yê te?”

-Naha te dît, xûşkê, -Kelo got,- derdê wê ji derdê te girantir e, zulma wî ji zulma yê hanê bilindtir e. Min got, birîna me gişka heye. Lê rind bizanibin, wekî birîn hene sax dibin, birîn hene tu gava nacibirin. Binê, mesele, birîna çeka mêriv ketinê bi dû-derman tê saxkirinê. Ezîzê te, delalê te mirinê, ew birîn jî hêdî hêdî sax dibe, dîsa tu ser xwe da têy. Lê birîna ez dibêjim ew birîna me gişka ye. Dibên ne dûyê wê heye, ne dermanê wê. Lê ez usa nabêjim, ez dibêjim him dûyê wê heye, him dermanê wê, him melhema wê. Ew birîna ez dibêjim, hetanî tu sax î, ew ê te biêşîne, daxa te derxe. Rehetbûna wê axîn-ofîna te ye. Navê wê birîna me gişka ew “bêwelatî” ye. Werên em tenê nekevîne xemxuriya birîna malekê, derdê her malbetê ra kaş nebin. Werên em dest bidine destê hev, pişt bikutine piştê hev, wekî bikaribin ber birîna “bêwelatî”yê teyax kin, tab kin û dest biavêjîne pêşa welêt, welêt ra kaş bin. Kutasiyê rind bizanibin, dermanê “bêwelatî”yê ew bitifaqî ye, yektî ye, riya wê da mirin e...

-Ez Xwedê xwe, -apê Sedo got,- Kelo rast dibêje. Derdê ku me qewimiye mîna sêlavê em dane ber xwe dibe. Çawa Kelo got, werên em ber wê sêlavê bibine zinar, zer û bona roja sibê bitifaq bin.

-Apê Sedo, birayê Kelo, -Rostem got,- ez bi nêta we ra qayîl im. Em koziya ji agirê gur qetiyayî ne. Gotî em nehêlin ew kozî bitemire, bibe xwelî. Pêwîst e em wê koziyê biparêzin, xweyî kin û rojekê bibin

---

1 **vemilandin:** maliştin, paqij kirin, ziwa kirin

têkine bin wî agirê gur. Bila ew agir daha jî gur be. Ew agirê gur wê li Kurdistanana mezin vêkeve. Lê ez ditirsim. Tirsî min jî ew e, wekî ew derd, ew merez, ew kul min di nava xwe da bihelîne. Qe kê dîtiye bênamûsiya aha bê serê meriya ew jî bêheyf bimîne!

-Rostem, bira, -Kelo got,- cara ewilîn vir da tu bênamûsî tune. Ewî eskerî xwestiye destdirêjayê bike, derba xwe jî stendiye. Hetanî ew sax be, ew ê çavên xwe binihêre û dax be! Serê xwe bilind bigire û ez bi vê mezintaya xwe va ber Gulîzera bi culet temene dibim'...

-Na, Kelo, bira, -Rostem got,- usa nebêje.

Hineke dinê jî Rostem ra kirine şer û gotin, wekî gotî ew qe tiştê usa neyine ser barê xwe.

-Birano, xûşkên hêja, -Kelo berbirî hemûya bû,- pirsek min nerehet dike. Ez çawa rispîk îro da teme didime we, zarên xwe bişînine mektebê. Enwerê kurê min îdî dersdar e, Nado jî sala şeşa da ye ew digirî, dibê, bavo, min jî bişîne xwendinê. Ez ê wî jî bişînim. Hivî dikim keçikan jî bişînin.

Bi vî awayî şev ji şevê derbaz bû... Hindik mabû bibe berbang...

---

1 **temene bûn:** (li ber yekî) rêz girtin

## 5

Dibên emirê rojên reş kin in, lê dîrokê da rojên usa hene çiqas sal derbaz dibin, ewana ji bîra mêriv naçin. Ji ber ku rojên usa silsileta<sup>1</sup> îro xwe ra dike beyt-serhatîke nemir, paşê wêya ewledê xwe ra qal dike, ewana jî wêya bona roja dahatî didine xweyîkirinê. Para gelê kurd, ku hatibû nefîkirinê îdî beyt-serhatiya “Nemir” diefirand.

Xemila wê beyt-serhatiyê ew deroderkirin, buxdankarî, neheqî, xelayî-celayî, nexweşî bû. Lê ro-robariya van qewimandina gişka yek bû: roja reş.

Hey-wayê! Hê sipîtayê xwe diavîte nava rojên reş, hê bîna nefîwanan<sup>2</sup> dihate ber wana, hê ewana koxtika da, goma da, binerda da cî-war dibûn, hê nûh qerçûmekên rûyan vedibûn dîsa tavîke zemîn ser wan da girt.

Guliyên jêkirî hê çend tiliya dirêj bibûn, rûyen dayîk-xûşkên veçirî hê dicebirîn, sêlaveke wede ya gur dîsa nefîwan da ber xwe.

Mêran hê pişta xwe ya kûzbûyî rast dikirin, hê paşî, pêşiya koçên koçberên zorê gihîştibûne hev, lê hinekan hê nizanibûn xûşk li kê derê ye, dewranê dîsa ewana dane ber zîpikan!

Dewr, zeman, wede te hew dizanibû bi destê neyarên kurdan, bûye merîkî zorbe, şûr daye destê xwe ciyê sekînî pey sêwîkî ketiye,

---

1 **silsilet:** nifş, nesl

2 **nefiwan:** kesê nefibûyî, koçber, sirgûnbûyî

wekî wiya bigire, qutqutî ke, lê ew direve xwe dide ber dîwarekî, bellî dîwar li wî bibe sitar, lê nişkê va diwar ser wî da hilwedîşe. Usa hatibû serê pareke gelê kurd. Çima her kes radibe sêwî dikute? Ji ber ku ew î bêxweyî ye, ew î bêpişt e?

O, wa!<sup>1</sup> Qe gel jî dikeve hewalê sêwî da? Erê! Çawa erê? Gava gel hev nagire, gava gişk hev ra hev ra nabêjin: “Mirina tevî êlê, şaya dinê ye” ew ese dibe xulamê ber deste vî, wî. Xulamtî dibe para wî. Gotî kurd rind bizanibin edûyê<sup>2</sup> wana timê mîna ruhistînekî pey wana digerin. Ew neyar, ew dujmin him li der-doran, him di nava wana da ne.

Neyar û nexwestiyên kurdan usa hizir dikin, wekî ev çî ku anîne serê kerîkî vî gelê pirmîlyon, hindik e.

Lema jî dujmin sala 1939a beroşeke qîrê-qetrenê ye nûh danî ser agir-alafa xwe, ew sal jî kire tevî roj-salên kurda ye reş û wan ra heşir-meşira nebîniyayî anî! Rojên reş bi rojên reş pêçand.

Şeveke zivistana sala 1939a bû. Her du tîfalên malbeta Îbo, Hu-seyn û Arif şîrîn şîrîn razabûn. Lê Îbo û Bedîcana jina wî ji hatin-çûyîna dunê, ji belengaziya xwe diaxifîn. Derî hate kutanê.

Îbo xwest rabe dêrî veke, vê gavê sê merî hev ra ketine hundir. Yek sedrê sovêta (şêwra) gund bu, dudu nenas bûn. Ji wanê nenas yekî got:

-Îbo Sadikov, kincê xwe xwe ke û bide pey me!

Paşê ser da zêde kir:

-Em çêkîst in. Ev jî ewreq, bona birina te.

Ewî dinê jî gote Bedîcanê:

-Binê, hetanê sibê dengê xwe dernexe û ji mal derneyê!

Îbò bi awakî dijwar kincê xwe xwe kir, hat ku xewê da bê rûyê her du kuran, wana nehîştin û yekî got:

-Ker-lal derê! Zaran hişyar neke!

Îbo birinê şûnda, Bedîcan wedekî ciyê xwe da mîna telte qeşa qerisî ma. Nişkê va derî vekir, derkete derva û nava tariyê da melisî melisî xwe gîhande mala bavê. Bi destên ricaf va derî kuta. Evdilê

---

1 o, wa: va ye, aha

2 edû: dijmin

bira derî vekir. Xûşk pêxas, wî halî da dîtînê tirsîya, veciniqî û pirsî:

-Xuşkê, çi bûye? Lê tu çima vê surê-sermê pêxas hatî? Destê te çima xwîn bûne?

Ji van gotina Kelo, Gevez veciniqîn, rabûne ser xwe, Enwer, Nado, Sînem hişyar bûn. Dê-bavê xwe hev ra gîhande Bedîcanê. Dê kesûka<sup>1</sup> xwe aha dîtînê bi xof, bi ecêb got:

-Weyla min qirikê! Ev çi yek e?

Bedîcan destê wan da diricifi.

-Xwedê xêr ke, keçik tirsîyaye, avê bidinê!

Pey van giliyên bavê ra ewê serê xwe kuta ser sîngê wî û bi hêsir-girî got:

-Du kesa, yek jî kurebeşkê şevê hatin Îbo birin!..

Gund qundîfî dizanibû sedrê şêwra gund ra dibêjin “kurebeşkê şevê”, sedrê kolxozê ra “kastî”<sup>2</sup>. Sedrê şêwra gund çawa kurebeşk şev diçe turba<sup>3</sup> vedide, ew ne bi xêr diçû vê malê, wê malê, yanî xwe ber çarmedora, deriya diteland<sup>4</sup>. Sedrê kolxozê jî him xwîna meriva dimêt, ew didane xebatê, him dibû şîrîkê keda her yekî, hebûna kolxozê jî mîna malê bavê xwe bela dikir, dixwer, stûyê wî qalim bibû, bibû stûyê ga.

Gotina Bedîcanê girtina Kelo anî ber çavan. Enwer hine av da xûşkê, de bi pêjgîrê rûyê wê, xwîn-qirêja destên wê paqîş kir, dît wekî çok tîştîşî bûne, xwîn tê. Îcar jî dê kete heyra çokên wê. Ew belengaz hetanî mala bavê serqot, pêxas, him ji tîrsa mîna zara çalepiya hatibû.

Bîstekê ketine xemxuriya Bedîcanê, nişkê va dê bi hewêrze got:

-Weyla ez korê, naha zar ziravqetî bûn!

Ewê îdî tu tiştî nenihêrî û bi ecele derî va derket. Kelo, Evdile, Enwer, Nado dane pey wêya. Bedîcanê xwest vegere, Sînem pêşa wê da dar da bû û giriya. Xûşkê destê wê girt û tev derketine derva. Lê dê-bavê, xûşk-birê bi rev îdî xwe devedevî mala wan kiribûn.

---

1 **kesûk**: bêguneh, belengaz, reben

2 **kastî**: segê ku dike kastekast

3 **turb/tirb**: gor, merzel

4 **telandin**: bi dizîka veşartin û çavdêrî kirin

Te tirê sêlav hatiye mal, malbeta delalê wan dibe, ewana jî dire-  
vin pêşiya wê bigirin. Hey hey dunyayê!

Sêlav hatibû, lê ne sêlava xwezayê bû. Ew sêlava dewrê bû, kesî  
nikaribû pêşiya wê bigire. Bedîcan û Sînem der da hatinê zar hişyar  
bibûn. Huseyn çav dê ketinê pirsî:

-Dayê, kanê bavo?

Ev her sê giliyên tîfalê<sup>1</sup> tîfalan li her çar dîwarê bin erdê ketin,  
vegerîn guhê gişkan xitimand, ziman lal kirin, tu kesî bersiv neda.

Weşekî ker-lal derbaz bû. Nişkê va bû kûrekûra Bedîcana reben, dê,  
xûşkê deng dane dengê wê. Ser şîna wan da giriyê zaran jî zêde bû.

Kew ketinê sibê hê seqirtiyê binerd hilda. Zarok kesirîn<sup>2</sup>, mezin  
jî ketine bîra mitalên şeva îşev e reş?!

Her ro vî wedeyî Bedîcanê bixêrî vêdixist û dîyê ocaxa wan der-  
diket.

Lê vê berbangê destê wê nedihat dû bide kerman, qirşikan, wekî  
vêkevin bibine kozî. Ne derva berfê diavîte çokê, hundur jî sar bû. Lê  
dîyê bixeriya fetisî zû va dilê wan da fitil dabû, bibû teniya salan!

Lema jî naha ne sermê, ne zulma gav bi gav carekê va ewana  
qels nedikir.

Hê li welêt bûnê jî Sedoyê camêr xwe ra kiribû xesiyet, berbangê  
radibû derdikete derva, der-dorê xwe dinihêrî, li gund mêze dikir,  
erşê esmîn ber gavên xwe ra derbaz dikir, ka binê îro hewa yê çawa  
be, çawa derbaz be? Îro jî usa.

Cara ewilîn çavên wî wê yekê ket, wekî dewsa piyên çend merivan  
pişta mala wî ra hevraz derbaz bûye. Paşê ew dews, ew rêç zêde bûne  
û hatine pêberjêr çûne. Apê Sedo şikber bû xwe xwe ra got:

-Ev kî ne şev kerreker hatine, kerreker çûne?

Paşê kete rêça berfê û hat gihişte derê mala Îbo. Li vira dewsa  
piyê çend mirovan dihate xanê. Gişk jî diçûne hundur. Îdî ewî ber  
xwe neda kete hundur. Çav Kelo û hemû malbeta wî ketinê, him jî  
dît ewî destê xwe ser hev ra biriye, reng lê xitimiye çok li Sedo sist  
bûn, pirsî:

1 **tîfal:** 1. zarokê viringî 2. reben, belengaz

2 **kesirîn:** 1. hesret kişandin, dil kirin tiştêkî 2. tî bûn



-Kelo, bira, xêr e?

-Xêr ji xêrê derbaz bûye, îşev hatine Îbo birine. Qewimandina şeva reş e derbazbûyî nava wedekî kin da derê 50-60 malên kurda ye binerd kuta, hemû kes bi wê yekê hesiyan. Lê tu kesî wateyiya girtin, birina Îbo nizanibû. Her gilî-gotin, derewî, rastî li hev dihate hûnanê. Bona pirs bihata zelalkirinê, bona rastî ji derewiyê bihata qetandinê, gotî kurebeşkê şevê, sedrê şewra gund bidîtana û hemû tişt ji wî pirs kirana. Lê ew ne li gund bû, ne li mal ...

Merî qelfe qelfe dihatin, diçûne mala Îbo û paşê jî bi dilekî sar, bi çokên şkestî, hinek bi çavên hêsir vedigerîn. Wê rojê hetanî êvara dereng kurebeşkê şevê nehate kivşê, kula ser kula, mereza ser mereza bû ew, wekî wateyiya birîna Îbo nehate safîkirinê.

Rojê dora xwe da evarê, evarê da şevê ...

Sibê berbangê dîsa hewarî mala geriya, wekî îşev hatine Rostem birine ...

Sibetira wê deng derket gotin: Teyfûr birine ...

Şeva reş her şevê tarî mala yekî, duda dikuta ...

Bi wî awayî mift derê gellekan ket ...

Çendekî şûnda Xwedê giravî, hate eyankirinê, wekî mêran dibine ser xebatê, wê zûtirekê vegerin.

Kulê tu mala gotiya kevî, ew zûtirek bûne heftê, heftê bûne meh, meh bûne sal ...

Êvarekê wedê tariyê erd hilçandibû, seqirtiyê gund hildabû, Kelo ji mala xwe derket, wekî here mala Îbo, serîkî neviya xe.

Ew çend gava dûrî malê ketinê, yek derkete pêşiya wî. Bi qazaxî got:

-Kelo, bira deqîçekê bisekine. Ez ê pirseke gellekî ferz te ra bêjim.

Kelo sekinî, him jî şikber bû û got:

-Kerem ke! Tu kî yî?

-Navê min Nûrsûltan e. Ez ji gundê jêrê me? Ez ji bal Rostem hatime. Bi pêşekê<sup>1</sup> xwe va avtoajo me. Pêşekzanên<sup>2</sup> usa hene ev hukumet hewcî ye. Lema jî qe na salê carekê destûra me didin, bèn serîkî jin-

1 **pêşek:** pişe, meslek, sinaet

2 **pêşekzan:** pişekar, xwedî-meslek, sinaetkar

zaran xin. Birao, ji min nepirse ez ku karê dikim, çi dibim, çi tînim? Ewa çend roj in ez pey te digêrim, a îro li vî ciyê xewle<sup>1</sup> ketî destê min.

Kelo navê Rostem bihîstinê, tevzî bedena wî ra çû lerizî, dilê wî bi zexm lê da, xwest tiştêkî bipirse, lê te digot dev-dirane wî ketine hev. Nûrsûltan ev derz kir û dîsa bi hemdê xwe berbirî wî bû:

-Diqewime tu bi min bawer nakî, lê tişt nabe. Ez ê nama wî bidime te, herim çendekî şûnda ser te da bêm. Tu nîşaneke ji mala Rostem hilde bal xwe xayî ke, ez ê ji te bistînim, bibim bidime wî. Lê bextê te me tu kesî ra tiştêkî nebêje! Wekî bizanibin min nama wî te ra aniye, wê min bi malbetê va bişînine riya çûyî-nehatê.

Paşê ewî dest avîte beriya xwe û tariyê da kaxez kire kefa destê Kelo û zû ji wî dûr ket, di şereşê da minê bû<sup>2</sup>.

Kelo êpêcekî nava rê da ma. Kaxez di kulma xwe da usa givişand, te hew dizanibû hinek dixwezin ewî ji wî bistînin, lê ew nade. Ew bê-gav mabû, nizanibû pêş da here, yanê paş da vegere mal. Lê weşekî şûnda biriyar kir vegere mal û kerr namê bi Enwer bide xwendinê!

Rê da xwe xwe ra kire pitepit: “Ev ji salekê pirtir e Rostem, Îbo, Egît û yê mayîn birine, ne deng e, ne hes e ...”

Kelo paş da zivirî. Gihîşte ber şêmîkê, sekinî, tariyê da dora xwe nihêrî, go ka binê kes pey wî nayê. “Diqewime bi evê riyê daw<sup>3</sup> danî-ne ez têkevime. Ez ji xwe natirsim. Çima ez ji yê çûyî kîjanî zêde me? Tirsî min ew e, min bi vê meniyê bigirin, zarok sêwî bimînin, gund bê rûsipî.”

Vê gavê derî vebû, Gevez derkete derva, ew ber şêmîkê dîtîne pirsî:

-Kelo, xêr e, tu çima vegeerî?

-Şikir xêr e. Min cixara xwe bir kiriye.

Ewa vegeerî kîsikê cixarê, bigere, bîne bide mêr, lê ew jî pey wê kete hundur. Jinê ber ronahiye rûye wî niherîne, tirsîya. Ew reş qemilîbû.

Kelo derbazî xaniyê dinê bû, Gevez jî pey hat. Ewî bi hemdê xwe got:

1 **xewle:** cihê talde û kesek lê tuneyî

2 **minê bûn:** winda bûn

3 **daw:** dafik, tele, kemîn

-Gazî Enwer ke, bila bê, tu xwe jî warê.

Êmê du-sê deqîqa nekişand dê û kur hatin. Ewê tê derxistibû, wekî tişteq qewimiye, diricîfî. Kelo bi dengêkî heyir got:

-Lê lê, welleh tişteq neqewimiye. Enwer, lawo, hanî vî kaxezî bixwîne.

Ewî kaxez danê kur, te hew dizanibû çelem destê wî xistin, deremên<sup>1</sup> dilê wî qusandin. Tirsiya, wekî ew kaxez bibe agirekî gur û malbeta wî bişewitîne. Hêzin da xwe, wekî careke mayîn kêxiz ji Enwer bistîne, tenê ew bi xwe bê girtinê, bê kuştinê, şirîtdarê<sup>2</sup> da bê dardakirinê, lê bila hemû tişt ji kur dûr be.

-Bavo, -Enwer got,- ev kaxez bi herfê latinî, bi kurmancî hatiye nivîsarê.

Evan giliyana şikberiya Kelo serobino kir, bîn hate ber bîna wî.

Desmalê va xwîdana eniya xwe vemalişt û got:

-De bixwîne, ez heyran.

Enwer kêleka xwe kuta kêleka bavê, rûnişt û dest xwendina namê kir:

*“Kelo, bira, selam!”*

*Saxî û silametiya we gişka armanca dilê min e. Eva çend meh in em anîne cîkî usa, wekî li der-dora berf diavêje bejna mêriv û nava daristanekî bê sero-bin da nin. Em riya hesin dikişînin. Ew rê diçe nava kûraya daristanê. Ev rê bona çi ye kesek nizane? Wekî dixwezî bizanibî ez kê derê me, keko qurban, ne li vir im, ne li wir im, ne li dera hanê me, ne ser erdê me, ne bin erdê me? Ne sax im, ne mirî me? Wedê em ruhber-girtiyê vî daristanî ji serkaran dipirsin: Gdê mi naxodîmsya? Dibên: - Na rodnoy zêmlê. (-Em li ku ne? Ser axa welêt).*

*Keko, qurban, kesek culet nake pirs ke: “Ser axa kîjan welatî?”*

*Destê me dane ber rûyê me, em ji welêt derxistin anîne besteke xikexalî, edûyê me bi wê yekê va jî qayîl nebû, em anîne cîkî bêxwedê. Merî nizane ro çi wextî dertê, çi wextî diçe ava? Aliyê rastê, çepê nayê bijartinê.*

*Keko, qurban, tu dizanî çima aha fînine serê kurdan?*

1 **derem:** reh, damar

2 **şirîtdar:** giyotîn

Gava nêçîrvan diçe nêçîrê, şêran, pilingan dikuje, paşê rûvî xwe di-  
dine dewsa wana. Erd hejîyanê çiyayê bilind dihedimin, milik<sup>1</sup> dimînin,  
yên ku çiya nedîtine, dibên ev çî çiyayên bedew in!

Dema yekî. ne tu tişt dixweze xwe ra avayîkî ava ke, bivir hildide  
diçe daristanê, digere kê derê dara bilind, qayîm heye jê dike, tîne  
dike perdî<sup>2</sup>, stûna mala xwe. Cîranên kurdan timê ji kurdan tirsiyane,  
nehîştine ewana serê xwe bilind kin. Bi destî nemaman<sup>3</sup> bokeberan  
kuştine, dewsê kundê mêra hîştine, gund dêrizandine<sup>4</sup>, dewsê kelefe<sup>5</sup>  
hîştine, berê her malekê dane derekê, wekî ewana hev ra nebîne perdî,  
nebîne stûn. Paşê neyarê me em xwe ra kirine kevirên kuçikan. Sêla  
xwe dane ser nan pehtinê, em ji dû zer bûne, nava êgir da kewgirî<sup>6</sup>  
bûne, nava xweliyê da mewicînê<sup>7</sup>. Sedem?

Sedem neyektiya me, hev ra çavnebariya me. Em sê bira ne. Ez birê  
mezin im. Bîrakî min Romê ma, me ra derbazî vî alî nebû. Em mane  
dudu. Roja hatin malê me bar kirin me nefî kin, ez çûme ber derê birê  
xwe., Ez ber wî geriyam, were bila malê me tev bar kin, ku da dibin  
em tev herin. Ew qayîl nebû. Lê wekî yek pîrs ke çî bûye, welleh tiştêkî  
vik î vala. Naha ez dizanim dilê wî jî, mîna dilê min dişewite. Em ke-  
tinê xerîbiyê, dûrî hev ketinê, hê li hev dişewitin, mîna berxa diya xwe  
undakirî dibe kalekala me. Lê dereng e ...

Em pêşiyê gulla diavêjine hev, paşê rûdinên mitala dikin: “Me çima  
aha kir?”

Kelo, qurban, tu bibe birayê min î qiyametê. Usa nuqutiye dilê min,  
mirina min heye, lê vegerandina min tune. Ez ê temekê bidime te.

Tu bi bextê mêrê berê, tu bextê Ker-Kulikê bira, hesreta min dilê  
min da nehêle. Usa mitala neke ez ê kirina te ji ku bizanibim? Ez binê  
axa sâr da bim jî, kirina te yê bi min eyan be.

1 **milik:** kêrt, girik, cihên ewqasî ne bilind

2 **perdî:** darê avakirina serbanê xaniyan

3 **nemam:** kesê ku gilî-gotinan digerîne, sîxur

4 **dêrizandin:** vala kirin, kavi kirin

5 **kelefe:** kavi, xirabe

6 **kewgirîn:** gelekî giriyar, zû zû bi ber xwe ketin, hundirê xwe xwarin

7 **mewicîn:** tê de gevizîn

Nav-namûsa xwe dispêrime te. Bextê keçika xwe Gulîzerê diavê-  
jime ber bextê te. Tu dewata wê bi destê xwe bike. Min dewat got,  
dewata min kete bîra min. Konê malbeta me tevî konê bi sedan, bi  
hezaran kurdan bereka Çiyayê Agiriye bû.

Roja dewatê qerd<sup>1</sup> hatine serjêkirinê, beroş hatine dagirtinê, ser  
kuçika hatine rêzkirinê. Ser sêlan nan dihate pehtine. Qelfên keçikan  
ji kaniyan av dianîn, semevar dikelandin. Meşk dikilan, beroş tijî dew  
dibûn. Dihol, zurne lêdayî westiyanê, tulum dihate lêdanê, bayê tu-  
lumê xilaz bûnê, tembûr dihate lêdanê, dengbêjan deng didane dengê  
hev. Govend jî qe betal nedibû. Ê, çi bêjim, min ji hezaran yek got.

Dibêim, belkî dewata Gulîzerê jî usa derbaz kî. Binê çi dibêjim, ha?  
Hetabî<sup>2</sup> serê min be ...

Ez xwe ra çîroka dibêjim. hîvîkirina min her ew e, roja dewatê ko-  
fîyê bide serê Gulîzerê, bûk derî va derxistinê, piştta wê girêde, xêr-  
xweşiyê bixweze, bila peparê<sup>3</sup> wê bibe peparê hetabiyê ...

Keko, qurban, ez xwezîlbûna xwe wê tînim. Ji ber ku mirina tev êlê,  
şaya dinê ye. Ez mîna kulekeke ji kêrî mayî me, gur jî ser min birriye...  
Him îdî kela min tijî bûye, lê lê me bigirîm, lê girî ne şênê mêran e. Dest  
li min diricife, çi bêjim, çi nebêjim, Xwedê dizane.

Birao, pêş min va gund gundîti selam bike. Bêje Xanê bila tu wedeyî  
reş girênedê. Her tenê bila nehelê dûye kuçikê min bitemire.

De bi xatire te!

Rostem”

Hingî name dihate xwendinê kirtîni<sup>4</sup> ber tu kesî neket. Name xilaz  
bûnê ra bû kûrekûra Gevezê. Kelo jî hêsirê ber çavên xwe paqîş kir  
û got:

-Lê lê, ne wedê girî ye, ber xwe bide. Derheqa namê da tu kesî  
ra, tu tiştî nebêjin. Yê name da min ser hev, ser hev teme da min.

-Lê ew kî bû? Gevezê pirsî.

1 **qerd**: ajalên qert, gir, mezin

2 **hetabî/hetavî**: xweşbextî, bêkederî

3 **pepar/pêpal**: qudoş, yom

4 **kirtîni**: kirtekirt, dengê kotinê

-Ewî qe tiştekek negot. Hema bi lez name da min, çû. Lê çûnê gote min çendekî şûnda ez ê bêm te bivînim.

-Lê tu yê rebena Xanê ra tiştekekî nebêjî?

-Ez ê bêjim.

Geveze kerreker hêsir barand, kela dilê wê rabû û ber xwe da ev bend hev anî:

*Ez ê sosina biçirpînim,*

*Destên gula binitirînim.*

*Sorgulavê lê bireşînim,*

*Ser xerîbê xwe da bişînim.*

-Evda Xwedê, -Kelo got, - bi girî tu birîn necebiriye. Rabe em tev herine mala Rostem.

Gevezê rabû, piştî xwe girêda, amade bûn herin, Enwer bêhnijî, sebra tek anî.

Kelo, -Geveze got, - kal-bavan gotiye ji xêra evarê şerê sibê rind e. Sebra tek mala me nayê, were gura' min bike, em sibê herin. Kelo gotina jinê ra qayîl bû. Wê şevê birîndarên heft şûran razan, lê xew li Kelo bibû kûvî. Demekî kêlek kêlek welgerî, te hew dizanibû, kozî ji kirine nava cî-nivîne wî. Kul, derd, hesretî, xerîbî li hev piçilikîbûn û di vê şereşê da ew dane pêşiya xwe bereka çiyayê ziyaretî gerandin, anîne zozanê “Mistogulo”, “Dûmaniyê”, werê: “Bedir Begê”, riya nefîbûnê ra derbaz kirin, birin derxistine bal Rostem û ewî gote wî:

-Rostem, bira, kê got û kir mêr e, kê got nekir kerê nêr e, kê negot kir şêr e.

Sibetira wê Kelo û Gevez çûne mala Rostem. Xanê û zar çav wana ketinê şa bûn. Eva ne cara ewlîn bû, ku ewana aha dihatin û sehetîplî vê malê dikirin. Wana kêf-halê hev pirsîn. Kelo bi hizkirineke mîna bavekî, mîna apekî hate rûyê zaran.

---

1 **gura yekî kirin:** xebera wî kirin, li ser gotina wî çûn

2 **wer:** war

3 **sehetî kirin:** lê xwedî derketin, kontrol kirin

Gulîzer rastî jî Gulîzer bû. Te hew dizanibû vê axlêvê<sup>1</sup> babişkef<sup>2</sup> ser wê ra derbaz bûye, tîrêjên tava zêrîn li bejin-bala wê aliyayî ye, lema jî ewa meh bi meh bejin diavêje, bedewî ser bedewiyê da tê.

Berê wê ketinê te dêmê gulover, eniya qerqaş, lama<sup>3</sup> bi xal, buriyê<sup>4</sup> reş e qeytanî, çavên belek e dor bi bijangên weke hev e nitirandî dîtinê te tirê, tu hîveke çardehşevî ye şemaldayî mêze dikî, pišta wê ketinê te bejna nîvçe, navmîla ber, guliyên zer e, ku hindik diman bigihîjine gûzikan, merî heyr-hejmekar dihîşt.

Kelo ev dayîna Xwedê, bedewiya keçikê mêzekirinê Rostem hate ber çavan û guhên wî da ev rêzên namê hatine bihîstinê:

*“Nav-namûsa xwe dispêrime te. Bextê keçika xwe Gulîzerê diavêjime ber bextê te.”* Vê gavê Gulîzerê kasên çayê anî da ber wana. Ji şiqîniya kasa guhên Kelo da dengê Rostem hate birînê û dîsa mîna bavekî ji salên xerîbiyê vegeirî, bi hesreteke mezin li Gulîzerê nihêrî û got:

-Keça min, delala bavê, were kêleka min rûnê, ez ê şîretekî li te bikim û guhê xwe da têke guhar.

Ewê jî qe tişteke negot û hat kêleka wî rûnişt. Weşekî seqirtiyê xanî hingavt. Kelo ketibû mitala û meriya aha dîdevan dikir<sup>5</sup>, wekî ew nizane çawa dest bi axaftina xwe bike. Ewî bi hemdê xwe berê xwe da wê û seqirtî teriband:

-Gulîzer, pûnga ber bîna bavê, maşallah, çavên Xwedê ser te be, tu mîna hîveke çardehşevî yî. Rostemê bira berê da zanibûye tu yê bibî xwedanê guliyên zer e direj, lema ew nav li te kiriye.

-Kelo bira, -Xane got, - îro 15 salê wê xitim dibe<sup>6</sup>, ewa derbazî 16a dibe.

-Şanzdeh saliya wê pîroz be! Bila Xwedê bextê wê hêşîn ke. Xwedê du cins xweliqandiye, du dayîn daye merivayê. Bext, hebûn daye

---

1 **axlêve:** destpêka biharê

2 **babişkef:** kulîlka ku bişkova wê venebûye

3 **lam:** enî

4 **burî:** birû

5 **dîdevan kirin:** ji tevgerê rewş nirxandin

6 **xitim bûn:** qedîn, xelas bûn

mêran, bedewî daye jinan. Emir da hinek mêt hebûn ser wan da hilşiyane, serê xwe dikine ber xwe û wê hebûnê bi helalî xêrê dikin, lê hinek har dibin, hebûn berê çavên wan digire, yanê ciyê sekînî xwînê didine rêtinê, yanî bênamûsiyê dike û rojekê ser bela xwe va vetê<sup>1</sup>, carina usa dibe dewsa warê wan vala dimîne, xan-manê wan dibine kelefe, wawîk têt xwe didine ser bircê wan kesa, govenda şayê digirin. Eva para Xwedê ye, ku daye mêra. Lê ya jinan?

Xwedê bedewî daye hemû jinan, lê hinekan daha bedew-rind dixuliqîne. Gotî ew bedew, ew canik<sup>2</sup> usa bike, wekî bedewî serê wê nebe bela, wê ra sosretiyê neyîne. Bedewî tiştêkî usan e hemû kes dixweze wêya dest bîne. Bedewiya keçikan her tenê carekê bi mixe-netî, bi nemamî bê pêpêskirinê, ew dibe mîna tîtika<sup>3</sup> destê zaran. Gulîzer, ez him dewsa bavê te, him kalikê te me. Timê bi diya xwe bişewire hetanî bavê te hat. Naha hûn zarno, rabin herne derva, hewakê xweş e, em mezin ê hev ra meslehetekê bikin.

Zaro hema dêrî va derketinê Xanê bi peroşî<sup>4</sup> got:

-Kelo, bira, nuqtiye dilê min, ku tiştêkî hatiye serê Rostem. Tu warê ya rast min ra bêje.

-Na, -Kelo got, - tiştêkî xirab neqewimiye, lê dixwezim ya dilê xwe bêjim.

-Bêje Keloyê bira, bêje.

-Xûşkê, bêje min, binê, te beyt-serhatiya "Kerr û Kulik" bihîstiyê?

-Pî, birao, çawa nebihîstiyê?

-Hewariyê didine dayîka Werdek, wekî Kulik hatiye kuştin, çawa dayîk ewa ber xwe da hêsira dibarîne. Aliyê dinê da dibîhîze, wekî Emer axa naxweze Perîşanê bide Kerr. Werdek dibê, bila şîna Kulik bisekine, ez ê dewatê bikim, paşê şînê. Tu hew dizanî du dilê Werdeka dê hebûye, yekê da şî, yekê da şayî. Gotî îro her dayîkeke kurd usa bike. Xwe dayne dewsa Werdekê. Naha çend zeriye mîna te bê

---

1 **vehatin:** rast hatin \*\*\* **ser belaya xwe va vetê:** rastî misteheqa xwe tê

2 **canik:** ciwanik

3 **tîtik:** pêlîstok

4 **peroşî:** heyecan



malxweyê malê mane. Yek jî keça min Bedîcan e. Ji girî, ji posîde-  
bûnê, dest ser hev ra birinê va tiştêk dernayê. Gofî hûn xwedanna-  
mûs bin, mîna jinan rûnên, mîna mêran rabin. Naha ez ê pirseke  
daha ferz te ra bêjim. Min ji Rostem name stendiye.

Ewê navê Rostem bihîstinê veciniqî, mîna zaro kire îskînî, Kelo  
destê xwe bire ser lêvên xwe, eşeretî da, wekî hiş be ...

Bîstek bi kerr-lal derbaz bû, paşê Kelo derheqa rasthatina xwe  
Nûrsûltan da got û namê da çi hatibû nivîsarê Xanê ra ta û derziyê  
ra kir.

-Ew qazax e, -Kelo dûmayîn da axavtina xwe, - sibê, dusba wê bê  
bal min, wekî ez nîşanekê ji mala Rostem bidimê, ew jî bibe bide wî.

-Kelo, bira, ez heyran, ewî hilde bîne mala me.

-Lê lê, xûşkê tu çi dibêji? Ew ditirse nişkê va ser meselê vebe, wê  
wî bişînine Sîbîrê.

-Çima?

-Çawa çima? Ew ciyê ku Rostem lê dixebite kesek nizane çi cî ye,  
li wira çi çêdikin, Xwedê dizane. Ev sura hukûmetê ye. Wekî hukû-  
met bizanibe, ewî qazaxî name aniye, ji vir jî tişt biriye, wê bêjin ew  
dizbergo<sup>1</sup> ye, him jî dujminê Sovêtê ye.

-Lê ez qe nizamim çi bidim? Çi bikim?

Hingî ewana hev ra diaxifîn Gevezê xwe ker kiribû, çawa dibên,  
ewa hate alîkariya Xanê:

-Tu wênekî Gulîzerê bide Kelo, bila ew jî bide wî qazaxî. Rostem  
ê şa be.

Kelo jî vê nêtê ra qayîl bû. Xanê rabû wênekî Gulîzerê yî biçûk  
hebû, anî da wî. Hinekî şûnda Kelo wana rabûn ku herin, dîsa teme  
da Xanê:

-Binê, xûşkê, keviyek bin, yek ser, evê meselê bila kesek nizanibe.

-Bira, çima me nan bi guhê xwe xariye.

Du-se roja şûnda Kelo çûbû îdara kolxozê<sup>2</sup>, li wir rastî Nûrsûltan hat.

1 **dizbergo:** 1. dizê jêhatî 2. sîxur

2 **kolxoz:** dema Yekîtiya Sovêta berê de koperatîfa gundiyan bû. Gundî  
dibûne endamê kolxozê, kê kar dikir, dewsa heqê xwe, rojxebat distand. Pêş  
rojxebatên xwe dawiya salê kolxozê çi direşand û diçand ew distand.

Wana çav kire hev. Hinekî şûnda Kelo ji îdarê derket ber bi gundê xwe çûnê, li newala nava her du gundan da sekinî, ser kevirêkî rûnişt, cixare derxist, wekî agir ke, Nûrsûltan rex wî ra derket û got:

-Bira, cixara min jî vêxe.

Hê wana kêf-halê hev pirsîn û Kelo wêneyê Gulîzerê da Nûrsûltan û got:

-Bira, Xwedê ji te razî be. Bêje Rostern Kelo digot zar, mal, kulfet sax û silamet in. Bila usa bizanibe ew î li vir e, çavên min ser zar, mal-halê wî ne. Xwestina me ew e, ew zûtirekê bê. Xwedê neke ew neyê, ewî namê da çi nivîsiye, çi temî daye, her tenê mirina min tunebe, ez ê wan hemûya emir da miyaser kim<sup>1</sup>.

Nûrsûltan jî razîbûna xwe da wî, wêne kire beriya xwe û got:

-Bila, ez ê hemû tiştî wî ra bêjim, wekî careke dinê bê, ez ê dîsa bê me bivînîm. De bi xatirê te, ez îdî herim, ditirsim hinek me bivînin.

Nûrsûltan bi gavên mezin va ji wir dûr ket, lê Kelo êpêcekî ser wî kevirê rûniştî ranebû, cixareke mayîn jî vêxist, kişand. Hey xwest derd-kulên dil da tevî dûyê cixarê bike, kê, lê nebû. Cixara duda kişandinê şûnda ji ser kevir usa giran giran rabû, te hew dizanibû, kevirên vê newalê li piştê wî ne.

Hindik mabû ew bigihîje gund Enwer wê da hat û usa xwe avîte pêşî bavê, te digot, ew ji devê guran xilaz bûye.

-Bavo, -ewî bi xof, bi hewar got, - hatin Evdileyê bira birin.

Kurebeşk jî wan ra bû.

Kelo ber dilê kur da hat, bêtaqet, bêbawerî vegeerî îdara kolxozê, belkî tiştêkî hîn be, lê tariyê erd hingavtibû, ewrê reş xwe ra ji wê wê da şeva reş dianî!

---

1 miyaser kirin: pêk anîn, anîn cih

## 6

Dem ew dem bû, wekî îdî girmegirma şerê hemdunyayê yî duye-  
mîn bû. Baweriya mayîn, nemayîn, jiyîn, nejiyîna kurdên nefîkirî ser  
tu tiştî nemabû. Ewana hatibûne ser we nêtê, wekî wê mêr, xortên  
mayîn jî bibine şêr, hê hêsîrê bibe hêsîr. Lê zûtîrekê fermaneke  
“şabûn”ê derket, wekî ji gelê hindikjimar tu kesî nebîne şêr.

Bi wê fermana xwe va destbilindên fêlkotî<sup>1</sup> li dunê xwe eyan dikirin  
çawa merivhez, edlayîhez û aşîfîhez. Ho, kulê tu mala derewa kebî!

Ka te çi hîşt? Ka te çi kir, çi nekir? Te bi hezara va merî dane pêşiya  
xwe, ji cî-warên wan kir, yê ku mir, yên ku ma...

Çav li te sor bibûn, tu bi vê yekê va hêsa nebûyî, çend sala berê  
mêr, xortên kirane bijart ku da bir, qe heta roja îroyîn Xwedê jî ni-  
zane. Vê kirina te va bi sedan va jin bî, keç bêdestgirtî, zaro sêwî  
man. Lê de dîsa wê fermanê nehîşt hêviya gel undabe. Îewra digotin:  
iDe, teşa wî vala be, textê wî welgere, ev jî tişteke el. Kelo fermanê  
hesiyanê destebirakê xwe Sedo ra gotibû: Bira, tu derz dikî ya me vê  
hukumetê çawan e? Mîna pêkenîna “Hevalê dil bi xilt e?” Yê dil bi  
xilt dibêje: “Hevalo, tu dizanî ez çawa ji te hiz dikim?” Dibê: “Çawa?”  
Dibê: “Warê çavên te derxim û paşê rûnê her ro bi van destên xwe  
va derman kim.”

---

1 destbilindên fêlkotî: rayedarên nebaş

Hêdî hêdî girêfikên<sup>1</sup> gulokên hevpiçilikî dihate vekirinê, wekî evê hukumeta xapxapok salekê, du sala berê dizanî bûye, wê dest bi şêr be. Lema jî kerr-lal mêr berav dikir, dibir amedeyî şêr dibû, usa dikir kesek bi kirina wî nehese.

Malbet bêmêr hîştinê şûnda fermana “qenciye” dide. Ya vê Sovêtê bûye ew, wekî yekî timakar, mixenet yekî diltemîz dixapîne û tevayî li bostîn zebeşa direşîninîn. Zebeş digihîjin, yê mixenet zebeşên gir berav dike, dibe difiroşe, hûrik-mûrika dihêle. Paşê tê hevalê xwe ra dibêje:

-Bira, were em zebeşa bibin bifiroşin û dirav nava hev da pareve kin.

Hevalê diltemîz xwe xwe ra dibêje: “Hela binihêre ew çi hevalekî helal e.”

Kurdên ku salên nefikirinê li Qazaxistanê û li rêspûblîkên<sup>2</sup> Asiya Navîn hatibûne hêwirandinê, sal bi sal hebinê konê nefikirinê yî reş vedikirin û tîrêjên royê xwe didane ser wana, tora pîra hevhevok, ku quncê tarî da hatibû hûnandinê, hêdî hêdî vedireşiya.

Gellek xaniyên binerd hatibûne hilşandinê, dewse avayê yek qatê hatibûne avakirinê, der-dorên malan bi pergar ser hev da anîbûn, çarmedorên dor hewşan dûr va rewş bi rewş dihate xanêkirinê.

Dibên, gundê şên bi rê va tê kivşê, halê malê rewşa avayî ra. Camêrên mîna Kelo, Sedo, Heso, Delo, porsipiyên mîna Rûbarê, Werdekê, Gulistanê, Xanê, Bedicanê ku herek weke mêrên mêrxas, mêrên biqîret mezinê mala giran bûn û yên mayîn weke hêz û zanebûna xwe, xwe ra avayiyê bi perger danîbûn. Berê ber derê mala tu kesî darek jî tunebû, lê îro te dûr va gund mêzekirinê, darên enwa bi enwa<sup>3</sup> rewşa gund bi carekê guhastibû.

Avayî, der-dorê gund ra tevayî, halê bineliyan jî hatibû guhas-tinê. Bineliyê gund payê pîr çemilê karekê va girtibûn. Ew îdî çend sal bûn Kelo diçû ber revoyê hespa. Giregirê kolxozê gişk ji kara Kelo razîbûn. Lê rojekê sedrê kolxozê, sedrê şewra gund ew gazî îdarê kirin û gotinê:

---

1 **girêfik:** hişkegilê

2 **rêspûblîka:** komar, cumhûriyet

3 **enwa bi enwa:** cure bi cure

-Kelo, tu îdî ne cahil î, gellekî diwestî, em ê xortekî bişînin dewsa te. Tu merivekî helal î, me gellek cara tu ceribandiyî. Em ê karekî mezin e bi bersivdar<sup>1</sup> bispêrine te. Em ê îro da erebekê, du hespa bispêrine te. Baweriya me gellekî ser te heye.

Paşê sedr ew da serwaxtkirinê, wekî ew ê rojê carekê bi erebê here navenda nehiyê, ji kûrexanê<sup>2</sup> nîn bar ke û filan derê lagêrçiyê<sup>3</sup> girtiya heye, bibe wura, nîn bide lagêrê<sup>4</sup> vegere bê.

Ew salekê zêdetir bû, Kelo erebevantî dikir. Ev karê nûh bona wî him qenc bû, him xirab. Qenc bû, wekî ewî bi wê yekê serê zarên xwe xweyî dikir, lê xirab bû bona wê yekê, gava ewî berê xwe danê lagêra girtingeha dikete halekî nemir-nejiyînê.

Him şabûn li wî diqesidi, him posîdebûn. Erebe tijî nanê somî, bûxanke<sup>5</sup> kirinê, ber bi lagêra girtiya reketinê te hew dizanî derdê wî tune, kul-birîna sala dibe mûkî nava mast de kişandî, dile wî tijî şabûn dibû. Lê ji lagêre vegehinê dîsa dixitimî, dîsa dilê wî bi xilta wede va tijî dibû. Dunê da tiştê nebînayî dibin ...

Ewî erebe tijî nan kirinê timê roye hinekî dizeriqand, hetanî dihat digihîşte lagêra girtiya, hetanî nan vala dikir, hetanî vedigeriya tariyê erd dihingavt. Te hew dizanibû tebiyet jî kirina dewrê ra, wede ra gav dide. Lema jî zû zû ewrê xitimî dicivîne ser hev, dûr va mîna konê reş dihate xanekirinê. Ev çi hal-hewal bû? Ev çi sur bû? Kelo hey dixwest bersiva van pirsan bona xwe zelal ke, lê çawa? Ewî car cara xwe ra digot: Xwezila çend deqîqa nava van ewrê reş ra biçûyama heft qatê erşê esmîn, belkî pê bihesiyama pîsî-xirabî, qencî-nemamî, zulim-ronahî, şayî-şîn destê kê da ye? Çima ciyê sekinî xwîn tê rêtinê, zulumkarî tê kirinê? Mêzîna heqiyê, neheqiyê destê kê da ye? Çima çerxa felekê rast, çep tê badanê? Çima hinek ji diya xwe bûnê kevirê aşê dide piştê û heta-hetayê dor hev dide zivirandinê? Çima em kurd ji bobeletê xilaz nabin?"

---

1 **bersivdar:** berpirsiyar

2 **kûrexane:** cihê agir lê vêdikeve

3 **lagêrçî:** serwêrê kampêkê

4 **lagêr:** (bi rûsî ye) kamp

5 **bûxanke:** (bi rûsî ye) nanê somî yê çargoşê

Ew nezîkî lagêrê bûnê hê dûr va didît, çawa girtiyê derva nezîkî çarmedora bi kelem dibin. Lê nizanibû, wekî gelleka xwezilbûna xwe wî dianî, wekî ew wî alî çarmedorê ye. Lê devedevî lagêrê bûnê didît çawa girtiyê hundur roderê ra dor bi hesin e weke kulfika tendûrê<sup>1</sup> ra dinihêrin, çawa ewana rê nadine hev. Yekî dihat çavên xwe dikuta rê, bi wê yekê va tariya dilê xwe kêr dikir, paşê ew paş da vedikişiya, îcar jî yê dinê dihat dinihêrî û qudûm dikete çoka, xwîna reş e dil rakişiyayî zelal dibû û boy roja sibê bawerî lê diqesidî, mirin bîr dikir, kefenê wede diqelişand. Hay way! Wextê ew ji lagêrê vegehrînê, bejin-bala girtiyan yên ser hev da quncilî halê wan, rûyê wan î xitimî reş qemilî, çavên kort da çûyî, hestûyê dêma yî bişqvedayî<sup>2</sup> anînê ber çavên xwe posîde, mişeweş<sup>3</sup> dibû. Lê carina hesirên ber çavên mêra dîtînê ew bi ruhê xwe va, bi bejin-bala xwe va diçû wê dunya tarî û xwe xwe ra digot: “Hey dewranê, hey zemano, tu xirab bî! Agir te kebe bişewitî! Bara dilê min da giriyê mêra reş xemilandina dunê ye. yanê mêr giriya, yanê tav rijiya, yanê jî dunya nava qedeke reş da hate pêçandinê, her du jî yek e, yek.

Ne, ez rind dizanim ev girtiyan payê pîrî ne sûckar in. Wana ne rê birîne, ne dizî, ne qetilkarî kirine? Dibên, ewana dijmin in, dujminê gel in! Dujminê Sovêtê ne! Hema ya me wan girtiyan yek e!”

Her ro ew ber bi kelê çûnê, timê mitala wê yekê dikir, çî wedeyî bigihîje girtiyan, çî wedeyî nan wan ra bigihîne. Lê ji lagêra girtiyan vegehrînê dikete zikir. Diçû derdikete welêt, gundê şênî rindik dianî ber çavan, girtin dikire bîra xwe û hê ew nêta giliyê çêkîst, wekî “hindik maye, ew bixweze jî, nexweze jî, îdî hespa wî wê nikaribe derbazî wî alî bel derz dikir. Îro dîsa Kelo vegehrînê xwe xwe ra digot: “Pak, firqiya me kurdên nefikirî û ya van girtiyan çî ye?” Rast e, wê rojê girtîkî xwezilbûna xwe bi min anî, got, wekî xwezila ez jî mîna te aza bûyama, lê min nexwest xatirê wî kevim. Baweriya wî bidime ber meqesê. Lê ew nizane, wekî hinekî ciyê wan teng e, ewana ji nava

1 **kulfik**: kulek, kun, pencereya biçûk \*\*\* **kulfika tendûrê**: kuneke biçûk a li binê tendûrê ku hewayê hilde

2 **bişqvedayî**: beloq û derketî

3 **mişeweş**: tevlihevi

çarmedorê nikarin derên. Welleh, hema em jî mîna wan girtiyan in. Wekî hinekî nûqî nava pirsê bibî, tu yê binihêrî halê-hewalê girtiye lagêrê ji halê me kurdan rindtir e. Vira tenê neferek, kesek girtî ye, lê ya me cihê ye. Lê merî qe bitemamî dikare gel bigire? Merî qe bi hezaran va merîva carekê va digire? Nava wan da him zaro heye, him kal-pîr, him mezin-biçûk. Gişke girtî ne! Çawa? Hela ecêba ser ecêbê mêze ke ... Ji vî gundî destûr tune tu herî gundekî dinê! Bira li vê nehiyê ye, xûşk nehiya dinê ye. Kurapek vê rêspûblîkê ye, kurapek rêspûblîkeke dinê ye. Bira dimire, bira nikare here ser birê. Naha ez metel mame kî girtî ye? Binê çi hatiye ser me. Em nava çend rêspûblîka, nava çendî çend marza<sup>1</sup> da, gunda da hatine belakirinê. Wedê em li Ermenîstanê bûn, ermeniyani ne ser tişteki, ne ber tişteki hey digotin, wekî em ermenî pîr-pîr qir bûne. Welleh, qira tev êlê şaya dinê ye. Lê qira mîna qira me li tu dewir-zemana nebûye. Merî merîki dikare bigire, dikare qop ke, seqet ke, post ke. Dîrokê da tiştê aha bûye, lê tu wexta neqewimiyê gel bigirî qop kî, seqet kî, post kî, zimîn jê bistînî. Emir da usa bûye mêrik ji weten hatiye deroderkirinê, lê gel bê deroderkirinê, bê cîguhastinê, eva ne zulm e, ne qetilkari ye, ne şipûk e; eva himberî erdhejandinekê ye, himberî bobelîskekê ye, wekî heft qatê erdê bilind dike, yekê werdigerîne ser yekê dunê, eva gelqir-mirin e! Lê mirin jî hatinê merîki ra, duda ra, deha ra tê, lê ne ku gel ra tê!

Welleh, billeh merî disa vî derdê ser derda ra dikare bikişîne. Lê, ziman ji te stendine. Usa bişewîne zimanê, ku dê daye te, bi zorê derxistine, yekî dinê tepisandine dewsê. Ew ziman cihê, xwîna dilê te ra çerx dide cihê. De warê ber vê bobelatê tehmiil bide! Îdî min emirê xwe payê pîr derbaz kiriye, gotî naha hê hînî zimanekî dinê bim.

Firqiya me van girtiya hindik e. Ewana nikarin herine malê xwe. Ya me jî hema tişteki usan e. Wekî birê te li gundekî dinê be, bimire tu nikaribî herî ser. Pewîst e destûrê bistînî. Hetanî destûrê distînî, sê roj derbaz dibe, dimîne heftê. Heftê ra ya Xaliq, bigihjêyî, negihjêyî... Ji ber ku bira dimire, hewar tê, îdî mirin dimîne alîkî, direvî

1 marz: parêzgeh, wilayet

erzê dinivîsî, divî didî, dibê here sê roja şûnda were. Ew kaxezê te ji vî destî derbazî destekî dinê dibe. Axir, dibêjî wekî bira miriye, yanî xûşk miriye, yanê bav, dê miriye, gerekî herime ser. Dibê, sê roja şûnda were, gotî bê nihêrandinê, binê rastî jî usan e. Bona deh kîlometra tu nikarî bigihîjî miriyê xwe jî. Carina jî dibên, tişt nabe, dunê bela nabe, wê bê te defin kin, meriv ê peyda bin. Îja sê roja şûnda te ku kaxez stend, a wê demê “şa dibî”. “Şayî” û şîna te dibe tev hev. Ya Rebbî, naha tu xwe bêje, girtina me bi şewat e, yanê ya nefsekî. Nefsek tê girtinê diçe, roja şînê qewm-lêzimê dinê beravî ser hev dibin, şaya xwe bi şayî derbaz dikin, şîna xwe bi şîn. Hê ya me usa nîn e. Ya me em e gişk e girtî ne. Serwêrê kelê ji nefsekî, ji girtîkî bawer nake, wî tu dera da bernade, lê ya me seraser ketiye bin bandûra şikberiyê. Welleh em girtî ne, ewana nivgirtî ne? Hela tu şuxulê dunê binihêre, girtî nivgirtîya ra nîn dibe. Hela mêze ke binê gel çawa mîna lêlafkê hev lifandine. Meselen, xwezila 10 sal, 20 sal, lap 50 sal kela bidana min<sup>1</sup>, lê jina min, ewledên min, qewm-lêzimên min serbest biçûyana, bihatana! Ya sereke li welêt bûyana!

Îdî erf-edet ji nav me hildane. Kanê “Beranberdan”, kanê “Newroz”, kanê roja qurbanê, kanê rojîgirtin? Kanê dohol, zurne, tembûr-tulim? Kanê erf-edetê şayî-şînê? Kanê koloz? Kanê bazbendê destê bûka? Kanê fîno-qotik? Kurtik-mêzer? Kanê kofiya bi fînoyê sor, şirik, şirdana bi zêr, zîv, polik, morî-mircan? Lema gotine “him dîn çû, him îman, him bawerî hate hildanê, him mêranî. Him gişk ketine halê merivê nava daristanê da xalifî<sup>2</sup>. Ew vir da, wê da direve, wekî du-sê roja li wir bimîne, ew belengaz îdî nizane tav ji ku dertê, li ku diçe ava? Bona wî şev-ro dibe yek. Ya me, ji wê jî xirabtir e. Merivê xalifî her rê şaş dike, lê em usa kirine conî kutane, me hemû tişt unda kiriye. Gel bi serbiser hatiye xalifandinê”.

Nişkê va mîna merivê sersemî dor-berê xwe mêze kir, kela wî tijî bû, hêsira rê nedane hev û bi wê kelê xwe ji xwe pirsî:

-Kanê êla rengîn? Kanê Çiyayê Agiriyê? Xwezila naha ez ber mirinê bûyama, lê çavê min li wî çiyayê ziyaretî keta tase ava gundê

1 **kela bidana min:** di keleyê de bihatama girtin

2 **xalifî:** rîya xwe şaşkirî



me yî li pêşa wî bidana min! Min ê bi şabûn bikira qîrînî û bigota mirovan:

-Dewata min hema îro hê lê dikeve.

Paşê kela dilê wî rabû: Mîna pêlê behrê ser hev ra pêl dan, hêdî hêdî ber xwe da kire vingevîng, hinekî şûnda dengê xwe bilind kir û bendek, dudu kilama “Heydero, Lawo” strâ:

*De lo lo, lo lo, lo lo ...  
De lo lo, Heydero, lawo,  
Bexê min, dilê dayîka te sêla hesinî,  
Berfekê li me barî,  
Li zozanê Hesenkêfê,  
Li Gîmlîk kavi, Guhadînê,  
Kulî kulî hat erdê sekinî.  
Bahara xelqê ketiye derdê  
Mal-hale dunyalikê.  
Derdê dayîka te ne mal-hal e,  
Ne koza berxan e, ne hoza miyan e,  
Ne tewla menekîyan e<sup>1</sup>, ne mala giran e,  
Derdê dayîka te, kekê Mehmed,  
Siyarê “Zerê”, axangî xortan e,  
Cotê gullê mawîzerê birîndar e.  
Li deşta Bişigîné,  
Bêxweyî, bêxwedan maye.*

Hema vê gavê dengê gullekê li wî tesele bû. Ewî kilam nivcî hîşt, çawa dibên, rû nava royê belengazî veciniqî, dora xwe nihêrî, nihêrî kesek tune, piş xwe va zivirî dît, merîk pey ereba wî direve, dest da jî tîfîng. Çok li Kelo şikestin, xwe xwe ra got: “Xwedê xêr ke, ev çi ye? Xwedê ewqasî li me hatiye xezebê dengê kilama kurdan bihîstinê agir-alav barand! Diqewime biryar derxistine ez haj pê tuneme, wekî ne di mal, ne li bajonê bi zimanê kurdî neyê axavtinê? Kilam bi wî

---

1 **menekî:** hespê kihêl

zimanî neyê stranê? Weleh, billeh, wekî usa be, ew kî dibe bila bibe, hema ewledê min bi xwe be, ez ê têkimê firsendê tifingê jê bistînim, gullekê bere dilê wî dim! Paşê xar bim, hine xwîna wî vexwum, piştî xwe rast kim, her hêteke xwe gullekê berdimê û xwînê da bimewicim, hetanî ruhê min devê min ra derê bi kurdî bêjime Xwedê: ‘Ya Rebbî, ne Te bi Xwe ev ziman daye me! Îja ez betalê tiştêkî me? Bona wî zimanî eva çendî çend qurne ye xwîn tê rêtinê. Hema van salê emirê min da li bereka Çiyayê Agirî dewsa avê xwîn kişiya, sewa wî zimanî em deroderî van best-beyara bûne. Binê berê me dane kê derê? Binê ro nava royê li vê rasta bê serobin, ku kesek lê tune, min xwest kula dilê xwe ra kilamekê bêjim, te wê sehetê agir ser min da barand, te wê deqîqê ruhustîn şande ser min. Ya Rebbî, ev bendê dunyayê gişk ewledê Te ne, yekî bi nan-xoyê dikî, yê dinê tî-birçî! Ya Rebbî, pêş gişka va ruhê min bistîne, lê nifira Xwe ji ser me kurdan hilde! Usa bike em jî li ser axa weletê xwe govenda emir bigirin. Em bibine xwedanê ax, kevir-kuçikê xwe!’

Ewî serê hespa kişand, erebe da xweyîkirinê. Ew merî hat gihîşte wî, selam dayê û got:

-Erebê bizvîrîne, a dinihêrî, dera hanê girtî dixebitin, serwêrê me jî wur e. Ewî emr kir, wekî ez bême te bivime wura. Min jî hey gazî te kir, nihêrî nabihîzî, loma jî gullek avît, wekî tu bibihîzî. Te dengê xwe dabû serê xwe.

Kelo bi dengêkî nimiz pirsî:

-Çima, çi bûye? Min çi kiriye?

-Qet tiştêkî usa yî bi tirs tune. Nava wan girtiyan da kurdek heye, ew dixweze te bibîne.

Feqîrê Kelo qe tiştêk fem nekir, lê berê erebê zivirande ber bi girtiyên, ku ji rê hinekî wê da dixebitîn. Ewî hinberî girtiyan erebe da xweyîkirinê, ji wê peya bû û gavek, dudu avîtînê, serwêrê girtiyan û merivekî bejinbilind ber bi wî hatin. Ewana pêşberî hev sekinîn.

Serwêr selam da û pirsî:

-Tu kurd î?

-Belê.

-De wekî usa ne, hûm hev ra gep kin.

Ewî ev gilî got û paş da zivîrî çû. Kelo û mêrikê bejinnîvçe êmê çend deqîqan li hev nihêrîn, paşê girtî hewal da:

-Bavo, ez jî kurd im. Ez Erebe Şemo me. Ez î girtî me. Min bihîst tu kurdî distirê...

Îdî sebra Kelo nehat, ber bi Erebe Şemo revî, dest stuyê wî ra bir û hate rûyê wî. Ew hemêz kir, serê xwe kuta sîngê wî û got:

-Ereb, bira, koraya mêrê çê! Ez te rind nas dikim, tu dihatî nava gundên me, te nava kurdan şuxul dikir, qeydê Sovetiyê dipesinî, paşê jî carekê hatî zar beşder kirin, bona Texnîkûma kurda ye Rewanê.

Mîna zara bû kûrîniya Erebe Şemo. Ax, wax, yek digiriya, dinaliya, yekî bi girî dilê xwe rehet dikir, yek mîna ewirê kimkimî hatibû girtinê, lê lê bû biteqe, birûsk vede!

Hinekî şûnda bîna herduya jî hate her wana û mîna du zarên sêwî ye posîde, pêşberî hev rûniştin. Kelo destê Erebe Şemo kire nava kefa destê xwe û êpêcekî şûnda got:

-Birao, ez kor bim, tiliyê te pifik dane.

-Bavo, bila dujminê te kor be. De çi bikim, min qelem daniye, mer' hildaye. Tişt nabe, ez ê hedî hedî hîn bim; biçûktiyê da min xulamî kiriye. Birao, ber xwe nekeve, her tişt ê zû-dereng bê ciyê xwe bigire.

-Birao, ca pirsê mayîn bila bimînin, çi qewîn vana em rastî hev anîn?

-Bavo, we rojê jî tu erebê va rex me ra derbazbûnê, te kula dilê min ra kilamek digot, guhê min sewta miqamê kurdî hilda, lê ez bi xwe şikber bûm. Lê îro îdî şikberî nema. Te "Heydero Lawo" distira. Heyder bona azadariyê şer dike, tê birîndarkirinê, de kilamê davêje ser. Ne diya min heye kilamekê bavêje ser min, ne yek heye bêje jorê, gelo, min kurê şivan çi kiriye? Çima ciyê neheq qeyd avîtine destê min? Çima qelema min ji destê min stendin, bi nemamî, bi qewîzî<sup>2</sup> mer dane destê min? Qerez ... îro dîsa te stiranê min zefta xwe neanî, kerreker hêsir barand û dilê xwe da got: "Canim, li vê rasta Qazaxistane ew kî ye usa bi şewat-şewat distirê?" Serwêr bi min hesiya û pirsî:

1 mer: bêra devrast

2 qewîzî: bêbextî, xedarî, minxetî

-Profêsor, tu çima digiriy?

Min hal-hewal jê ra got. Ewî ew xort şande pey te. Bavo, gişk dizanin ez î xwendî me, nivîskar im rûsî rind dinivîsim, a lema min ra hurmetê dikin û dibêjin: “Profêsor”.

Kelo kîsikê titûnê, kevir-hest derxist, du cixare pêça, agir kir, yek dirêjî Ereba kir, yek xwe da ser lêvên xwe.

-Welleh, -Erebê Şemo got,- ez nakişînim, lê carcara ya dilê xwe tevî dû dikim, wekî bigihîje erşê esmîn.

Paşê pirs ji ber pirsê derket. Ereba Şemo kurt derheqa girtina xwe da got.

Êmekî xurt derbaz bû û eskerekî hat got, wekî îdî bes e, wede derbaz dibe.

Wana mîna du xêrxazan, mîna du birîndaran, mîna du hesreta rabûn xatirê xwe ji hev xwestin. Ewana hatine dest- rûyê hev, te tirê destê dê ji ewled dibû.

Kelo ji kûraya dil keserek kişand, got:

-Birao, em kurdên li van dera, ku hatine nefikirinê tu wext te bîr nakin. Ez ê herim gişka ra bêjim, em ê ese bêne dîtina te.

Kelo çend cara zivirî piş xwe va nihêrî, nihêrî Ereba Şemo hey kûz dibe, hey rast dibe, mîna girtiyên dinê erdê dikole, xweliya vedayî ser hev da weldigerîne.

Dewir, zeman jî mîna erdê ye. Dinihêre ew dikeve destê kê? Te hew nihêrî ew dikeve destê hineke usa, ewana erdê radikî, dexî direşînin, erqê dikolin av tê ra dikişê; hostan, necaran dicivînin boy merivayê qesra, avaya çêdikin, didine rex hev. Ulumdaran, zanyaran beşder dikin, ulm pêş da dibin, emir şên dikin, bi gilîkî qayîl nabin derzî bê ta bimînin. Lê carina ev yek tê vejandinê. Avayî, qesrên heyî dibine kelefe, dewsa xasbaxça, dewsa zeviyê hêşîn, erd reş dikin, qijik meytê însanetê dide ber nukulan, bîn-buxsa xirab dunê dihingivîne. Navên wan telaqreşa, wan versûya<sup>1</sup>, ku çerxa zemîn bi wedelî destê wan da ye, dikeve nava însanetê dunyayê, çawa navên bi xof, navên dor bi qetiran, sew girtî. Ji ber ku ser sîngê erdê, ewana

1 versû: gornebaş

bi destî merivên mîna Erebê ziyaret, erqê didine kolanê, lê kesek nizane wê erqê ra av ê bikişe, ronahiyê bide merivayê, yanê xwîn ê bikişe, dunyayê bi tîbûn-birçîbûnê, xelayê va, talan-tajan kirinê va, belengazî-sêwîtiyê va, girî-hewariyê va bê hêwirandinê.

Kelo gihîştinê ber dêrî ro çûbû ava. Dilê wî ra derbaz bû, wekî naha wedê hatina keriyê pêz e, garana dêwêr e. Lê ne deng hebû, ne hes ... Naha, wekî li ciyê kal-bava bûya, keriyê miya ye têkira kalekal, çêlekan têkira oreor ... Lê nişkê va ji Xwedê bû, ji benda bû hespekî kire hîrehîr. Kelo ji vê yekê dêmxeş bû. Hîrehîra hespê ra Gevez, zar derketine der- va.

Dîsa şukur... Rasthatina xwe Ereb anî ber çavan, dêm lê xitimî.

-Jinik, -Kelo got,- ez îro rastî Erebê Şemo hatime.

Jinê fem nekir, Kelo şukurbûna xwe çî tîne, wê yekê tîne, wekî derê malê dengê heywanekî mekrî<sup>1</sup> hat, yanê jî boy wê yekî, wekî rastî Ereb hatiye. Yek jî mitale kir Ereb kî ye? Lema pirsî:

-Lo lo, Erebê Şemo kî ye?

-Çawa Erebê Şemo kî ye? Tê bîra te, wedê em welêt bûn, ew hate nava gundên me, bona lawikan bibe Têxnîkûma kurdan. Têxnîkûma kurda ye li Rewanê.

-Pî, pî, erê! Ew î li ku ye?

Kelo xar bû hate rûyê Nado, Sînemê. Paşê mesele monik-monik gote jinê. Her Gevezê car carina çokê xwe dixist, digot:

-Mala te bişewite, vayîso<sup>2</sup>!

Hinekî şûnda li gund bû hewêrze. Behsa Erebê Şemo mal mal geriya. Lê kurdên vî gundî nizanibûn ji vê behsê şa bin, yanî şînê bikin, wekî yekî mîna Ereb dest kirine çelemê anîne van dera, çawa “neyarê gel”.

Erebo, belengazo! Biçûktiyê da ji aliye dê da sêwî ma. Şemoyê bavê wî yî kasib<sup>3</sup> rojekê destê Ereb girt, zarên dinê jî hilda, ji gundekî

---

1 **mekrî:** ajalê goşthelal

2 **vayîs/ baîs:** sedemkar, çî erênî çî neyînî be kesê ku bûye sedemê bûyerekê

3 **kasib:** kesê ku bi qezenca destê xwe debara xwe dike, feqîr

Roma reş derket, hat hat li gundekî malakana<sup>1</sup> hêwirî. Ereb emir da çi roj nedît? Bû dûajo<sup>2</sup>, bû pişkorî<sup>3</sup>, bû xulam, bû nivîskar ...

Deng-behs vî alî bela bû, wekî wî alî dewleta kasiban, bêkesan tê sazkirinê. Erebê sêwî bi zikekî têr, bi zikekî birçî li Sovêtê qesidî. Xwend, boy qeydê Sovêtiyê nava gundên kurdan da kar kir, ked kir. Erebê doyî pişkorî, îro bû piştovanê qeydê nû, bi hezaran merî da-gerande kolxozê, ne şeva wî şev bû, ne jî roja wî roj bû; kar dikir, diçerçirî. Lê çawa bû kurdekî sêwî yî bêkes, hinekî pêş da çû û nişkê va rabû, miqabilî Sovêtê derket? Eva hukmê wede, kirina merivê durû bû.

Êvarê mala Kelo yê camêr meriva va kimkimî bû. Mezinan dixwestin bi qewimandinê ra bibine nas, bizanibin, ew çawa rastî Ereb hatiye, meniya girtina wî bihesin? Biçûkan jî pirs didan:

-Apê Kelo, Erebê Şemo kî ye? Ew merîkî çawan e?

Hemû kurmancê gund li mala Kelo beşder bibûn. Hinekî şûnda dinboya<sup>4</sup> bi ecele xwe mala sedrê şewira gund ra gîhandin, wekî hemû kurd civiyane mala Kelo. Çi mesele ye kes nizane?! Sedrê şewira gund, rabû çû mala sedrê kolxozê û bi eceb pirsî:

-Tu nizanî ev kurdana bona çi civiyane mala Kelo?

Ne, qayde-qanûn ev bû, wekî şayik hebûya, gotî xwedanê malê pêş da bigota sedrê şewira gund, wekî filan rojê dewata kurê min e, yanê şayiya keça min e, wê ewqas meriv ê berav bin. Mirov jî mîrinê, dîsa berî gişka agahdarî didane sedrê şewira gund, çawa dibên ew destê hukmetê yî rastê bû. Bi gilîkî, hê roja roj bibû civat û derheqa qeyde-qanûnê heyî her yekî ra gotibûn. Çi mesele bibe, gotî mezinê gund-sedrê şewira gund, sedrê kolxozê, katibê teşkîleta partiyayê

---

1 **malakan/malekan**: di rûsî de wateya “moloko” “şîr” e; “molokan” jî “şîrvexwir” e; li gor baweriyêke rûsan lazim e mirov di heftê de du roj şîr vexwara, lê hin kes rabûn gotin tu asteng nîne ku mirov her roj şîr venexwe; ev kes piştê ji mezhebê ortodoks veqetiyar, dan ser rê û terîqeke din û di nav gel de ji bi vî navî hatin naskirin; di şerê osmanî-rûsan de (1876-1877) jî li derdora Qersê hatin îskankirin; naskirina wan û Erebê Şemo jî rastî vê heyamê tê.

2 **dûajo**: alîkarê şivên

3 **pişkorî**: zarok an jî ciwanê ku debara malê dike

4 **dinbo**: ceşê dilsoz û nefehma; dingo

bizanibin. Lê îro ev çî yek e, gişk beravî mala Kelo bûne, ji van mezinan kesek tişteki nizane? Lema jî wana wê deqîqê gazî brîgadîr<sup>1</sup> Mûradxan kirin û teme dane wî:

-Mûradxan, ca here dizîna va binihêre evana vê şevê boy çî berav bûne? Rast e tu kurdî nizanî, lê dîsa diqewime tu tişteki hîn bî, yek jî bizanibe ji kurdên gundê me kî ne wire? Eva ese pewîst e. Ew kurdê ku neçûne wê derê, wekî usane, ew wan kurdên mayîn ra neqayîl e û ew ê her tiştî me ra bêje.

Ji şevê êpêcekî derbazbûnê şûnda meriv vegeriyane malên xwe.

Lê Mûradxan êpêcekî dereng hat. Çawa dibên ew “destvala” hat û got:

-Min gellekî xwe ber çarmedorê teland<sup>2</sup>, paşê min çû guh da ser derê wana tenê bi zimanê xwe digotin, dibilandin. Evana merivê ecêb in, hema beravî cîkî bûn, tenê bi zimanê xwe dipeyivîn. Kurd gişk li wir bûn.

Mezinê gund pirr nerehet bûn, mesele gellekî hilxistin-daxistin û hatine ser vê yekê, wekî sibê, dîsa şev, ewana beravî mala Kelo bibin, çî pêwîst e bikin.

Lê sibê Kelo, Sedo û çend camêrê dinê hatine îdara kolxozê. Ewana çûnê kabînetê<sup>3</sup> sedrê şêwira gund, pey selam- kelimê ra wana meniya hatina xwe gotin. Ewî meriv şande pêy sedrê kolxozê. Sedr jî hate wira.

Kelo çawa rastî Erebe Şamo hatibû, usa nêta xwe ser hev da anî.

Sedran hev ra pirsîn:

-Ew kî ye?

Kelo got:

-Erebê Şemo nava me kurdên Ermenîstanê da merîkî herî xwendî bû. Dê-bavê wî mirinê ew hê biçûk bû. Ereb li mala malekanekî da dibe xulam, rûsî rind hîn dibe û dixwîne. Ewî bi alîkariya hevalên mayîn me kurdên Sovêtê ra elîfba nivîsî. Ew gund gund digeriya, zarên kurdan dida ber xwendinê. Ew li Yêrêvanê dirêktorê Têxnîkûma kurda bû. Bi kurdî, rûsî kitêbên wî hatine weşandinê.

1 **brîgadîr:** (bi rûsî ye) serokê komekê, serkar

2 **telandin:** çavdêrî kirin, payîn

3 **kabînet:** civat, meclis, qebîne

-Xweş, -Sedrê şêwira gund xwe zeft nekir pirsî- lê şeva derbazbûyî kurdên gund çima beravî mala te bûbûn?

-Bineliyan-kurdan bihîstin, wekî ez rastî Erebe Şemo hatime, lema jî berav bûbûn, ji min pirs, hewal dikirin.

-Naha, -Sedo rabû got,- em hatine bal we, wekî hûn meselê bizanibin. Yek jî me do şev meslehet kir<sup>1</sup>, wekî rojê ji malekê yek me here dîtina Erebe Şemo.

Sedrê şêwira gund bi avrûke kûr li wan nihêrî û got:

-Bila tu kes, tu dera da neçe, hetanî ez, ji xwe mezina ra neaxifim. Herin li roja xwe bigirîn, herin bi derd-kulên xwe va mijûl bin. Hûn hatine usa pesinê Erebe didin, te tirê tu sûcê wî tune, ciyê sekinî hatiye girtinê. Hema merivê mînâ wî beqî<sup>2</sup> qeydê Sovêtê dixûnin, pêş da diçin, têr duxun, paşê bin va miqabilî vê dewleta me ye delal xirabiyê dikin.

Wan camera îdî tu gilî negotin, li çavên hev nihêrîn u hêdîka derî va derketin.

-Bira, -Sedo got,- em hinekî vir da, wê da bikin, wê bêjin destê wan û Erebe Şemo yek e. Erebo, belengazo, kurdo bê xwiyo ...

Çend roja şûnda sedrê şêwira gund gazî Kelo kir û gotê:

-Em hîn bûn, wekî Erebe Şemo girtiyê siyasetê ye, lema jî destûr dane tenê şeş meha carekê rastî wî bên.

Him jî destûra hemûya tune rastî wî bên. Tenê meriyê nêzîk dikarin herine dîtina wî.

Kelo bi hemdî xwe pirsî:

-Sedr, bixefirîn, merivê nêzîk hema em in.

-Hûn wî hema hawa<sup>3</sup> nas dikin, lê merivê nêzîk jina wî, diya wî, bavê wî ne. Te fem kir?

-Belê fem kir, lê we got, Erebe girtiyê siyasetê ye. Siyasetê çi?

-Gotî ez ji te bipirsim, tu ji min dipirsî ... Katibê Ermenîstanê yî yekem girtine çawa dujminê gel, destê wî Erebe yek bûye. Ji mala katib namê Erebe derketine. Erebe nivisiye, Xwedê giravî halê kurdên Pişkavkazê giran e.

1 **meslehet kirin**: li hev şewirîn û biryar dan

2 **beqî**: teqez, helbet

3 **hawa**: wisa, wiha



Ser derdê ahala da derd zêde dibû, lê sal pey sala derbaz dibûn, emir dihate guhastinê. Zarokên kurda ye do ye, çawa dibên, ku bona parî nan digiriyar, îro bibûne xortên bersimêl, keçên kezî. Xort hebûn dixwendin, xort hebûn hînî pêşeka dibûn. Mezina li wan dinihêrî û bi şabûneke mezin hev ra digotin: “Şukur gişk ser xwe nin, karkar in, xwendevan in. Hêdî hêdî dikevîne govenda jiyânê û xwe dixingirînin”<sup>1</sup>. Belê, keçikên do ye pêxas, serqot îro bibûne keçikên kezîzêr, serî bi desmal, guzûkê bi xişir, ustu bi torbend<sup>2</sup>, zend bi morî, berpişt bi neynûk<sup>3</sup> bûn.

Belê, îro emirê kurdên nefikirî nava du xemila da hatibû pêçandinê. Xemilekê hêdî hêdî sor dikir, xemila dinê zû va reş vegirtibû. Xemila sor silsileta<sup>4</sup> îro Enver, Nado, Hu-seyn, Sînemê, Gulîzerê, Mîro, Siyabend û yê mayîn xwe werkiribûn, lê merivên di emirê Kelo, Gevezê, Seyrê, apê Sedo, Heso, rebena Seyranê, Bedîcane, Delo, Rihanê û çendî çendê dinê zû va zemîn, wede ewana nava xemila reş da pêçabû. Ewana kenîyanê, kenê ha ra dibên, kenê ber girî, ewana şabûnê, şabûna ha ra dibêjin, şabûna ber mala cîranan.

Hesreta cî-warê kal-bavan, kula emirê delal, ezîzên bêwede qusi-yayî, hilweşandina malên şên, fetisandina dûyê ocaxa, deroderbûna êla rengîn, serobinbûna erf-edet, rabûn-rûniştandina binamûs dilê wan da bûbûne şirîteke dirêj; paşê ew gişk hev aliyabûn, bûbûne gilokeke mezin e hişk û tu kesî, tu tiştî nikaribû ewê ji hev veke. Dû-dermanê vê bobeletê tunebû. Dilê wan da hemû tişt mîna şûşeke hûrxaş bû, cebirandina wê her tenê destê feleka telaqreş da bû. Felek jî tu wexta li mêriv nayê hewarê. Ew xwe hewarê ser hewarê da, zulmê ser zulmê da tîne. Ew bi xwe birînê ser birînê da tîne. Ew timê meriva ra çavgirtonek dilîze. Firqiya marê reş û felekê tune. Emir da usa bûye mêrê mêrxas, serkarê êlekê, mezinê welatekî, yanê pêşîkarê gel felek qest wî hev dizivîrîne rastî gulla neyar tîne, ew xweşcamêr jî ne boy xwe, lê boy paşrojiya gel, boy meremê qenc

1 **xingirandin:** xwe di govendê de hejandin \*\*\* **xingirîn:** di govendê de listin

2 **torbend:** gerdênî, kolye

3 **neynûk:** awêne

4 **silsilet:** nîfş, nesl

direve, xwe cîkî vedişere, lê tu nevê<sup>1</sup> ev der ber qulla marê reş e. Marê reş şa dibe, wekî ewî birîndar e, ji qulla xwe dertê wî mêrxasî vedide, jehrê vedireşe.

Mêrê mêrxas di xwe da dikewgire, kêlek kêlek weldigere, di wî halê xwe da mitala elê-eşîrê dike, mirin hêdî hêdî perda xwe dikişîne ser wî, lê felek û marê reş govenda şayê digirin.

A, eva çendî çend sal e, wekî felek û marê reş bûne nêçirvanê gelê kurd.

Dibên dunê da merîkî usa tune bê derd be. Lê yek heye derd, yek jî heye xwestin. Hinekê teral xwe xwe ra dibêjin: “Xuzila ewqas malê-halê min hebûya, xuzila şev razama, rabûma min binihêriya mehîneke mîna mehîna “Bêcanê” derê mala min e”. Eva tişteki mîna wê ye, wekî mirîşk xewnê da hevrîşkê dixwe. Eva xwestin e, derd tişteki mayîn e. Lê derdê ser derda ra jî tişteki nebîniya ye. Ax, wex, derdê van kurdên nefîkirî derdê ser derda ra ne.

Xênî ji vana silsileta, ya sisiya jî pê avîtibûne jiyânê. Zaroken mîna Bahoz kitêb li picekan, pênûs, hubur destan da didane pey xortê mîna Nado diçûne mektebê ...

---

1           nevê: nebêje

## 7

Salên nefiyê bûbûne gewlezê emir. Wan salan gellek qewimandin hatibû qewimandinê. Hinek avên zelal hatibû şêlûkirinê, hinek avên şêlû hatibû zelalkirinê. Şerê Cihanê ye Duyemîn xilaz bûbû. Ji vî şerî xênî ji qira însanet hindik mabû tîbûn-birçîbûnê hemû dunya hilda. Gellek dewlet ji taqet ketin. Ji wan dewletan yek jî Îran bû. Artêşa Sovêtê dikeve Îrane û axa wê dagir dike. Di dawiya şer da Îran bi her alî ji hêz ketibû. Ew çend sal bûn kurdan bona azaya xwe şerkarî dikirin û dixwestin di vê navê da rizgariya xwe dest bînin. Bona vê yekê li vira dest bi xebatên siyasî, çandî û leşkerî kiribûn.

Bona daxweza kurda ye bi qurna bê serî bi serkariya peşîkarên gel sala 1945a Partiya Kurdistanê ye Dêموkrat damezirandin. Bona gelê bindest partiyayê gellek tişt kir.

Van sala gelê azerî jî rabû û bona azayê şerkarî kir. Azerî û kurdan êpêce pîrsa da destê biratîyê, dostîyê direjî hev kirin.

Çawa hemû kurdên dunyayê, usa jî kurdên nefîkirî hey xemxuriya wê yekê dikişandin. Gelo, ew heja azayê wê çawa bibe? Hey dixwendin, dibihîstin, wekî Partiya Dêموkratîyê Îranê bi her alî pîrsa leşkeriyê va mijûl e.

Rojekê jî bihîstin, wekî Mustefa Barzanî tevî 800 peşmergeyên xwe yên çekdar ji Kurdîstana Başûr derbazî ya Rojhilat bûye.

Êvarekê Kelo rojnamek dêst da berbirî kur bû:

-Nado, lawo, îdî şukur tu mezin î, rojnaman dixwînî. Ca were evê gotarê min ra rind bixûne, Barzanî kî ye, ji ku hatiye, ku da diçe?

Nado ber bi bavê hatinê, ewî got:

-Îro girtîkî evrojame daye min, digot derheqa kurdan da nivîsîne.

-Erê, -Nado bersiva bavê da, - usa ye, bavo. Barzanî bi hevalê xwe va ji Kurdistana Îraqê hatiye Kurdistana Îranê.

-Weyla ez qurbana xîretê me. Lê lawo, bêje min binê ew kî ye?

Tifalê Nado, şagirtê dersxana mekteba navîn, şagirtê gundekî Qazaxistanê yî dûrî rê-dirbê dunya mezin çi bizanibûya Barzanî kî ye, siyaset çi ye? Qe wê êvara payîza dereng dihate hişê kê, wekî qewimandinên dunyayê, kirinên zemîn wê usa hev bê piçilikandinê, qe felek jî şev-ro rûnê, wê nikaribe serederiyê ji kirinên siyasetvanan derxe. Bav û kur ji ku bizanibûyana hine<sup>1</sup> teleqreşê, ku fêza wan, li qesra Krêmlê rûniştî, hinekê bintara wan “Mala Sipî” da kişk dane ber xwe û ser wî textên biçûk dunyayê pareve dikin, gelan vir da, wê da erdê ra dikişînin. Him hetaviyê didine wana, him bedbextiyê, him dergê cinetê, him dergê cehnemê wana ra vedikin ...

Rojeke zivistina sala 1945a behseke bi xêr, mizgînîke here mezin gihîşte kurdên nefikîrî ji, wekî Qazî Mehmed li meydana “Çarçira” damezirandina Komara Mehabad elêm kiriye<sup>2</sup>. Wê rojê meydan û soqaqên Mehabadê bi ala kurda ye sêreng kesk, sor û zer va hatibû xemilandinê. Wê rojê xênî ji serbajarê Komarê, usa jî bajarên Mako, Serîmas, Urmîyê, Bûkan, Serdeşt, Bane û yên mayîn mîna bûkeke berperdê rewş bi rewş bû.

Hemû kurdên Tirkiyayê, Suriyayê, yên Yekîtiya Sovêtê û yên mayîn şa bûn, bona hemûyan royê hê nedîr dabû<sup>3</sup>. Lê evê şabûnê, evê hetaviyê gellekî nekişand ...

Komara Mehabadê weke salekê kişand. Di nava vê salê da, aliyê siyasî, aborî, çandî, civakî da kirinên hêle hatibûne kirinê. Lê di aliyê leşkeriyê da pêşmerga dest dabûne destê hev, te hew dizanibû ketine

---

1 **hine:** hinek

2 **elêm kirin/elam kirin:** îlan kirin

3 **nedîr dan:** şemal û rewneq dan

govendeke bi govek' û navê wê govendê danîne: “Weten xweyîkar”.

Erê, bavo, wextê pêşmergan dest dabûne destê hev, mîna çarme-dorekê dora sînorê Komarê ji Yekîtiya Sovêtê destpêkirî, ji başûrê hetanî bajarê Wanê û Serdeştê domkirî, bi sîngê xwe va ew xayîkirinê, wextê wana nedihîştin çivîk bi çivîkiya xwe va wî erdê ziyaretî biterbîne, se “xwedanên erd-esmîn” xerîta dunyayê hê berê dabûne ber xwe, ser welatpa- revekirinê da mitale dikirin.

Erê, dayê, dema gelê kurd roj bi roj, meh bi meh ber agirê azayê hê nûh xwe germ dikirin, dema birîna çend qurna hê dereve bibû, dema zarokan, kal-pîrên hizhizî<sup>2</sup> dest dabûne hev kar dikirin, xerebe ava dikirin, bajar-gund şên dikirin, tîbûn-birçîbûna salan bîr dikirin, dema qeyd-zincîrên bi qurna hûrxaş dikirin, nizanibûn ku “xwedanên erd-esmîna”, hukumdara hê şer didomandin xerîta dunê dabûne ber xwe û welat nava hev da pareve kiribûn. Ev welat min ra, ew te ra, ew wî ra, ev ber min ra, ev gol te ra, ev çem min ra. Ewana hatin derketine ser Îranê. Çêrçîl berbirî Stalîn bû:

-Hûn ê Îranê hildin, yanê Rûmînyayê?

Stalîn êmekî kete mitala. Seqirtiyê ode hingavt. Çawa dibên, sê benda dunê pareve dikin qe tu dijarî pêş da nehat, lê bona Îranê çima pirs pêş da hat? Sedem çî bû, wekî ev merivê siyasetzanê dunê yî eyan ber pirseke aha kete mitala? Lê kesî nizanibû vê demê bedena wî ra enar<sup>3</sup> derbaz bû, gellek tişt hinberî hev kir û bi hukumdarî got:

-Rûmînyayê!

Vê demê Rûzvêlt, rûyê Çêrçîl nihêrî. Ne, axir<sup>4</sup>, eskerê Sovêtê zû va ketibû Îranê, zû va ew kiribû bin bandûra xwe. Axa wê dagir kiribû. Lê gelo, ev siyasetzanê dunêyan<sup>5</sup>, pey ewqas xerc-xeracîra<sup>6</sup> çima dixweze ji welatekî mîna Îranê yî dewlemend, derê.

Şer xilazbûnê ji Stalîn ser nêta xwe ye berê sekinî.

1 **govek:** 1. çember, xeleq, dayîre 2. bingeh 3. fireh

2 **hizhizî:** 1. ricîfî, lerizî 2. temendirêj 3. peritî, kevn

3 **enar:** êş û janên zirav ên wekî elektrîkê di laşê mirovan re derbas dibe; tevzî

4 **ne, axir:** jixwe

5 **dunêyan:** 1. dunyadîtî 2. ji aliyê dunyayê ve naskirî

6 **xeracîr:** xirecir, teşqe

Çelo<sup>1</sup>, çima ew dixweze dergê Şerqê ser xwe da bigire?

Sal ê derbaz bin û siyasetzan ê evê yekê aha şirove kin:

Ya yekê. Îdî sala 1946a li Îranê him komara Azerbaycanê, him jî komara Kurdistanê hatibûne damezirandinê. Paşwextê pirs ê pêş da bihata kişandinê, wekî Yekîtiya Sovêtiye piştovanê edlayê, dêmokratîyê, rastiyê ye, lema jî girîng e Azerbaycana Sovêtê û ya Îranê bibe yek. Wê demê li Şerqê dewleteke mezin tê damezirandinê. Alîkî da ev yek dest nade, alîkî dinê da Gurcistan û Ermenîstan ê têkevîne bin siya komara Azerbaycanê ya Mezin.

Ya duda. Pak, Komara Mehabadê, ya kurdên Îrane heye, lê pîrsa kurdên Tirkiyayê, Îraqê, Sûriyayê, ya Yekîtiya Sovêtê çawa bibe? Wekî usa ne dewleteke kurda ya mezin gotî bê damezirandinê. Ev yek jî dest nade. Sedem gellek in. Ya sereke, wê demê Yekîtiya Sovêtiyê wê çend dewleta ra bibe dijmin. Lê ya rind ew e, ser hîmê pîrsa kurdan, timê çend welatên Şerqê derbazî aliye xwe bike û gellek pîrsa da bi gotina wî rabe, rûnê. Lema jî şevêkê Yekîtiya Sovêtiyê ya “edlayîhiz”<sup>2</sup>, “piştovanê hemû gelê bindest” ordiya xwe ji Îranê kişand, derxist. Sibetirê ordiya Îngîlterê tijî Îranê bû. Gellekî nekişand, Îrana wê demê ye nizeniz pêketî bi destî hêz û çekên welatên dereke 30 Adarê sala 1947a serekomar Qazî Mehmed<sup>3</sup> û hevalên wî şirîtdarê da dar da kirin! Bi wê yekê va perda reş Komara Mehabadê hingavte nava xwe û xwestina kurda ye bi qurna<sup>4</sup> dîsa hate pêpeskirinê. Komara Azerbaycanê jî hate kaf-kûnkirinê. Lê Melle Mustafa Barzanî dijmin ra nehate rayê<sup>5</sup>. Ew çawa pêşmergên xwe yên çekdar va ji Kurdistana Başûr derbazî ya Rojhilat bûbû, dîsa bi destî wan mêrxasa miqabilî dujmin şer kir û riya hatî ra vegeî. Lê li Îraqê jî hal gellekî giran bû, Mustefa Barzanî Yekîtiya Sovêtê, çawa weletêkî piştovanê şerkarê azayê hesab kir û lema jî bi hevalên xwe ye pêşmerga va berê xwe dane Sovêtê, hatine Rêspûblîka Azerbaycanê ye Sovêtê ye Sosiyalîstê. Hay dewranê, hey zemanò!.. Hey dunya mirok!

1 çelo: çilo, çawa

2 edlayîhiz: edalethez, dadperwer, heqnas

3 qest jê Qazî Muhemmed e.

4 bi qurna: bi sedsala

5 hatin rayê: hatin ser rîyeke hevpar, li hev kirin

Belê, salên nefîkirinê, salên bi teniya sêlê nikaribû pêşiya jiyîna kurdan bigire. Ji ber ku dibên, alîkî emir reş e, alîk sipî ye, yek diçe, yek tê! Ewê jî dibêjin, wekî av û jiyana mîna hev in. Ew him şîrîn e, him tehl, şor e, him şêlî, zelal e. Ew him heye, him tune. Lê firqîk heye. Av dikîşe dawiyê da tê derekê asê dibe, disekine dibe gol, behr, okêan, lê jiyana mirovan ne usa ne, ew derekê nasekine. Îro şîn e, sibê şayî. Îro posîde ye, sibê bi ken, îro reş xwe kiriye, sibê al.

Çawa jorê hate qalkirinê, keç-kurên çend sala berê, yên ku poz bi xîtik bûn, naha ewana bûbûne keçikên kezî, ew bûbûne xortên tûncikzêrîn. Her yekê wan di hindava xwe da<sup>1</sup> karên hêlê<sup>2</sup> dikirin. Wê ra tevayî ew keç, xortana bi mirazê hev şa dibûn. Xazginî diçûn, dihatin malê hev. Çawa dê-bavê Siyabend. Ewana du-sê cara çûbûne mala Rostem, Gulîzer kurê xwe ra dixwestin, lê Xanê digot hetanî bavê wê Rostem neyê, ew yek serê xwe nagire. Careke xazginî -dê-bavê Siyabend- Şero û Zernîşan hatine mala camêrê Kelo. Wana kêf-hewalê hev pirsîn, rûniştin çay vexwerin. Zernîşanê hedîka niçande Şero, wekî meniya hatinê bêje. Ewê tê derxist, ku mêr nizane çawa ser pirsê veke, bi xwe aha axaft:

-Kelo bira, merî gotî tu wedeyî pêxemê<sup>3</sup> şuxulê şayê nexe.

-Xûşke, -Kelo bi ken got, - me pêxem li kîjan şuxulê xêrê xistiye?

-Na, -Şero kêlimî, - pirs usa nîn e. Em hatine hîvîkirinê<sup>4</sup>. De hûn rind dizanin Siyabend bûye maşoqê Gulîzerê. Em çend cara çûne mala Rostem, lê Xanê dibê 'hetanî bavê keçikê neyê, ew şuxul serê xwe nagire'.

-Keloye bira, -dîsa Zernîşanê got, - Rostem bextê Gulîzerê avîtiye ber pêşîra te. Namûsa wan spartiye te. Tu bi xwe dizanî Siyabend xortekî ser xortan e, him avtoajo ye, him hemû maşînê kolxozê pate dîke<sup>5</sup>. Destê wî zêr dibire. Hemû serê wî sond dixwen. Keçik jî wî hiz dîke. Pêşîra xwe veke her du jî ewledê te ne, destê wan bigire têke

1 **di hindava xwe da:** ji aliyê xwe de

2 **hêlê:** mezin, gewre, kêrhatî

3 **pêxem lê xistin:** feşkilandin, pûç kirin

4 **hîvî kirin:** tika kirin, lavayî kirin, rica kirin

5 **pate kirin:** tamir kirin

paşila xwe, bila ewana bi mirazê xwe şa bin. Xwedê mirazê ewladê we mîna dara merxê hêşîn ke.

-Ez jî ser wê nêtê me, -Gevezê got,- xwe jî wekî Kelo qayîl be hema em ê naha rabin herine mala Rostem.

Ewana hev ra pev ketin<sup>1</sup>, xût vê evarê herine mala Rostem.

Ewana ji mala Kelo derketine, heweke baharê ye xweş bû. Baraneke hûrehûr lê dikir. Bîna darên bişkivî kulîlkdayî, barana lêkirî tev hev bûbû, te hew dizanî gulaveke rind li te direşînin.

Avayê wan êpêcekî dûrî hev bûn. Çawa dibên, ewana yê ji vî serê gund, wê biçûyana wî serê gund, hela hinekî jî wê da.

Her du mêra dabûne pêşiyê, her du jin pey wan dihatin. Ewana ji çend mala derbazbûnê şûnda Şero vegerî gote jine:

-Diniherî, min gazî riya ziyareta ez te ra çûyî kir, ew hate hewariya me.

-Ere, -jinê got,- Xwedê mala xêrxazan bike ziyaret.

-Şeroyê bira, -Kelo got,- ez ê rastîkê bêjim û ji bîra xwe dernexe. Erê ez dizanim, wekî tu çûyî ziyaretê. Ziyaret li me kurdan nakeve? Ew li me nayê?

Şero tev hev bû, bi dengê ricifî pirsî:

-Çima? Ew çi gilî ye tu dibêjî?

-Kînge kurd ji vî serê welatê xwe, çû serê welatê xwe yî mayîn û vegerî hate mala xwe, nexşeya welêt vekir, bi şabûn malbeta xwe ra got, wekî hela warên mêze kin aqara welatê me çiqasî mezin û bêserobin e. Paşê bêje: “Ez vir ra derbaz bûme hatime vî bajarî, ji vî bajarî çûme vê navberiyê, ser vî çemî ra derbaz bûme, ser vê golê sekinîme, li vî daristanî qesidîme, vira av vexweriye, vira nan xweriye”. Bira, ziyareta mezin ew welat e. Heta ku welatê me ziyareta me ser navê xelqê ye, li me nakeve em herine ziyaretê. Çawa dibên, şabûn mirtiba nayê, ziyaret jî me kurdan. Ji ber ku ziyareta me destê dujmin da ye.

Ev gilî-gotin xweşa Şero nehat, hinekî kete mitala, xwe xwe ra got: “Hela bihêle, hela bisekine, ez rind nûqî nava nêtê camêrê Kelo bûm. Hema nişkê va pêşîra wî bigirim bikişînime meydanê û wî ra

---

1 pev ketin: ketin xebirdan û suhbetê



bêjim, tu ne rast î, gotî ez jî gotinê xwe mîna wî mak kim”<sup>1</sup>. Kelo jî dît ew tev hev bûye pirsî:

-Çima usa ketî diwariyê, zor e?

-Na bira, Xwedê tu zorê nede, lê ez him gotina te ra qayîl im, him jî na.

Îdî wana devedevî mala Rostem dikir, ser rê dikan hebû, Zernîşan çav dikanê ket got:

-Kelo bira, min qurbana xwe ke, çend deqîqa bisekin ez Gevezê va têkevîne dikanê kîlo-dudu kanfêt<sup>2</sup>, kalêt<sup>3</sup> bistînim, destevala ne rind e.

Ere, -Kelo bersiv da,- gotî merî zû zû gura jinê bike. Şero, usa ne yanê na?

Şero bi beşereke xweş kêlimî:

-Belê, vê gotina te ra qayîl im.

Hema vê qasê kurê Rostem Barî wê da hat. Wana kêf-halê hev pirsîn, jin jî, ji dikanê derketin tevayî çûne mala Rostem. Xanê derkete peşiya wana û got:

-Kerem kin, hûn ser sera, ser çavan hatine?

-Kerema te Xwedê ra be!

Him Kelo aha got, him Şero. Mêvan rûniştinê şûnda, Xanê çû maldizkê, wekî xwerek<sup>4</sup> hazir ke, him jî kete enenê<sup>5</sup>: “Xwede xêr ke, Kelo, Gevez çima wan ra hatine?”

Lê Kelo wê çirikî gazî wê kir:

-Xanê, lele, were vira rûnê, hela lez nekeve.

Ewê jî tiştê negot, hat pêşberî mêvana rûnişt. Kelo li rûye wê, ewê jî li wî mêze kir. Ewê jî dil kesereke kûr kişand, çend çirika şûnda got:

*-Rojê buhurî venagerin,*

*Meriye gora ranabin,*

*Emelê xirab çê nabin.*

---

1 **mak kirin:** piştrast kirin, spartin rastiyeke, îsbat kirin

2 **kanfêt:** (bi rûsî ye) şîrinahî

3 **kalêt:** (bi rûsî ye) qurabiye

4 **xwerek/xurek:** hemû xwarinên ku li ser êgir tîn amadekirin

5 **ketin enenê:** bi berfirehî pirsiyara tiştêkirin

Xûşka Xanê min hema badilhewa ev mesele negot. Xwedê dizane careke mayîn çavên me yê çiyayê Agiriyê bikebe<sup>1</sup>, yanê na? Bikiriyê<sup>2</sup> Rostem ser çava, em nizanin, ew ê kengê bê? Em nehatine emelê xirab, em hatine şayê. Heqê te heye tu ji min pirs kî, lê ez çima çawa xazgînî hatime. Ne Rostem bextê Gulîzerê avîtiye her bextê min, gotî ez dewata wê bi destê xwe bikim. Îro ez him ji aliyê keçikê da, hîm ji aliyê xort da hatime vê malê. Ew jî, ewa jî ewledên min in. Xêr-xweşî Rostem bê, wê bêje destûr destûra Kelo ye. Siyabend xortekî êgin e<sup>3</sup>, malbeta Şeroyê camêr malbeteke seqirtî ye, tu giliyê min erdê nexe.

-Kelo, bira, -Xanê got,- evana çend cara hatine min destûr neda-ye, ez qayîl nebûme her tenê bona Rostem. Lê te me ra gellek qencî kiriyê, rispiyê gund î, yek jî Rostem em spartine te. Min cara dawî gote Zernîşanê bêne bal te. Ewana jî hatine. Tu çawa rê tê ra dibînî<sup>4</sup>, usa bike.

Kelo bi şabûneke mezin got:

-Xwedê rûye te sipî ke!

Zernîşan ji ciyê xwe rabû hate rûye Xanê. Şero ser hev, ser hev got:

-Xwedê pîroz ke!

-Xanê, -Kelo got,- rabe pirsekê jî safî ke, bila dilê min da tiştek nemîne, ji Gulîzerê bipirse, ewa wî mirazî ra qayîl e yanê na!

Dayîk rabû çû xaniye dinê û hinekî şûnda hat, got:

-Keloye bira, Gulîzer dibê 'erê'.

De-bavê Siyabend şabûna rabûn çepilê xwe bilind kirin reqişîn, dora hev çûn, hatin.

Paşe Zernîşanê kanfêt, kalêt anî danî nava wana û got:

-Hildin devê xwe şîrîn kin!

-Xanê, heyranê, -Şero got,- here bûka me bîne vira, apê wê nîşaneke pê da ke.

Him dê, him Zernîşan çûn destê Gulîzerê girtin anîne vê odê.

Şero rabû hate eniya Gulîzerê, dest avîte beriya xwe, ji nava dest-mala desta gustîleke zêr derxist û bi şabûneke nebîniyayî got:

---

1 **bikebe:** bikeve

2 **bikirî:** qedr, yadîgar, bîranîn

3 **êgin:** jir, mêrxas

4 **tê ra dîtîn:** wisa dîtîn, wisa hesab kirin

-Eva çend meh in, ez vê gustîlê beriya xwe da digerînim.

Ewî aha got û gustîl kire tiliya Gulîzerê û bi dengêkî bilind berbirî hazira bû:

-Xwedê pîroz ke!

Kelo jî hat ewa maç kir, xêr-xweşî wê ra xwest. Bariyê bira jî hate rûyê xûşkê.

Gulîzer şerma wira nesekinî, çû xaniyê dinê, Kelo gote wana:

-Rûnên nêteke min heye, we ra bêjim. Ez ê keça xwe Gulîzerê bi erf-edetê kurdan verê kîm. Eva cara ewilîn e pey nefîkirinê ra derê mala me dewat ê bê derbazkirinê. Warên em bi carekê va mala xwe bi destê xwe neşewitînin, em bi carekê va kurmanciya xwe unda nekin. Ez ê herim deste sazbandê kurdan bînim, kofîke bi dilê hemûyan bidime girêdanê. Wana hetanî demekê şevê gotin, şa bûn, cîran jî hatibûn. Xazginî bi xêr-xweşî çûne mala xwe.

## 8

Sibetirê Kelo ji vî gundî çû derkete gundekî dinê, go ka binê, kofiyê kî rind girêdide, sazbanda ku bînim? Kofî hene cuda cuda nin ez gotî kofîke usa bidime girêdanê, wekî bi tiliya nîşanî hev din.

Bi edetê heyî kofî ne kara wî bû. Lê ewî digot ez him apê bûkê me, him apê zavê, him jî ev xwestina Rostem e.

Ew du-sê roj bû Kelo li gundê cîran, li mala Bedoyê camêr bû. Jina wî Perîxanimê hê bûktiya xwe da kofiya bûka çêdikir. Pêşiyê ewê textekî rast î meht<sup>1</sup> î zirav hildida, dianî dida mêrê xwe û ser ra disekinî, digotê, vira aha bibire, vira aha veroje. Paşê dida destê xwe, vir da wê da lê dinihêrî, gotî ew textê usa za bûya<sup>2</sup>, gava te bi tiliyan lê da, mîna diholê deng jê bahata. Ewê hemû textê, fanêrke<sup>3</sup> begem nedikir. Pirsra textê kofiyê safibûnê şûnda, bona perçê fino<sup>4</sup> Kelo çû dikana nehiyê û çend mêtir mexmerê<sup>5</sup> sor stend anî.

-Kelo, bira -Perîxanimê pirsî, - tu yê ç a kî ewqasî?

-Tişt nabe, bila Xwedê zêde ke. Hebûn bilindaya serê mêriv e, tunebûn nuxsantî<sup>6</sup> ye. Yek jî, Xwedê mala we şên ke, de mal e, bila

---

1 **meht:** rîprast û şimşad

2 **za:** neşil, hişk

3 **fanêrke:** (bi rûsî ye) texte

4 **fino:** cil û bergekî keçên kurdan ê mîna kuman e, ji perçeyê mexmer tê çêkirin û bi vê tê fêmkirin ku azib e.

5 **mexmer:** qedîfe

6 **nuxsantî:** kêmasî

bimîne. Te hew nihêrî sibê yek jî bona kofiyê hate bal te, îdî çima perçê fîno bigere.

Perîxanimê kula dilê xwe ra perçe qut kir, birî kişande ser texte û tayê sipî va dirû.

-Kelo bira, lê dora kofiyê bi çi wê bê xemilandinê?

-Ey lê lê, xûşkê, bila dewr ew ew dewir bûya, bila em ê li welêt bûyana, te yê bidîta, min çendî çend rêz zêr dor kofiyê rêz dikir, yanê na? De, naha çi bêjim, dibên, em ne ji malekê ne, lê ji halekê ne. Sê zêrê ber kofiyê, ji ber kofiya pîrika min mane, him jî ewana nîşana Weten in, em çiqasî ketine nava birçîbûnê-xelayê destê min nehat wana xerc kim.

Ewî dest avîte beriya xwe, ew zêrê nava pînê sipî da pêçayî derxist, danî ber Perîxanimê got:

-A, eva ew her sê zêr in! Wana têke nava zîv, morî-mircana û kofiyê bixemilîne.

Perîxanimê zêr dane destê xwe, paşê maç kir, danî ser çavê xwe û bi kelogirî got:

Bîna çiyayê me yî ziyaretî<sup>1</sup> li rûyê min ket! Bira, Xwedê pîroze ke. Tu yê bibinî, xûşka te yê kofîke çawa bixemilîne.

Paşê Kelo ji beriya dinê çend hev<sup>2</sup> zîv jî derxist da Perîxanimê.

Sibetirê danê êvarê kofiya bûkê hazir bû. Perîxanimê kofî bire oda jorîn, danî ser stêr, desmaleke hermûş<sup>3</sup> va ser girt û derbazî oda dinê bû. Mêrê wê, neferê malê, çend cîran, Kelo li wir rûniştibûn. Ewê bi dengêkî şa got:

-Kelo bira, de kerem kin werên kofiyê binihêrin.

Gişk bi hewaseke<sup>4</sup> mezin derbazî oda dinê bûn. Çavê xwe gerandin, tiştê nedîtin. Perîxanim qure qure nêzikî stêr<sup>5</sup> bû û got:

-Hûn çi qul-bêjiya dinêhêrin! Kofî ku heye, ewa him bilindaya

---

1 **çiyayê ziyaretî:** Çiyayê Agiriyê (li cem kurdên vê deverê ev çiya pîroz e)

2 **hev:** heb

3 **hermûş:** hewirmiş

4 **hewas:** xwestin

5 **stêr:** çend qat nivînên li ser hev

serê me ye, him namûsa jinê ye. Lema kofiya nûh datînîne bilindciya, datînin ser stêr.

Gişka li stêr nihêrî. Ewê xwest ji ser kofiyê desmalê hilde, Kelo kêlimî:

-Xûşkê can, kerema xwe hinekî destê xwe xweyî ke.

Paşê vegerî ser bûka malê:

-Dayê, ca xurca destê min bîne.

Bûk wê demê çû oda dinê û xurca Kelo anî da wî.

Kelo dest avîte xurcê, perçekî bedew derxist û got:

-Xûşka Perîxanimê, ez jî, ji vê dunê tiştêkî fem dikim, hela şukur edetê me bîra me neçûye. Eva çend mêtir perçe min pêş da boy kofiçêkirê çawa xelat kiriye<sup>1</sup>.

Ewî aha got, perçe hilda ber bi wê çû. Perçe vekir avîte ser wê û got:

-Naha ser kofiyê veke.

Gişk bi şabûneke mezin kenîyan. Perîxanimê ser kofiyê vekir.

Peşiyê Kelo nêzîk bû, eniya kofiyê maç kir, paşê mêrê dinê jî usa kirin û hev ra hev ra gotin:

-Kofiya bûkê pîroz be!

Lê xwedanê malê, pêş da hat destê xwe danî ser stêr û got:

-Kelo bira, bila stêrê bûkê jî vî stêrî qube be!

Paşê hat tiliya Kelo girt, desmal derxist da destê xwe, kete sergovendê û berbirî beşderan bû:

-Lawikno, keç-bûkên delal, têkevîne govendê, ez ê kilama “Ka bûkûnga min” bêjim, bila Keloyê bira li min vegeîne.

*-Ka bide min, bûkûnga min?*

*Malê me danîne dûr e,*

*Li ber çemê Xamûr e,*

*Berfê lê kiriye hûrehûr e.*

*-Nadime te bûkûnga te,*

*Hetanî kofiya wê neyê.*

---

1 çawa xelat kiriye: wekî diyariyekê standiye

*-Kofiya wê hazir e, hazir e,  
Min şandiye şirik kire,  
Ka bide min, bûkûnga min...*

Hetanî ev kilam xilaz bû, govendê govek girt<sup>1</sup>, şên bû. Hetanî wedekî şevê beşderbûyî kilam stran, gotin-bilandin.

Wedê îdî der-cîran dixwestin herin Seloyê cîran got:

-Bedo bira, bila mala te şên-qedîm be! Bila timê dengê şayê ji vir dûr nebe. Mala we berê da bûye mala mêvanan, mala mêran. Îro beqî<sup>2</sup> serê Kelayê camêr me şeva xwe rind derbaz kir, em gişk bi ruhê xwe va çûne welat. Malî ava! Bila timê kofiya bûkan vê malê da bê çêkirinê, bila timê bejin-bala bûkan vê malê da bê xemilandinê! Hezar bîn-bereket ji vê malê bê!

Paşê berê xwe ber bi Kelo kir:

-Kelo bira, Xwedê pîroz ke! Xwedê rûyê te sipî ke, wekî tu ewqasî erd hatî, boy kofiya bûkê! Te bi vê yekê va em gişk dane heşyarkirinê, wekî hela em nemirine, hela erf-edetê me nemirine!

-Bira, delalo, -Kelo kêlimî,- Xwedê we ji merîvayê kêm neke! Yek jî werên em wê yekê bîr nekin kal-bava gotine: “Şayî-şîn birê hev in”. Nefîkirin me ra şîneke mezin e, bila ew şîn derê mala wan be, kê ciyê sekinî berê me da van derana! Îja hema sal bi sal em unda bin? Na! Na! Gotî em kurdên nefikirî nefiyê îro da nava qedekî<sup>3</sup> reş da bipêçin, çehl kin, ser wê em gişk dest bidine destê hev, govendeke usa bigirin, usa bêjin-bikenin, bila neyar kor be!

Gişk, kî ku vê derê bûn, usa kerr-lal sekinîbûn, te qey digot her vira ev her du camêr in, hev ra dihewilin<sup>4</sup>.

Paşê ewana hev hemêz kirin, hatine dest-rûyê hev<sup>5</sup>!

---

1 **govendê govek girt:** govend wekî xeleşekê li hev rêz bû

2 **beqî serê yekî:** bi sayeya wî, bi sedema wî

3 **qed:** pîne

4 **hewilîn:** 1. axaftin 2. muhtac bûn

5 **hatin dest-rûyê hev:** 1. (di nava hevtemenan de) merhebatî dan hev û rûyên hev maç kirin 2. piçûkan destê mezinan û mezinan jî rûyên piçûkan maç kirin

Yên hafî yeko yeko dêrî va derketin û gotin:

-Şeva we bimîne xweş! Xwedê malê we şên ke!

-Ser sera, ser çava, herine ser şayiyê!

...Çendekî şûnda berbangê dengê zûrnê, diholê gund hilda serê xwe. Qasek derbazbûnê hewşa camêrê Şero govendeke usa govek girt, çawa dibên, paşî-pêşî nedihate kivşê. Di mala Rostem da jî be-jin-bala bûkê dihate xemilandinê.



## 9

Ji derd-kulan dengê kurdekî li dunê tesele bû: “Bi elek, bi bêjing, bi aş î, dunya! Çerxa te hey fitil fitil dora hev diçe, tê, qe nawestî dunya! Mirovan elek, bêjinga xwe ra derbaz dikî, dikî nava beraşên aşê xwe dor hev dizivirinî, dunya! Ciyên sekinî şeran radikî, însan însîn qir dike, şipûk tê, bahoz radibe, erd diheje, hindik dimîne erd û esman bigihîjîne hev, mirov ji dest diçin, lê talaşa te nîn e, hey çeçeçeqa te ye. Lema gotine: “Beraşê aşa ro da diçin, tu pey çeçeçe ketî” dunya!

Eva çend qurne ne kurd di nava zelûliyê<sup>1</sup>, rev-bezê, koçekoçê da nin, qe qerçimekê eniya te ser hev da nayê, dunya!

Bêjing, elek, beraşên aşê xwe qe ji ser kurdan hilnadî, dunya! Te gelê kurd kerî kerî, beşbeşî kiriye. Pêşiyê bêjingê dixî gira dibî, paşê elekê dixî, hûrika dibî, dunya!

Wana dikî kevirê kewkî<sup>2</sup> vir da, wê da davêjî, dikî hêleçana xwe, vir da, wê da dibî-tînî, dunya! Çawa mîna şeva îşevîn. Hingî fermana azayê derketibû, kurdên ku hatibûn nefîbunê mal bi mal, malbet bi malbet, deste bi deste ser Behra Xezerê ra paş da vedigeriyan.

Digotin, em ê ber bi welêt herin!

---

1 **zelûlî:** mehrûmîyet

2 **kevirê kewkî:** kevirê virvirkî

Şeva îşevîn di nava Behra Xezerê du gemî rastî hev hatin. Yek diçû wî alî, yek dihate vî alî. Bi edetê behrvana borî pey boriyê hate lêdanê, selam dane hev. Ji vî dengî çend kurd ji vê gemiyê, wê gemiyê derketine qatê jorîn, tariyê da hev nihêrîn.

Çi hatibû serê kurdên ku paş da vedigerîn, em kê-m-zêde dizanin, dunya! Lê ev kurdana kî ne, ji ku hatine, ku da diçin, ku da dişînin, çi wê bê serê wana, me ra qal ke, dunya! Awa ...”

Du merivên xerîb nava çend kesa ra gav didan. Ji ewan merivên xerîb yekî bejinbilind, yekî bejinnîvçe bû. Ewana rex hev, lap nêzikî hev gav didan. Ewana ji qatê şeşa dadiketine qatê yekê, ji wir jî wê daketana jêrê, bona mêvandariyê.

Ewî bejinbilind hêdîka xar bû guhê hevalê xwe da, çi got, negot ew ciyê xwe da sekini, wê demê te digot birûskê li wî da, ew xwe da xitimî. Reng hate guhastinê, reş qemilî, hêdîka pirsî:

-Pîşewerî, kê te ra got?

-Naha ne cî ye bêjim.

Paşê yê bejinnîvçe gavek, dudu jî avît, qesta destşûştinê mîna bayê birûskê fitil da xwe, paş da vejerî, derkete derva. Îdî qe piş xwe va nenihêrî soqaqê ra pêberjer bû, ji nava avaya ra bi babizotî<sup>1</sup> diçû. Lê nişkê va kete bîrê, ne ew nizane wê ku da here, vê gavê xanimêk kelekê ra derbaz dibû, bi lewzekî tirkî ye şîrîn pirsî:

-Xanim, bibaxşînin, MGB (Wezîriya Dewletê ye Bêqezayabûne<sup>2</sup>) ku ye?

Jinikê hema aha bihîstinê gav da, riya xwe şaş kir, reverev kete pêşxana<sup>3</sup> avayîkî. Ew mehtel ma, xwe xwe ra got, canim min çi tiştêkî xirab gote vê xanimê, ewa usa tirsîya, xwe jî hela binê çawa revî û xwe verşart?

Ewî dîsa soqaqa nenas ra da gava. Îcar mêrekî navsere rastî wî hat, evê te ew da xweyîkirinê, dîsa bi lewzekî şîrîn pirsî.

Vî mêrikê navsere hêdîka milê wî girt, ji rê derxist û got:

-Ez dinihêrim tu ne merivê van deran î, merî tiştê ha dizînkava dipirse, te fem kir?

1 **bi babizotî:** wekî agirê ku li ber bayê gur her diçe xurt dibe

2 **Wezîriya Dewletê ye Bêqezayabûne:** Wezareta Ewlehiya Dewletê

3 **pêşxane:** ji aliyê hundir û derve ve valahiya ber û pişt deriyên

Paşê ewî ew da serwaxtkirinê çawa here wira, him jî tu maşîne, yanê faytonê siyarbûnê, navê wê derê mekşîne, lê bêje, min bive filan derê, wira jî peya be, hema ser milê rastê ew der e.

Ewî dîsa soqaqê ra da gava.

Faytoneke yekmerî siyar bû û gote faytonajo, wekî min zû bigihîne filan derê.

Ew li soqaqeke fire ji faytonê peya bû, diravê faytonajo dayê û li wir sekinî dora xwe nihêrî, ew derana verevurt kir<sup>1</sup> û aliye çepê ra da gava. Li ber derîkî sekinî. Vê demê çêkîstek ji hundur derket, evê te milê wî girt û pirsî:

-Ez çawa dikarim herime bal mezinê we?

Çêkîst bi avrûke tûj li wî nihêrî, milê xwe ji destê wî derxist û got:

-Çi ye, tu dîn bûyî?

Paşê dît ev merivekî dereke ye<sup>2</sup>, dîsa kêlimî:

-A, here ber derê hanê pirs ke.

Ev merivê dereke ber wî derî sekinî û şûşa wê zexm kuta. Xortekî hurpizî<sup>3</sup>, bejinbilind derî vekir û bi hêrs pirsî:

-Çi ye, çi dixwezî?!

-Destûrê bide ez herime bal mezinê we.

Xort ew hinekî wê da dehv da û derî ser da girt.

Ew hinekî sekinî, paşê vir da wê da da gava, lê nihêrî tişteke derneket, derî dîsa kuta. Vê carê ev xortê hurpizî bi hêrs derket, hate ser wî, ew dehv da û bi dengêkî bilind got:

-Lo, bêaqilo, bicehime ji vira!

Ewî ha got û vegeerî dîsa dêrî bigire, evî para va qayîşa piştê girt, bi hêz ber bi xwe kişand, ewî berê xwe wî da kirinê, evî qayîşa wî berda. Dest avîte pêsîrê û bi destê rastê va şileke usa li nobedar xist, agir ji ber çavên wî barî. Nobedar xwe şaş kir, revî hundur, derî vekirî hîşt, dest avîte têtêfonê, çi got, negot, qe du-sê deqîqa nekişand çend merî hatin û ew derbazî hundur kirin. Yekî zû para va destê wî

---

1 **verevurt kirin:** 1. berawird kirin 2. tesele kirin, kontrol kirin, ber çavan re derbas kirin 3. çareser kirin

2 **dereke:** 1. ne ji wê herêmê 2. biyanî

3 **hurpizî:** qelew

bada. Ewî usa kire fendê, qe evan hevalê dinê nizanibûn çawa bû pişta hevalê wan li erdê ye. Gişk ciyê xwe da qerimîn<sup>1</sup>, lê yekî dest avîte qirme derxist û got:

-Hema tu bilivî, ez ê te cî bi cî bihêlim!

Ewî qe tişteq negot, ber bi wî da gava û qirma xwe kişande ser wî, bi dengêkî sewgirtî berbirî wana bû:

-Ez Barzanî me! Gêneral im, min bivine bal mezinê we!

Yekî ji wan çêkîstan berbirî hevalan bû:

-Hûn herine ser şuxulê xwe!

Ewana, gişk vegeerîne ciyên xwe.

-Bibaxşînin, hevalê Barzanî, -ew çêkîstê li wir mayî got, -kerema xwe derbazî vê odê bin, hinekî li vira rûnên, çend deqîqa şûnda ez ê vegerim.

Barzanî derbazî oda qebûlê bû, li wir dîwan hebû rûnişt, bi destê xwe va porê xwe şe kir, pêşîra xwe rast kir, hinekî bîna xwe stendibû, ew çêkîst der da hat û gellekî bi rûmet got:

-Hevalê Barzanî, kerema xwe bidine pey min.

Hinekî şûnda Melle Mustefa Barzanî û sedrê MGB yê Rêspûblîka Azerbaycanê pêşberî hev rûniştin û diaxifin. Ewî çî digot Barzanî wî ra qayîl nedibû. Ewana weke sehetekê ber hev dan, lê yek bû, Barzanî nedihate rê.

Sedr nihêrî nabe, rabû ser pê û berbirî Barzanî bû:

-Kerema xwe rabin derbazî oda dinê bin, ez ê dîsa gazî we kim.

Barzanî derbazî oda dinê bûnê, sedr têtêfon hilda Mîr Cefer Baxîrov ra axifî. Epêcekî xurt derbazîbûnê şûnda, ew hate ber têtêfonê.

-Çi ye? Çi bûye?

Sedr got, wekî Barzanî hatiye vira eva sehetek e ez nikarim wî bidime serwaxtkirinê. Baxîrov bi hêrs got:

-Desteka têtêfonê bide wî!

Sedr desteka têtêfonê hinekî ji ber guhê xwe wê da girt û got:

-Kerem kin, hevalê Baxîrov dixweze te ra bipeyîve. Barzanî bê-mehde destek ji destê wî stend, da ber guhê xwe û got:

---

1 qerimîn: tevizîn

-Belê!

-Tu çîma, çawa çûyî wira? Eva êpêce wext e em vira hîviya te ne. Ne îro em vira mêvandariyê didin. Rabe maşîne siyar be were.

-Bona mêvandariyê zehf razî me. Ez ê ç a kime tasa zêrîn, wekî ez ê tê da vereşim!

-Ev çi gilî-gotin in, çi bûye?

-Çawa çi bûye? Merivên min ra hatî gişk girtine, çekê wan ji wan stendine. Ez hîvî dikim bila gişka berdîn û çekê wan jî bidinê!

-Canim, rabe were vira pelava para te sar dibe.

-Bibaxşîne, ez ne pelava usa dixum, ne pişrûk<sup>1</sup>.

Êmê deqîqekê, duda tu gilî-gotin nehate gotinê, lê dihate sehkirinê ew hêrs ketiye.

-Barzanî, rabe maşîna Sedr siyar be were vira û em hev ra pev kevin.

-Tu pevkirin min ra dest nade. Yanê emir bike merivên min gişka berdîn, yanê jî bila min jî têkine cem wana!

Baxirov dît nabe:

-Pak, destekê bide sedr.

Ewî çi digote sedr Barzanî nizanibû, her dibihîst, wekî sedr digot:

-Yêst! Yêst! Xoroşo!

Sedr destek danîne şûnda berbîrî Barzanî bû:

-Rabin, maşîne siyar bin herine cem hevalê Baxîrov, ez ê merivên te gişka bidime berdanê û êvarê li filan derê dikarî rastî wan bêyî.

-Min ra maşîne ne lazim e, bi çi hatime, ez ê bi wê jî herim.

Barzanî bi gavê mezin da gava, derî usa ser sedr da girt reqîniyê ew derana hingavt.

Li soqaqê ew dîsa faytonekê siyar bû û ber bi Kommerkezê<sup>2</sup> da ajotinê, piş xwe va vejerî, dît maşînek pey wî tê.

Li ber avayê Kommerkeze peya bû û bi liftê<sup>3</sup> hilkişiya qatê şeşa. Li vira gotin, wekî hevalê Baxîrov li mêvandariyê hîviya we ye.

Li wir Barzanî rûnişt û got, wekî herin bêjin, min têr nan xweriye. Ez ê vira li hîviya wî bisekinim.

1 **pişrûk:** navê xurekekî ye ku bi av, ard û rûn tê çekirin

2 **Kommerkez:** Komîteya Navendî

3 **lift:** asansor

Sehetekê şunda dîsa hatin elamî Barzanî kirin, ku Baxîrov bi ecele çûye pey şuxulekî dinê, bila sibê bê.

Barzanî rabû û got:

-Me xwîn rêt, boy rastiyê, em derbazî vî alî bûn. Lê tu qey dibêjî rastî tenê li çiya heye.

Ji wê rojê da Mîr Cefer Baxîrov kîna xwe kuta Melle Mustafa Barzanî.

Barzanî îdî rind zanibû Baxîrov kî ye, merivekî çawan e? Ew hîn bû, weki ew naxweze gilîkî wî bikine duda. Ewî kê ra çî got, gotî yê pêşiyê bêje: “Belê, belê”. Yekî ku hinekî serê xwe bilind dikir Baxîrov bi du riya ew ji nav dida hildanê. Yanê navê neyartiyê datanî ser, digot, filan kes “neyarê dewletê ye”, “neyarê gel e”, yanê jî bi destî ewanê ber behrê dida hildanê.

Îdara MGB ye Azerbaycanê li ber Behra Xezerê bû. Lema jî yek ku digirtin, yek ku dikuştin, yanê ku dihatin ji mal dibirin, digotin “ewanê ber behrê” ha kirin, îdî gişka fem dikir, weki gilî derheqa MGB, derheqa karkarên wan da diçe.

Barzanî îdî rind dizanî, wekî ne ku tenê Azerbaycan destê Baxîrov da ye, lê Stalîn ji wî gellekî hiz dike, serê ku Baxîrov jê dike, Stalîn nabêje çima?

Barzanî rê-dirba digeriya, wekî çawa bike ji nava lepê vî him xwe, him merivên bi wî ra hatî derên. Ew nava van mitala, nava lêgerinê da bû Baxîrov dîsa dest avîte nemerivtayê.

Rojekê hatin ew merivên Barzanî 700-800 nefer ji hev qetandin. 150 nefer şandine Laçinê, 30-50 şandine Kelbecerê, şandine Qubadliyê, Zengilanê<sup>1</sup> û ciyê mayîn.

Li bajêr çend kes, yek jî Barzanî ma. Agir dîsa vî şêrê şêra ket. Ew çendek bû ew diçû ber Komîtêta Merkezîyê, lê Baxîrov herê carê bi menîkî ew qebûl nedikir. Baxîrov nihêrî kêr gihîştîye hestû. Ew qebûl kir. Oda Baxîrov da xêr ji wî sedrê MGB, wezîrê karê hundur rûniştibûn. Barzanî yek rind nas dikir, lê yê dinê nenas bû. Baxîrov her du wezîr bi wî ra kire nas, cî nîşanî Barzanî da û rûniştin.

---

1 Laçin, Qubadlı, Kelbecer, Zengilan bajarên sereke yên Kurdistanê Sor a otonom bûn.

Dibên, Barzanî gellekî hêrsketinê, yanê jî rastî nerastiyê hatinê dida çêra. Ewî xwe xwe ra got: “Evî çarçav, ev her duyê dinê aniyê vira, wekî min bide tirsandinê, hey min ... Ez ê îdî ji çi bitirsim, min bav-dê, bira unda kir, ji malbetê qetiyam, serbarê ser da ji axa weten derketim, ji vê girantir çi roj?”

Baxîrov êpêcekî çavên xwe kuta çavên Barzanî, ewî jî qe ji wî na-na nekîr, buriyê xwe jî neqirpand. Herduyan hev fem kîrin. Baxîrov kêlimî:

-Qe çawan î? Çi heye, çi tune?

-Ez hîvî dikim, were em mîna mêra hev ra biaxifin.

Ji vê bersiva Barzanî wan her sêka rûyê hev nihêrî, lê Baxîrov ji hêrsa çend qelem ji ber xwe hilda û nava destê xwe da mizda û got:

-Ev çi zarotî ye tu dikî! Tu lap mîna kurdan dipeyvî!

-Cara ewilîn ez ne zar im. 44 sal emirê min heye, du saliya xwe da bi diya xwe va ketime kelê, bîna barûtê min ji wê rojê tehm kiriye. Ji wê rojê da tîrsa min hatiye girtinê. Min nede tirsandinê! Ya duda, belê, ez kurd im û mîna kurdan, mîna mêran dipeyvîn!

-Min çi te ra got, min çi tu dayî tirsandinê?

Barzanî destê xwe dirêjî wan her duyên dinê kir û got:

-Evana ku ha ne ruhustînê benda nin. Lê bona min erd-esman yek e.

-Tu were aha qure qure gava nevêje, min gazî van hevalana kiriye, wekî alîkariyê bidine we.

-Ewana wê çi alîkariyê bidîne min, wekî bi zorê şervanê hevalê min herek<sup>1</sup> derekê da şandine.

-Na xêr, tu rast nabêjî. Me hevalên te nava nehiyên kurdan da cî-war kiriye.

-Rind tê bîra min, roja ewilîn min ji te pîrsî li Azerbaycanê kurd hene, te got na. Lê îro ew kurd ji ku derketin? Eva yek. Ya duda, bihîstina min bihîstiyê te hinek pêşmerge min şandiye Kelbecerê, hinek şandiye Laçînê. Li wir jî ew mêrxasana ser gunda hatine parrevekirinê. Deh pêşmerge şandine vî gundî, bîst şandine wî gundî.

---

1 herek: her yek

Destûra wana tune ji vî gundî herine gundekî mayîn. Eva giringeha dor fire ye, çi ye?

-Barzanî, were ji mûkî hûkî çêneke? Em dixwezin him kareke rind bidine te, him jî ew merivên te ye vira mayîn cî-war kin.

-Min ra tiştek ne pewîst e. Cara ewilîn gofî we rind bizanibûya, bona kurdan sê tişt nîşana namûsê ye: jin, çek, yek jî hesp. Te ku ji vana kîjan stend, bizanibe te pêpesî ser namusa wî kiriye! Çekê hevalên min gişk stendine, eva yek. Ya duda, nedibû, wekî ew mirovên me gişk bişandina çikî. Naha ez ji we hîvî dikim, min û merivên mayîn bişîne cem hevalên me, meselen Laçînê. Destûrê bidin ez herim halê wan ra bibime nas.

Baxîrov ji ciye xwe rabû, çû wî serê dîwanxanê, vegerînê xalîça erdê hinekî qerçimîbû, bi rik piyê xwe va rast kir, nihêrî rast nabe, wezîrê karê hundur rabû, ku kûz be xalîçê rast ke, ewî bi hêrs got:

-Rûnê!

Barzanî bi eceb li vê yekê nihêrî.

Ew vegerî ciye xwe, zivirî piş xwe va li wênê Stalîn yê fêza serê xwe mêze kir, careke dinê berê xwe ber bi Barzanî kir:

-Hevalê Stalîn jî derheqa wê da dizane. Dîsa diwekilînim, çi alîkarî hebe em ê bidine we. We berê xwe daye welatekî aza yî edlayîhiz, welatekî ku hîmê wê Lenîn, bavê me gişka Stalîn daniye, qe diqewime tiştê nerind bê kirinê.

-Baxîrov, de wekî usa ne destûrê bide ez bavê we gişkan Stalîn ra bi tîlê biaxifim çend giliya bêjim.

-Barzanî, bêje bavê me gişka, ne ku bavê we gişka.

-Hê min bavtiya wî nedîtiye, ew hineka ra bav e, hineka ra zirbav e. Çav li Baxîrov sor bûn, destê xwe pêşxwîn'ê xist, bi hêrs got:

-Slûşiy, ti çto, s ûma saşyol?

Barzanî îdî rûsî rind fem dikir:

-Nêt paka.

Baxîrov dîsa bi hêrs got:

-Çi ye, te çima xwe xwînê daniye! Tu ji me çi dixwezî?

---

1 pêşxwîn: mase



-Hevalê Stalîn ra bêje, bila destûrê bide em derbazî welatekî dinê bin!

Baxîrov hinekî li wî nihêrî, hinekî hevalê rûniştî mêze kir, dîsa ji ciyê xwe rabû, fitilek da odê û hema ser pê got:

-Xoroşo, rabe here, ez ê paşê bersivê bidime te!

Barzanî êpêcekî kete mitala, rabû, hema ser pê got:

-Hevalê Baxîrov, we qe serê çiyayê bilind mêze kiriyê?

Baxîrov vebişirî got:

-Erê! Nehiya Gûbayê, kê derê ez hatime dunê, her alî çiya nin.

-Hûn dizanin, kevîrê serê çiya yî herî bilind rojê sê cara digirî.

Baxîrov bi avrûke tûj li Barzanî nihêrî û xwedêgiravî bi henek got:

-Bîrayê kurd, çi ye, çiya ketine bîra te! Em dikarin we bişînine çiyân.

-Hevalê Baxîrov, çiya her tim bîra kurdan da ne, çiya û kurd hevalcêwî ne. Lê ez dixwezim tiştêkî we ra bêjim û rind bîra xwe da xweyî kin, wê rojekê we ra pewîst be. Belê, kevîrê serê çiya yî herî bilind rojê sê cara digirî. Çima? Ew xwezilbûna xwe wî kevîrî jêrê tîne û xwe xwe ra dibêje: "Rojekê zû, yanê dereng hej ê bilindaya çiyê bikeve, ew ê hilweşe, ez kevîrê fêza gişka usa hûr bim, qe nayême kiyê? Xwezila ez kevîre lap î jêrê bibûyama." Lê mirovê mîna we qe bin piyê xwe nanihêrin, way wê rojê hûn jor da bên. Binê hûn ê têkevîne halê çi?

Dibên çav li Baxîrov sor bûn, lê ... Ji wê şûnda ne roja Barzanî roj bû, ne şeva wî şev. Ew gellekî ketibû heyra hevalên xwe. Ewî têtêgram ser têtêgrama Moskva'yê ra dişand. Ewî dew dikir wana bi tevayî bişînine welatekî Avropayê. Her carekê gotine wî, bila hinekî sebir ke, wê pîrsa wan çawa pêwîst e usa safî kin. Ewî rind dizanibû Baxîrov jî dixweze wana ji Azerbaycanê derxe ...

... Şev ji şevê derbaz bûbû. Derê Barzanî bi qewlê şervanan hate kutanê. Ewî çirp kire ser xwe. Derî dîsa bi wî qaydeyî hate kutanê. Barzanî mîna eskerekî, bi lez kincê xwe xwe kir, qirma xwe hilda, hate her dêrî û îcar jî ewî bi tiliye xwe, bi şiveta<sup>1</sup> barzaniya hundur

---

1 şivet: şubhet, rêbaz, awa

va derî kuta. Bersiv stendinê ra derî vekir. Hema li ber şêmkê ewî Evdilrezaq hemêz kir.

Bavo, ewana usa li hev piçilkîbûn, vê deqîqê pelewana nikaribû ewana ji hev bike. Êmekî şûnda Evdilrezaq bi Kelogirî destê Barzanî girt û got:

-Kek Barzanî, destûrê bide, bême destê te, bila sonda min bê sêrî!

-Birao, tu ku ev der ku? Qe lawikê dinê çawan in?

Barzanî him şabûna, him ji kerba xwe şaş kiribû, ji ber şêmkê nedilivî, wekî mêvanê vê şevê derbazî hundur be, lema jî ewî got:

-Keko, kengê va kurd li ber şêmkê kef-halê hev dipirsin?

-Birao, min xwe şaş kiriye.

Barzanî cî nîşanî hevalê xwe yî şervaniyê kir, ew rûnîşt. Ewî hê seropiya' Evdilrezaq mêze kir. Nihêrî ew halekî usa da ye, her Xwe-dê xwe bê hewariya wî. Kaloşê piya yek qelişibû, pêçiya wî tê ra derketibû, potikê lê tîştîşî bûbû, pembû tê da dar da bûbûn, çavên reşbelek kort da çûbûn.

Barzanî tê derxist ew tî ye, lêvên xwe dicû. Barzanî zû kase çeqler-mast direjî wî kir, ewî qe tu gilî negot kasa tijî ser xwe da kir. Barzanî kas ji wî stend wê da danî.

Evdilrezaq xar bû, kaloşê piyê xwe derxist. Barzanî gote wî:

-Rabe, derbazî hemamê bibe. De dest-piyê xwe bişo, bila bîn bê ber te, paşê em ê hewal din.

Barzanî anî xwerek germ kir, çay da ser bikele. Ewî nan xwerinê şûnda dîsa Barzanî pirsî:

-Qe çi heye, çi tune?

-Keko, ez heyran wê çi hebe? Çekê me ji me standine, em şêlan-dine. Belê, ewê yekê ez dizanim, paşê ...

-Paşê xêra dunê serê te be! Em 150 kes li nehiya Laçînê ne.

Evdilrezaq qal kir, wekî ew û çil kesên dinê li gundê Kamaliyê ne. Her yek wan malekê ne. Lê her êvar beravî malekê dibin, û heta demekî şevê derd-kulê xwe ra dibine şîrîk, wextê razanê her yek diçe "mala" xwe.

---

1 seropiya: li ser piyan, şipê

Ewî dîsa stekanek çay vexwer, paşê axaftina xwe domand:

-Keko, ez qurban, ew gund mîna gundê me ye. Hewa wî, ava wî rind e, gelê lê dimînin mêvandar in.

-Kurd lê hene?

-Gişk kurd in.

-Lê çawa bû tu hatî?

-Kek Barzanî, serê min qurban be, sê roja berê min xewnek ser te dît. Dît, wekî serê te diêşe. Bila serê neyarê te bêşe. Tu ser zinarekî bilind rûniştî, te desmaleke reş va serê xwe pêçaye. Paşê min dît, tu ketî çemê Zêya Biçûk. Ava çem gur e, dixweze me ro da bibe, lê tu sobekariyê<sup>1</sup> dikî. Him dest-piyê xwe ba dikî, him jî xemila tebiyeta weten mêze dikî. Ez jî pey te tîm. Carekê te vejerî gote min:

-Evdilrezaq, hela binê çiya-baniyê me çawa bedew in, tu hew dizanî hineka qest ew usa xemilandine. Hinekî şûnda tu hatî kevirê reş î mezin asê bûyî. Te çiqasî kir, nekir tu ji wî kevirî derbaz nebûyî. Tu ji çem derketî, te berê xwe da çiya. Min da pey te. Nişkê va dûmanek hat çiya hingavt. Em ji hev qetiyen. Xewnê da, ez vir da, wê da direviyam. Hinekî şûnda, dûman kişiya min hat nihêrî, te serê xwe daye ser “Kevirê Mêrxasan”. Eloyê ber destê Barzanî bi hewaseke mezin pirsî:

-“Kevirê Mêrxasan” ku ye?

-Çawa ku ye? -Evdilrezaq hinekî bi hers pirsî-. Barzanî ber xwe da vebîşirî û got:

-Evdilrezaq, çima hêrs dibî, Elo xort e, ew yek nebihîstiye. Qal ke bila ew jî bizanibe, him jî bila ew derana bêne ber çavên me.

Kek Barzanî aha gotine Evdilrezaq bi hemdê xwe giliyen xwe pêş da bir:

-“Kevire Merxasan” li Kurdistanê ye, nêzîkî gêdûkê Derbendî Bazan e. Ew gêdûkî bêhûde, gellekî sert e. Hunerê tu kesî tune wî gêdûkî qevz ke<sup>2</sup>. Havîna sala 1919a, wextê şervanên kurdan bi ser-kariya Şêx Mehmûd miqabilî<sup>3</sup> esker, ordiya Îngilîs şer dikirin hatin li

---

1 **sobekari:** avjenî, melevanî

2 **qevz kirin:** bi ser re bazdan

3 **miqabili:** li hemberî

wir hêwirîn. Li vira ordiya Ingilîs her tişt unda kir, vira hate altkirinê. Lê li vira Şêx Mehmûd tê birîndarkirinê. Sibê dinihêrin Şêx tune. Gişk li Şêx digerin, tên dibînin Şêx birîndar e, ewî piştta xwe kutaye kevirê mezîna û tu hew dizanî ew ketiye xewa şîrîn. Dibên, ew birîna xwe dukute wî kevirî û te tirê, ew kevir ji êvar da hetanî sibê, dibe melhema birîna wî. Paşê navê wî kevirî dafînîn “Kevirê Mêrxasan”. Vê şûnda Evdilrezaq berê xwe da Şêx Barzanî:

-Keko, sibê min xewna xwe lawikan ra şirovekirinê, wana gotin, wekî ew kevirê Şêx pala xwe kutayê, lê kek Barzanî serê xwe daye ser, Xwedê me ra kerîm e. Em ê derekê da derên. Pey xewnê ra min gote lawikan, wekî ez ê herime Bakûyê, yeqîn tiştê serê kekê me heyê. Hebe, tunebe ew î tengasiyê da ye. Tiştê li kek Barzanî qewimiye. Lawika min ra kirine şer, gotin, hinekî sebir ke, rê-dirb bi berfê va nimixîne<sup>1</sup>, tu yê çawa herî? Min jî got, ez ê herim, ku herim ...

Do, destî berbangê min penî hilda<sup>2</sup>, Keko, aliyê gund î çepê daristan e, nav ra jî çem e Hekariyê dikişê. De heyrana çem bim, çemê welêt e, min xwe gîhande wî. Êpêcekî berjêr çûm, gihîştîme gundê Şilaniyê.

-Çi navekî rind e!

-Belê, keko, gund jî rind e. Li wî gundî îdî kew kete sibê. Li bintara gund mala dostê min bû. Min wî camêrî, li berojê gund çend cara gîha dirûbû. Carekê-duda ewî ez dizînka va biribûme mala xwe. Miriyê gelê<sup>3</sup> xwe ye. Hey min ra kilam distira û timê digot:

-Wekî ev kilamana nebûyana, naha min zû va berpalê xwe dabû merzelê hanê.

Min go, ka ca vê roja dijawariyê wî biceribînim. Min berê xwe da gund. Hema ez gihîştîme mala dostê xwe, min nihêrî ew ji mal derketiye diçe kadînê.

Hema li devkadînê<sup>4</sup> min ser wî birrî<sup>5</sup>. Ew pêşiyê tirsîya, go yeqîn tiştêkî ne bi xêr qewimiye. Min jê ra çawa bûbû got. Him jî min xwe

---

1 **nimixîn:** niximîn, xitimîn

2 **penî hildan:** ling hildan, bi piyan rê ketin

3 **miriyê gelê xwe:** di ber gelê xwe de serê xwe dide

4 **devkadîn:** deriyê kadînê

5 **ser li yekî birrîn:** pêşî lê girtin

xwe ra got, ew hinekî vir da, wê da bike, ez ê wî têkime kadînê, bila ew jî bibe xurê mar-mişkan. Keko, camêrî tişteq negot. Her vegeerî ser min û got:

-Têkeve kadînê bila kese<sup>1</sup> te nebîne, vê deqîqê têm.

Min dilê xwe ra derbaz kir, yeqîn ew çû hewariyê li malê, li gund daxe, wekî ez direvim. Lê na!

Min nihêrî hinekî şûnda dest da tişteq heye û bi lez ber bi kadînê hat. Hat, kete kadînê, pêşiyê qûçe nan, nav da penêr direjî min kir:

-Bixwe, go ser da jî meselek kişand, min qe nebihîstîbû:

*Sibe parîkî, yanê du parî,  
Nîvrojê heta dikarî,  
Êvarê dixwî tu zanî,  
Naxwî jî tu zanî.*

Paşê tişteqî pêçayî direjî min kir, got:

-Eva sê nan, hine penêr e hilde, rê va bixwe, rê dûr e. Zo kaloş da min, go şerm e çarixa derxe, tu yê herî bajêr.

Pey vê yekê ra Evdilrezaq bi şabûneke nebiniyayî va berbirî Barzanî bû:

-Keko, ewî ji picenga xwe gem derxist, da min got: "Gemê hilde, mehîne we ye tewlê da ye, zû bike em xwe tewlê ra bighînin. Mehîne gem ke, siyar be, here derê Laçînê. Li wir mehîne berde, ew ê xwe bê vê derê. De hatiye, hat, nehat, bila qurbana mêrê mîna Barzanî be. Te ew dîtîne bêje, bê Cemal digot, nêta wî ku bê sêrî, ji sê kura dudu qurbana wî ne. Bila yek jî bimîne bibe pêşmergê wî. Him jî bila dujmin nebêjin ew çi maleke bêdûmek e".

Dibên hingê ku Barzanî xwe nas kirîbe negiriyabû, lê pey vê yekê ra hêsira rê nedane hev, ser simêla palik da dilop dilop hatine erdê.

-Kek Barzanî, min nexwest gemê hildim, hespa camêr siyar bim herim, paşê çi bibe, çi nebe? Lê ewî bi hutul-mutul<sup>2</sup> gote min, wekî hespê siyar nebî neçî, ez ê rabim hewarê gund xim û bêjim, wekî tu

---

1 **kese:** kesek

2 **hutul-mutul:** teqez, miheqeq

hatiyî diziyê! Ez ê -Xwede neke- şera bavêjime te. Min gem hilda. Ewî da pêşiyê, min da pey wî, em hatine tewlê. Tu nebê ew sê roj bûye mehîn zaye. Camerê Cemal mehîn gem kir, gem da destê min û got:

-De destkêş ke<sup>1</sup>, derê, zû siyar be û ji gund derê, hê ku gur ji sa nayê kivşê.

Min mehîn destkêş kir, wextê ewa hate ber şêmîka tewlê, ewê ber bi ceniyê stuyê xwe xar kir, usa kire hîrehîr, me tê derdixist eva hîrehîra zelûlê ye, hîrehîra xerîbiyê ye, destê dê ji ewled dibe. Ji vê yekê em zendegirtî bûn. Min li camêrê Cemal niherî, ewî li min. Min nava dengê mehînê da şewata ewled derz kir bi hesreta ewlada, ku dile min da kînorgirtî<sup>2</sup> bû jan<sup>3</sup> pê ket. Vê demê camêrê Cemal got:

-Serê wê berde.

Min ku gem avîte ser stuyê wê, ewa nêzîkî ceniyê bû, bê mene ji doçikê girtî, hetanî sêrî bîn kir, paşê ji sêrî dest pê kir, hetanî doçikê ewa dalast, usa didalist me qey digot, ewa eva çend meh e kelfî ye, xoy dîtiye, zimanê xwe va dadilêse. Welleh, hinekî şûnda ewê serê xwe bilind kir û li camêrê Cemal nihêrî. Nava vê nihêrandinê da min tê derxist, ewa dixweze bêje, camêro, çima zulimkariyê dikî, çima destê min ji ewledê min dikî. Gelo çima ev însanet ewqasî bêînsaf e? Keko, qurban, vê gavê zarokên min hatine ber çavê min. Min dît êvarê her sêk jî derva sekinîne, diya wan e belengaz ji hundur gazî wan dike, wekî warêne hundur, ewana hev ra hev ra, deng didine denge hev:

-Dayê, bihêle em hinekî jî çavên xwe bukutune riya bavo!

Vê xema min e şîrîn da camêrê Cemal nêzîkî wê bû, çavên wê mizda, hate her du çavên mehînê û gote min:

-Naha gemê hilde bikşîne, ew ê pey te bê. Min gem da destê xwe kişand, ewê da pey min.

Keko qurban, min xerîbê xerîban, dilbirînê weten, hesret-êşê ewledan dîsa nexwest dilê mehîna sê roja zayî mîna dilê xwe birîndar kim, min nexwest dilê wê mîna dilê min tîştîşî bibe, dewsa xwîna zelal, telte telte kêmbigire. Lema jî min gote Cemal:

---

1 **destkêş kirin:** gema hespê girtin û li pey xwe kaş kirin

2 **kînor:** kunêr \*\*\***kînorgirtî:** kunêrgirtî, kêmbûn birin girtî

3 **jan:** êş

-Bira, were ez dê ji ewled nekim. Ez ê peya herim.

Na, ew razî nebû, hutul-mutul ser min birî, wekî ez hespê siyar bim. Ewî ez dame serwaxtkirinê<sup>1</sup>, çawa filan derê ra herim, çawa bêvan derê ra derbaz bim. Paşê hate rûyê min û dîsa kêlimî:

-Dixwezî zîn ji hilde, hespê zîn ke, lê hesp paş da vegere gişk ê têkevîne şikê.

Min zîn hilneda û hespê siyar bûm, berê xwe da Laçînê. Welleh te qey digot mehîna zer ji zanibû hal çawa ye, kevir nedigot, kuçik nedigot ser ra banzdida, ji vê newalê ez derdixistime newaleke dinê, ev gelî qevz dikir, digihîşte gelîkî mayîn. Carekê rê da hesp bin min da litimî, wê deqîqê gema wê kişand, peya bûm, niherî fêza simê lingê pêşîn xwîn bûye. Pî, min bira koro, weylê min malşewitî, min yeke çawa anî serê xwe!

Bi desmala destê xwe va xwîna dilopkirî vemiland, dît welleh, weke devê bijûnekê<sup>2</sup> çermê piyê rastê kevir rût kiriye. Reng min da hat.

Min bi desmala destê xwe va ew birîna biçûk girêda, dîsa rê ketim. Wextekî min nihêrî îdî min devedevî Laçînê kiriye. De, Laçînê Xwedê te şên ke! Ber pira bintara Laçînê ji hespê peya bûm. Ez hatime her du çavên mehînê, gem ji sêrî derxist, ew berda. Ewa paş da zivirî, hinekî ji min dûrketinê sekinî, serê xwe bilind kir, kire hîrehîr. Ev hîrehîr ne mîna hîrehîra berbangê bû. Di nav wê da şabûn, mizgînî, hewar-gaziya rasthatinê ya sereke, azayî hebû!

Min pey wê kire gazî:

-Heyran, tu here bigihîje ewledê xwe, min ra ji Xwedê kerîm e!

Ez sekinîm, min êpêcekî pey mehînê nihêrî. Te qey digot hineka daye pey wê, riya hatî ra çawa diçû? De, xwezila min bizanibûya, ew çû derket, yanê na?

-Xwedê mezin e!

-Kek Barzanî, ez rê va rastî ecemekî<sup>3</sup> hatim!

-Kerem ke, kerem ke bi hûrgilî bêje. Her te hewaldanê dilê min fire dibe, bîna min tê ber min.

1 **serwaxt kirin:** tê gihandin, pê dan fêm kirin

2 **bijûn:** şûjin

3 **ecem:** azerî

-Keko, hema ez gihîstibûme ser riya Laçîn-Yêvlaxê, maşîneke barbir wê da dihat. Min destê xwe bilind kir, avtoajo maşîne xayî kir. Ew xortekî qemer bû, ji min pirsî tu yê ku da herî? Min gotê, wekî ez ê herime Bakûyê.

Avtoajo tê derxist, wekî ez ne merivê van dera me, ew bi meselê hesiyane got:

-Em û kurd bira ne. Min derheqa hatina we, derheqa hatina merivê Partiya Azerbaycanê ya Demokratîyê da bihîstiyê. Ser xatirê biratiya azerbaycan û kurdan ez ê te hetanî Yêvlaxê bibim. Lê rê va kî me xayî ke tu xwe nexweş bavêje, qe gep meke.

Îdî çi serê te bêşînim, danê nîvro avtoajo ez anîme li stansiya Yêvlaxê ya riya hesin. Me xatirê xwe ji hev xwest. Hinekî sekinîbûm, min wextekî bihîst kurdî dipeyivin. Min dît, çend jinên kurda ye mîna berê xwekirî<sup>1</sup>, bi kofî-kitan, li wir sekinîne. Nava wan da du mêr jî hebûn. Keko, min zefta xwe neanî û ez nêzîkî wana bûm, selam da wana û pirsî:

-Hûn kurd in?

-Belê.

-Hûn kurdên kê derê ne?

Ewana pêşiyê nexwestin bersiva pirsê min bidin. Lê wedê pê hesiyane ez kî me, dora min çarmedor bûn<sup>2</sup>. Bi heyr-hejmeke berbirî min bûn. Nava wan da mêrikekî bi zarşirîn hebû, got:

-Evdilrezaqê bira, hema em halekî da ne. Sala 1937a em ji Ermenîstanê nefî kirin. Deh sala şûnda destûr dan, Xwedêgiravî vegerrine weten. Lê li vê stansiye pêşiya me girtin, a malê me hilşandine vê herîreşkê<sup>3</sup>.

Min nihêrî bintara riya hesin, çend kon vegirtine, çend mal jî bê kon rex hev, rex hev danîne. Agir dilê mêriv diket.

Ewana wî halê xwe da zorê dixwestin min bivine “malê” xwe. Ez xwe da şewitîm, peritîm, neçûm, lê pirsî:

-Hûn ji ku tên? Hema tenê hûn nefî kirine?

---

1 **xwekirî:** lixwekirî

2 **çarmedor bûn:** li dorê rêz bûn û xeleq girtin

3 **herîreşk:** cihê av û herî



-Na birao, em çendî çend hezar kurd neffî kirine Asya Navîn û Rêspûblîka Qazaxistanê. Dibên Ermenistan qayîl nabe, wekî em vegerine ciyê kal-bavê xwe. Çendekî berê me mirovên xwe şande Ermenistanê, ewana zivîrîne hatine û dibên, wekî pey nefîkirina me ra ji weletê dereke ermenî anîne û tijî wan gundê me ye bi pergar kirine, lema gotine: “Rû dibine buhust, dujmin nabe dost”.

Barzanî ji van giliyana xitimî. Rabû destê xwe da pişta xwe, nava malê da, vir da wê da çû, hinekî şûnda kêlimî:

-Ronahiyê çiqasî nava tariyê da bipêçinî, ew ê bijiqe<sup>1</sup> derê.

-Belê, keko! Keko ez ser tiştêkî mehtel mame, li wir, li welêt me dibihîst, wekî li Sovêtê hemû tişt aza ye. Keko, ez serê te yî ezîz kim, min ew kurdên li Yêvlaxê, nava axa sipî da dîtine vir da, min hemû derd-kulê xwe ji bîr kiriye. Min digot hetanî ez sax im du birînê min hene yek ê zû-dereng bicebire, yek ê min ra here tîrbê. Yek ew e wekî, weten mîna keça kezî<sup>2</sup> destê neyaran da ye. Yek jî, keko, ez qurban, wexta em çend pêşmerge daketine gundê me, me dît agir bere gund dane, me ji wî gundî her zarek xilaz kir. Me zar hilda paş da vekîşyan, Zarokê dikire nalenal, çavên xwe venedikir. Ew li milê min bû. Em gihîştine çiya, îdî me go, şukur me zar xilaz kir. Lê ... Nişkê va me hew zanibû ew xwe da hat, hineka qewat-sihet dane<sup>3</sup> wî. Zarongê çavên xwe vekir, li me gişka nihêrî, vegeî dor-berê xwe mêze kir û bi lewzekî şîrîn got:

-Apo, avê bide min.

Bavo, hineka gotin, na avê nedinê, hineka gotin hûn nabînin lêvê wî tî da qerçimîne, tiştêkî wî tune, avê bidinê. Me av dayê. Ewî av vexwerinê şûnda got:

-Ax, çawa şîrîn e ava weten!

Ev giliyên wî ye dawiyê min ra bûne derdê bêderman. Naha halê wan kurdên hêsîr min ra bû derd-kulê sisiyan. Ev çito azayî ye?

-Birao, ev azayî nava teniya sêlê da bûye, me nizanibûye.

Evdilrezaq stekaneke çay vexwerinê şûnda, dîsa berbirî Barzanî bû:

1 **bijiqîn:** jê avêtin û derketin derve

2 **keça (bi)kezî:** keça xama û bermêr

3 **qewat-sihet dayîn:** jê re sihhet û afiyet xwestin

-Lo, ez heyran, qe napirsî, lê ji Yêvlaxê virdatir çawa hatiyî?

-Birao, tu her şa bî. Lê ez î vê deqê nava şînê da me, merî emir da çiças derd-kula, nerastiya, tîbûn-birçîbûnê, talan-tajankirinê<sup>1</sup> xwe ra dike barê giran? Lê tu gellekî ber xwe nekeve, rind bizanibe, ev tiştê ha nîbin, em tu wexta dernayêne azayê! Naha, kerem ke, dûmayînê bide rêwîtiya xwe.

-Keko, paşê xortekî bejinbilind, namilpehn<sup>2</sup> hate stansiyê. Wan kurdan ew bi meselê dane eyankirinê. Bavo, ewî milê min girt ez birime rêstoranê. Me nan xwerinê şûnda xort Xidir gote min:

-Were ez te bi poyêzeke barbir bişînime Bakûyê, poyêzên dinê va ditirsim rê va te bigirin.

Min go, heyran çawa dixwezî. Xidir çû maşîneajo<sup>3</sup> ra pev ket, navtilî<sup>4</sup> danê, evî te ez hildame bal xwe. Xidir ez verêkirinê got:

-Bêje kekê Barzanî her kurdekî bi namûs-xîret bona riya azayê hazir e serê xwe bide. Bila şûrê xwe neke kêlîn<sup>5</sup>, yek jî bila baweriya xwe van dera va girênedê. Hîme vê dewletê bi vir-viza va hatiye dayînê.

-Bavo, xort rast gotiye. Ez jî hedî hedî bi fen-fêlê wan dihesim ... Lê hê rêke mayîn tune.

Paşê Barzanî derbazî oda dinê bû, vegeî got:

-Bavo, tu westiyayî, rabe hinekî pal de<sup>6</sup>, îdî sibe ye.

---

1 **tajan kirin:** êşandin, zêrandin

2 **namilpen:** navmilpehn

3 **meşîneajo:** şifêr

4 **navtilî:** bertîl

5 **kêlîn:** -kalên (awayê tewandî yê peyva /kalan/- cihê şûr

6 **pal dan:** razan

## 10

Rojeke payîza dereng bû. Li bajare Bakûye bakî usa dihat, te digot erd-esman ê bigihîjne hev. Bayê ha ra binelî dibêjin “Xezrî”. Bê berêvarê dest pê kiribû. Şev daha gur bûbû. Nîvê şevê derbaz bûbû, lê xew nedikete çavên Barzanî. Ew kêlek-kêlek waldigerî, te tirê vizeviza bê derdê wî ra dibe şîrîk. Carina ji roderên<sup>1</sup> avayê bilind şûşe jor da dahatine erdê, daran dikirin qirçeçiqîrç dişkestin. Ewî heyfa xwe dara dihanî û ev ba, bayê çiyayê Kurdistanê ra himberî hev dikir. Li wir zivistanê carina ba radibû, lê nermenerm dihat, sibê te dinihêrî gelî-gebezok<sup>2</sup> tijî berf bûye, dar gişk ciyê xwe da ne. Ew bi mitala va çû cî-warê welêt: Kerkûk, Erbîl, Zaxo, Amedî, Selexnî, Xanekî, Geliyê Elîbegê, Sûlêymaniyê, Geliyê Casanê, Rewanduz, çemê Zêya Biçûk ...

Wê şevê ew gellekî nerihet raza.

Berbangekê dengê têlêfonê ew ji xewê kir. Barzanî destek hilda:

-Belê, belê, Rehîm, ez im.

Rehîm Qazî sibexêrî da wî û got:

-Do ewî gazî min kiribû. Te tê derxist gilî derheqa kê da ye?

-Belê, belê.

-Ew dixweze we gişka bişîne cîkî<sup>3</sup>, lê nizanîm ku da?

---

1 **roder:** pace

2 **gebezok:** ji gêlî biçûktir e û ne kûr e; gelî ji gebezokê kûrtir e

3 **cîkî:** cihekî

Ji vê yekê Barzanî hinekî şa bû, got:

-Rehîm, mirîna tev êlê şaya dunê ye. Qe tu haj lawika tunenî? Ne digot, îro ji Kelbecerê merî yê bên.

-Birao, nerihet nebe, lawika gişka wê bînine Bakûyê. Li mal be wê bêne pey te.

Pey vê yekê ra hevalê wî ji xewê rabûn, Barzanî got:

-Ew çend roj bûn ez gellekî nerihet im. Pîşewerî jî gotiye min, wekî evî çar-çav rêkê dikişîne, çi rê ye kesek nizane? Tê xanêkirinê, wê kurdên, ku ji wî alî hatî alîkî da bişînin, lê nizanin ku da.

Rojekê Rehîmê Hesên Qazî û Pîşewerî hatine bal Barzanî, wekî ew here cem Baxîrov binê çi dibêje?

Melle Mustafa Barzanî merivekî xwedanê giliyê xwe bû. Ewî ku got na, îdî nà, venegere nabêje erê. Barzanî wana ra got:

-Ew merivekî namerd e. Ewî ciyê sekinî gellek ocax temirandiye, careke dinê ewana vênakevin. Serbarê ser da ew mera<sup>1</sup> dixapîne. Ez tu wexta dîsa berê xwe nadime wî.

Ewana nava cehlê<sup>2</sup> da bûn, yekî derî kuta û hema ber şêmîkê giliyê xwe got û çû.

Barzanî vegerî odê û got, wekî yê hatî dibê, ku ez herime bendera behrê. Van her sêka rûyê hev nihêrîn, Rehîm Qazî kelimî:

-Rabe, em herine wira.

Barzanî rê va hezar mitale dilê xwe ra derbaz kir û hate ser wê yekê, wekî ev merivê bi delk-dolav<sup>3</sup> tu gava riya qenc nabijêre. Xwe xwe ra kire pitepit: "Hetanî roja qiyametê ez neyarê te me", paşê berbirî Pîşewerî bû:

-Tu rind bizanibe, merivê mîna Baxîrov him hetab<sup>4</sup> e, him belen-gaz e. Navê yên aha reş tê nivîsarê.

Pîşewerî merivekî bi hemdê xwe bû, rasterast ji Baxîrov vedikişiya û lema jî got:

-Birao, hêdî hewal de. Welleh guhê erdê jî heye.

---

1 **mera:** mirova

2 **nava cehlê da:** di nava nîqaşê de

3 **delk-dolav:** dek û dolab

4 **hetab:** xweşbext, bêkeder

-Wekî ew naha rastî min bê, ezê giliyê daha giran wî ra bêjim. Ew îro hetab e bona wê yekê, wekî mezinê Azerbaycanê ye, yekî mîna Stalîn wî ra “belê”, “belê” dibêje. Bi vê yekê va jî, ew bi penbû serê ewledê gelê xwe ye eyan dide serjêkirinê. Paşdemiyê<sup>1</sup> gel ê navê wî gedeke reş da bipêçe û wê nehêlin ewli axa weten bê defnkirinê.

Ev gilî-gotinê Barzanî qe xweşa Rehîm Qazî jî nehat, lê ewî xwe kerr kiribû, ji ber ku dinîhêrî xezeba Barzanî mîna behra Xezerê ra-bûye.

Barzanî disa berbirî Pîşewerî bû:

-Binê te ra dibêjim, miqatê xwe be. Pak-pîs ez ji nava lepê wî derdikevim, lê tu pišta xwe wî girênade. Ez li ku hebim, ez ê te ra bême girêdane.

Ewana îdî gihîştibûne ber behrê. Li wir peya bûn, Barzanî niherî ji wir, ji wir meriv ber bi wî revîn, deng hatine bihîstinê:

-Keko! Kek Barzanî! Şukur vê rojê ra!

Heylo bavo! Te hew zanibû hewêrze ye! Ev mêrên vira beşderbûyî rê nedane hev, wekî nêzîkî Barzanî bin. Nişkê va dengêkî usa bilind hat, meriv jê zendegirtî bû:

-Gişk wê da bisekinin! Kî pêş da bê namerd e! Werên em dora merxasê merxasan govendekê bigirin, kilama “Heylo siyaro”, bêjin, têtêrêr bejin-bala pêşîkarê<sup>2</sup> xwe, azadarê<sup>3</sup> xwe binihêrin, paşê yeko yeko bêne destê wî.

Hema wê deqîqê govend hate girtinê, dengê kilamê bayê behrê kerr kir. Barzanî, Rehîm û Pîşewerî nava goveka govendgirtiya da man. Ewana usa direqisîn, usa bi şewat kilam distiran, li hev vedi-gerandin, merivên li benderê, karkerên wê derê hatine dîtina nedîtî, bi eceb hev dipîrsîn, ev çi ye? Ew merivê hanê kî ye?

Hinekî şûnda Barzanî desmala xwe ji beriya xwe derxist, peşiyê xwîdana eniya xwe paqîş kir, paşê kete sergovendê, merivan deng dane dengê hev û digotin:

---

1 **paşdemî:** pêşeroj, dema bê

2 **pêşîkar:** pêşeng

3 **azadar:** azadker

-*Canê, can! Ez qurban! Hey lo birao, weten kanê?*

-*Canê, canê! Ez heyran! Hey lo birao, dayîk kanê?*

-*Canê, canê! Ez heyran! Hey lo siyaro, azayî kanê?*

Govende êpêce fitil da. Dibên paşê, derheqa govendê da Baxîrov ra gotinê, ew dibêje:

-Gele ha tu dema bindest namîne!

Hinekî şûnda govend betilî. Du merivê kîtelreş nêzîkî Barzanî bûn, yekî got:

-Heval Barzanî, em hîvî dikin, werên îdî gemî rê dikeve.

-Hûn berê me didine kî alî?

Evî tu tiştek negot, reşbelekek dirêjî wî kir.

-Ev çi ye? -Barzanî pirsî.

-Ev navnîşana hevalên we ye, him jî ewreqên mayîn in. Hûn li Krasnovodiskê peyabûnê, wê bêne pêşiya we.

-Esker deyîndara<sup>1</sup> bersiva gênêral rast bide! Me ku da dişînin?

-Wir da hatiye nîvîsarê.

Barzanî çarçavî bû, bi hêrs got:

-Kerê kurê kerê!

Ber şêmîka gemiyê Rehîm Barzanî hemêz kir:

-Kek Barzanî, -got,- wedê min bihîst apê min Mehmed, neferê malbeta me hatine dardakirinê ez ewqasî neşewitîm.

-Miqatî xwe be, -Barzanî got,- tu yê hela gellekî lazimî Welêt bî, yek jî bila çira Qaziyan bi carekê va netemire.

Ew Pişeverî va jî hatine dest-rûyê hev ...

Li wî alî behrê, li Krasnovodskê Barzanî pê hesiya wana dişînine Uzbêkistanê.

...Wê salê şûnda tu kesî nizanibû Mûstafa Barzanî û hevalên wî kê derê ne? Heft, heyşt sala şûnda, gava heja dêmokratiyê, bayê rastiyê li Yekîtiya Sovêtê hêdî hedî milmilî, hate zanînê, wekî Barzanî bi destê xwe va anîne Komela Uzbêkistanê, ew kesana kolxoz û sovxoza da çawa karkar cî-war kirine, Barzanî bi xwe kolxozekê da qentervan karê dike, hetanî di nava diwarê Krêmlê<sup>2</sup> da guhastin hate kirinê.

1 **deyîndara bersivê:** cewaba mecbûrî, bersiva pêwîst û layiq

2 **Qesra Krêmlê:** Qesra Kremlinê

## 11

Nado îdî dersxana deha<sup>1</sup> xilaz dikir. Lê ne şeva wî şew bû, ne roja wî roj bû. Ew mîna belgê bin avê xwe da zer dibû. Sala duda bû, ku mereza pîrsekê dilê wî disot. Lê ewî ew yek qe kesî ra nedigot.

Roj pey rojan derbaz dibûn, şagirtên hevalê wî şa dibûn, wekî hindik maye, wê îmtahana bidin û hinekan digotin, pêsira wan ê ji mektebê xilaz be û wê herine xwendina bilind ...

Lê tîfalê Nado dixwest nişkê va emrekî usa derê, bêjin, wekî mekteba navîn ne ku dehsal e, lê panzdeh, bist sal e.

A, îro wedê dersa kîmyayê, kula ku zû va dilê wî da bûbû, ser-teşîkeke rehetbûn nedida wî, dest danê, givaştin û eşandin. Jan ser janê da zêde kirin. Ewî xwest rabe pirtûkan bide bin piçenga xwe û here, careke dinê derê mektebê veneke. Lê ...

Wedê dersa berê dersdar elamî şagirtan kir, wekî dersa dinê hûn ê pîrsa bidine min, ez ê wan şirove kim. Li mal rind hazir bin û pîrsa bidin. Nado destê xwe bilind kir, destûr stend û du pîrs hev ra da dersdar. Ev pîrsana xweşa dersdar hatin, ew êmekî nûqî mitala bû, ku ji ku dest pê ke. Vê demê, Sehîdê berzeq<sup>2</sup>, qure ji ciyê xwe rabû û got:

-Dersdar, hela eva çima pîrsan dide. Ne destûra yên mîna wî tunene here înstîtûte<sup>3</sup>. Îdî çi pîrs?

---

1 **dersxana deha:** dibistana amadehiyê

2 **berzeq:** bêşerm, bear, bêheya

3 **înstîtût:** enstîtu

Ji vê gotinê agir ser êgir da hate dadanê, mereza ku rehetbûn nedida Nado, ev bû. Ewî ji gişka rintir dixwend, dersdaran ew gellekî hiz dikirin. Dilê wî ra derbaz dibû pey koma deha here paytext û ewreqê xwe bide ûnîversîtête. Lê ewî rind dizanî destûra zarên nefibûya tune, wekî herin xwendina bilind dest bînin. Ê, lo felekê, lo zemano...

Ji van gilî-gotine şagirt dersdar reş qemilî, rika wî hat, got:

-Careke dinê tiştê ha nebihîzim!

Pey dersa kîmyayê îdî Nado dersên dinê da rûnenişt, bi kelogirî vegeirî mal. Bav û dê ecêbmayî man. Nado tu wexta ders nedihîşt, nedihate mal. Lema bavê pirsî:

-Lawo, çi bûye?

Li mektebê çi bûbû ewî bi ricaf qal kir. Him lêvê xwe dicût, him kelogirî bû.

Dê û bav ketine halekî dijwar. Belengazan rûyê hev niherîn û serê xwe kutane erdê. Hinekî şûnda bavê got:

-Lawo, ev çi şipûk e, ev çi dewirreş e hatiye ser me kurdan, kes nizane? Kî ye sûçkar, Xwedê dizane? Lê lawo, Nado, baweriya xwe unda neke. Ewrê reş dadiliqe der-dora, lê zû, yanê dereng dikişe, diçe.

Dê jî, ji ciye xwe rabû, hate rûyê wî û got:

-Ez ê xwe qurbana bejin-balê kim. Lêvên xwe usa necû, dilê min xirab neke. Rabe destê xwe, rûye xwe bişo, ez ê te ra hêkerûnê bipê-jim. Mastê bi sîr jî heye. Lawo, Xwedê yek e, derge hezar.

Wê şevê xewa Nado kişiya erşa. Ew wextekî şevê rabû, maldizkê da ber çira neftê rûnişt, çend name nivîsî. Lê nîşkê va nêteke usa nuqufî dilê wî, meriya bawer nedikir. Ewî bi dilêşî, bi şewat, hinekî jî ser hîmê dirokê nameke nebîniyayî jî nivîsî. Wî nama kutasiyê çend cara xwend, çend car ji ber hev nivîsî û paşê qat kire ser hev, bû sê-kunc<sup>1</sup>. Bi destnivîsareke rind, her herfek bi bedewî, weke pêkanîna xwe nivîsî û te tirê hê dilê wî hinekî rehet bû. Ewî hew dizanî eva çendek e keviyek di dilê wî da dar da kirine û hema hêcka<sup>2</sup> ew kevir qetiya, ji wê yekê ew hêsa bû.

1 sêkunc: sêgoşe

2 hêcka: xulekek berê, berî demeke kurt



Hê rabû raza. Kulfetê malê berbangê rabûnê, dê hêdika gote wana:

-Bi fesal, nekine qareqar, bila Nado razê. Îşev min tîna xwe dayê<sup>1</sup>, hetanî berbangê ders dixwend.

Lê dê nizanibû Îşev ewledê wê gaveke bi culet avîtiye? Ew gav diqewime wî ber bi ronayê, diqewime ber bi tariyê bibe? Kî dizane?

Nado ji xewê rabûnê ro êpêcekî bilind bûbû. Ewî pirtûka kîmyayê hilda û ji mal derket. Dê, bav bi wî hesiyanê, ew îdî gîhîştibû ber derê namebir<sup>2</sup>.

Namebir camêrekî pak bû. Ew î ne ewqasî kal bû. Lê weke emrê xwe dunê dîtibû. Ewî Nado li ber dêrî dîtîne, derkete derva û bi lewzekî şîrîn pirsî:

-Kuro, te bi xêr e?

-Eke<sup>3</sup>, min çend name aniye, wekî tu bişînî, lê hîvî dikim, ber te digirim, derheqa van nama da tu kesî ra gilîkî nebêje.

-Kurê min, ser çavê min. Wexta maşîne ji nehiyê bê, ez ê morê namên te xim û tevî namê dinê kim, bişînim, bila bi xer-xweşî herin, bi xêr-xweşî bersivan bistîni.

Ewî ev giliyana usa got Nado tirê ew dizane, wî çi nivîsiye, kê ra nivîsiye. Lê na. Ev gilî-gotin namebir ra bibûne edet, ewî gişka ra ev xêrxwezî dixwest.

Nado pirtûk ji pîcenka xwe derxist, name dirêjî wî kir. Namebir tê derxist dest li Nado ricifîn, lê ewî xwe wan erda danenî. Nado çûnê şûnda namebir navnîşana ser namê xwend mor lê da û kete mitala. Paşê xwe xwe ra got: “Xwedê xêr ke”.

Nado piş malê va zivirînê, xwe da nav darê dor rê veşart. Dareke sêva bi her du desta va hemêz kir, pêşiyê ricafê ew hilda, paşê mîna zara birçî ya dê undakirî kire îskeîsk giriya. Pey girî ra ji pêçiyê piya girtî hetanî sêrî rehet bû. Hîngî ewî çi kişandibû ji bedena wî derket. Lê xofê zû ew hingavt. Xwe xwe ra got: “Gora serê min. Tirsî min

---

1 **tîna xwe dan:** dêhna xwe dan, bala xwe dan

2 **namebir:** posteger

3 **eke:** (bi qirqizi) bira

wê tirsê ye serêşê bidine bavê min, malbeta me deroder bikin<sup>1</sup>. Ya Rebbî, min çi kir?”

Ew ji mitala qetiya, serê xwe bi her du desta va girt, paşê tiliyê xwe va porê xwe yî gustîlgustîlî hev xist, te tirê, wir da tişteke unda kiriye. Lê nişkê va bi her du destê xwe va porê xwe usa kişand êşê avîte sêrî. Nado paş da vegeerî û xwe xwe ra got, wekî ez ê herim nama paş da hildim. Çend gav avîtibû nihêrî maşîna, ku heftê du cara dihate gund, şuxulê mayîn ra tevayî poçta<sup>2</sup> heyî dibire nehiyê, ji derê namebir rê ket. Ew sekinî posîde posîde dû maşîne mêze kir, toza wê rakirî nava hewe da minê dibû.

Wê şevê Nado bijanga nedane ser bijanga. Xewê mala xwe ji dor wî bar kiribû.

Dibên, wedê dijwariya emir, roja reş li te dibe “mêvan” gotî ewê yekê hineka ra qal kî, qe na herî ser avê, wê yekê ava zelal ra bêjî. Lê Nadoyê tîfal qe nizanibû çi bike? Kirina xwe kê ra qal ke? Sibê mîna merivê nexweş rabû, bêmehe taştê kir. Xwe xwe ra got: “Bila dayîk tişteki derz neke”. Mîna her ro pirtûk da piçenga xwe, şûşa hubirê da destê xwe dêrî va derket. Li mektebê şagirtan digotin, dikenyan, lê Nado çû kete seywana<sup>3</sup> wê dersê derbaz bin, rûnişt.

Hinekî şûnda zengil lê ket, şagirtan ciyê xwe girtin. Dersdara dîrokê Vêra Îvanovnayê dest bi dersê kir. Ewê ji du şagirtan ders pirsî û paşê navê Nado kişand. Nado bi halekî dijwar, te qey digot, piyê wî wira nayên, hate ber textê nivîsarê.

Vê demê çavê wî reşve hatin, her şagirtek dudu dudu dihatine xanê. Lê dengê dersdara hizkirî te hey zanibû ronahî da çavan û ewî xwe civand, lê kir-ne kir deng jê derne- ket.

Vêra Îvanovna ev halê wî tê derxist û got:

-Nado, delalo, tê kivşê tu nexweş î, erê?

Ewê ev giliyana usa bi dilovanî got, wê demê rengê reş qemilî sorayî hatê, lê Nado dîsa tişteke negot.

---

1 **deroder kirin:** qewartin, derbider kirin

2 **poçte:** poste

3 **seywan:** fêrgeh, pol

-Here, rûnê, -Vera Îvanovnayê daha bi şîrîn got, - dersa dinê ez ê dîsa ji te pirs kim.

Hetanî ders xilaz bû, Vêra Îvanovna bin çawa va li Nado dinihêrî. Ewê rast tê derxistibû, wekî tiştêk qewimiye. Dersdarê dizanî, wekî kurdên vê derê hatine nefikirinê. Lema, şikber bû.

Vêra Îvanovna timê bi hewas, bi lewzekî<sup>1</sup> şîrîn ders şirove dikir. Lê îro ewê daha bi dil, daha bi kûrayî ders qise dikir.

-Îro, ez ê we ra derheqa dostî, biratiya gelên Sovêtêyê da qal kim. Em gişk şehedê wê yekê ne, çawa bi serî Stalînê mezin me gelê Sovêtîyê rev fasîstên devbixwîn xist.

Vêra Îvanovna aha gotinê, Nado kete mitala: “Lê gelo bavê me Stalîn çima gelê kurd da nefikirinê? Gelo rastî gelê kurd sûçkar bû, wekî ji ciyê kal-bavan hatinê rakirinê. Naha jî destûrê nadin, ewledên wan bixwînin, pêş da herin? Hema em ê bibine xulamê xelqê”.

Hema, ku zengil lê ket, Vera Îvanovnayê gote şagirtan:

-Gişk ji dersxanê derên, xenî ji Nado.

Vera Îvanovna rabû hate rex Nado, rûnişt û destê xwe da ser milê wî û mîna wêlîke<sup>2</sup> dilşewitî pirsî:

-Nado, çi bûye? Min ra ya rast bêje?

Tevzî canê Nado ra çû, nizanibû çi bêje. Lê ewî rind dizanî, wekî Vera Îvanovna time bi xemxurî berbirî wî dibe. Loma jî nexwest derewan bike. Nado pirtûka “Dîroka YRSS (Dîroka Yekîtiya Respûblîkê Sovêtîyê Sosiyalîstiyê) derxist, bi destê ricaf çend belg ser hev da welgerand, ser belgeki sekinî û tiliya xwe danî ser wêne û got:

-Min vî ra namek nivîsiye.

Vera Îvanovna li wêneye Stalîn nihêrî, hinekî tev hev bû u pirsî:

-Te çi nivîsiye?

-Min nivîsiye, wekî destûre bidin, ez herime xwendina bilind.

Nado ew giliyana got û kelogirî bû. Dersdara dilovan ber dilê wî da hat:

-Te gotî pêş da min ra bigota. Ne dibên, aqilek rind e, dudu daha rind in. Lê tişt nabe... Bêje min binê, bavê te wana haj ji vê pirsê hene?

1 **lewz:** peyv, axaftin, gotin, lefz

2 **wêlî:** (jin) dilbirehm, bimerhemet

-Na, Vera Îvanovna. Min tu kesî ra negotiye. Lê ez dixwezim bizanibim, gunê min çi ye? Çima destûra min tunebe ez herime înstîtûtekê?

Vera Îvanovna ber van pirsan zûr ma, li rûye Nado niherî, ha got:

-Rabe, here mal. Ese evê qewimandinê bavê xwe ra bêje. Bila ew pê bihese, diqewime sibê bên ji wî bipirsin.

Ewê rabû, dest avîtê pirtûkê Nado, alî wî kir û ew heta ber derî verê kir.

Nado bi kulzikî hate mal. Bav wê deqîqê şikber bû û pirsî:

-Lawo, çi bûye? Çima ha zû hatî?

-Bavo, dayê, werên em derbazî maldizkê bin, paşê.

Dê, bavê rûyê hev nihêrîn. Ewana şikber bûn, ku ese tiştêk heye.

Ewana derbaz bûn rûniştin. Nado derê maldizke para va dada û got:

-Bavo, min tiştêk kiriye, dixwezim bêjime we. Lê hîvî dikim rika te negire, nêta min rind hilde, daxe. Çawa carina tu dibêjî, pêşiyê aranê bibe zozana, zozana warîne<sup>1</sup> arana, paşê neta xwe ron ke<sup>2</sup>.

Keloye camêr bê hemdî xwe ji ciyê xwe rabû, dîsa rûnişt. Rûnişt destê xwe da eniya xwe û hinekî mizda. Rastiye jî ew bi mitala va çû zozana, dagerî arana; hinekî şûnda got:

-Lawo, merî gotî berga tiştê xirab pêş da bigire<sup>3</sup>. Lê qewimandin, ku qewimîn gotî rê-dirba bigerî. Bêje, lawo, te çi kiriye?

-Mîn Stalîn ra name nivîsiye, wekî destûrê bidin, ez pey koma deha ra herime înstîtûtekê.

-Xwedê xêr ke. Lê te çi nivîsiye?

Hê ewî bersiva bavê nedabû, dê kire ofeof, çokê xwe kuta. Keloyê camêr gote jinê, wekî bihêle, bira ew bêje, binê çi nivîsiye?

Nado rabû ji maldizkê derket, çû ji nav pirtûkê name anî got:

Mîn rûyê<sup>4</sup> namê xweyî kiriye. Bibihîzîn min çi nivîsiye:

1 **warîne:** bine, werîne

2 **ron kirin:** ronî kirin, aşkera kirin

3 **berg:** 1. biha 2. tedbîr \*\*\***berga tiştêkî girtin:** pêşiya tiştêkî girtin

4 **rûyê nameyê:** kopye û nusxeyeke nameyê

*“Hevalê Stalîn,*

*Ez bi mîletê xwe va kurd im. Lê malbeta me sala 1937a hatiye nefî-  
kirinê. Rind nizanîm kî sûçkar e?...*

*Dewr, zeman, yanê mezinê me? Ew yek ê paşwextiyê bê zelalkirinê.  
Ez îsal koma deha xilaz dikim, him jî rind dixwûnim. Lê destûra me  
ewledên nefîbûyan tune, wekî herine xwendina bilind.*

*Stalînê mezin, we bi xwe gotiye, wekî kur ne bersivdarê bavê ye.  
Giliyê giranbaha nin.*

*Bavê me yî mezin Stalîn, dibên hûn zara hiz dikin; usa bizanibin  
ez ji wan zara me. Ber we digirim, emir kin, bila destûrê bidine min,  
ku şuxulê xwe bidime instîtûtê.*

*Bi silavê şîrîn*

*Nado”*

Kelo hêdîka got:

-Him rind e, him bi tirs e. De bawerî ji Xwedê.

Dê bi her du desta va hate çokê xwe, kire axînî, ofînî û got:

-Kelo, mal ê li me bişewite. Rabe derê, berê xwe ber bi qulbê bike  
û qurbanê bêje.

Ewana rabûn tev ji maldizke derketin. Kelo zivirî piş malê, berê  
xwe aliyê qulbê da kir, her du destên xwe bilind kir û got:

-Ya Rebbî, evê şîpûkê bi xêr-xweşî ji ber derê me bide derbazki-  
rinê! Beranê kel di wê riyê da qurban dibêjim.

-Lo lo, -dê got, - ez jî ehd dikim, wekî pirtîkî jî wê qurbanê nexwim.  
Ez ê pêxas nava gund bigerim û qurbanê li malan pareve kim.

Ew çend roj bû kulfetê mala Kelo ne xwerina xwe, ne rabûn-rû-  
niştandina xwe dizanîn. Teqînî ji dêrî hatinê mezina hew dîzanibû,  
hatine Nado bibin. Rastî jî êvarekê, idî neferên malê şuxulê xwe  
xilaz kiribûn, dixwestin beravî dora destexanê bin, dest bi şîvê bi-  
kin, derê wan kuftan. Sivikê malê ber bi dêrî revî, derî vekir. Sedrê  
şêwira gund, katibê teşkîlata partiyayê der da ketine hundur. Çok li  
dê, bavê şikestin. Wana rind zanibûn, wekî sedrê şêwira gund derê  
xelqê bi xweşî venake. Ewana derbaz bûn rûniştin û sedrê şêwira  
gund elbihê ra' pirsî:

---

1 **elbihê ra/elbê ra:** tavilê, hema pê re û bêyi ku paşê

-Kelo, kurê te Nado li mal e?

Camêrê Kelo tûka xwe daqurtand bi dengekî ricaf got:

-Belê.

-Gazî kinê bila bê.

Nado xaniyê dinê da ders dixwend. Ewî bihîst, wekî merî hatine malê, rabû derbazî oda mêvana bû.

Sedrê şêwira gund ji piya hetanî sêrî ew mêze kir û bi hêrs got:

-Te wezîriyê ra name nivîsiye?

-Belê.

-Te nivîsiye, ku hukûmetê rast nekiriye, wekî kurd nefî kirine? Bi giliyê te kurd ne sûçkar e, lê hukûmet sûçkar e, hevalê Stalîn, bavê me yî mezin şaşî kiriye? Erê?

-Na, xêr, mîn usa nenivîsiye.

-De te çawa nivîsiye, ne nivîsiye, ew şuxulê me ye. Sibê îdî neçe dersê. Emir kirine te ji dibistanê derxin û şuxulê te bidine prokûratûrayê<sup>1</sup>. Hela li vî binihêre, hela li bejina weke buhustekê binihêre! Kirina wî binihêre!

Paşê rabû ser piya got:

-Were vira binavîne<sup>2</sup>, wekî sibê da ji mal dernekevî heta ji nehiyê merî neyêne pey te.

Vê demê Nado xwe jî nizanibû çî bû, tirs-xof ji ser wî firî, dil ber dil da hat. Ew bi şidiyayî pêş da hat, pêşberî wî sekinî, hilda kaxez xwend, bin lêva vebîşirî û kaxez navand.

-Hela, - sedrê şêwira gund got, - tu li qolê<sup>3</sup> wî binihêre. Te tirê qolê narkom<sup>4</sup> e.

Nado îdî xwe zeft nekir:

-Hela nivîsara xwe binihêre, hevokeke kurt da sê şaşî hene.

-Tişt nabe, wê derê, wê wan şaşıyana nîşanî te kin. Ewî destê xwe li hewa ba kir û gote katibê teşkîleta partiyayê:

-Rabe, em herin, bîna xwînê ji wî tê!

1 **prokûratûra:** (bi rûsî ye) dozgerî

2 **navandin:** şanên kirin, îmze kirin

3 **qol:** şanên, îmze

4 **narkom:** (bi rûsî ye: kurtebeşa "narodniy komitet"): meclisa gel

Ewana çûnê şûnda, çawa dibêjin, xêr-xweşî ser cîrana da barî, kevir-kuçik ser mala Kelo da. Ev hatina, ev pêparê ne bi xêr bû gizikekê, pêşiyê hol bû derê mala qewm-lêzima, paşê hêdî hêdî gund geriya.

Ew roja sisiya bû hingî derê mala camêrê Kelo bi kulzikî<sup>1</sup> hatibû kutanê. Qewm, lêzim, dilşewîtî tarî ketinê kerreker dihatin, diçûn. Carina jinan diçûn xwe didane alîkî tewlê dizîka va digiriyan. Digo-tin, nişkê va dengê girî bibîhîzin, wê bêjin, rastî jî ewana sûçkar in.

Li derê vê malê tarî û ronayî tev hev bûbûn. Te qey digot, biçûkmezina nizanibûn ro ji ku dertê, li ku diçe ava.

Çavên gişkan li rê bû. Wedê maşînek ber bi gund hatinê berî gişkan neferên mala Kelo didît, berî gişkan deng dikete guhê wana. Şev ku se direya, yanê dîk bang dida gişkan rûyê hev dinihêriya. Dê-bav diketine halê nemir-nejînê; rûyê wan î ber sur-serma tebiyetê, ber rojên giran qerçimî reş diqemilîn. Nado ev yeka rind derz dikir û xwe xwe ra digot: “Xwezila zû bên min bivin”. Him jî pêr ewî bê hemdî xwe peyîvîna dê-xûşkê bihîst û dil lê hate sotinê.

Dê digote keçikê:

-Porkurê, ser min da! Ne rîs heye, ne hirî. Were em binihêrin mal da çi heye vereşînîn, lepik û gore çêkin. Çavê min birije, kî zane wê berê wî bidine kê derê?

Nado hemû tişt seh dikir<sup>2</sup>, lema jî ber xwe diket. Dêrê ser derda ew bû, wekî îdî ew nedîçû mektebê. Digotin, dirêktore mektebê emir daye û wir da nivîsiye, wekî Nado ji mektebê tê derxistinê, bona wê, ku ewî şer avîtiye hukmetê.

Bîna Nado mal da diçikiya û zû zû derdikete derva, hey rê dinihêrî. Xwe xwe ra digot: “Binê min çi kir? Xuzila îro bên min bivin, him ez ê bizanim rîya min kî alî ye, him jî neferê malê wê ji şikberê xilaz bin, wê ya xwe bizanibin.” Ew dîsa derketibû derva, çavê wî li rê qerimî. Tu maşîne nedihate kivşê. Hema Nado dixwest vegere malê, siyarek wê da ber bi mala wan dihat. Ew jî ciyê xwe nelivîtî<sup>3</sup>, dê jî hat kêleka wî sekinî. Siyar hat pêşberî malê peya bû, hesp dest-

1 **kulzik:** kula ku di zik de ye û ne aşkera ye

2 **seh kirin:** bihîstin û tê gihîştin

3 **livitîn:** libitîn, hereket kirin, ciyê xwe de nesekinîn

kêş kir û da gava. Siyar kincê esker da bû. Ew xort bû. Ew gihîştinê himberî dê-kur, selam da û pirsî.

-Mala Nemoyev Kelo ev e?

-Erê, -Nado got.

-Lê hûn kî ne?

Nado hemû tişt fem kir û got:

-Eva diya min e. Navê min Nado ye. Esker jî vê yekê dêmxweş<sup>1</sup> bû û got:

-Hema ez hatime pey te. Komêndatûra<sup>2</sup> gazî te dike.

Vê gotinê ra dê xwe kuta, bû hewêrze. Girî tev girî bû, şîn tev şînê bû. Lê siyarê hatî pirsî:

-Evana çima digirîn? Çi heye? Çima min çî got?

Nado hinekî vir da, wê da ew da serwaxtkirinê. Esker got:

-Welleh, billeh, tişteki usa tune. Wedê tişte usa çend merî tên, bi çek tên. Binihêrin ez î bêçek im. Qe metirsin.

-Nado, rabe hespekî peyda ke em siyar bin herin.

Van gilî-gotinana berga tişteki negirt. Nado nêzîkî dê bû, ewa hemêz kir, got:

-Dayê, ez diçim hespa xalê xwe siyar bim û herim. Metirse, ez ê zûtirekê vegerim.

Neferê malê hev ketin. Bû hewêrze. Nado îdî tu tiştî nenihêrî, ber bi mala xalê revî. Ewana cîranê hev bûn. Hespa xalê bext ra derê malê zînkirî ber çarmedorê girêdayî bû. Xalê wî revoyê kolxozê xweyî dikir. Ew hatibû firevaniyê<sup>3</sup>.

Nado wê deqîqê hesp vekir, gema wê rast kir û piyê xwe kire zengûyê. Ewî xwest hespê bajo, xûşk zengûya zîn va dar da bû, lê lê bû piyê birê bi zengûyê va têke devê xwe. Paşê ewê nava rojnamê da tişteki pêçayî dirêjî wî kir û bi girî got:

-Eva zoke lepik in. Çavê min birijin, min pê ra negîhand gora çêkim.

1 **dêmxweş:** rûken û kêfxweş

2 **Komêndatûra:** (bi rûsî ye) fermandarî, biryargeha leşkerî

3 **firevanî:** firavîn, navroj



Nado dest avît, pêçek<sup>1</sup> hilda û gote xûşkê:

-Delala min, zengûya zîn ber de. Wa ye dayê jî, ji wê da tê. Bihêle ez herim, tu miqatî dayê be.

Xûşkê bêhemdî xwe zengûya zînê hespê berda. Eskerê hatî hespa xwe ajote bal Nado û got:

-Bajo, em herin.

Siyar hinekî ji mal dûr ketin, Nado li ser zîn piş xwe va zivirî nihêrî. Dê, bav, xûşk û çend kesên din pey wî dihatin.

Dê destê xwe hewa da bilind kiribû, dihate kivşê, gazî Xwedê dike.

Siyaran hesp ajotin û ji gund derketin. Dûr ketin, ketine nava deşta bêserobin. Tavê usa dizeriqand, usa germ bû te tirê jor da agir dibare. Te ku dûredûr mêze dikir ber çavên mêriv behr dihate xanê. Behra çi, ava çi? Ev derana salê çend meha dibûne hesreta dilope av û lema erd tîştîşî bû. Hey ewana pêş da çûnê tevzî canê Nado ra diçûn. Çawa birîna xeder germî germî naêşe, paşê diêşe, a usa hêdî hêdî xofê Nado hingavt, reng sipîçolkî dibû, lêv tîbûna diqerçimîn. Car cara ewî serê xwe bilind dikir û devê zo zo li vir, li wir çêriyayî dinihêrî. Esker seraser tê derxist, wekî rengê xort xeyîriye<sup>2</sup>, vê germa havînê diricife, xwe xwe ra got: “Gotî ez ewî ji wî halî derxim. Ka qala pirseke usa bikim, wekî ew qe mitale neke”.

-Nado, -ew berbirî wî bû, - were em rind hev ra bibine nas. Ewî hespa xwe ajote hinberî hespa Nado û destê xwe dirêjî wî kir:

-Navê min Esilxan e.

Nado hêdîka ber xwe da got:

-Ez şa me.

Esilxan dest bi gotinbêjeke kalikê xwe kir:

-Biçûktiyê gellekî deva siyar bûme. Kalikê min ez xwe ra dibirime riya dûr. Carekê ez û ew ser deveke aha rê diçûn, kalikê min gote min: Hela devê hanê binihêre, çawa wan kelema şîrîn şîrîn dicû, dixwe. Deve heywanên bi ecêb in. Ewana bi heftan va tî dimînin,

1 **pêçek:** 1. tiştê di nava kaxez, pine û hwd de pêçayî; paçik 2. zarokê viringî yê di nava pineyan de

2 **xeyîrîn:** guherîn

gellek wext birçî dimînin. Barê giran hildidin û hêdî hêdî riya xwe diqedînin. Dewran jî usa hêdî hêdî tê derbaz dibe, kî lez dikeve bila lez keve, lê hey-way, ew şuxulê xwe dike. Ewa çerxa xwe ye nemirî ba dide. Lê rind bizanibe, firqiya dewrê û devê heye. Zû, yanê dereng çok li devê sist dibe, rojekê jî çok vedide qe ranabe û heta hetayê çavên xwe digire, diçe dunya tarî. Îcar jî deve kudika xwe dihêle, wekî dewranê ra gav de.

Paşê Esilxan derbazî bûyereke mayîn bû, heta hatin nêzîkî komêndatûraye bûn.

-Nado, ez zar bûm, li gundê me aş tunebû. Zivistanê kalikê min genim, cehê qewm-pismama, der-cîrana hildida, çawa bi xwe digot, deve zêde bar dikir û me berê xwe dida gunde aş lê heyî.

Fêza gundê me hevrazekî bêhûde<sup>1</sup> hebû. Zivistanê berfê, qeşayê rê-dîrba hevraz digirt, hatin, çûyîn dibû dijwarî.

Dîsa rojê zivistanê kalikê min deve bar kir û em rê ketin. Me xwe da hevraz. Deva me ye sipî hey dilitimî, hey xwe rast dikir, bi dijwari rê diqetand. Nişkê va devê çokê xwe kuta erdê, bû nirenira wê, buhust buhust pêş da çû û êpêcekî din hevraz parava ma. Em derketine fêza hevrêz. Li wir kalikê min hate her du çavê devê; barê devê danî, got bila ew hînekî bîna xwe bistîne. Paşê destê min girt ez anîme dev-hevrêz û got:

-Lawo, hela jor da binihêre, binê çî gelîkî kûr e. Jiyan jî usa bi kûr û dûr e. Deve ruhberine qewî<sup>2</sup> nin. Te dît, çawa çokên xwe kuta erdê tu dijwariya ra qayîl nebû, gihîşte meremê xwe. Gotî merî jî boy nê-meremê emrê qenc riya jiyînê a usa gav de, ji tu tiştî netirse. Jiyan bona însîn barekî daha giran e. Mêr ew e ji tu tiştî netirse.

Ewî usa gilî-gotin hev dianî, te qey digot, ew kalekî sed salî du-nedîtî ye.

Vê derê Esilxan xwe kerr kir, hespa xwe ajote rex hespa Nado, destê xwe danî ser pilê wî û got:

-Yek jî kalikê min digot, bûyaren şîrîn bona rê dibe pire. Dinihêrî, em îdî gihîştine komêndatûrayê.

1 **bêhûde:** dijwar û bilind

2 **qewî:** xurt û zexm

Pêşberî komêndatûrayê ewana ji hespan peya bûn. Nado birin xanîkî, dane rûniştandinê û gotin:

-Li vira rûnê, hinekî sebir ke.

Heta hatin Nado birin hezar mitale dilê wî ra derbaz bûn. Hinek jî derbaz bû xortek hat got:

-Bide pey min, em herin serkar hatiye.

Ewana ji derîkî, duda derbaz bûn û ber yekî sekinîn. Xortê ku Nado anî got:

-Bisekine, ez têkevime hundur, hatina te bêjim.

Du-sê deqîqa şûnda xort derî vekir:

-Kerem kin.

Nado hêdî hêdî da gava, kete hundur. Oda serkar gellekî direj û ber bû. Hema ber dêrî sehwe ew hingavt; kir, nekir piyê wî wî ra nehatin, ku ew pêş da here.

Menîke<sup>1</sup> vî halê Nado ew bû, hema der da ketinê hundur, çavê wî li wêneyê Stalîn î mezin ket. Ew wêne li fêza serê serok dîwêr da hatibû dardakirinê.

Serok ev yek tê derxist û xwe rabû ber bi wî hat. Xudaneke zîpik zîpik hate eniya Nado. Ew hat destê xwe direjî Nado kir û pirsî:

-Te derheqa xwendinê da nivîsî bû?

Nado bi destekî xwe va xudana eniya xwe paqîş kir, destekî xwe dirêjî serok kir û got:

-Belê.

-Ez te pîroz dikim. Duh kaxez hatiye û destûr dane tu herî xwendina bilind.

Paşê kete milê Nado wê oda dirêj ra anî pêşberî xwe da rûniştandinê. Hê derbazî ciyê xwe bû, rûnişt û cake ramana xwe dubare kir:

-Destur dane, wekî tu ewreqê xwe bidî hemu înstîtût û têxnîkûmên bajarê welatê me yî mezîn, xenî ji serbajarên rêspûblîkan.

Nado hê bi guhê xwe bawer kir. Ew çend heftê bûn, wekî Nado mîna germa van dera xwe da dişewitî, wî tirê ew erdê bêav e, ber tavê tîştîşî bûye, lê naha êvareke hênik daye ser wî, pê ra jî pijîkê<sup>2</sup> baranê

1 **menî:** 1. mehne, wate 2. sedem

2 **pîjik:** 1. şîşikên goreyan 2. dilopên baranê yên hûrehûr

rûyê wî dikevin, bîn tê ber bîna wî. Sorayî hate dêma, lêvê qerçimî tijî xwîn bûn. Hiş zelal bû; dûmana ber çavan kişiya.

Nado hê serê xwe bilind kir, li wî nihêrî û got:

-Hevalê polkovnîk<sup>1</sup>, ne emir dane ez ji mektebê derxistime.

-Ez dizanim, -ewî bi ken got, - ay eva kaxezê destûrê bona îns-tîtûtê. Rabe, here mal, sibê jî here mektebê. Ew emir hate guhastinê!

Nado bi şabûn rabû, qe xatirê xwe ji polkovnîk nexwest, ber bi dêrî bi lez, da gava. Polkovnîk pey wî nihêrî, vebîşîrî, bi têtê teme da, wekî Nado verê kin.

Nado bi rev ber bi hespê revî, siyar bû û ber bi gund da rikêfa<sup>2</sup>.

Êpêcekî hesp da rikêfa, lê hewa hê germ bû, hespê xuy da. Ewî gema hespê kişand û bi orxe<sup>3</sup> rîya xwe cedand. Nêzîkî gund hesp da rikêfa. Wextekî nihêrî li ber dêrî ye. Ji hespê peya bû, dît dê ber dîwêr rûniştîye, çavê wê rê ye. Ew ber bi dê revî, hê dîr va got:

-Dayê, mizginiya min bide!

---

1 **polkovnîk:** (bi rûsî) serheng

2 **rikêf:** zengû \*\*\* **dan rikêfa:** zengû li binzîkê xistin da ku bibeze

3 **orxe:** cureyekî beza hespan e

## 12

Roj derbaz dibin dibine hefte, hefte dibine meh, meh dibine sal. Ew çend sal bûn Nado înstîtûta pêdagojiyê da, para kîmya-bîologiyê da bi serfînyazî<sup>1</sup> dixwend. Înstîtûtê da bibû xwedanê navekî bilind. Xênî ji dersa, ew tevî civaka xwendevana ye ulmî dibû, gotar û helbestên wî dihatine weşandinê. Ew sal bi sal pêş da diçû. Lê ya sereke ewî di nava kurdên nefikirî da kareke mezin dikir, wekî ewledên kurdan bixwînin, bèn qebûlî înstîtûtan bin. Di vî alî da ew gihîştibû nêta xwe. Îdî zarên kurdan çav dabûne Nado sal bi sal pey wî dihatine înstîtût, têxnîkûman. Di nava kurdên wan komela Nado bûbû mînak. Îdî vî xortê êgin salên xwendinê devedevî dawiyê kiribû, naha jî dilê wî bi hub-hizkirinê va tijî kiribû, pêsîra wî ber bi Helîmê dikişand. Ewî xwe xwe ra digot, ev jî rêke emir e, gotî wê ra derbaz bim, lê çawa? Wê şevê bawer bikî heta berbanga sibê Nado xew nekir. Mîna merivê birîndar kêlek kêlek welgerî, te hew dizanî birîn diziqitîn, êş ser êşê da tê.

Eva îdî salekê gellektir bû bejin-bala Helîmê ye nivçe, eniya ber e qerqaş, çavên gulover, navkêlka zirav, serbarê ser da, xesiyetê wê yî delal, rabûn-rûniştina wê ye giran rehetbûn nedida Nado. Pirseke mayîn jî ew nerehet dikir, ji ber ku ewî îdî îmtahanên dewletê dabû,

---

1 serfînyazî: serfîrazî

wê biçûya mal û vegeriya bihata vira, wê ewreqê pêwîst bidana wî û ewê biçûya ser karê. Lê belê, ewî hê dilê xwe ber Helîmê venekiribû. Ew î him şa bû, him posîde bû. Şa bû: pênc salê înstîtûtê parra va ma-bûn, ewî pê davîte nava emir, nava ulm, lê boy wê zeriye posîde bû.

Ewana rojê du cara, sibê zû çûnê înstîtûtê, nîvro vegefinê rastî hev dihatin. Kêf-halê hev dipirsîn, ew hevraz, ewa jî berjêr diçû. Him jî carekê duda tevî keç-xortên înstîtûtê çûbûne sînêmayê. Carekê jî înstîtûtê da êvarî hatibû amadekirinê, wê demê Nado çend cara tevî Helîmê şîrîn-şîrîn gotibû-bilandibû.

Çawa dibên, îdî huba wan firiyabû ser hev. Her ewana rastî hev hatinê soromoro dibûn. Qe nizanibûn ev çi hewal e?

A, îşev Nado biriyar kir ese sibê dilê xwe ber wê veke, lê çawa? Nişkê va ew kê-m-zêde bipeyîve, ewa jî bixeyîde? Paşê gelo, çawa bike? Demekî şevê ew ji şabûna rabû, nava cî da rûnişt, ber xwe da vebîşîrî. Ewî hevoka ku wê sibê Helîmê ra bêje, çend cara wekiland. Dîsa veleziya, lihêv kişande ser xwe û kete xewa şîrîn.

Sibê ewana mîna her car rastî hev hatin. Ewî usa kir, ku ewa selamê bide wî. Helîmê bi dêmekî ken got:

-Selam, Nado.

Nado hinekî xwe şaş kir, hevoka ku êvar da çend cara wekilandibû, bi dijarî hev anî û got:

-Selam, bûka diya min!

Dîsa yek hevraz, yek berjêr çû. Lê nişkê va ewa ciyê xwe da bû risas, sekinî. Ewê hê fem kir Nado çi got. Alîkî şa bû, alîkî jî xwe xwe ra kire şer, wekî min çima bersiva wî neda. Lê îdî dereng bû.

Te hew dizanibû îcar jî dora wê ye, îcar jî gotî ewa nerehet be. Dikir-nedikir dengê Nado ji guhê wê nedîçû. Şirovekirina dersdaran mîna bakî her guhê wê ra derbaz dibû. Qe ewa hetanî dersa dawiyê rûnenişt, rabû hate mal. Huba Nado dilê wê da bûbû kuçikekî gur. Êvarê keçikên hevalên wê jî tê derxistin, wekî ew e nerehet e, nava mitalan da ye û lema pirsîn:

-Helîme, çi biye? Yanê dîsa pîrika te Qerqaş ketiye bîra te?

-Na, Gulçoyre, îcar çawa nêçîrvan berê xezalê bide çiyakî û ewa jî tu rê nebîne, a usa hatiye serê min.

Gulçoyrê mîna xûşka xwe ewa hemêz kir, hate rûyê wê û got:

-Tu hela bêje, binêw ew neçîrvan kî ye? Paşê em ê berê wî bidine neweleke usa, ew here û dijwar ji wir derê.

Mesele çawa bûbû ewê Gulçoyrê ra qal kir. Ewê destê xwe hev xist, bû pîrçepirqa wê, keniya:

-Lê lê, hema ev. Rastî bêjî Nado xortekî ser xwe ye. Ew î xwendî ye. Min du, sê cara dîtîye, bi van guhê xwe bihîstîye, çawa ew civaka xwendevana ye ulmî da pêş da hatiye. Dersdar timê pesinê wî didin.

-Pirs ne wê da ye, ez dizanim ew carke dinê rastî min hatinê, wê dîsa wê nêta xwe biwekilîne, gotî ez bikaribim bersiva wî bidim.

Gulçoyre ewqasî jî nûqî nava vê gotinê nebû û rabû pirtûk hilda, got, diçime pirtûkxanê.

Helîme odê da tenê ma. Rûnişt û her du destên xwe va serê xwe girt, kete mitala: Bi nêt-meremê xwe va çû derkete heft qatê esmîn, dakete dunya ronkayî hemêz kir, paşê çû gundê wan, hate mala bavê xwe, çû rex pîrika xwe ye dunêdîtî, şewirdara malên der-cîranan, rûnişt. Ewê posîde posîde serê xwe da ser çoka wê. Te tirê ji wê alîkariyê dixweze. Nişkê va bûyereke pîrikê kete bîre, rabû ku pîrikê hemêz ke, lê ewa ku, pîrik ku? Dilê xwê da got: "Xwedê îmanê bide te, pîrikê. Şa bû. Bûyera "Gulîzer û Hebûn" kete bîrê. Rabû, bû şingêşinga wê, ode paqîş kir, fera-fotik şûşt, destê xwe cî-nîvîna gerand. Dest pê kir xwerek bipêje.

Çend seheta şûnda Gulçoyre vegerî. Vegerî odê nihêri, mala şûştî-mûştî mêze kir, ji serî heta piya bejîna hêvala xwe pîva, çav dêmê wê ye sor, çavên wê ye bi ken ketinê, dilê wê bi xwe jî tijî hub-hizkirin bû.

-Xûşkê, -ewê bi dengekî ken-hen' got, -şukur tê kivşê Nado hatiye vira, lema tu ye aha bi eşq î, bi ken î, ji dêmê te şewaq<sup>2</sup> dibare. Ode jî mîna oda bûka ber perdê ye.

-Erê, ew maye, wekî Nado bê vira. Min çî ku digeriya, ew jî dit. Pîrika min hate hewariya min.

-Di riya Xwedê be, ca sergirtî nepeyîbe. Te çî unda kiribû, çî dît? Pîrika çî?

1 **ken-hen:** ken û henek

2 **şewaq:** şewq, şemal, rewneq

-Were rûnê, ez bûyereke pîrika xwe te ra bêjim, binê qe hişe te çi dibire?

Ewana rûniştin. Helîmê bi dil-can bûyera “Gulîzer û Hebûn” ta-derziye ra kir. Gulçoyrê ew dîsa hemêz kir û got:

-Cara ewilîn dixwezim tişteki bêjim, eva sê sal e em bal hev in, tu hey mesele-metelokê gelê xwe, kilamê bi miqamê şîrîn dibêjî, tê kiv-şê zargotina we dewlemend e. Ev bûyera te hêcka ronkirî him xweş e, him riya jîyanê nav da heye. Te rind tê ra dîtiye, îcar jî tu bere wî bide hevrazê çiyayê Tyan. Şanê, bila ew bizanibe, dunê da çi heye.

Keçik bi hev kenîyan, rabûn destexan vekirin bi mehde nan xwe-rin, çay vexwerin û dîsa nûqî nava dunya pirtûkan bûn. Lê Helîmê bawer nedikir sibe çi dem ê ron be, ew ê kîngê rastî Nado bê?

Çawa pêşiya gotine, sibe li Ometê bi xêr-xweşî vebû, usa jî sibe li wê ron bû. Dîsa mîna her car ewana rastî hev hatin, Nado got:

-Selam, bûka diya min!

-Xorto, -Helîmê got, -guhê xwe rind veke bibîhîze. Ez ê bivime bûka wê dayîkê, wekî kurê wê yekî herî dewlemend be.

Nado ev bersiva bihîstinê, çawa dibên, çiya xwe da qerisî<sup>1</sup>, bû şelte<sup>2</sup> qeşa bivir nebirî. Ewî bi guhê xwe bawer nekir. Xwest ji wê bipirse, ev çi gilî ye, ev çi gotin e? Lê îdî Helîme ji wî dûr ket û di nava xwendevana da ji ber çavan unda bû.

Nado li wê duriyanê<sup>3</sup> hinekî jî sekinî. Bizûtin<sup>4</sup> nekir here dersê, vegeirî hemjîyînxanê<sup>5</sup>. Wê rojê ew nobedarê odê bû. Lê destê wî nehat tişteki bike. Odê da vir da, wê da çû, hat. Ewî xwe xwe ra got: “O, hela binê, ewê çi got? Xwezila ewê bigota na, xwezila ewê bigota tu yî nerind î, tu yî kotî yî, tu yî ne tu tişt î! Min ra bi dilê xwe bikira şer, lê ev yeka negota. Ê, binê min çiqasî şaşî kiriye? Binê, min heta naha tê dernexistiye ewa xwedanê çi xesiyetî bûye? Binê, ruhê wê bi çi va hatiye girêdanê?”

1 **qerisîn:** cemidin

2 **şelte:** parçe (ji bo tiştên cemidî)

3 **duriyan:** cihê ku rê ji hev diqetin û li ser çend rîyan pareve dibin; çar-rê

4 **bizûtin:** hereketkirin, dilkirin

5 **hemjîyînxane:** cihê ku xwendekar lê radibin û rûdinin



Ew ber roderê sekinî, çavên xwe kuta dara derva penc vedayî,<sup>1</sup> êmê çend deqîqa li wê mêze kir, paşê dîsa nava malê da da gava, diçû wî serî, dihate vî serî. Te hew dizanî ewî tiştêk unda kiriye, lê digere. Paşê hat rûnişt û biriyar kir, ku namekê wê ra binivîse, name bidê û bi vê yekê va qelema reş bikişîne ser wê huba xwe ye ewilîn.

Ewî bê selam, bê kalam aha dest bi nivîsara namê kir:

*“Lê lê, çima tu nizanî malê dunê, hebûna zemîn qirêja destan e? Kanê dewleta merivên dunêzeftkirî? Kanê ew mirovên, ku boy hebûna dunê, dunya kirine kelefê?”*

*Mîna mûriyan însan qir kirin, bi sedan va, bi hezaran va barê devan zêr-zîv, mal-durr bar kirin, dane ser hev, dîsa gotin, ev hindik e. Dawiyê da ew gişk destevala çûne dunya tarî, hineka jî kefen nebû qismetê wana”.*

Nado qe navê xwe jî nenivîsî, name qat kir kire beriya xwe, wekî sibê rastî wê hatinê bide wê. Lê bînteng bû, ew hate ser wê nête, hema îro, dane nîvro ewa ji instîtûtê derketinê bive namê bidê. Ewî, usa jî kir.

Nado rabû hate wê duriyanê sekinî, ya ku ewana timê rastî hev dihatin. Hinekî şûnda ewa tevî qelfê keçikan wê da hat. Ewê Nado vira dîtinê ji keçikan qetiya û nêzîkî wî bû. Ewî tu tişt negot, name derxist û raberî wê kir<sup>2</sup>. Ewê name hildanê, Nado zivirî here, Helîmê nehîşt, got:

-Bihêle, kaxizê te dayî bixwînim, paşê.

Ewê nama wî xwendinê şûnda, bû pîrqepîrqa wê keniya û got:

-Ey, xorto, te nêta min rind derz nekiriye. Were em ji gelê xwe dûr nekevin, lema gotine, hemû teyr xweşe refê xwe ra. Ez dizanim çend roja şûnda tu yê îmtahana bidî herî mal. Here, tu ku bûyera “Gulîzer û Hebûn”ê hîn bî, tu yê bersiva pirsê min bibînî.

Paşê ewa gavekê jî ber bi wî hat, got:

1 **penc vedan:** (dar û giya) reh berdan xweliyê û xurt bûn

2 **raber kirin:** pêşkêş kirin, lê nîşan dan

-Delalo, ber xwe nekeve. Ez ê sibê herime mal, min îmtahan ji wede zû daye, dibên pîrîka min Qerqaş bedhal e<sup>1</sup>.

Pey vê yekê ra hinekî beşera Nado vebû û got:

-Gelo, çima riya me welatekî ra derbaz nabe? Tu yê herî Qırqis-tane, ez ê herime Qazaxistanê. Xwezila wê rojê, riya hizkiryên keç-lawên kurdan ji welatekî ra derbaz be, welatê ku ser navê wan e.

-Gotî ewê riyê em bigihîne hev.

-Erê, usa ye, bûka diya min. Ez ê wê bûyerê ese hîn bim.

Wana êpêcekî kerr-lal rûyê hev mêze kirin. Helîmê ev seqirtî te-riband:

-Xorto, de bi xatirê te.

Cara yekem bû, wana dest dane destê hev û çirikekî<sup>2</sup> şûnda ji hev qetiyân.

... Îşev dîsa Nado rêwî bû. Ew di vê riyê da gellekî çûbû-hatibû. Çend salan berê, dema dersxana deha kuta kiribû, destûr dabûne wî here înstîtûteke da qebûl be, çawa dibên, ew bê bawerî, bêgav bû. Lê bi dijwarî, bi hevraz-berjêr, her tişt wî ra hev hat, ew qebûlî înstîtûtê bû û salê, çend cara vê riyê da diçû-dihat. Belê, îşev ew oxira wî ye ewilîn kete bîrê, him jî ...

Şev bû. Kûpê<sup>3</sup> da gişk razabûn. Lê Nado hişyar bû. Ji şabûna xew nedikete çavan, paşê jî mitalan mîna bayê birûskê ew bir derxiste ro-jên zarotiya wî, wedê rojên heşir- meşirê, rojên nefikirinê. Ew poyêza barbir kete bîrê. Ev kûpê û ew vagona barbirinê himberî hev kir. Hineki tî bû, av kete bîrê. Ew payîza sala 1937a bû. Vê gavê dengekî rojê buhurî, dengekî dîrokî li wî tesele bû: “Wê şevê, wê vagona barbir da ji hal-wextê zemîn, ji derd-kula bavê te jî xew nekir. Ewî xwe xwe ra digot: “Min kor î, ez ê van tifalana çawa xweyî kim? Ne hal e, ne hewal e, ne dû ye, ne derman e?” Paşê jî ewî bi xwe bersiva pirsên xwe da: “Gişk çawa, ez jî usa, çima malbeta min ji ya kê zêdetir e? Çima zarongên min çavreş in, yên xelqê rûreş in? Ax, şîna tev êlê şaya dunyayê ye”.

1 **bedhal:** gelekî nexweş

2 **çirik:** saniye

3 **kûpê:** (bi rûsî ye) kompartimana trenê

Demeke berbangê Keloyê bavê te ji ser vê kêlekê welgerî ser kêleka dinê, rodera vagonê ra tîrêjên tavê dane ser wî. Ewî hinekî çavên xwe vekir, dîsa girt, te tirê ew besta va, xwe xwe ra diaxive: Tûûû, çi ye, ez xew da mame? Ne naha garana dêwêr birine bajonê? Ne naha keriyê pêz ji gund derket? Dîsa Deloyê gavan wê bi min bikene û bêje: "Tê kivşê tu Gevez xanim hetanî berbangê ketine kêf-heneka, paşê jî xewê li te zor kiriye, xewê da mayî, erê?"

Lê nişkê va te qey digot yekî niçande wî û ew mîna merîkî sersemî ji ciyê xwe rabû. Rabû nihêrî ew î li ku ye, dîsa ber xwe da kire pitepit:

-Canim gundê çi? Garana çi? Keriyê çi? Camêrê Delo kanê? Dikirkê<sup>1</sup> wî ser çava be?

Ew hê êvar da tî bû. Evarê qêmîş nekir avê vexwe, go bila zaronan ra bimîne. Ji ber ku, ji vê vagonê gilî gihîştibû vagona dinê, wekî dibên, îdî du roja, du şeva poyêz ê nesekine, bisekine jî li van derana av tune, lema jî avê kêmbûn.

Ew ber bi elba avê çû, nihêrî devê elbê vekiriye. Xar bû, şerbikê destê xwe ti jî av ke, nişkê va te tirê ew veciniqî, paş da vekişiya. Dît avê da tiştek heye. Nuqutî dil, wekî hebe-tunebe, ew yanê mişk e, yanê beleban e<sup>2</sup>. Dîsa xar bû, dît, belebanekî gir ketiye elba avê. Ew ser elbê ra sekinî. Bîzê wî vevat<sup>3</sup>. Paşê wî usa derz kir, wekî paşî-pêşî li wî birrîne. Pêş da here wê gelî da bê xarê, paş da vegere, bîra kûr e. Avê birêje, çawa birêje, nerêje çawa nerêje? Av him hatiye herimandinê, him jî diqewime jerdadayî bûye.

Ewî bi dijarîke mezin va, bi giraniya weke çend pûta<sup>4</sup> elba avê hilda û welgerande qelîşteka vagonê.

Neferê her du mala yeko yeko hişyar dibûn û te qey digot, qestbende<sup>5</sup> hinek dibêjine wana, wekî ber bi elba avê herin. Diçûn, ecêba

1 **dikirk:** yadigarî, bîranîn

2 **beleban:** cird, mişkê mezin

3 **bîz:** mehde, qilde \*\*\* **bîzê yekî vevat:** qildeyê wî hilnedan, mehdeyê wî ranekirin

4 **pût:** mengiraniyeke bi qasî 16 kîloyî ye

5 **qestbende:** bi derewî

nedîtî ber çavên xwe didîtin û paş da vedigeriyan. Zaran dikire îskînî, mezin zûr dibûn çavên hev dinihêrîn.

Îdî danê berêvarê bû. Kelo nava vagonê da wê da, vir da diçû, dihat. Zar yek li vir, yek li wir qincilî ser hev bibûn. Lê kûrekûra<sup>1</sup> Nado bû. Ew ewqasî giriya, nîşkê va deng lê hate birrîne, çav pelpelî<sup>2</sup> bûn, dev lê xar bûbû, dihat bibihece.

Kelo nişkê va, hema li nav vagonê çok kuta erdê û destê xwe bilind kir, got:

-Ya Rebbî! Binê te çi anî serê me? Kanê çemê kêleka gundê me ra kişiyayî? Kanê kaniya nava gund e bi lûlê<sup>3</sup>? Kerba xwe ev bendana jî gotin:

*Gulê, Gultepe gundê me ye,  
Canê, Gultepe gundê me ye.  
Gulê, kaniya nav lûle ye,  
Canê, kaniya nav iûle ye.*

Ya Xaliqê Jorîn! Qe merî ber çavên merivan daxa mêriv derdixe, qe merî ber çavên meriva dil-hinavê mêriv diqelîne!

Ber çavên min ewledên min bona şerbike av mîna çira neft xilazbûyî ditemirînî!

Gevezê ev halê mêr dîtîne, hat milê wî girt, ji erdê bilind kir, got:

-Kelo, rabe, mêr î şerm e! Rabe, bi hoşeriyê va berê min derz ke, bila jê xwîn bê! Bi xwîna berên min, lêvên zara ye qerçimî şil ke. Dibên, xwîna berê diya nahêle hetanî demeke dirêj ewled tî da bibihecin, paşê Xwedê kerîm e.

Kelo rabû mîna merîkî hewapêketî<sup>4</sup> ber bi fermeşa quncê vagonê çû, lê dê pêsîra xwe vekir, piştta xwe da zaran, berê xwe derxist, hazir sekînî.

Mêr wê da vegeirîne, jin wî halî da dîtîne, got:

- 
- 1 **kûrekûr:** dengê girinê
  - 2 **pelpelî bûn:** wekî keviran bûn
  - 3 **lûle:** borî
  - 4 **hewapêketî:** dîn, cini

-Bavo, belengazo! Dewranê tu kaf-kun bî!

Paşê ew bi hemdî xwe hate eniya jinê. Jinê nihêrî ewî ji fermeşê werîse weke deh metra derxistiye û ewê nizanibû ev çi hewal e, ew ê çi bike?

Ew kêleka jinê ra derbaz bû, mêkut hilda rodera vagonê şkestand, Paşê bi lez serîkî wêris helboqe kir, avîte nava xwe, serîk desteka derê vagonê va girêda û mîna xortekî quloz bû, roderê ra daliqî derva.

Jinê ev ecêba dîtîne, kire kûrekûr û wê hew dizanî naha cîran ê bêne hewariya wana. Lê, hey la heyê!..

Vê demê derva bû qırçeçırça gulla. Çend deqîqa şûnda poyêz sekinî û şeçînî ji derê vagona wan hat. Derî vekirin, nihêrîn zarek li vira, yek li wira veleziyaye, hinek dikine ofeof, hinek dikine axeax, hineka tenê çavên wan diçûrûsin. “Mezin” meniya daliqandina Kelo hesiyane şûnda, ji vagonên dinê hinek av dane anîne. Ruh ber zar û mezinan da hat. Lê Kelo birinê şûnda, dîsa bû hewêrze.

Belengaza Gevezê dîsa girtina Kelo kire bîra xwe, bû kûrekûra wê. Lê hinekî şûnda ew veğerandine vagonê.

Şîn-şayî tev hev bû. Anîn rodera vagonê ye şkestî bi belgekî hesin va xitimandin. Paşê poyêz rê ket.

Li stansîkê poyêz sekinî, dengê dîroke li Nado hate birrînê, qewimandinên wan salana mîna dûmaneke ji ber çavan kişiyên. Ewî rabû şerbike ava sar vexwer, dîsa veleziya. Kete mitala û îcar hizkiriya xwe, bejin-bala wê, demê gulover, eniya ber e kever, çavên reş e dor bi buriyê qeytanî anî ber çavên xwe û te hew dizanî, Helîme pêşberî wî sekiniye û bi dengê şirîn dibêje: “Nado, here nava gel bigere û wê te ra bûyera “Gulîzer û Hebûn”ê bêjin. Paşê ewî dîsa pirs da xwe: “Naha ez ku da herim? Herime nava kurdên Azerbaycanê, Gurcistanê, Tûrkmenîstanê, Ermenîstanê, yanê nava kurdên Tirkîyayê, Îraqê, Îranê, Sîriyayê? Hela tu kirina dewrê, ya dujmin binihêre, binê ev gel çawa sergerdan<sup>1</sup>, bela bela kiriye.

Xuzila rojek bihata min qelem hilda û binivîsiya, gelo ev gel çima

1 **sergerdan:** kesê li çol û pesaran dikeve û êdî venagere

aha kerî kerî, pirtî pirtî bûye, çima hatiye nefikirinê? Bizanibûya rast e, bavê min, mezin dibêjin, wekî ermeniyana usa kirin, wekî ciyê ermeniyana fire be, ermeniyê dunyayê beravî Ermenîstanê bibin û Ermenîstana Mezin çêkin. Lê çima hinek kurd ji Nexciwanê hatine nefikirinê? Vira jî dibênen pêçiya wan heye. Kurd li Nexciwanê gellek bûn, her tenê kurdên ser sînorê Ermenîstanê dane reqandinê<sup>1</sup>, wekî ewana rehet wê derê jî bigirin û têkine tevî “Ermenîstana Mezin”. Ev gotina mezinan e, lê rastî çawa ye, ewreqê dewletê da çi hatiye nivîsarê, ew yek hela sergirtî<sup>2</sup> ye? Lê paşê çima sala 1944a ji Gurcistanê kurd hatine nefikirinê?

Kalikê min î rehmetî usa rind derheqa gela da şirove dikir. Digot ermenî gellekî jêhatî ye, bi tifaq e, dîrokê da mala wan tiştêkî şewitandiyê û naha jî dişewitîne. Ewana ku beravî ser hev dibin, têr dixun û dibênen: Dunê da her tenê ermenî gelê xas e, ji filan derê hetanî, filan derê ya me ye, gotî em bistînin. Ciyê sekinî ewana dibine peşka<sup>3</sup> serê cîranê xwe, dest bi hezar fen-fêlan dikin, dîroka qelp<sup>4</sup> dikolin, dibênen ev derana ya me ye. Îja têne qirê. Merzelê nuh çêdibe. Ewana beravî merzelê nûh dibin, şîne dikin, vê demê mirî jî radibin, deng didine dengê wana. Dengê miriya, reqereqa serê miriya li serkêlkê ketinê, ew deng gihîştinê zindiya, hê dibêjin “Hey lo, mala me bişewite, yênen mirî em in” û paşê diçin ciyê xwe da rûdinên.

Lê ya kurdan nexweşîke mayîn e. Bê tifaqî, pîrr qebîltî, ya lap<sup>5</sup> sereke pîrepîrtî<sup>6</sup>, hev ra neqayîlbûn. Her kes dibê ez. Xelqê ra rê diçin, barê wana xarbûnê amade ne serê xwe bidin, barê wana rast dikin, lê hev ra, hindik dimîne çavên hev derxin, hev ra zordestiyê dikin, gulla davêjine xwe xwetiye, paşê poşman dibin.

Qasek şevê Nado kete xewa şîrîn. Ew usa razabû, hindik mabû

1 **reqandin:** koçber kirin, ji warê eslî raqetandin

2 **sergirtî:** veşartî, nepen

3 **peşk:** bela, feşk, pêxem

4 **qelp:** dilnesax, xayîn, sextekar

5 **lap:** tam, herî, tewrî \*\*\* **lap sereke:** hera sereke, tewrî sereke

6 **pîrepîrtî:** belawelayî

ji stansiya wê peya be derbaz be. Beletdar<sup>1</sup> jineke navsere bû, hate kûpê nihêrî Nado şîrîn-şîrîn razaye, ewê deyîl<sup>2</sup> wî kir û got:

-Vistan, mamînî sînok! (Rabe, kurê daykê!)

... Wê rojê mala Keloyê camêr bû şayî. Hatî-çûyî pîrr bûn. Gellekan digot: "Kelo, Gevezê, çavên we ronkayî, şikir Nado hindik maye înstîtûtê xilaz ke. Him jî dibên, ew dixweze bibe ulmdar, dîsa şikir". Lê Hesoyê kalemêr hate rûyê Nado got:

-Lawo, Xwedê rûyê te sipî kê, şîre diya te, keda bavê te li te helal be! Tu boy ewledên kurdên nefikirî bûyî pêşewîtê<sup>3</sup> ewilîn, pêşiyê tu ser qeşa çemê kûr î ber ra derbaz bûyî. Îdî gelleka çav dane te, xwe xwendinê girtine. Lawo, temîke min kalemêrî, rîspî ji bîra xwe dernexe. Timê bicedîne bibe piştovanê lawê miletê xwe. Tu wexta navêje<sup>4</sup> eva qewim e, eva wêliya me ye. Bila boy te gişk bibine qewm, wêlî, hizkirî. Te hew nihêrî ji cîkî xerîb î usa yekî derê te vekir, wekî ew paşê dikare bibe rênîşê<sup>5</sup> milet. Lê tu dêrî ser wî da bigirî, wekî usa ne tu dêrî ser gişka da digirî. Lawo, emir, tebiyet berê berê da usa hatiye avakirinê, gofî yek bibe piştovanê yekî, wekî reş ji sipîtayê bê kivşê. A, tu li çiyayê here mezin mêze ke. Tu yê bivînî, pêşa wî çiyayê bilind pê da pê da bi çiyayê biçûk, bi tonika<sup>6</sup> va hatiye wergirtinê, usa nîbe, ew çiya yê bihedime, jor da bê xarê.

Nado xar bû hate destê wî û got:

-Apo, sond dixwum, ez tu gava pêşiya ronayê nagirim. Ez ku bizanibim, kur, keça filankesê gavekê ber bi riya emirê rast davêje, ez ê dest bidime destê wana, milbikutime milê wana. Lê pirseke min heye:

-Kerem ke?

-Bi zanebûna min te li Romê xwendiyê?

-Erê. Min orta okul (mekteba navîn) dixwend, Dersaxana heyşta da bûm. Ez ji mektebê derxistim. Çima?

1 **beletdar:** kesê beled û zana

2 **deyîl yekî kirin:** deng li yekî kirin, hişyar kirin

3 **pêşewît:** kesê ku piyên wî şewitî ne

4 **navêje:** nebêje

5 **rênîş:** kesê rê nişandayî, rênîşandêr

6 **tonik:** girik, bilindahiyên piçûk

Dersdarê edebiyatê spartin da me, wekî em mal-serbest' derheqa welat û derheqa "ziman" da binîvîsin. Hevokên wê nivîsarâ min îro jî bîra min da ye. Min aha nivîsîbû: "Eva çendî çend sal e, ku devê me kurdan bi bizmik e, çepilê me bi qeyd û cîdar<sup>2</sup> e. Li ser axa welêt awayên bilind, odê fire bona wan in, bona me binerd, quncikê tarî ye. Rengê me timê sipîçolkî ye". Bona vê nivîsarê ez ji mektebê derxistim. Pey wê yekê ra, çend sala şûnda, çawa dibên, dunê hev ket, malbeta me jî tevî koçberên kurdan derbazî vî alî bûn.

Roj pey roja derbaz bû, îdfî sê roj mabûn Nado vegere bajêr, însîtûte, lê serhatiya "Gulîzer û Hebûn"ê hê hîn nebibû. Berêvarekê ew li nava gund rastî apê Heso hat.

-Lawo, -Heso got, - êvarê were mala me. Car cara lawîk, keç-bûk êvar êvar beravî mala me dibin, şayê derbaz dîkin, ez jî wana ra, çîrok, bûyerê vê dunya bêbin dibêjim. Lê xwestineke min e mezin ew e, wekî yên mîna te ji merivên mîna min, çîrok, bûyer, beyt-serhatî, kilamên gelê xwe binîvîse, xweyî ke. Welleh, em mezin ji dunê çûnê şûnda, kesek ê tunebe bende kilam bêje.

Heso aha gotinê, Nado şa bû, te hew zanibû ewî tiştêkî pirr hêja unda kiriye, naha dît. Lema jî bi şabûn got:

-Apo, ez ê ese bêm. Lê min dixwast bizanibûya, gelo hûn bûyera "Gulîzer û Hebûn"ê dizanin.

Hesoyê nêzîkî 80 salî mîna xortekî reng vebû, ber xwe da vebîşîrî û got:

-Lawo, apê te hemû tiştî dizane. Lê tu min ra ya rastê bêje, binihêrim bengiya te heye, erê? Qe şerm meke, pirsra here sereke emir da ew e. Ez ê ji emirê xwe te ra surekê vekim, tu bûnê ulmdarê mezin, binê tu dikarî wê surê şirove kî. Ew çi ku ez ê te ra bêjim bi hişê min ew qunceki ulm î tarî ye.

Du mirovan rex hev nava gund ra gav dikirin. Yekî rojên meha, sala kiribû gewlez, avîtibû piştî xwe. Wî gewlezî da moriyên reş, sipî hevpiçilikî bû, lê yê dinê hê mala emir ava dikir, tora dawiyê dihûna û kesî nizanibû, çi morî-mircan ê wî bendî ra bê derbazkirinê.

1 **mal-serbest:** li malê bi awayekî serbest

2 **çidar:** zincîra ku pê ajalan girêdidin; kap, tewl



Ewana rex hev gav dan û hatin derketine serê gund. Wê wê da topikê' gewir, ji topika wê da rêzên çiya bûn. Heso li vê derê berbirî Nado bû:

-Lawo, were em herine ser topikê han î gewir, rûnên û te ra sura dilê xwe qal kim.

Nado û Heso gihîştine serê topik, ew wê deqîqê ser keviyekî bilindî rûnişt û got:

-Lawo, dara dilê min da, jiyane da du tişt bi ziyaret in. Yek welat, yek dê-bav. Ez van salên paşwextiyê zû zû tîm, ser vî kevirî rûdinem, berê xwe ber bi Çiyayê Agirî dikim, êpêcekî wî ra dihevilim, dilê xwe rehet dikim û radibim diçim. Rast e ez ji wî çiyayî gellekî gellekî dîr im, lê ez rind zanim, vê demê berê min ber bi wî çiyayî ye û ez çî dibêjim ew dibêze. Min tu anî vira, ber vî çiyayê ziyaretî, wekî te ra sura emirê xwe vekim, paşê tu zanî, Agirî zane ...

Heso aha got, xitimî, kela wî tijî bû, lê xwe ser hev da civand, dûmayîn da derd-kulê xwe:

-Lawo, îdî ez qilozî çiyayê emirê xwe bûme, dinihêrî hetanî derketim vî topikî bîna min hate çikandinê. Îdî ez ne ew im, wekî hevraz bim, ya min derbaz bûye, dadigerim. Naha dor dora te ye. Hevraz ya te ye, berjêr ya min e.

Nado jî pêşberî wî rûnişt. Heso carekê vejerî dora xwe nihêrî, te qey digot dinihêrî ka binê kî heye, kî tune? Dû ra çavên xwe kuta Nado û bi dengêkî westiyayî got:

-Lawo, min emirê xwe da du zerî hiz kiriye. Yek wedê ezî 19-20 salî bûm. Ez û meta te Zînê gihîştine mirazê hev û ji 50 salî gellektir me bi helalî hev ra derbaz kiriye. Wedê ez î 30-35 salî bûm min careke dinê yek hiz kir. Hubeke netemirî bi min aliya. Vira Nado zefta xwe neanî û pirsî:

-Çima, apo, tu du cara zewiciyî?

-Na, na, lawo. Du cara zewac ne şênê mêran e. Zanî merî çî gavê du cara bizewice, dema lê dît jina te pê şimitiye, erê lawo, yanê berde, yanê bukuje.

---

1 **topik:** bilindahiya sivik, ji çiyayî piçûktir

-Bibaxîşîne min navbirîn' da axaftina te.

-Xwede bibaxîşîne, tiştekanabe. Erê, lawo, wedê ez î 30 salî bûm, wedê îdî du xizanê min hebûn, ez rojekê çûme cîkî mayîn mêvandarî. Hema dema bûka wê malê dîtinê, ez nerihet bûm. Xwûdaneke germ hate eniya min.

Wê şevê qe xew nekete çavên min. Dêmê we, bejin-bala wê ji ber çavên min nedîçû. Porê wê, guliyên wê usa reş bûn, te qey digot qetran e, lê tûncika wê bi têtê hinekî sipî, hinekî zer va, reş va tevî hev bûbûn. Lawo, eva nezîkî pencî sal e ew dilê min da ye. Bi hişê min, hemû wênekêşê dunyayê beşder bikî û bêjî, wekî gişk rûnên wêneye vê bûkê bikişînin, qe bawer nakim ewana tişteki hasil kin. Çima? Ji ber ku ewa ji ber qelesa Xaliqê Alemê derketiye. Bi reza dilê min Xwedê rûniştiye mîna wênekêşekî herî rind, wedekî dirêj, ji roja xuliqandina însîn dest pê kiriye bejin-bala wê, navmîla pehn, navkêlka zirav, dêmê bedew, guliyê dirêj e heta gûzikê nitirandiye. Paşê ruh daye wê, paşê gotiye wê:

-“Kerem ke keça min, pê bavêje emir. Min tu bedewîk bona nefsa te nehêvişand<sup>2</sup>. Kî zane, ez careke dinê yeke mîna te buxulqînim, yanê na?”

Rast, rast Xwedê her tenê wênekê kişandiye, nitirandiye, ew jî wêne wê bûkê ye. Lawo, pey vê kirina Xwedanê erd û esman ra îdî bende çi dikare bike. Bende çi kare ye, wekî çi ku Xwedê xuluqandiye, paşê jî ew bêje ez jî heme.

Kalê usa bi bawerî, usa cî bi cî diaxifiya, Nado bêgav mabû. Xwe xwe ra digot: “Hela binihêre dunê da ecêbê çawa hene? Pêncî salî hub-hizkirinekê dilê xwe da xayî kî, tu kesî ra tişteki nebêjî”. Lema jî pirsî:

-Apo, bibaxîşîne, te qe dilê xwe ber wê venekir? Qe hûn rastî hev nehatin? Ne dibên tu xortekî bedew bûyî. Hema naha tu kalekî qemer î kişmiş<sup>3</sup>.

1 **navbirîn:** navbir

2 **hêvişandin:** kêmasî kirin, teksîr kirin \*\*\* **nehêvişandin:** kêmasî nekirin, teksîr nekirin

3 **kişmiş:** 1. mêtewij 2. rengê reşolekî

-Na, na lawo! Tu rind bizanibe, wekî ez rastî wê bihatama, tu wexta hub-bizkirina wê nedibû birîneke bêderman û eva çendî çend sala dilê min qul nedikir. Nizanim dilê mêriv da hêlûna hub-hizkirinê cî-war dibe, yanê na? Lê ez rind zanim, wekî ji wê rojê şûnda dilê min da hêlûna şewatê, agir-alavê cî bûye! Ew hêlûn her ez çûnê axa sar wê hilşê<sup>1</sup>. Tenê carekê destê min destê wê ket. Em mala wan da beşter bûbûn.

Ez ber roderê rûniştibûm. Ewa mêrê xwe va diçûne mala bavê wê zeyîtiyê<sup>2</sup>. Tora <sup>3</sup>stûyê wê, gustîlên wê ber pencerê bû. Ew mêrê xwe pêşberî min sekinî, ewê got:

-Heso, bira wê torê, wan gustîla bide, em ê herin.

-Ez rabûm, min tor û gustîl hilda dirêjî wê kir. Êmê deqîqekê tiliyê wê nava destê min da ma, ew ê li min nihêrî, min jî li wê. Ji wê rojê vir da germaya kefa destê min kê mabe. Ro ewqasî giraniya wê hub-hizkirinê nakeve ser min. Lê şeva ... Carina, min tirê, agir girtiye tilî-pêçiyên min, ji neynûkê min birûsk vedidin. Destê xwe dikime bin lihêfê tişteke nabe, destê xwe dikime picenkê xwe dîsa ew hewal e, tiliyên xwe dikime devê xwe, agirê tiliyên min xwe davêje dil-hinavê min, îcar destê min rehet dibin, hundurê min agir-alav digire. Heta wextekî şevê kêlek kêlek weldigerim.

De, min got, wekî roja min ewqasî cizaretî<sup>4</sup> nedikişand, lê şeva di xwe da diheliyam. Xew nedikete çavên min, wextekî razanê şûnda min besta va xeber daye. Min nihêrî paşê li mala me, diya min e belengaz, rehmetlêbûya jina min dikirine pistepist derheqa min da çi dibêjin, çi nabêjin Xwedê dizane, paşê xûşka min jî bû şîrîkê vê “nexweşiya” min. Çendekî şûnda sura “nexweşiya” min ji nava her çar dîwarê mala me derket, li malên cîranên geriya, ji wir jî çû der-cîrana, hêdî hêdî malên gund geriya, paşê hemû gund pê hesiya, wekî ez nexweş ketime, şeva besta va dikime bilebil, teptepî<sup>5</sup> bûme.

---

1 **hilşê:** hilweşe

2 **zeyîti:** dab û nêrita ku keça mêrkirî diçe serdana malbavana xwe

3 **tor:** gerdenî, kolye

4 **cizaretî:** ceza, eziyet

5 **teptepî:** kesê ku ji bestan diaxive

Dû ra ez pê hesiyam diya min e rehmetlêbûyî diçe ser mellan, şêxan min ra dide nihêrandine<sup>1</sup>, nivišta, bazbenda<sup>2</sup> dide nivîsarê. Lê çi feyde “nexweşiya” min qe qenc nedibû.

Rojekê diya min e qertel<sup>3</sup> gote min:

-Vî gundê cîran mellek heye, were min qurbana bejina xwe ke, em tev herin te ra bidine nihêrandine. Min çiqasî got, wekî tişteki min tune, lê nebû. Min tê derxist diya min roj bi roj ji destê xwe diçe, kerreker hesira dibarîne. Rojekê razî bûm, min got, bila dîsa birîn dilê dayîka min e şkestî nekeve.

Em ji gund derketin. Dayîkê da pêşiyê, min da pey. Rê va dayîka min zû zû vedigerî li min dinihêrî, digot ka binê ew pey min tê, yanê Xwedê neke, belkî tepe wî bigirin<sup>4</sup>, ew nişkê va paş da vegere, bireve. Carekê jî ewê vegeirîne, li min niherîne, min dît ewa hêsira ser dêmê qerçimek da dibarîne. Min destê wê ye germ kirine nava destên xwe, hesirê çavên wê paqîş kir û got:

-Dayê can, dayê, welleh ez î ne nexweş im, tu ber xwe nekeve. Rast e, hûn dibên ez şev xwe xwe ra diaxifim, vediciniqim, lê tişt nabe. Lê de tu were gilî-gotinên min berga tişteki nedigirtin. Ewa nava dunya tirs-xofê da bû, ewa ditirsiya min jî unda ke.

Hetanî em çûn gihîştine gund, ez ber dilê wê da hatim, min wê ra henek kir û lêbelê, ewa kerrekerr<sup>5</sup> di dilê xwe da digiriya. Em gihîştine mala melle. Keçikekê em birine odekê, em ser kulavê xurustanî<sup>6</sup> rûniştin. Êmekî şûnda yekî bejinbilind, kitêb dêst da hat, selam da, çû jorê rûnişt. Melle li min, diya min nihêrî û got:

-Lawo, pêş da were.

Min ji axaftina wî aha fem kir, wekî diya min pêş da hatiye vira û derheqa nexweşiya min da qal kiriye.

1 **dayîn nihêrandin:** jê re nivîşt dan nivîsandin

2 **bazbend:** nivîšta çargoşe qatkirî ya diavêjin bazûyan, milan

3 **qertel:** 1. cureyekî teyran e 2. belengaz

4 **tepe wî bigirin:** cinê wî werin û pê bigirin

5 **kerrekerr:** bêdeng

6 **xurustanî:** cureyekî kulavên ku ji livaya biharê tê jenîn

Ez rabûm hatim pêşberî melle rûniştim, ewî destê min î rastê kire nava destê xwe, kefa destê min nihêrî, vir da wê da destê min welgerand û got:

-Xorto, şukur tu yî aha yî bi dest î - pê yî, bedew î, rind î çi bi te hatiye? Qe xwerina te çawa ye?

Berî min diya min bersiv da:

-Melle, ez qurbana te me, van rojana ew lap kê m duxwe. Min dengê xwe nekir, nexwest xatirê diya xwe bikevim. Ji ber ku min nan, xwerek bimehde dixwer. Tenê ez carekê satircemî bûbûm, wana ew nexweşiya min jî "bestebebûn"<sup>1</sup>, min ra, "teptepî"<sup>2</sup> ya min ra girêdidan.

Lê, lawo, ser vê nexweşiyê tişteki hatiye serê min qe kê ra bêji bawer nake.

Ez nexweş ketibûm, min tişteki neduxwer. Rojekê, gava şivê diya min hat kêleka min rûnişt, dest stûyê min ra bir, ber min geriya û got:

-Lawo, min dora serê xwe bigerîne! Min xwerekêki avînî<sup>3</sup> pehtiye, were ser xatirê dayîka xwe çend kevçiya bixwe.

Min dixwest seba<sup>3</sup> xatirê diya xwe çend kevçî avsîrê buxum. Lê mehdê min tunebû, gewrî li min hatibû xitimandinê. Lê nişkê va horiya min hate ber çavên min. Mehdê min vebû.

Ez qayîl bûm. Diya min şa bû, rabû gazî bûkê kir, teme da xûşka min, wekî destexanê vekin, yek xwerek bîne, yek nîn bîne ...

Heta wana destexan anîn raxistin, ez jî rabûm, min ser çavên xwe genc kir, hatime ser destexanê. Welleh, bi erd-esman kim, wextekî min nihêrî delala, ku ez pê dinalim, derî vekir, hat çok kuta çoka min, rûnişt. Diya min taseke mezin tijî kiribû, welleh, kevçik min hilda, yek wê hilda. Bû şingeşinga bazinê zenda zer, kevçiyê wê kevçiyê min diket û evê yekê ruh ber ruhê min da anî. Min ew xwerek gişk xwer, neferê malê şa bûn. Welleh, bi qesemê Xwedê kim, heta roja îroyîn jî, car cara min xwerekê avînî xwerinê, ewa jî kevçiyê xwe hildide tê, pêşberî min rûdinê, kevçî xwerek ez duxum, yekî jî ewa. Erê, lawo, melle destê min kire nava kefa destê xwe û got:

---

1 **bestebebûn:** ji xwe re axaftin

2 **xwerekêki avînî:** xurekê avkî, avsîr

3 **seba:** ji bo

-Ez aha dibînîm tişteki xort bi tirs tune. Ez ser tişteki şikber im, xort ser yekê bengî bûye.

Ez soromoro bûm.

Dîsa diya min kelimî:

-Na, lo, ez qurbana wê kitêba destê te me, tu çi dibêji? Ew î zewicî ye, du zarên wî jî hene. Ewledê min ji destê min diçe, hûn heneka dikin.

Melle tişteki negot, belge kaxiz derxist, sê nivîşt nivîsî da diya min. Paşê min ra got:

-Xorto, rabe derê derva.

Min tê derxist, melle bal min naxweze bêje, diya min wan nivîšta çawa bike, êmê du-sê deqîqa şûnda em ji mala melle vegeftine gund.

Vira ape Heso navbirî da serhatiya xwe ye bi ecêb, çavên xwe zûr kir nihêrî, êpêcekî nihêrî, paşê kuxiya û got:

-Lawo, hema hêcka ewa û Çiyayê Agiriyê hatine ber çavên min. Ewê baqe kulîlk berav kiribû û dixwest direjî min ke, dûr va dengê gullekê li me tesele bû. Hela neyar î heşiyar e, ew î bi çek e, ez î destevala me. De Xwedê me ra jî kerîm e. Xorto, rind bizanibe, binihêre neyarê me kurdan çiqasî xwînxwer in, xewnê da jî nahêle em kulîlken çiyayên ziyaretî bidine hev.

Ewî dîsa xwe kerr kir. Nado jî xwe xwe ra got: "Hela binê bin sîngê vî kalemerî da çi heye, çi tune? Dunyake mezin, sûreke nebiniyayî xwe wir da cî-war kiriye? Ev yek di pirtûkekê da, duda da nayê reşevêkirinê". Ew bi hesreta Agiriyê dinale, giraniya Agiriyê û ya wî yek in, ji ber ku merî her tenê ewî dikare himberî Çiyayê Agiriyê bike. Sere Çiyayê Agiriyê timê bi dew-doza bûye, emire wî jî nava agir-alavê da şewitiye, heliyaye, dihele". Nişkê va dengê apê Heso î giran ew ji mitala qetand:

-Lawo, îdî ez rispiyê êlê me. Belkî jî îdî ev yek ne cayîz e bêjim, lê ez dixwezim tu sura jiyîna min bizanibî. Ewê yekê jî bizanibî, binê min çi kişandiye, lê ji nan xoya xarî derbaz nebûme.

Ew bûka, bûka destebirakê bavê min bû. Eva yek. Ya duda min mala wan da nan-xoyê xaribû. Go, dizekî welêt î herî eyan şevêkê

---

1 **reşeve kirin:** bûyereke tarî derxistin ber ronahiyê

hate mala dewlemendekî. Ewî dizî bi hevalê xwe hemû tiştê dewlemend hilda, wekî derên, nava tariyê da, li ber pencerê dît tiştek dişuxule. Ewî çû ew tişta da destê xwe, xwe xwe ra got, “Hebe, tunebe eva lal-dur e”. Lê şikber bû. Hilda ew bîn kir û zimanê xwe lê xist. Diz tê derxist ew xoyê ye. Pey vê yekê ra ewî dizê hevalê xwe ra got, wekî serê çirê vêxin. Xwedanê malê heşiyar kir û gotê:

-Ez filan diz im. Dinihêrî min hemû hebûna te berav kiriye, lê min mala te da xoyê xar, bêje bila nîn jî bînin, buxun û em bibine dostê hev. Naha te derz kir, min çima wê delalê ra tiştek negot û eva çendî çend sal e wê surê, wê hubê dilê xwe da digerinim. Erf-edetê gel erdê nexistiye. Min roja roj xwe xwe ra got: “Ez mîna gênim sêlê da biqelim, mîna rûn bihelim, bivme tojen<sup>1</sup>, dîsa ji riya xwe dernayê”. Dawiyê da dixwezim te ra bêjim, wekî tu kê hiz dikî, hiz ke, lê usa bike ewa heta hetayê bibe stûna mala te. Pirsra stûnê çîroka “Gûlîzer û Hebûn”ê da rind hatiye dayînê. Lawo, şeva derbazbûyî min dîsa xewnek dît. Wekî wê xewnê hineka ra bêjim, vî emirê xwe da ez ê rûmeta xwe erdê xim, him jî kesek ê bawer neke.

-Apê Heso, -Nado bi lavayî got,- wê xewna xwe jî bêje, yek e ez tu kesî ra nabêjim. Lê diqewime demekê ez bi ulmî wê yekê va mijûl bim.

-Lawo, kî bawer dike, bila bawer ke, kî bawer nake, ew dizane, yek jî dergê Xwedê. Bila ew here ber dergê Xwedê û pirs ke: “Ev çi sur e?”

Lawo, şeva derbazbûyî min xewnê da dît, ez û ewa odekê da ne. Em ciwanên wan rojan in. Cî-nivînê wê fêza odê, ya min ber dêrî hatiye danînê. Ewê kirasek û hevalkirasekî sipî xwe kiribû, por, guliyên xwe ye reş ser da berdabû. Rabû bejin-bala xwe nîşanî min kir, nava malê da fitilek da xwe û bi tiliya va gazî min kir. Hetanî ez çûm gihîştîme cî-nivînê wê, çend cara erdê ketim, ez mîna zaran çalepiya çûm gihîştîme wê. Min ewa hemêz kir, xwest wêya ramûsim, nan, xoya mala bavê wê hate ber çavên min, hej bi min ket, dest li min ricifî. Nişkê va hêsirê berê çavên min bûne mîna ava kanîke zelal û dilop

---

1 tojen: ariya tiştê şewitî

dilop dilopî ser dêmê wê bûn. Nişkê va ew dilopê hêsirê min bûne birûskê êgir û avîtine rûyê min. Êgir ez hildam. Ez di agirê xwe da gellekî şewitîm, hindikî şewitîm, nizam, ez veciniqîm, hişyar bûm, wekî xewn e. Xwezila ewa xewn nîbûya, ez di xwe da bişewitiyama û bibûma xweliya ber piyê wê”.

Vira ewî xwe kerr kir, gavekê şûnda destê xwe ber bi erşa bilind kir û got:

-Ya Rebî! Heta te ruhê min ji min nestandiyê xewnê aha zû zû têke para min, yanê na, ditirsim kînora dilê min neêşe, wê demê dilê min bisekine.

Pey van giliyan ra ew rabû û milê Nado girt, got:

-Rabe, em herin, îdî piyê min qerimîn. Lê ma bûyera “Gulîzer û Hebûn”ê, êvarê were mala me, binê dunê da çi heye, çi tune, çi qewimiye?

Ewana ji topik çend gava dûr ketibûn, Heso got:

-Min dixwest evê surê xwe ra bibime axa sar. Niqutiye dilê min, ez rind zanim, wekî tu yê bibî merivêkî mezin, a wê demê rûnê verevurt bike, binê dunyayê da çi diqewime?

-Apo, nedibû, te carekê ewa bida serwaxtkirinê.

-Na, na. Te ku gilî got, gotî tu bibî xwedanê giliyê xwe. Eva yek, ya duda, ne min got, min nikaribû nan û xoya xwerî pêpes kira.

Paşê ewî serê xwe bilind kir, erşê ezmîn mêze kir û got:

-Bismillahî Rrehhmanî Rrehîm!

Nado ser vê kirina kalê ecêb ma.

Kalê ev yek derz kir, loma jî got:

-Tu usa nizanibe hema ciyê sekinî ez ebabetiyê<sup>1</sup> dikim, na. Tu hela cîwan î, rind bizanibe ew kesê wê ji Quranê hewal bide gotî berê bêje:

- Bismillahî Rrehhmanî Rrehîm!

Lawo, sûreyê Quranê yî sisiya, benda duda da tê gotine, wekî ji Xwedê pê ve tu Xwedê tune! Yê sax û avadîn Ew e! Lê boy nefsa min xênî ji wê bedewê tu kesek tune, ewa bedewa vê dunê û wê dunê ye.

---

1 ebabetî: duakarî



Boy vê gotinê bila Xwedê Mezin min efû ke, efû dike, bila efû ke, na, ez mirinê şûnda, bila heta hetaye min nava êgir da bişewitîne, nav beroşa qetranê da bikelîne.

Ez wê yekê jî dizanim, ku vî emrê xwe da hemû merivên dunyayê beşder bikim û şewata dilê xwe wan ra bêjim tu kesek min rind fem nake.

Eva yeka sureke mezin e. Tu kesek nikare nûqî nava vê surê be. Her Xwedanê Mezin zane ev çi sur e, her Ew dikare vê surê şirove ke. Ez xulamê Wî, xweliya ber piye Wî bim, Ew ewqas surê dunyayê xweyî dike, yek jî sura dilê min e. Eva pêncî salî zedetir e, wekî ez miqabilî Xwedayê xwe şer dikim. Ewî hey dixwest ez ser nanê xwerî ra pêpes kim derbaz bim, min wê demê ruhê xwe, hub-hizkirina xwe, çawa çîrokê da dibêjin, kire şûşeke neşkestî, dev girt, davîte behrê. Ez wê demê bûme tişteki mîna bê ruh, bê xwîn, bê goşt. Min bi vê kirina xwe va qewata evîndariyê zeft dikir, qeyd dikir. Ewê zeftkirinê dilê min misqal misqal xwer, ewê qeydê çawa derziyê bedena te ra kin, a usa destê min ra, piye min ra diçûn, carina sehet-qewatê dike-tim, carina jî hêz dihate min. Di wê rojê da du hêz hundurê min da miqabilî hev şer dikin. Ewana li hev aliyane. Yek hey dixweze destê min bigire bibe wê dinê, lê ya dinê hey pêşa min girtiye, vê dunê dide gerandine, lema jî îdî ber bi nodî diçim.

Lawo, dostî jî rewşeke dunê ye. Ez çend sala ji bavê te mezintir im, lê em dost-birê hev in. Yek heye bibî dost, destebirakê hev, lê yek jî heye bibî dost-birê hev, tehma vê cuda ye, cuda. Gava bira him jî dibê dostê te, wê demê, rojê şayê da jî, rojê şîne da jî tu bilind dibî, digihîjî bandeva<sup>1</sup> çiya. Jiyanê da aha bûnê tu hew dizanî, tu timê “Duqerse” direqisî.

Nado pirsî:

-Apo, “Duqerse” çi ye?

-Xorto, ew navê qeydekî govendê ye. Wêya her tenê mêr direqisin! Xêr-xweşî dewata te da em ahil ê govendekê bigirin û Duqersê bixingirin.

---

1 **bandev:** lûtke, zîrwe

Nado ne ku bi dilekî şa, lê bi hezar dilê şa va xatirê xwe ji apê Heso xwest û ber bi malê çû.

Evarê mala apê Heso meriva va kimkimî bû. Hinek her êvar dihatine vira, hinek îşev hatibûn, wekî dîsa Nado bivînin<sup>1</sup>. Emirê înstîtûtê ra bibine nas, him jî guh bidine bûyerên gelê kurd, yên dewlemend. Apê Heso li jorê ser kulêv rûniştibû, palê xwe dabû balgî. Gişk çawa dibên, cî-warbûnê şûnda, ewî balgî ji berpala xwe<sup>2</sup> hilda, danî ber dîwêr û piştê xwe kutayê, got:

-Îşev ez ê we ra qewimandina "Gulîzer û Hebûn"ê bêjim.

Nihêrî Nado hinekî dûr rûniştiye, vegerî gote xortê kêleka wî rûniştî:

-Lawo, tu Nado ciyê xwe bugaherin. Bila Nado bê rex min rûnê û çîrokê binivîse, mirin heye, jiyîn heye. Ez dixwezim, nîşanek ji min bimîne. Gotî paşê hûn jî ewledên xwe, neviyên xwe ra qal kin.

Nado kaxiz, qelem hilda û hîviya wî bû, ew bêje, ew jî binivîse.

Apê Heso dest avît simêla xwe mizda, paşê dest kişande bijangê xwe û bi lewzekî şîrîn dest bi buyerê kir:

-Go, li weletê Muqurezemîn<sup>3</sup> merîkî gellekî dewletî hebû, jê ra digotin Nîvpadşah. Ji Xwedê bû, ji benda bû ewledê wî nedibûn. Ewî ber Xwedê çok vedida, diçû ser şêxa, mella, tesequt<sup>4</sup> da, wekî jê ra xizanek bibe.

-Apê Heso, -yekî pîrsî, -bibaxşînin, xizan çî ye?

-Lawo, xizan, yanê zar.

Go ew rojekê rastî remdar<sup>5</sup> hat. Remdar got:

-Nîvpadşah, nê bike, wekî te ra keçîkek bive, mezin bûnê û ewa kê bixweze tu gotî na-na nekî. Nîvpadşah got:

-Remdar, ez sond dixum, bila nêta min bê sêrî<sup>6</sup>, ez ê gotina te bikim.

1 **bivînin:** bibînin

2 **ji berpala xwe:** ji ber piştê xwe

3 **Muqurezemîn:** di çîrokên kurdî de navê deverêkê, wekî Çiyayê Waqilwaqê

4 **tesequt:** teseduq, xêr \*\*\* **tesequt da:** xêr belav kir

5 **remdar:** remldar; falbêj

6 **hatin serî:** pêk hatin, rast derketin \*\*\* **bê serî:** pêk were, bibe rastî

Go, ji Xwedê bû, ji benda bû, bedena jina wî hêşin bû, ewa neh meha, neh roja, neh seheta şûnda raket<sup>1</sup>, jê ra keçikek bû. Navê wê danîn Gulîzer. Bona xwendinê Nîvpadşê heft saliyê da Gulîzer danî ber destê loqmana<sup>2</sup>, ber destê mamostan.

Keçika te ro bi ro bi fem, bi zane bû. Meh meh mezin dibû, sal bi sal dibû hîva çardeşevî.

Gulîzera te hat gihîşt, bû keçikeke te gotî. Kulê tu mala bedewê, guliyê dirêj, çavên belek, bejina bi qametî<sup>3</sup> nekevî. Kê ewa carekê didît digot, xwezila ez wêya careke mayîn jî bivînim, mirin emirê Xwedê ye.

Ewa hat gihîşt, bû keçika kezî. Kê dihat ewa dixwest, ewê tu kesek begem nedikir<sup>4</sup>.

Rojekê bavê gotê:

-Delala min, wedê te yî mêra ye. Were ya xwe min ra bêje?

Go:

-Bavo, ne te nêt kiribû?

Go:

-Belê.

Go:

-Qewlê<sup>5</sup> min ev e. Li rasta bintara mala me avayîkî du qatê çêke, dorê bilind bilind bi çarmedorê bide hilçandinê. Paşê ez ê nêta dilê xwe bêjim.

Îcar Nado giliyê kalê birrî û bi hurmet pirsî:

-Apê Heso, bibaxşînin, çarmedor çi ye?

-Lawo, Xwedê bibaxşîne, we çi nizanibû bipirsin. Çarmedor bi rûsî “zabor”, bi tirkî, “çeper” e.

Paşê apê Heso qelûna<sup>6</sup> xwe tijî titûn kir, xortekî qelûna wî vêxist. Ewî çend qulap<sup>7</sup> qelûnê xist û dûmayîn da bûyera xwe:

1 **raketin:** (jina ducanî) hemla xwe danîn, zarok anîn

2 **loqman:** zanayên gelêrî, hekîm

3 **qametî:** (tenê ji bo bejnê) dirêj

4 **begem kirin:** ecibandin

5 **qewl:** 1. soz, gotin 2. biryar

6 **qelûn:** darikê ku pê cixare kişandin; darcixare

7 **qulap:** kişandina bêhnek ji cixare an jî qelûnê; bêhnefişk

-Go, keçikê çawa gotibû bavê usa kir. Gulîzer xanima te bi berdestiya-cariyan, dergevan va çû wergê<sup>1</sup> xwe yî nûh. Paşê qewlê xwe got:

-Qewlê min ev e:

-Ez gotî xortekî herî dewlemend, dewletî bistînim.

Ev qewlê wê li her deran bela bû. Kî hate dîtina wê, kî nehat Xwedê dizane? Bi barê deva zêr, zîv hat; gotine wana, ev hindik e. Bi qeynterê deva zêr, zîv anîn, revoyê hespa<sup>2</sup>, garana dêwêr, keriyên pêz, li dor çarmedora xanmanê wê hêwirîn ewê got na, ev hindik e.

Ev qewil li welatê Muqurezemîn, ji wir li welatê cîran bela bû. Dîsa mal-dewlet, hebûna bi hêja kişiya hat, lê Gulîzer xanimê, got na, hindik e. Ev gişk bal min hêjayî bendikekî nîn e.

Çawa dibên, dunê hev ketibû: dê-bav nerehet dibûn, ne şeva wan şev bû, ne roja wan roj bû. Dewlemendên Kurdistana bêserobino, deste deste dihatin, diçûn. Tiştê nedihate çareserkinê.

Rojekê, rojê Xwedê xortekî bi kêfa te, bi bejin-bal, bi dest î pê hat dergê Gulîzer xanimê kuta.

Dergevan derî vekir û pirsî:

-Xorto, çi dixwezî?

-Ez hatime Gulîzer xanimê bixwezim.

Go:

-Çima te qewlê wê nebihîstiyê?

Go:

-Min bihîstiyê.

-Lê wekî te qewl bihîstiyê, rûto, hatî çî? Tê kivşê çarpêkê<sup>3</sup> te jî tune, wekî qe na peya nehatayî.

-Dergevan, ew ne şuxulê te ye. Go, here Gulîzer xanimê ra bêje, bê xortek hatiye aha dibêje: “Ez bi du çiya, bi qewlekî hatime huzûra wê. Çiyak ser pîlê min î rastê ye, yek ser pîlê çepê ye. Wekî qewlê min jî qebûl ke, stêrka me wê tev bişuxule”.

Belê, derge ser xort hate girtinê. Dergevan çû huzûra Gulîzer xanimê û xort çawa gotibû wî, ewî usa bi hûr gilî gote wê.

1 **werge:** wargeh

2 **revo:** hespê bezê; kihêl

3 **çarpê:** ajala çarpê; merkeb

Gulîzer xanim êmê deqîqekê, duda kete mitala, paşê gote dergevan:

Dergevan, here ewî xortî bîne huzûra min. Dergevan çûnê şûnda ewê tew-temûrî<sup>1</sup> da bejna xwe, guliye reş e dirêj şe kir, gulava heftê heft gula ser xwe da kir.

Xort anîn li odekê dane rûniştinê û gotin, vir sebir bike, hinekî şûnda xanim ê bê.

Vira ape Heso berbirî neviya xwe bû:

-Lê lê, sivika malê, bîna ber kalikê! Ca<sup>2</sup> rabe şerbike av bide min, gewriya min zaha bûye!

Neviyê rabû, wê deqîqê şerbik tijî av kir û direjî kalikê kir.

Ape Heso şerbik ji destê neviyê hilda û raberî beştera kir, got:

-Kerem kin, kê avê vexwe.

Gişka hev ra hev ra gotin:

-Efêt be!

Ewî av vexwer, şerbik direjî neviya xwe kir, got:

-Rinda min, hanî şerbik hilde. Ava destê te dilê min rehet kir.

Paşê dîsa dûmayîn da bûyera xwe:

-Hinekî şûnda teqînî ji dêrî hat, Gulîzer xanim û sê berdestiya va hate hundur.

Xort ji ber wê rabû û ciyê xwe da qerisî ma. Ewa bedeya<sup>3</sup> dunê bû. Êmekî şûnda xort serê xwe xanimê ra berjêr kir. Gulîzer xanimê got:

-Em zehf razî ne, xorto, gilî-gotinê te gotine min. Naha çawa dibên, desmalê ji ser siniyâ gilî-gotina xwe hilde, ka binê siniya dilê te da çi heye?

Xort got:

-Xanim, ez bi gorî, ez bi du çiya û bi qewlekî hatime dîtina te. Çiyak ew riya jîyanê ye rast e. Merî gotî xwe emirê-jîyanê ye rast bigire. Ew yek paşê mêriv ra dibe nav- dengekî bilind.

Çiyayê duda kara emir e. Merî dibe xwedanê çi pêşeyî bila bibe,

1 **tew-temûrî:** makyaj û xeml \*\*\* **tew-temûrî dan bejna xwe:** xwe çêkirin, ser û sîçeyê xwe xemilandin

2 **ca:** îcar

3 **bede:** bedew

lê hetanî rîdana te erdê keve gotî tu dîsa mîna zara çalepiya<sup>1</sup> ber bi wê kaş bî. A, wê demê tu yê derêyî serê bandevê<sup>2</sup>.

Vira xort xwe kerr kir, careke mayîn ji piya hetanî sêrî xanim mêze kir û got:

-Qewlê min jî ev e: Jin jî gotî bube stûna malê.

Gulîzer xanimê got:

-Jin ku heye stûna malê ye.

-Belê, -xort got,- wekî her du nîşanê min gotî, yek jî stûna malê ser hev da hatinê, ewana dibine xeleqe zincîra jîyanê.

-Ez te ra qayîl im -Gulîzer xanimê got,- tu rast dibêjî. Hebûna dunê ber vê yekî gûzeke kor e. Vegere, here xazginiya bişîne mala bavê min.

Apê Heso vira dîsa xwe kerr kir, paşê yeko yeko li rûniştiyan nihêrî û got:

-Hew. Min ev bûyera got, wekî her kes ji wê para xwe hilde.

Paşê, yên li êvariyê<sup>3</sup> beşterbûyî razîbûna xwe dane apê Heso, xatirê xwe ji wî xwestin çûn.

Rê va Nado hê fem kir Helîmê - hizkiriya wî çi xwestiye wî ra bêje. Dilê xwe da şa bû.

---

1 çalepiya: çarlepî, çarlepîka

2 bandev: lûtke, zîrwe

3 êvarî: şevbihêrk

### 13

Rojên ledê<sup>1</sup> jinên gund dahatin ser kaniyê kiraşoyî<sup>2</sup> datanîn. Ji çavkaniyê dûr pê da pê da beroşê avê datanîne ser kuçik, dikelandin, teşt datanîn û kinc dişûştin. Araviya<sup>3</sup> bi kefa çoxanê<sup>4</sup> dûrî kaniyê tevî avê ro da dikirin. Sabûn zû va tunebû. Kurden nefîkirî dewsa sabûnê diçûne bajonê, li bintara beroja, kolê çoxanê berav dikirin dianîn û bi wê hemû tişt dişûştin. Bineliyê hîmlî ew yek nedizanîn, ewana jî hîn bûn û diçûn çoxan berav dikirin. Bona wê yekê wana razîbûna xwe bi kurdan dlanîn. Wan sala, çawa digotin, sipî jî ser gel da dibarî. Lê kincê bi çoxanê şûştî mîna berfê çîl-qerqaş dikir û ji bîna çoxanê sipî qir dibûn. Bineliyê gund qazaxa digotin:

-Xwede kurdan ra be! Hatin, em ji “şerê sipiyan” xilaz kirin!

Vê roja lehdê te qey digot keç-bûk, jinên gund e navsere gişk e li ber kiraşoyê bûn. Seyran, keça xwe va wê da hatin, bintara gişka kiraşo danîn. Ew weşek bû jina kinc dişûştin. Gişka derpî-kiras, hineka jî kincên mayî dikelandin. Çawa jina hev ra digotin, îdî bi devê yekê; kinc şûştibûn, hineka şirît kişandibûn, kiras, hevalkiras

1 **led:** lehd, yekşem

2 **kiraşoyî:** 1. kincşûştin, cilşûştin 2. aman û alavên kincşûştinê

3 **aravî:** ava qirêj a ku ji ber şûştinê derdikeve

4 **çoxan:** cureyekî çêreya ku ji bo şûştina kincan jî tê bikaranîn

dar da kiribûn, hineka jî kincên dinê ye<sup>1</sup> reng bi rengî li ser çêreyê hêşîn raxistibûn.

Çend jinên navsere ber bi kiraşoya Seyranê hatin. Seyranê nihêrî jin ber bi wê tîn, teyşta kinca wê da dehv da, rabû destê xwe temûl kir<sup>2</sup> û gavekê, duda ber bi hatiyan çû. Jinek hate rûyê wê, got:

-Sehet be!

-Ser sera, ser çavan hatine!

-Lê lê, -wê jina navsere dîsa got, - çima aha qure bûyî, çima ber bi me nayêyî? Dibên, hûnê sibê-dusiva herine bajarê mezin?

-Meta, Hacê, -Seyran hate rûyê wê û got, - Welleh eva bîst sala zedetir e ez nizam qurrebûn çî ye. Min go, devekê, duda kinca bişom, paşê bême bal we. Lê mesela çûyîna bajêr rast dibêjin, nêteke me usa heye. Eva weke çar-pênc mehan e Mîro nikare bê mal. Me go, em herin serîkî wî xin.

-Erê, oxir be, herin, bila piçîkekî bîna te bê ber te.

Ewana hinekî dûrî kuçik, dev erqa kaniyê rûniştin.

Hacê jineke bi gotina te bû. Gişka wê ra qedir-rûmet datanî. Por-sipîke gund bû. Ewê ji serî hetanî dawiyê bejin-bala Seyranê mêze kir û got:

-Seyranê, ez dinihêrim tu çilmisî yî. Miqatî xwe be. Yekî mîna Mîro kurê te ye. Dibên, şukur li wir, navekî usa qezenc kiriye, gişk xwezilbûna xwe li wî tînin. Dibên, ew ji Nado paş da namîne.

-Meta Hacê, xwezila Xwedê ser ewled neviyên te be. Welleh, ez bi kînora dilê xwe nikarim. Nizam kînora dilê mirova da dertê, yanê na, lê ez dêran rind dizanim, dilê min da kînoreke serteşî<sup>3</sup> derketiye. Kînora dilê min, pizika ser zimanê min ew derdê undabûna Sanoye çavbelek e. Derd-kul usa li hev piçîlikiye rojê çend cara ji serî hetanî piya bedena min didine ber janê.

Dibên kînora derbûnê meriv rihet dibe. Lê eva çend sal in ne kînora dilê min derdibe, ne pizika ser zimanê min qenc dibe. De, xûşkên delal, hûn rind dizanin êşa kînora ser hemû eşan e.

---

1 ye: yê.

2 **temûl kirin:** tehfir kirin, bi aveke paqij şuştin

3 **kînora serteşî:** derdê bêderman, kula giran



Jinekê bi heyran li wê nihêrî, got:

-Lê lê, lê lê Xwedê neke êş bigihîje bedena mêriv. Jan, êşa birîna gişka yek e.

-Na, xûşkê, -Seyranê bersiva wê da,- were ez xûşka xwe ra me-selekê bêjim. Yeqîn hûn gişk derheqa “Kela Dimdim”ê da dizanin. Go, ew çendek bû, dujmin dora kelê girtibû, şer diçû. Rojekê Xanoyê Çengzêrîn pirsî:

-Kanê kurê min?

Gotinê:

-Xan sax be, kurê te nexweş e.

Go:

-Danê nîvro ez ê herime dîtina wî.

Xulama bersiv dane kurê Xano, lê tu bizanibe, bavê te wê bê dîtina te. Tu nebê kur kînor derxistîbûye. Ew xwe xwe ra dibê: “Bavê min bê bivîne, wekî ez bi destî kînorekê radi- zêm, wê bi min bikene”. Lema jî radibe bi şûr kefa destê xwe jê dike û dide girêdanê.

Bav tê dinihêre kurê nava cî-nivîna da ye, tê rûyê wî û dipirse:

-Çi bûye, lawo?

Bavo, destê min bi şûr hatiye birîndarkirinê.

-Ê, -got, - tu qey dibêj, tu ne kurê min î. Min jî hew zanibû te kînor derxistiye, rabe ser xwe, dujmin dora kelê girtiye, îro roja xîretê ye.

Jin gişk posîde bûn. Rengê wan xitimî, reş qemilîn, te hew zanibû her yek bûye ewrekî payîzê yî reş î xitimî û wexta<sup>1</sup> usa zîpik, baranê bibarînin erd û esman tev hev be.

Seyranê ev yek tê derxist û xwe xwe ra got: “Ka kula dilê xwe bi temamî bêjim”. Lema got:

-Xûşkên delal, kî dizane dizane, kî nizane, bila bizanibe. Koçên me nêzîkî bajarê Aşxabadê dane sekinandinê. Doxtir û esker hatine nava me. Doxtiran hîmlî zaran dinêhêrîn. Sanoyê min ava behrê vexweribû û zikê wî warimîbû, çavên wî sor bibûn. Doxtira li wî mêze kirin, hev ra çi gotin, çi negotin, nizam, eskerekî dada<sup>2</sup> kurik ji min bistîne. Ewî wê da, min vir da kişand. Esker sîngê min da bi

1 **wexta:** hema piştî çend xulekan

2 **dadan:** rahiştin

hêz lê da, min dîsa kirasê Sano va girt! Emirkinbûyê eskerekî mayîn jî hat û ewana mîna gurê serê çilla Sanokê min ji nava lepên min derxistin. Her tenê ji kirasê delalê min, pirtîkî weke kefa destê min bi destê min va hat.

Gelî xûşkan, min nelomînîn!<sup>1</sup> Ji we rojê da şevan bêxew, rojan nerehet im. Bêbîr<sup>2</sup> bûme, çi datîname ku, vedigerim nizanim ku ye? Şevkorî<sup>3</sup> bûme. Îdî hêsir ji çavên min nayên, hêsirê min mîna kaniya miçiqî miçiqiye. Guhê min ser denga, hesa ye; kî tê mal, min tirê bersiveke xêrê aniye, kî ji mal diçe, çavên min li rê diqerime, wekî ew ê bê û tiştêkî xêrê bêje. Lê roj dibine şev, şev dibine roj, çûyî vedigerin, kesekê melhemekê bide ser birîna min tune. Dilê min bûye sêla derd-kula. Li sêlê çiqas nan bê pehtinê ew dipêje. Lê sêla dilê min çiqas şîn-girî, derd-kul hebe ew ê hilde. Ji şîn-girî ewqasî dilê min werimiye, fire bûye, lê nateqe ...

Te qey digot, devê torbê derdê Seyranê vekirine, lema jî ewê dini-jand<sup>4</sup> nedini-jand xilazbûn tunebû. Dîsa ewa berbirî jina bû:

-Met, xatî, xûşkên min e qiyametê. Eva çend sal in ez xwe da dikewgirim nakewgirim, dihelim nahelim, dişewitim naşewitim, dikelim nakelim. Xwezila şevêkê ruhustîn bihata min ra bigota: “Ez hatime ruhê te bistînîm bibim, bikelînim, yanê jî biqelînim, têkme tevî ruhê Sanoyê te bila ew pêş emire te va jî bijî”, ez ê şa bûyama. Min ê çepik hilda bileyîsta û paşê bigota: “Ruhistîno, ez heyrano, ez xweliya ber piyê te, ez hazir im.”

Neşewitim, çawa neşewitim. Min neh meha ew bedena xwe da xayî kiriye. Sê sala ew bi ruhê xwe, bi şewata dilê xwe, bi şîrê xwe va xweyî kir, mezin kir. Ciyê sekinî van xêrnedîta êrişî “mala” me kir û mîna gurê birçî dadane min û kurikê çavbelek hildan, pekiyan. Min ew unda kir. Xwezil mirin hebûya, undabûn tunebûya. Undabûna tîfalê min, eva çend sal e hundurê min da mîna kozîkê dişewite.

1 **lomandin:** lome lê kirin, rexne kirin

2 **bêbîr:** kesê zû tiştan ji bir dike; bîroke

3 **şevkorî/şevekorî:** kesê ku di tarîbanê de baş nabîne

4 **nijandin:** 1. dîwar bi keviran dan ser hev 2. li hev anîn, afirandin, strandin  
3. derdê xwe vegotin

Ez carina tê derdixim, wekî ew kozî dixweze vêve, alafa wê min bihingivîne, min dêranê bişewifîne, têke xwelî, lê te tirê ew lepê telegreşa, ku Sano wê da kişandin, min vir da, nahêlin ew “hetabî” bibe qismetê min.

Îdî lêv li wê hejyan, dest avîte berpêşira xwe û tiştekan ji ber kurtik derxist, nîşanî jina da û bi kelogirî got:

-A, eva pirtîkî kirasê Sanoyê, ku destê min va hat! Eva bîst sale zêdetir e min ew kiriye nava vî pirtî perçê sor û rojê sê cara derdixim ser da digirîm û careke dinê dikime nava her du bistanên xwen<sup>1</sup>.

Hacê hêdîka ew ji destê dayîkê stand, danî ser çêrê hêşin û vekir. Ax felek! Ew pirtiyê ji kirasê sipî ewqas hêşir ser da hatibûne barandinê him zer bibû, him jî qulqulî bibû. Ne dibên, hêşirê dayîkê kevira qul dike, îdî ev perçê weke kefa destekî çi ye?

Wey dêranê! Vê şûnda, xêr-xweşî te barî, kevir-kuçik van jina. Derd tev derda bû, şîn tev şînê bû, beyt-kilamên şînê nava hewê da bûne pêlê roja reş.

*Were keko, bavê min,  
Unda bûye lawê min,  
Şikestiyê piştî min,  
Xwîn dirije çavên min.*

*Lo, lo, lo, ev çi çerx e?  
Yek î gur e, yek berx e?  
Were were, zû were,  
Ji zindanê min derxe.*

*Ev çi xwîn, çi hêşir e,  
Ev çi dil e, sebir e?  
Çima ewa sax maye?  
Yeqîn tat<sup>2</sup> e, kevir e.*

---

1 **xwen:** xwe

2 **tat/teht:** kevirê ku rûyê wî rast e

Jina êpêcekî şîn kirin. Çawa dibên, perça<sup>1</sup> dilê wan danî. Hacê hêsirê ber çavên xwe bi pêşa mêzera xwe va paqîş kir û got:

-Îdî bes e! Bi girî hê tu tiştêk hasil nebûye!

Seyranê dîsa, mîna her car, pirtîkê kirêş kire nava perçê sor û mîna tiberikê hilda, kire paşîla xwe.

Bûkekê av anî gişka destê xwe, serçavên xwe şûştin.

Hinekî bîna wan hate ber wan, lê te tirê, derd û kulê zemîn bûye kevir û dilê her yekê da hatiye dardakirinê. Wana tu tiştî nenihêrîn rabûn her yek ber bi kiraşoya xwe çûn, wekî çemîla kara rojê bigirin. Kincan bi kiraşoya dewrê bişon, aravê ro da berdîn.

Ew çend roj bûn malbeta Evdo karê xwe dikirin, wekî herin bajarê mezin. Jina ev gilî derxistibûn: “Bajarê mezin”. “Ciyê ku lê dixwînin, dibine dersdar, doxtir, bê bajarekî mezin e, bajarê ser bajara ra ye”.

Hineka, der-cîrana, xuzilbûna xwe Evdo, Seyranê dihanîn, hev ra digotin, “destê wan î xêrê ser serê me bê”, “Xwedê rojekê wê oxirê têke para me”. Alîkî meniya wan giliya ew bû, wekî hukmetê deh sala berê nedihîşt tu ji vi gundî herî gundê dinê, naha şukur rê vebûye, yek jî xuzilbûna xwe wê yekê dihanîn, wekî yanê ewledên wan, yanê neviyên wan herine xwendinê, ewana jî mîna van awa herine dîtina “dersdara”, “doxtira”, “înjînêra”<sup>2</sup>.

Xwezilbûna ha ra dibêjin, ya xêrxweziyê ye. Nava vê xwezilbûnê da qelptî, xweyîntî, çavnebarî tunebû.

Wî bajarî da Nado jî, Mîro jî dixwend.

Herekê tiştêk anîbûn, wekî Evdo, Seyran wana bigihînine lawikan. Qewm-lêzima jî par anîbûn; yekê hine rûn, yekê hine penêr, yekê çend hêk sor kiribûn. Kel-melê xwedanê malê hazirkirî bibû xurceke tijî.

Wedê wê îdî dêrî va derketana meta Rûbar derî vekir û hate mal. Eva hate rûyê Seyranê û guhê wê da çend gilî gotin û ewana tev derketine derva, ji wir jî derbazî, piş xênî bûn.

Gund-gundîfî Rûbarê ra digotin Metê. Mêrê Rûbarê sala 1939a birin, heta roja îroyîn jî ne deng bû, ne hes. Malê da ewa, kur, keçik

1 perç: 1. werm 2. keser

2 înjînêr: endazyar, mihendiz

mabûn. Çawa dibên, ew e bêkes bû. Kelo, Heso, biryar kirin, wê ra gişk bêjin “Metê”. Gişka ewa mîna metê, zarên wê mîna bira-xûşka hiz dikirin.

Li piş xênî Metê gote Seyranê:

-Xûşkê, tu serê zaran, ez ê ser vê oxirê te bidime sondê, lê nexeyîde.

-Mormorkê<sup>1</sup>, -Seyranê bi şirîn gote wê, - çima çi bûye, wekî ez sond buxum?

Qe tiştêk nebûye. Ez ê te ra tiştêkî bêjim, ez ê tiştêkî bidime te, lê gotî tu kesî ra nebêjî. De tu kî, tu vê rê kî, tu serê wî kî, ku diçî bal wî!

Metê tev hev bû, gilî-gotin tev hev dikir.

-Welleh, sond li mala me nayê. Me got erê-erê, na-na!

-Xûşkê, de wekî usan e bêjim.

Paşê ewê dest avîte paşila xwe, pêçekeke biçûk derxist û dîsa domand:

-Ez qe xwe jî nizanim ev çi ye? Vê berbangê Perînazê bi şermoke daye min, wekî tu bivî bidî Mîro. Ez bextê te me, usa neke, wekî ciyê sekinî navê yeke mîna keça min Perî- nazê derneyê.

-Metê, ez bi vê oxirê kim, ew her çi ye ez ê kerr bidime Mîro. Ez ê teme bidime wî jî, ne dev bizanibe, ne diran...

Seyranê pêçan hilda kire her pişta xwe. Metê hate rûyê wê û got:

-Xwedê oxira we bike oxira xêrê! Xêr-xweşî herin, bên!

-Xwedê bext bide ewledê te!

Jin ji piş malê zivirînê, erebe hate derê malê. Ewana yê bi ereba Kelo heta navenda nehiyê biçûyana, wê wê da bi avtobûsê.

Evdò û Kelo sibexêrî dane hev û Evdo xurcika tijî, tepisî anî danî erebê, vegeî gote jinê:

-Lê lê, zû bike, bila camêrê Kelo ji riya xwe nemîne, belkî em jî bigihîjine avtobûsê.

Hinekî şûnda mêr-jin erebê siyar bûn û ewana rê ketin. Erebe kêleka kîjan malê ra derbaz dibû, keç-bûkâ wê malê av pey wana direşandin û duwa dikirin.

---

1 mormork: bêhiş, gêj

Erebe êpêcekî ji gund dûr ketibû. Te qey digot her sê bende kerral in. Vê gavê her yek ketibû nava dunya mitalê xwe. Tenê dengê simê hespa û car-cara çiriniya erebê li wan tesele dibû.

Hinekî çûnê şûnda nişkê va Seyranê got:

-Çi rêke bi teht e rind e.

Êmekî derbazbûnê Kelo kelimî:

-Erê, rê rêke rind e. Ev rê bi destî însanet mirovan ra him heta-  
viyê, him xirabiyê tînin. Bi rawêja<sup>1</sup> min meriv gişk rêwî ne. Yek diçe  
dewatê, yek diçe şayê, yek diçe qencyê, yek diçe hewariyê, yek, sed,  
hezar diçine xirabiyê, riya-dirba li însanet dibirin.

Vê sibê zû te hew dizanibû dîsa belgê kitêba dilê Kelo yek ser  
yekê da tê qatkirinê ...

-Meriv riya çêdike, xirab dike, riya dibirre. De, hûn rind dizanin  
sala 1937a riya me kurdan birrîn, bi hezara va em nefî kirin. Meriv  
riya dibirre, şera radike, gund, bajara wêran dike, însanet dide qirê.

-Erê welleh, -Seyranê got,- tu rast dibêjî. Hema em bêne ser vê  
riyê. Çend sala berê qe me dikaribû aha serbest vê rê ra herin, bên.  
Hemû derê komêdatûra danîbûn. Wê salê mala kurapê min zivis-  
tanê agir pê ket şewitî, min xwe hewariya wan ra negîhand, ji ber ku  
gotî min biçûya erîze<sup>2</sup> binîvîsiya, ez çî dizanim wê erîze bişandana  
ku da, bersivê ji ku bahata Xwedê dizanibû? A, li dera han te hew  
dizanibû qeleçe ye<sup>3</sup>, ser rê avayî danîbûn, çend esker çek dêst da  
şev-ro nedihîştin çivîk ji wî alî rê derbazî vî alî be.

-Erê usa bû, lê şukur vê rojê ra.

-Xûşka Seyran, -Kelo bersiva wê da, -em bi şukurbûna va dijîn. Ya  
here rind ew e, ku hê nehatiye hişê tu kesî, yanê na wê, evê şukur-  
bûnê jî, ji destê me bistînin.

Hinekî şûnda ewana devîdevî nehiyê kirin. Kelo li duriyanekê  
erebe da xayîkirinê û got:

-Bira, xûşkê, vira peya bin. Ez ê vê rê herim, hûn ê jî vê riyê  
ra. We ra oxir be! Sax herin, silamet warên! Pêş min va rûyê lawika  
maç kin.

1 rawêj: 1. texmîn 2. zen 3. bîrbirin 4. şikbirin

2 erîze: daxwazname, erzehal

3 qeleçe: kozika leşkerî; çeper

Hinekî sekinî, hetanî ewana ji erebanê peya bûn, kel-melê xwe vala kirin, erebê siyarbûnê got:

-Birao, riya mirovan zû, yanê dereng ji hev diqete. Careke mayîn digihîje hev, lê gotî însanet tu wexta bîr neke, wekî rêke wan a tev heye, ew jî riya wê dunyayê ye. Lê bila Xwedê hela wê riyê qismetê me neke.

Kelo erebe ajot, çû lê jin-mêr êpêcekê ser duriyanê sekinîn. Hinekî şûnda avtobûsek hat, hinda wana sekinî, hinek peya bûn, Evdo jinê va siyar bûn.

Tavê hêdî hêdî dizeriqand. Tîrajên wê te tirê şûşân roderên avtobûsê ra ketine heneka, carina xwe davêje ser wana, carina minê dibe. Hêdî hêdî germaya derva, bîna merivên avtobûsê da li hev dipçilikîn, hewa hundur giran dibû. Lê roderên vekirî ra bayê nazik rûyê merivan diket û wan ra hênikayî dihanî. Hinekê kêleka hev rûniştî hev ra qal dikirin, hinek ketibûne mitala, hinek dihênijîn.

Evdo, Seyran jî nûqî nava mitalên kûr bibûn. Kesî nizanibû dilê wan ra çi derbaz dibe? Lê nêteke wan e bi ziyaretî hebû, ew jî, ew bû, wekî ewana zûtîrekê bigihîjine ciyê cî. Ewana hedî hedî ji navenda nehiyê dûr ketin. Avtobûs kete best-beyareke<sup>1</sup> bêserobino. Te li bestê niherînê çavên mirovan diqerimî, tiştek nedihate kivşê. Tavê jî îdî qayîm diqijiland. Evdo nihêrî Seyran hênijiye. Ewî xwe xwe ra got: "Feqîrê westiyaye. Eva çendek e qe ranaze, Xwede nekirî tu hew dizane ewa bawer nake bigihîje kur".

Nişkê va ewa veciniqî.

-Lê lê, -Evdo bi hizkirin pirsî,- çi bû?

-Lo lo, min xewn dît. Min dît siyarekî hespê boz vê bestê ra derbaz dibe, min jî daye pey wî.

-Xewneke rind e, hesp miraz e! Siyar Mîro ye, xêr-xweşî berêvarê em ê bigihîjine siyarê hespê sipî.

-Evdo, min hew dizanibû, ew siyar Sano ye. Ez pey ketime, min ew negirt. Lê ewî destê xwe min ra ba dikir, dayîkê were!

-Lê lê, xewn rastî û derewiya nava duniya sisiya ye.

---

1 **best-beyar:** deşt û çiya

Wana rûyê hev nihêrî û ciyê xwe da tevizîn. Deng ji tu kesî derneket. Lê hinekî şûnda dayîkê hêsirê her çavên xwe paqîş kir û dîsa çavên xwe kuta best-beyara, bavê jî kire axînî, serê xwe berjêr kir.

Demekê şûnda ber çavên dayîkê bû mij-dûman, te hew dizanibû ewa tiştekî nabîne. Çavên xwe ji derva kişand, kete mitala. Mitala mîna bayê birûskê ewa bir derxiste bereka çiyayê Agiriyê. Hate bîra wê ewê çawa cer<sup>1</sup> hildida dahate ser kaniyê. Keç-bûkên dinê jî dihatin, hev ra dikenyan, diketine gilî-gotina. Çawa yekê sura huba yeke mayîn dida ber “bê”. Bûka şêwir dida keçikan:

-Lê lê, filan xort te hiz dike, bigire bernede.

Yane jî digotin:

-Lê lê, ew xort ne layîqî te ye, ji wî dûr here!

Rasthatina wê û Evdo hate bîrê. Dewata bi heytehol<sup>2</sup>, siyarê bûkê, balgî derxistin, sêvên ku jor da zavê avîtine ser kofiya wê pey hev bûne gewlazê bîranîna wê. Paşê rev-bez, koçberî, halê wê yî duhala yê giran. Welidandina wê ye dijwar, giriyê dê, xesûyê, hewar-gaziya mêran, vê gavê guhê wê da kirine zingînî. Wê demê ewê hişê xwe unda kiribû, dengê nuxuriyê<sup>3</sup> wê ewa ji dunya çûyîn-nehatinê vegerand. Ooo, merî qe nizane nava wî dengî da çi sur, çi qewat<sup>4</sup>, çi bilindayî heye, wekî bûka ku dibe dayîk, ji mirinê serê xwe bilind dike, ruh ber ruhê wê da tê, şîrê ber bistana<sup>5</sup> dikele, wê ra germayê, hub-hizkirina ber bi biçûkê nava pitika da tîne. Hey dunyayê! Ev yek dijwar e bê şirovekirinê!

Nişkê va avtobusê meriv ciyê xwe da dane leqandinê. Rê bi çehl-kortik bûn. Seyran ji mitala qetiya, dilê xwe da xwe ra got: “Hela lê? Ediyê<sup>6</sup> me her piyê me ye! Avtobusê nehîşt hela sêrî pey kula xwe herim!”

Ro dageriyabû. Hênikayê avtobûs hingavtibû. Îdî hindik mabû ewana bigihîjne “Bajarê mezin”. Hevekî şûnda avtobûs li sekinan-

1 cer: kûzê avê

2 heytehol: qelebalix

3 nuxurî: ji bo dê-bavê zaroka/zarokê pêşin

4 qewat: hêz, quwet

5 bistan: memik, çîçik, ber

6 edî/edû: dijmin



dinokê<sup>1</sup> da sekinî, hinek peya bûn, hinek siyar bûn. Êpêce meriv ser pê sekinîbûn, maşîne rêketinê keçîkekê bi kurdî got:

-Sano, milê min va bigire.

Van her çar giliya Seyran ji cî da leqandinê. Xortê bal keçîkê jî kêlimî:

-Xalgerden, metirse! Ez nahêlim tu bikevî!

Evan giliyana Seyran çarçehvî kirin. Evan giliyana Seyran birine rojê buhurî. Mîna şîrtekê ber çavên wê ra ew yek derbaz bû, çawa doxtir, eskeran zorê kurîkê wê ji wê stendin. Evî dengî xwîna dilê wê rakir. Rûyê xort nihêrînê germayî hate wê, xwîna wê usa ser wî da ke-liya, lê lê bû rabe xwe bavêje wî. Lê nişkê va dîsa destpiçilkbûna wê, doxtir û eskeran hate ber çavan, wê ra tevayî derd-kulê dîtî bû barekî giran û hindik mabû wê bifetisîne. Bû inteinta wê. Gewrî li wê ziya bû. Reng da reng stend. Te hew dizanibû xwîna dil û ya bedenê gişk tijî tamar û derema bûye û wexta ewana pêl bidin, bijiqitin<sup>2</sup>, biqetin.

Demekê şûnda ewê kire xirexir. Hê Evdo bi wê hesiya. Destê xwe da eniya wê, tê derxist enî mîna qeşa sar e. Dest avîte zenda wê, wî tirê ewê bi temamî sirafetiya<sup>3</sup> xwe unda kiriye. Lema jî bi dengêkî ricaf got:

-Gidîno, îlacekê bikin, jina min dimire!

Ji denge wî gişk ecêb man. Avtoajo avtobûs da sekinandinê. Pê-şiyê jineke bejinbilind rûniştibû, ewa rabû hate hinda Seyranê û got:

-Ez doxtir im, bihêlin ez wê mêze kim.

Ewê pêşîra kurtîkê Seyranê vekir, destê xwe da ser dilê wê û paşê got:

-Gelî mêra, alîkariyê bikin, nexweşê derxine derva, bila hewa li wê kebe.

Du mêt rabûn alî Evdo kirin, ketine ber milê Seyranê û ewa derxistine derva. Li erdê doxtirê li wê nihêrî, av da anînê. Çend dilop rûyê wê reşand, destê wê vir da, wê da ba kir, devê xwe kire devê wê,

1 **sekinandinok:** rawestgeh

2 **jiqîtin:** tepisîn hev zor lê ketin

3 **sirafetî:** di tenduristiyê de rewşa mirovan a asayî \*\*\* **sirafetiya xwe unda kiriye:** ji ser hişê xwe çûye

bîna wê kişand. Hinekî şûnda Seyranê mîna zara kire îskînî û çavên xwe vekir. Ji vê yekê dêmê doxtirê vebû û got:

-Birao, xwîna wê rind naxebite, lema jî gotî ewê ji cî neleqînin, bila hinekî vira rûne, paşê maşîneke mayîn va werêne bajêr.

Avtobûs rê ket çû, ser rê mêr-jin man.

Êpêcekî xurt derbaz bû Seyran xwe da hat. Evdo, bi dengekî heyr-hejmekar pirsî:

-Delalê, çi bû? Hindik mabû mal li min bişewite!

-Lo lo, te tîna xwe da wî xort û keçika, ku bi kurdî diaxifîn?

-Erê, awaziya kurdî gihîşte min, çima çi bûye?

-Lo, mal avayo, gotî te ji wî xortî bipirsiya, tu kî yî?

-Lê lê, agir mala bavê neketê li Qazaxistane dibên 15-20 hezar kurd hene, hema kê bivînî, pêşiyê bigirim, bipirsim tu kî yî?

-Na lo, mesele ne usan e. Ew xortê kurd bi keçikê ra tev avtobûse sar bûn<sup>1</sup>, ew Sanoyê kurê me ye!

-Canim, tê kivşê te hişê xwe avîtiye? Dunê da ewqas Sano hene. Bes e, bihêle em bi xêr-xweşî oxira xwe biqetînin.

Evdo aha got, lê dilê wî ra jî tîrên hizkirina ewled derbaz bû, lê ewî xwe wan erda danenî, dîsa kêlimî:

-Ez nizam em diçine şayê, yanê Xwede nekirî ...

Ewî gilî devê xwe da xweyî kir, xwe kerr kir.

-Xwedê devê te xwar neke usa nebêje, ev yek, ya duda, dilê min dayîke dibê ew Sanoyê min bû.

Paşê ewê dest avîte paşila xwe, ew pirtiyê kirasê Sano derxist, vekir, danî erdê û got:

-Evdo, dinhêrî ji hêsirê min perçê kirasê Sano him qulqulî, him zer bûye. Welleh, bîna vî pirtiyê kiras, bîna wî xortî mîna hev in. Eva bîst sala gelletir e qe nebe rojê du cara, sê cara bîna vî “kirasê” kurê xwe dikişînim. Ez bawer nakim, dilê min, min bixapîne. Bihêle kela min dîsa tijî bûye, beytekê, duda bejim:

---

1 sar bûn: siwar bûn

*Lê lê hekîmê, hekîm kêşê,  
Ez ê her du desta bavêjime pêşê,  
Bêjim xûşkê, tu bi Xwedê kî,  
Bide min dêranê dermanê ve dilêşê.*

*Ez ê qertel ê çî bêjim, çî nebêjim,  
Îro bê sewda<sup>1</sup> bûme, ker û gêj im,  
Birayo, em bi qetilê nefî kirin,  
Nizam derdê xwe kê ra bêjim.*

Ewa tère-têr giriya. Kela Evdo jî tijî bû, lê zefta xwe anî. Kela Seyranê sivik bûnê şûnda reng hatê.

Ji wan wê da ceweke avê dikire xulexul dikişiya. Ewana hatine ser avê. Ewê zendê xwe şuştin, rûye xwe can kir, paşê kulme av vexwer, pişta xwe rast kir, dor-berê xwe mêze kir û berbirî Evdo bû:

-Lo lo, min ra digotin piştîkûzê. Welleh, billeh derd ez kûz kirime. Eva çend sal e ez diêşim. Doxtir dibêjin, gurçikê min da kevir heye. Ew jî derew e. Rast e kevir bedena min da hebû, ew kevirê Sano bû, dilê min da hatibû dardakirinê. Evdo, heyrano, vê gavê ez usa me, çawa bûka ber perdê me. Dizanî çima? Ji ber ku çavê min çavê hesiretê min ket. Min dûr va ew bîn kir, xwîna wî nava hewê da firiya, kişiya nava xwîna min, ya ku eva çend sal bû hey diqerisî, hey vedibû. Hemû derd-kul, êşa bedena min bû mîna mûkî, ew jî Sano xwe ra kişand bir. Ne bi gotina min, lê bi gotina Xaliqê Jorîn, zûtirekê ez ê şaya wî da aha, aha bireqisim.

Ewe çepilên xwe bilind kir, carekê, duda bi reqas fitil da xwe.

Evdo nihêrî jinike gellekî şa ye, ewî jî çok veda, ser-çavên xwe bişo û got:

-Bila Xwedê dengê te bibihîze!

-Bihêle ez jî kulme av vexwim, wa ye maşînek wê da tê, ka binê wê me bibe bajêr. Riya nîvsehetekê maye.

Ew du roj bûn dê-bav li bal kurê xwe Mîro diman. Mîro hem-

---

1 **bê sewda:** bê hiş

jiyînxanê da dima. Ew du hevalan va odekê da diman. Hingî dê-bavê wî hatibûn, hevalên wî diçûn odên mayîn da diman.

Berê da dê-bavê şewra xwe kiribûne yek, wekî hema wê gavê, bi lez-bez derheqa qewimandina avtobûsê da tişteki nebêjin. Hela binihêrin çi heye, çi tune, xort îsal înstîtûtê kuta dike wê ku da here, wê wî ku da bişînin? Ne nêta hatina wan e sereke ew bû, wekî kur bê gundê wan, yanê bê nehiyê.

Nerehetbûna wan ew bû, wekî tayê tenê<sup>1</sup> ji ber çavên xwe nekin, zûtirekê dewata wî bikin.

Ew du roj bûn dayîk dikewgirî, pirsên heyî ew nerehet dikirin. Cara ewilîn qewimandina li avtobûsê, paşê jî pirsê pêçana, ku Metê dabû.

Vê êvarê odê da tenê dê û kur bûn. Evdo çûbû hemamê. Kur yeko yeko halê merivên gund dipirsî. Dile dê tipetip bû, ka binê ewê derheqa Meta Rûbar bipirse. Te digot ji Xwedê da bû, Mîro yek, dudu pirsîn û bi beşereke xweş pirsî:

-Dayê, qe Metê zarên xwe va çawa nin?

Ji vê pirsê dê dubare şa bû. Kur him halê Metê, him halê zarên wê pirsî. Lema jî ew dudilî bû, dest avîte beriya kurtikê xwe pêçeka Metê derxist, dirêjî kur kir û got:

-Lawo, Metê jî pak e, keça wê jî. Ewa weke navê xwe ye. Perînaz bûye kevoka ser desta. Ez heyran, roja em rê ketin Metê ev pêçek da min û got, wekî Perînazê daye, ez bidime te. Hela binihêre çi ye?

Mîro şa bû, hinekî jî şerm kir, sorayî hate dêmê wî. Ewî tayê dora pêçekê vereşand, ji nav pêçekê desmaleke desta derket. Dora desmalê bi morî-mircan bû. Desmalê sor, gevez, hêşîn dikir. Morî-mircan jî reng bi reng bûn. Mîro desmal destê xwe da vir da, wê da welgerand, nihêrî û vebişirî. Dayîkê jî wî pirsî:

-Lawo, çi dikenî? Diya xwe ra jî bêje. Him jî desmalê bide ez jî binihêrim.

Kur desmal da dê. Ewê jî, çawa dibên, berayî, dirêjaya desmalê nihêrî, nexşê tilî-pêçiyê Perînazê mêze kir, berbirî kur bû:

---

1 tayê tenê: zarokê tekane

-Çi desmaleke bi nexşbedew e. Lê ev çi ne aha? Kur desmal ji dê stend û got:

-Dayê can, eva herfa “M” ye, eva herfa “P” ye. “M” were ser “P” ro-robarî “MP” ye. Eva herfa navê min e, ewa herfa navê wê ye. Ewa dixweze bipirse: “Navên me bêne ser hev, yanê na?” “Em bi mirazê hev şa bin, yanê na?”

-Lawo, dê qurban, hela binihêre çi keçikeke bi kûr-nêt e? Lê tu yê çi bidî min ez bibim bibime wê?

-Dayîkê can, dayê, ez ê bi xwe zûtirekê bême gund, bila ew jî bibe bûka dayîka min.

Dayik ji vê gotina kur şa bû, hate rûyê kur û got:

-Şîrê min li te helal be! Lawo, pirseke mayîn jî heye. Ez dixwezim wê jî bêjim, bila şayî tev şayî be.

-Bêje dayê! Dilê xwê da xayî meke!

-Ez qurban, vî bajarî da kurd gellek in?

-Na. Çend xort û du keçik dixûnin. Çima dayê?

-Qet, lawo tu wan xorta nas dikî?

-Erê, em 4-5 kurd in, çawa hev nas nekin. Dayê wan xort û keçikan bihîstine hûn hatine, sibê roja lehdê ye, ew ê gişk ê bêne dîtina te û bavo. Her tenê Nado ne li vir e. Ewî bi serfîniyazî instîtût kuta kiriye, ew ê here ser karê û di aspîrantûrê<sup>1</sup> da bixwîne.

Mîro derz kir, wekî dê nizane aspîrantûra çi ye, lema jî, got wekî ew ê here xwendina daha bilind.

Nadoye ji wir here gund.

-De Xwedê per-bask bide wî. Ew bû dûmeqeska xwendinê, we jî çav da wî.

-Erê, dayê, usan e. Ew ê bibe ulumdar, kî dizane belkî em disa pey wî çûn.

Guhe dayîkê ser kur bû, hişê wê alîkî mayîn bû. Her tenê aha got:

-Xwedê bext bidê!

Dayîkê xwest qewimandina avtobûsê qal ke, lê dît, wekî kur î usa

---

1 **aspîrantûra:** xwendina bilind a piştî zanîngehê; master

geş e, usa firnax<sup>1</sup> e, lema dengê xwe nekir. Mîro desmal da ber pozê xwe, bîn kir, gote dê:

-Dayê, bîna kulîlka ji desmalê tê! Ewê desmal kiriye nava kulîlkê reng bi rengî!

-Lawo, bila Xwedê bextê kulîlkên we tu wexta neçilmisîne! Wextê dewata we, ez ê wê desmalê bidime destê xwe, têkevime sergovendê. Ez ê bêjime sazbanda, qeydê “Kofi”yê lê de. Tu binhêre dayîka te ye çawa bixingire, gişk ê bêne mêzekirina reqasa min. Paşê ez ê te û ...

Ewe gilî xwe devê xwe da hîşt. Xwast beje, “ez ê te û Sano têkime govendê. Ez ê tiliyê we bigirim, têkevime nava we herda<sup>2</sup>, çokê xwe bişkênim, çi derd-kul min dîtiye, wê ji bedena min derê.” Lê ewê dîsa zefta xwe anî. Giliyê xwe guhast, got:

-Lawo, ne sibê roja lehdê ye. De, wekî xort-keçikên kurdan wê bêne dîtina me, gotî dayîka te xurekekî rind bipêje. Şukur me ji gund her tişt aniyê. Ez ê ji qeliyê, birinc û elegezê<sup>3</sup> xurekekî bipêjim merî tiliya xwe jî pe ra bixwe.

Dayîkê dilê xwe da eyan kir, wekî ew xort-keçika avtobûsê wê bêne dîtina wana.

Lê dê nişkê va dudilî bû, reş qemilî, berê xwe ji kur guhast. Xwe xwe ra got: “Çawa Evdo dibê hema navê xort Sano ye, wekî usa ne ew kurê me ye? Ewqas Sano hene. De, çi bêjim, destûra tu kesî tune dayîkê bixapîne. Wekî Xwedê zêna min şaş ke, ew yek bi Xwedê Xwe xweş naçe. Gotî bende, Xwedê, yek jî dilê dayîkê bi xwe dayîkê nexapîne. Xapandina dayîka şipûk e, nava erd û esmana da buhuste erd dimîne”.

Nişkê va ewê çok veda, her du destê xwe bilind kir û bi dengekî lerizî got:

-Ya Xaliqê Jorîn! Min nexapîne!

Kur sêrkirina dayîkê metel ma. Pêş da çû, kete milê wê, ewa ji erdê hilda û pirsî:

-Dayê can, çi bû? Te çima nişkê va usa kir? Çi qewimiye, bêje?

1 **firnax:** şanaz, serbilind

2 **herda:** her duyan

3 **elegez:** cureyekî çereya wekî ku wekî tirşo û gûlikê tê bikaranîn

-Qet, lawo, min bo ewledê xwe ebabetî kir.

Vê demê Evdo der da hat. Tê derxist tiştêk bûye. Xwest pirs ke, Seyran berî wî kêlimî:

-Tu ji hemamê hatî, were rûnê stekane çay vexwe. Mîro dibê, sibê wê mêvanê me yê bên.

-Bila ser sera, ser çavan bên. Mêvanê me kî ne?

Seyranê hemû tiştê gote mêr. Wê şevê birîndar razan, lê rebena Seyranê bijang nedane ser hev. Berbangê hinekî hênijî. Dema ewa hişyar bû, dît bav-kur rabûne û kerreker diaxifin.

Ewê ser-çaven xwe qenc kir, derbazî odê bû selam da kur û mêr. Rast e, şev ranezabû, nerehet bû, lê rengê wê vebibû, kêfxweş bû. Ewê taştê hazir kir, wana xwer-vexwerin. Paşê rabû, bû şingêşinga wê fera-fotik şûştin û got:

-Lo lo, xorta, ne wextê rûniştandinê ye, rabin alî min bikin, em ê pê ra negihînin, te hew nihêrî mêvan hatin!

Ewê kur ra got filan karê bike, teme da mêr çî bike, xwe jî rûnişt birinc bibijêre.

Ewê hêdî hêdî, bi sebir kar ji ber destê xwe derxist. Lê dibên, dema mêrî nerehet e, merî pê ra nagihîne hemû tiştî cî bi cî bike.

Derî hate kutanê, maldizkê da kefgîr ji destê Seyranê ket, li fereke kaxet<sup>1</sup> ket û ew bû du para. Mîro xwe şaş kir nizanibû ber bi dêrî here, dêrî veke, yanê ca binihêre ew çî deng bû?

Evdo li bal jinê bû, her tişt dît, dît kur jî xwe şaş kiriye got:

-Lawo, here dêrî veke! Qe tiştêk nebûye.

Paşê vegerî gote jinê:

-Lê lê, mêvanin dêrî dukutin, tu jî mêzera ber xwe veke!

Hinekî sekinî bi henek ser da zêde kir:

-Derbazî oda dinê be, ca bedewîkê bide ser dêm, bejin-bala xwe.

Hetanî Seyran derbazî odê bû, mêvan pey hev der da ketine hundur. Hema ber şemîkê Mîro got:

-Bibine nas, eva bavê min e.

Evdo hate rûye her sê xorta, eniya keçikan û kêf-halê wan pirsî. Vê gavê Seyran jî oda dinê derket.

---

1 **kaxet:** kaxetîtk, porselen

Evdo dest avîte nîn, bisimillah kir û got:

-De kerem kin, Xwedê çi daye, buxun.

Lê Xalgerdenê got:

-Heta meta Seyran neyê, tev me nîn nexwe, ez destê xwe dirêjî destexanê nakim.

Mîro wê gavê çîrp kire ser xwe<sup>1</sup>, çu maldizkê. Dê ewa dîtîne zû hêsirê ber çavên xwe paqîş kir. Êmekî dê û kur çavên hev nihêrîn. Kur posîde bû. Dayikê ev yek tê derxist, lema jî kêlimî:

-Lawo, şukur ve rojê ra.

Kur derz nekîr dayik rastî jî, ji şabûna usa dike, yanê dîsa barê derdê sala kete bîra wê, wê difetisîne.

-Dayê, keçik dibên, em nîn naxwin heta tu neyê ser destexanê.

-Erê, birê min, bavê min, tu here, ez têm.

Çen deqa şûnda Seyran ber bi pêşxûnê hatinê, Evdo bi şabûneke mezin got:

-Keyê, were mêvan hîviya te ne.

Xalgerdenê hêdfîka ji Mîro pirsî:

-Çima navê diya te Keyê ye?

-Na, ewê yekê ji bavê min pirs ke.

-Lawo, -Evdo berbirî wan bû, -rast e em îdî têra xwe mezin bûne, lê bi edetê heyî, me xortî, bûktiyê da bal mezina, bal mêvana navê hev nekişandiyê<sup>2</sup>. Min wê ra gotiyê “lê lê”, “keyê”. Ewê jî min ra gotiyê “lo lo”. Îro jî ew yek bûye edet, xesiyet.

Xalgerdenê çavên xwe ji meta Seyranê nedikişand, ewê jî bin çavan hey ewa mêze dikir. Xalgerdenê ewa nas kiribû, loma pirsî:

-Meta Seyran, wê rojê ew tu bûyî avtobûsê da dilê te xera bû, bibaxşîne tu xeriqiyî?

-Erê, lawo, ez bûm. Lê ew xortê bal te îro çima nehatiye vira? Lê ew vira naxûne? We çima ew xwe ra nehaniye?

Te qey digot dayik dixweze bi carekê va hemû pirsê bide û zelal ke.

Sîmzera hevala Xalgerdenê kêlimî:

<sup>2</sup> -Metê, ew xort desgirtiyê Xalgerdenê ye. Ew jî mîna we bi mêvanî hatibû, duh na, pêr çû.

1 çîrp kirin ser xwe: bazdan ser û rabûn piyan

2 navê yekî kişandin: bi nav gazî kirin, navê wî aşkera kirin



-Ew ku dimîne?

Dengê dayîkê hêdîka hate bihîstinê.

Ewana li Tûrkmênistanê dimînin.

Evdo û Seyranê rûyê hev nihêrîn, parî gewriya dayîkê da ma. Evdo av dirêjî jinê kir û çav kire wê, yanê ku ber xwe bide.

Vê şûnda gellek tişt eyan bû. Eyan bû ku mala bavê Xalgerdenê li Qirqistanê ye. Mala bavê Sano va qewmê hev in. Lê mala bavê Sano wana berê da li Tûrkmênistanê dimînin. Hêna nefîkirinê, wana xwestiye pismamê xwe bînine Tûrkmênistanê, lê nehîştine. Ne axir kurd li ser çend rêspûblîkê Asiya Navîn bela kirin. Rêspûblîkayê jî ewana ser Marza, Marza ser nehiya, nehiya ser gunda û avana bela kirin, qeydê sirêder<sup>1</sup> da ser wan. Feqet, qewm-lêzima bin desta va, dizînkê va pîrsa hev dikirin. Lê hêna<sup>2</sup>, ku hinekî serbestî dayînê, rê-dirb vebûn, qewm-lêzim ser hev da çûn-hatin. Ser destexanê ew yek jî hate gotinê, ku nava kurdên nefîkirî da pîrsa xwendinê da Nado bibû balindekî û xwe dabû bandeva çiya. Lema jî keç-xortên kurdan dibûne dûmeqesk û xwe Nado digirtin, dihatine bal wî. Ew ji wan ra dibû rênîşandar, şewirdar. Helîmê, Xalgerdenê, Rojhat, Emer û yên mayîn bi şewira Nado, qebûlî înstîtût û têxnîkûma bibûn. Lema gotine: "Bin siya darekê da hezar pez mexel tê".

-Erê, usa ne. Em gişk beqî wî bûne xwendevan, Mîro got.

Îdî Nado ne li wî bajarî bû. Ewî înstîtût kuta kiribû û ew şandibûne ser karê. Deng-hesê qenc ji wî dihat. Kovar û rojnaman da gotarên wî di aliyên pîrsên neftê da dihatine weşandinê.

Weşekê şûnda xwendevan çûn, mal da dê-bav û kur man.

Kur îdî ser hes-hesa ketibû<sup>3</sup>. Halê dayîkê ne tu hal bû. Ewa sipî-çolkî bibû, xitimî bû. Kela wê tijî bibû û menîkê bend bû, wekî mîna bendavê dereve be. Evdo hey jinê dinihêrî û dihanî ser zimanê xwe, wekî pîrsê kur ra bêje. Seyranê jî ev yek derz kir, lema got:

-Lo lo, dilê min tê bisekine, ser gilî-gotina veke, bila Mîro biza-nibe.

1 **qeydê sirêder**: ji rêzê der, awarte

2 **hên**: dem, gav, wext

3 **hes-hes**: şik û weswese

Ewê aha got, dest ustuyê kur ra bir û mîna taviya baharê hêsir ser wî da barand. Tifalê tifala şaş bû, qe nizanibû ev çi yek e?

Evdoo jin da kerrkirinê û monik monik pirs kur ra qal kir.

-Bavo, dayê, -ewî bi bawerîke mezin va got, -dunê da hemû tişt diqewime. Welleh, hûn wedekî usa hatine, wekî me jî pêş da îmtahan dane, heftêkê şûnda wê me bibine Xamxopanê, bona karkirinê. Hema sibê na, dusiba em herine Tûrkmênîstanê, ez navnîşa mala Sano wana dizanim. Wira gundekî kurda yî mezin heye, em ê herine wira. Bila hesret dilê dayîka min da nemîne.

Paşê ew xar bû hate rûyê dayîkê. Dayîkê bi kelogirî got:

-Erê lawo, em herin, mirin daha rind e, ne ku çavên te rê bimîne. Em ê herin bûye sed şukur, nebûye em çi bikin ...

Ji van gilî-gotina dêmê dê hêdî-hêdî vebû, posîdebûnê mala xwe ji ser wê bar kir.

... Sê rêwî bav, dê û kur ji rêspûblîkekê, diçûne rêspûblîke dinê. Sê xerîb, ji xerîbistanekê diçûne yeke dinê. Sê birîndar diçûn melhemekê bigerin. Ax! Dewranê! Wax! Zemano! Weten tunebûnê merî sergerden dibe. Weten tunebûnê mal-hal tiştêkî nehêja ye, sêwîti ji wê yekê rintir, bilintir e! Ro da sêwî li vir, li wir ser erdê kal-bavê xwe digere, zike nan qezenc dike, êvarê jî tê ber konekî, ber binerdeki, ber avayikî, ber zinnarekî ditele<sup>1</sup>, serê xwe dafîne ser keviyekî weten radizê! Weten wî hemêz dike, rojekê jî zû, yanê dereng destê wî digihîne nîn! Lê ev her sê ruhber ne mîna rêwiyan rêwî nin, ne mîna xerîba xerîb in, ne mîna sêwiyan sêwî ne. Hema em bêjin ewana çûn gihîştine ciyê cî<sup>2</sup> û ya dilê wan hasil bû, vegeirîne dîsa rêwî ne, dîsa xerîb in, dîsa sêwî ne. Ji ber ku emir da destê xerîba digihîje hev, rêwî bi hezar cefayî diçe digihîje menzîla xwe, sêwî dibe xwedanê mal-hal. Lê ev her sê mirov, bende bê Welat in! Lema hey rêwî ne, hey xerîb in, hey sêwî ne. Bona hey nebî rêwî, nebî xerîb, nebî sêwî, gotî boy axa weten xwîne birêjî, ser axa wê bimirî, ne ku bi sala bibî xerîb, rêwî, sêwî, bêpişt.

1 **telîn:** 1. sitirîn, êwirîn 2. aşt bûn

2 **ciyê cî:** cihê xwestî û armanckirî

Lê îro dayîk rêwî bû. Oxir, oxira dayîkê bû. Ewê nizanibû, ewa diçe ser xêrê, yanê ser şînê. Birîna sala diziqîti. Êwê dilê xwe ra dinijand: “Yanê ev oxir ê min ra bibe melhem, birî- na min ê der bike, yanê ez ê bi vê kulê herime tîrba sar. Alîkî dilê min dibê here, alîk dibê na, neçe! Tarî, ronahiya min tev hev bûye. Şev, rojên min hev piçilikîne. Lê lê, ber xwe bide. Lê çima gotine: “Derd yek e, derman hezar!” Lema Xwedê gotiye: “Ji te hereket, ji min bereket”.

Roja duda, nîvro riya rêwiya qesidî. Wana devedevî gund kirin. Mala Ceferxan pirsîn. Avayîkî bi pergar nîşanî wan kirin ... Ber şemîkê yekî bejinbilind, namilphen derkete pêşiya wan. Mîro pêş da hat û berbirî wî camêrî bû:

-Apo, selam elêkîm! Ev mala apê Ceferxan e? Sanoyê kurê wî ...

Mêrik dest avîte simêla xwe ye palik mizda, bi dengekî hurmijî<sup>1</sup> giliyê xort dêv da nîvcî hîşt:

-Elêykîme selam! Belê, eva mala Ceferxan e. Ew, ez im, lê Sano ne li mal e, kerem kin, hûn kî ne?

Evdo gavekê pêş da hat, got:

-Em mevan in ...

-Mevan mevanê Xwedê ne, kerem kine mal, ber şemîkê nesekinin.

Ewana derbazî hewşê bûnê, ewî bi dengekî şa, bilind got:

-Rewşê! Rewşê! Ca derê derva, mêvan hatine!

Jineke bi dest-pê, xelateke doxtiriyê sipî lê, derkete derva.

-Eva jina malê ye, -Ceferxan got, - bibine nas.

Mevan jî, ewa jî zûr bûn rûyê hev nihêrîn. Lê kevaniya malê gavekê, duda ber bi Seyranê hat bi şermoke got:

-Xûşkê, kerem kin, ser piya nesekinin, derbazî mal bin!

Ewê aha got, vegeerî ber bi derê odê çû, derî vekir, dîsa bi zarekî şîrîn kêlimî<sup>2</sup>:

-Kerem kin!

Ode şûştî-mûştî bû. Kulav raxistî bû, çend balgî dûrî hev dûrî hev danî bûn, xalîçeke mezin dîwêr da dardakirî bû. Du wêne bin

1 **hurmijî**: dengekî stûr î ji qirikê

2 **kêlimî**: axivî, tekêlûm kir.

şûşa dor bi qeytan dardakirî bûn. Yekê da jin- mêrik, yekê da dîsa jin-mêrek û çend zarok bûn.

Mêvan rûniştinê şûnda Ceferxan vegeerî ser jinê:

-Çayê hazir ke!

Jinik bi xanimî derbazî oda dinê bû, xelata doxtiriye derxist, derkete derva, lê malxûyê malê dûmayîn da giliyê xwe:

-Bixefirînin<sup>1</sup>, pirsê etbî<sup>2</sup> tunebe, hûn kî ne?

-Em, -Evdò bersiv da, - kurdên Ermenîstanê ne, sala 1937a hatine nefîkirinê, naha li Qazaxistanê dimînin.

Ewî îdî dûmayîn neda giliyê xwe.

-Ez Sano nas dikim, -Mîro got, - em îsal hev ra bûne nas.

Hema vê qasê Sano der da kete hundur; selam da û ew Mîro hatine dest-rûyê hev û pirsî:

-Bira, tu ku, ev der ku? Lê ev kî ne?

-Ev bavê min, eva diya min e. Em bona pîrsekê hatine, paşê em ê qal kin, saxî be.

-De, hûn ser sera, ser çavan hatine!

Paşê ewî vegeerî bavê nihêrî û her du hev ra derketine derva. Vê demê dilê Seyranê temûl nekir, rabû hat li wêna mêze kir.

Vê demê Sano vegeerî hundur, dît ku jinik wêna mêze dike, pêş da hat, got:

-Ev wêneyê dê-bavê min e, bi malbetê va. Ev wêneyê duda yê dê-bavê min e.

-Ez bi heyran, Sano, lawo, -Seyranê bi hesretîke mezin va pirsî, -wêneyê te nava van zaran da kîjan e, çavên min rind nabînin?

-Metê, ez nava van zaran da tunenim. Wêneyê min ê yê diya min tev kişandî oda dinê da dardakirî ye.

Ewî aha got û derbazî oda dinê bû. Derên odan ser hev da vedibûn. Seyranê jî da pey wî. Odê da stêrekî mezin hatibû hildanê. Li erdê xalîçe raxistûbûn. Li du dîwara pê da pê da xalîçe hatibûne dardakirinê.

Sano ser milê çepê vegeerî ber dîwer sekinî û got:

1 **bixefirînin:** bibexşinin

2 **etbî:** lome

-Metê, diya min dibê, ev wêneyê min î sêsaliyê ye.

Seyranê serê xwe bilind kir wêneyê ser xalîçê da dardakirî mêze kir. Rewşenê destê Sano girtibû, wêneyê wana ser pê hatibû kişandinê. Te hew dizanibû Seyran dîwêr va zeliqiye.

-Metê, -Sano gotê,- ser piya nesekine, rûnê.

Li dayîkê usa werhat, wekî ev deng, dengê Sanoyê wê yî sêsali ye.

Her tenê firqî ew bû, ku ew deng bi girî, bi hêsir bû, ev deng bi gorî, bi mêranî bû. Wê weşê te tirê yekî guhê dayîkê da kire piçepiç: "Bigire, bernede, ew Sanoyê te ye." Hej Seyranê ket, porê wê bîzbîzî<sup>1</sup> bû, çav li wê bijiqîn, hêzeke usa hate wê, her wekî ew eskerê lawê wê pekandî pêşber wê bisekiniya, welleh, ew ê dest bavîta qirika wî, ew bixeniqanda. Ewê xwest wêne jor da bîne, destê Sanoyê xwe ji destê vê dayîkê bike, lê belê, kir nekir dest bilind nebûn. Nişkê va dengê dinê ji kûraya sala hate guhê wê: "Sebir ke, mala Xwedê bi sebirê hatiye avakirinê. Yek jî tu çî dizanî ew hutul-mutul Sanoyê te ye." Ji vî dengî dayîk veciniqî, xwe paş da da.

Şiqînîk ber guhê Evdo ket, ew ji oda dinê derbazî vê odê bû. Dît rengê jinê sipîçolkî bûye. Ew kete ber milê wê, anî oda dinê da da rûniştandinê. Ewê kase çay vexwerinê şûnda ser hiş-sewdayê xwe da hat. Xwe xwe ra got: "Belê, sebir, dîsa sebir".

Êmekê şûnda destexan hat, nan xwerin, ji vir, ji wir peyivîn.

Mêvanan meniya hatina xwe aha şirove kirin: "Em rêbarî<sup>2</sup> hatine mala we, em rêwî ne ..."

Ax, xwezila yekî ji wan bipirsiya:

-Hûn rêwiyê hetanî kê derê ne?

Lo bavo, lê dayîkê, hetanî hûn riya xwe kurt nekin, negihîjîne ber dergê Dayîka Mezin-Kurdistanê, hûn ê hema aha bi dilşewat bin, hûn ê hema aha çav bi hêsir bin.

Xwedanê malê û mêvan heta demeke şevê hev ra axivîn. Mêvan hîm bûn wekî kurdên Tûrkmênîstanê hema ser axa kal-bavê xwe nin. Ceferxan avtoajo bû, lê te tirê êwî dîrokzan e. Dunêdîtina wî dûr û kûr bû. Ewî ser hîmê qewimandinê dîrokê digot, wekî ev gundên

1 **bîzbîzî:** (ji bo pirçê) vizvîzî, rast û hişk

2 **rêbarî:** bi barê rêwîyan, bêyî kel-melê zêde

me kurdan navika Kurdistanê da ye. Îro wê ra dibêjin Kurdistanê Iranê. Mêvan wê yekê jî hesiyar, wekî kevaniya malê Rewşê doxtir e, dayîka pênc zaran e. Malxweyê malê bi serhatiya rêwiya, ya bobelat ra bû nas, her tenê undabûna kur negotin. Ji ber wê yekê negotin, mêvan bi hev şewirîn, tivdîr dîtîn, wekî sibê Seyran kerr pirsê Rewşê ra qal ke.

Qasekî şevê cî-nivîn danîn, ku mêvan rabin razên, xwe jî çûne odeke dinê. Hinekî şûnda bav-kur razan, lê xew nekete çavên Seyranê. Xew dunya sisiyan e. Ew him jî vê dunya ronahî, him jî wê dunya tarî şirîntir e. Çiqasî derd-kulê te hebin, yanê jî tu birîndar bî, birîne te ha biziqîtin, ewana bi kêmxwîn bin, seqet bî, birîn bidine ber janê, ew gişk şev-roj rehetiyê nedine te, tu kêlek kêlek welgerî, erdê ra bixişikî, hey têkî axeax, ofeof, lê şeva ku tu têkevî nava dunya sisiya, hemû tişt ji bîra te diçe, şirîn şirîn radizêyî. Hêzeke vê dunya sisiya jî heye. Ew nava her du dunya da cî-war bûye. Carina usa diqewime tu serê xwe datîni îdî careke mayîn venagerî vê dunê, ew dunya sisiya te dibe dunya hate-nehatê. Lê ecêb ew e miriyê aha ra dibên, “ciyê wî bi cinet e”. Feqet, tu kes nikare şirove ke çima aha gotine, çima aha dibêjin? Mirîn, mirin e. Rastî jî belkî ev dunya sisiya destê bendê xwe digire dibe cineta dunya hate-nehatê. Em bende wê dunyayê ra dibên dunya çûyîn-nehatê. Belkî dunya heqî, ya hertimî ew e.

Belê, xewa dayîkê nedihat. Te digot ewa çend heb qelînek e diqele, te hew dizanî, ewa hinek goşt e beroşeke mezin da dikele. Nişkê va ewa ji nava cî rabû, hate ber dîwarê wêneyê Rewşê û Sano dardakirî. Bi destekî ricaf wêne hilda û zû vegeirî nava cî. Dayîkê wêne kire nava paşîla xwe, paşê kire nava her du bistanê xwe, destê xwe yî çepê danî ser, çavên xwe girt, kete mitala. Hinekî şûnda mitale ji wê revîn û ewa kete xewa hingorê<sup>1</sup>. Te hew dizanî eva 20-25 sal e dayîk nava beroşa qîrê-qetranê da dikele, te hew dizanî birînen salan kêmxwînê girtine, lê naha, vê şevê ewa ji qîrê-qetranê xilaz kirine, loxman, hekîman birîne wê derman kirine, ewana gişk dereve bûne, dayîk

---

1 **xewa hingorê:** xewa şirîn

bûye zara yek salî, du salî, dayîkê ewa têr têr mêjandiye, kiriye hêlê-çanê, ewa hedî hêdî hejandiye. Lema ji ewa ketiye xewa şîrîn, ketiye nava xewneke bêserobin. Xewn jî ew rastî-derewî, bûyer, serpêhatî, qewimandin-neqewimandinê her du dunya tîne nava dunya sisiyanava xewê, paşê hespê wana, yên rengsipî, reş dide bezê. Bila xewna qertela Seyranê, xewna wê ye şeva îşevîn bibe xewna xêrê. Lê vê demê kesek tunebû ji dayîkê ra bêje:

*“Şev e dirêj e,  
Qiyamet e dûr e”.*

Te tirê wê şevê dayîk çû qiyametê û vegerî. Tîrêjên tavê roderê xistinê dayîk hişyar bû. Rabû bir wêne cî da dar da kir. Kincê xwe xwe kir, pişt da pişt a xwe, por, biskê xwe şe kir, kofî da serê xwe û neynikê da li bejin-bala xwe nihêrî, kir-nekir nekete bîrê, gelo, cara paşîn kîngê aha li bejin-bala xwe mêze kiriye, kîngê rewş daye bejina xwe.

“Sibe ku ron dibe, dilê mêriv şa dibe”. Neferê malê û mêvan bi şabûn rabûn. Nava wedekî kin da destexan hate vekirinê, xwerin-vexwerin. Lê belê Seyranê hezar menî girt nan nexwer. Rewşê gellekî nerehet bû, rabû derkete derva, Seyran pey wê derket û got:

-Rewşê, heyran, Xwedê male we ava ke, mal qîsmetê malxweyê malê be. Ez ê pirsekê ji te bikim, erê, erê, na, em ê herin. Metelokekê da gel aha dibêje:

*“Rêwiyo rê da,  
Qelpo, zaxê<sup>1</sup> da.”*

Him jî ez ê meniya nan-nexwerina xwe bêjim. Eva çend sal e bi derdekî dinalim, bi agirekî dişewitim. Ez ê kurt kurmancî bêjim. Ya min heta vira ye. Ya dilê min nebe, kî dizane ez ê bigihîjime mala xwe, yanê na?

---

1    **zax:** zag, zinar

Rewşê bi eceb li wê nihêrî, got:

-Kerem ke.

-Derva ne rind e.

-De wekî usa ne were em herine oda jêrîn.

Ewê aha got û da pêşiyê, Seyranê da pey wê. Odeke biçûk da ewana pêşberî hev rûniştin.

-Lê lê, xakê, -Rewşê got, - kerem ke pirsax we bide, rast be wê hasil be, derew be wê betal be!

-Rewşê, rewşa te dunê be! Ez ê te bi hingilê xwe bidime sondê! Te ku her tişt rast got, ez ê nanê mala te buxum.

Ewe aha got û dest avîte hingilê xwe ji ber kirê, kurtik derxist û bi lewzekî bergerandinê got:

-Tu bi van hingila, tu bi nanê vê malê, rast bêje! Na, ez ê nifirekê li malbeta we bikim: Eva bîst sala zêdetir e hingilê min ji kel ketine<sup>1</sup>. Şîrê bistanê min hatiye birrînê. Min rojekê bi dil piştax we venekir û neketime paşla helalê xwe! Te rast got Xwedê ji te razî be, na, bila hemû keç bûk, kurê te karê bikin, xêrê nebînin. Bûktiyê da şîr nekebe bistanê bûken te, mîna kaniya miçiqî bimiçiqe. Tu nevîkî te nebêje dayîk e. Giliyê dayîkê li wana bibe hov, hûn li çiya-baniya bigerin! Wekî rastiyê nebêjî, bila dergê we bi heft mora va bê morkirinê! Nanê mala te heram be. Mêvan têr bîn, birçî herin. Ewê aha got û kel pê ket giriya. Rewşê ji van gilî-gotinan xitimî û bi dengêkî ricaf got:

-Lê lê, agirê kulê mala bavê ketê, ev çi nifir in, tu dikî, ev çi sond e tu didî! Ne min got, ez ku bizanibim ez ê ya rast bêjim.

Seyranê hesirê ber çavên xwe paqîş kir, mîna zarokan kire îskînî, hinekî kerr bû, te qey digot bîna wê çikiyaye.

-Di riya Xwedê, bêje binê Sano kurê te yî helal e?

Ji vê pirsê te hew dizanî brûskê Rewşê xist, sipîçolkî bû, bi halekî giran va bersiva pirsê bi pirsê da:

-Tu çima dipirsî? Min ra nêta dilê xwe bêje, paşê ez ê bêjim, erê yanê na!

---

1. **ji kel ketin:** êdî nekelîn, şîr jê miçiqîn



Seyrane bobelata salan, şewat-hesreta dilê xwe bi hêsira va Rewşê ra qal kir. Rewşê destê xwe stûyê wê ra bir û her du hev ra giriyan. Rewşê dil da ber dilê xwe û got:

-Xûşkê, naha guh bide min. Min texnîkûma doxtiriye kuta kiriye û eva çendî çend sal in nexweşxana riya hesin da dixevitim. Payîza sala 1937a bû. Rojekê çend zarokên nexweş anîne nexweşxanê û gotin, wekî ewana zarên nefîkiriya ne. Nava wan zaroka da zarên tirkan, çeçenan û kurdan hebûn. Zarên kurdan bi zimanê dinê nizanibûn. Ew sê zar bûn. Doxtirê sereke ew her sê zar kirine palatekê<sup>1</sup> û teme da min, ez wana binihêrim.

Hedî hedî zar qenc bûn. Alîkî dû-dermanên doxtiran, alîkî da kara min e şev-ro ewana ji mirinê kuta kirin<sup>2</sup>. Ewana ro bi ro hînî min dibûn, min jî bîna xwe dabû ser wan, mîna dayîka li wan dinihêrî.

-Rewşê, delalê, -Seyranê bi lavayî pîrsî, - navê zaran çi bû?

-Lez nekeve, ez ê hemû tiştî bêjim... Erê, zar tamam qenc bûnê şûnda, rojekê hatin du zar birin, wekî bigihînine dê-bavê wana. Lê kaxizê zara sisiya nexweşxanê da hatibû şewitandinê. Tevî hine ewreça, ewreçê zara sisiya agir pê ket şewitî. Ser wê yekê çend doxtir hatine girtinê, hinek ji xebatê derxistin. Ew zar li nexweşxanê da ma. Wextê îdî ewana dîtin, wekî bê ewraq nikarin dê-bavê kurik bivînin û biriyar kirin, wî bidine sêwîxanê. Min nehîşt. Min bi destê hukmetê ew ser malbeta xwe nivîsî. Ji wê rojê da ew bû kurê malê.

Seyranê dîsa xwest bikêlime, Rewşê şanî kir, ku hiş be, ez qewimandinê kuta kim:

-Tu jî dayîk î, ez jî dayîk im. Gotî dayîk dayîkê nexapîne. Dayîk hatinê xapandinê gotî erd û esman tev hev be. Pêwîst e mala min da nan-xoyê bixwî. Him jî te ez bi sondeke ziyaretî dame sondê! Boy navê Xwedê, boy sonda ziyaretî ez ê rast bejim:

-Nave zarokê Sano bû. Sano wê gavê digot, ku nave diya min Seyran e, nave bavê min Evdo ye. Lê de tu were ewî paşnav nizanibû, wekî li wê bigeriyana. Naha Sano destgirtî ye. Çendekî şûnda em ê li vê hewşê dewata wî bikin.

1 palat: jûr, ode

2 kuta kirin: xelas kirin, qedandin

Naha jî ez te bi wan sonda didime sondê, hetanî dewatê kesî ra tiştêkî nebêje. Roja dewatê warên, em ê ser meselê vekin, bila şayî tev şayê be. Pey dewatê ra têkeve milê kur û bûka xwe û ji vî dergê xêrê derxe, herine ser hetaviyê.

Îdî Seyranê xwe zevt nekir, dest stûye Rewşê ra bir, hate rûyê we, tiliyên destê wê kire devê xwe, çawa zarok bistana bimije, usa mêt. Rewşê jî hate, rûyê wê. Qasek kerr-lal derbaz bû. Wana rabûn hesirê ber çavên xwe paqîş kirin, wekî derêne derva Seyranê got:

-Xûşke, dilê min ser min nasekine, ka em tiştêkî têkine menî, têkevîne oda Sano tê da razayî, ez bi kula dilê xwe wî maç kim.

-Sano, -Rewşê bersiv da, - avtoajo ye. Kew ketinê sibê ew rabûye çûye. Ew çend hevala va çûne bajarekî dinê, wê çend roja şûnda vegezin.

Rewşê usa tê derxist, ku ew ê bawer nekir, lewra got:

-Were em herine oda wî.

Dema ewana hatine odê, dê xwe avîte ser cî-nivînê Sano. Balgiyê ber serê wî hilda hey ramûsa, balgî danî lihêva wî ber xwe va kir, dîsa maç kir, bi hesirê şabûnê va got:

-Erê, welleh, bîn bîna lawê min e!

Rewşê kete ber milê wê û got:

-Rabe, rabe! Xwezila dê ewled, mirov jî welêt unda neke!

... Ey dunyayê! Dê, bav, bira vir da bûne rêwî, ewled, bira wê da bû rêwî!

## 14

Sêlava<sup>1</sup> salên nefiyê îdî hatibû zelalkirinê. Wê sêlavê çî dabû ber xwe biribû, çî birîn dilê mirovan xist her salan dizanibû, yek jî kurdên deroder.

Ji roja rathatina Kelo û Erebe Şemo jî sal derbaz bûbûn. Gellek kurdên Qazaxistanê hatibûn û hê jî dihatîne dîtina wî, wî ra nan dianîn. Girtiyên girtingehê, ser vê yekê ecêb mabûn, ji ber ku Erebe Şemo gişka ra gotibû, wekî li vira tu qewm-pismamê wî tune. Kî dihate dîtina wî, boy kurdiyê, boy nefsa wî dihatin.

Ew çendek bû, Kelo nan dibire lagêra, ku Erebe Şemo tê da bû. Îro dîsa hatibû vira. Rojêke zivistanê ye usa bû, wekî ba-bagerê dilîlan-dê. Carina bayê firtonekê çend mêtira berf bilind dikir, mîna çerxekê dor hev dibir, dianî, fitil didayê, rê-dirb bi berfê va tijî dikir. Usa dibû çav çava nedidît.

Kelo nan valakiribû, lê nediwêrî ji hewşa lagere derê. Ew ketibû mitala ... "Here, çawa here, neçe, çawa neçe?" Ew ji xwe neditirsiya, nuqutî dilê wî: "Nişkê va rê da tişteke bê serê hespa wê bêjin, ewî qest usa kiriye, ew dujmin e." Kelo nava van mitalan da bû, bext ra, serkarê lagêre wê da hat û got:

-Biratok, (birako) hewa gellekî xirab e, elam kirine hinekî şûnda wê teyrok ê, bahoz ê rabe. Tu îşev li vira bimîne, ez ê temê bidim,

---

1 sêlav: lehî

bila hespan cî-war kin, destûra te jî bidim here bal profesor bimîne. Wê salê tişteki aha qewimî: Rê da him erebeajo, him jî hesp miribûn. Boy hespan Moskwayê agir ser me da barand. Naha ez ê herim temê bidim, bila hemû tiştî bikin.

Paşê ewî vegeerî gote dergevan, wekî Kelo bi erebê va nehêle derê derva.

Hinekî şûnda du merî hatin, yekî serên hespan girt, kişand bir wana cî-war ke, yekî jî gote Kelo, wekî ew bide pey wî. Ewana hatine xanîkî. Li wir ji serî hetanî piya Kelo nihêrîn, beriyê wî vejendin, vajî kirin, çep kirin, kêreke wî ye biçûk hebû, ew hildan, tizbiya wî jê stendin, ew pêxas kirin, nava solan, goran nihêrîn. Çawa dibên, ew qula derziyê ra derbaz kirin, mêze kirin û paşê ew anîne kitebxanê, bal Erebe Şemo.

Ew êpêce wede bû, Erebe Şemo danîbûne serwêrê kitêbxana lagêre. Kitebxane ji du oda bû. Yek biçûk, yek êpêcekî mezin bû, ya biçûk da sobe danîbûn, ya dinê pê da pê da kitêb, rojname û kovar bûn.

Ewana der da hatinê, Erebe ber sobê rûniştibû û kitêbek dêst da dixwend. Erebe Şemo çav Kelo ketinê him beşerxweş<sup>1</sup> bû, him xwe şaş kir. Ew meselê hesiyane şûnda nizanibû çî bike.

Ewana tenê manê hatine dest-rûyê hev, kêf-halê hev pirsîn. Paşê yek vî alî sobê, yek wî alî rûnişt. Erebe şerbikek çay direjî Kelo kir û got:

-Çaykê vexwe, paşê hinek nanê para min heye, em ê bixwen.

Kelo qe tişteke negot, şerbik ji destê Erebe bira hilda hê firek, dudu lê dabû, derî hate vekirin û xurekpehtê<sup>2</sup> girtingehê nava rojname da tişteke danî ser rûnişteke û got: Eva payoka (para) mêvan e.

We deqîqê jî zivirî çû. Ew çûnê şûnda Erebe got:

-Kelo bira, were wana çî daye em buxwen, wê şûnda hetanî berbangê hev ra hewal bidin. Şevê zivistanê dirêj in. Ewî aha got û mîna zaro destê xwe li hev xist ji şabûna, ji ciyê xwe qiloz bû û dîsa got:

-Şeva îşevîn bona min şeveke nebîrkirî ye. Hela binihêre ez ku, tu ku? Çiyayê Agiriyê ku, besta Qazaxistanê ku?

1 beşerxweş: rûgeş

2 xurekpeht: aşpêj

Kelo qe tişteq negot, ew mîna ewirê baharê yî reş kimkimîbû. Ewî usa dixwest, wekî hema vê demê evê lagêre ser hev da welgerîne, meftûlên (dirikên) dora keleyê bi kelem, bi diranên xwe va bicû, girtiyan gişkan aza ke û bibe xwedanê hespê Bor, Erebbide terkiya xwe û li bereka Çiyayê Agiriyê peya bin. Ew çok vede, sê cara erdê maç ke, hêja mîna zaran çalepiyan ewqasî here hetanî şelê lê di çoka da birize, paşê rabe, piştî xwe rast ke û bêje:

-Ya Rebbî, mirin heq e!

Ewî ya dilê xwe Erebbide ra negot û kerreker çend pirtî nan avsirê da kir, xwer û nişkê va bi dengekî ricaf pirsî:

-Ereb, bira, lê halê me yê çawa be? Em ê bibine xwedanê cî-warê xwe, yanê na?

-Bavo, -Ereb dest bi ya dilê xwe kir, - bobelata me ji wê yekê dest pê bûye, wekî em nava çar dewletan da hatine parevekirinê. Şipûka ser şipûkê ew e, wekî me hineka xwe daye ser tirkan, hineka ser farsan, hineka ser ereban, hineka ser ermeniyan. Bi tevayî tu yek wana naxweze kurd bibine xwedanê bextê xwe. Hinek dibên ew tirk in, ereb in, fars in, carina jî dibên qe millet û gelê awa tune.

Bavo, qîreke mayîn jî heye em ketinê. Ew jî bêyekîtî, pirqebiltî, axatî, begtî ye ...

Dema kurdên vê Kurdistanê radibe şerkariyê, kurdên Kurdistana dinê miqabilî wê yekê xayîntiyê, qelptiyê dikin. Dibên: "Kurmê darê ji darê nîbe, dar narize." Bi reza<sup>1</sup> hişê min kîngê kurdan gişk dest dane destê hev, kîngê gişk gura hev da bin, kîngê her çar beş bûnê yek, a wê demê em ê bibine xwedanê axa xwe ye helal.

Kelo tê derxist, wekî bersiva van pirsên ha bona Erebbide Şemo di-jwar e, çawa dibên, birîn ser birîna wî da tê, lema jî ewî pirseke aha da nivîskar:

-Keko, diqewime nişkê va we berdîn, ne ...

Kelo nêta xwe heta dawiyê negot. Erebbide bi beşereke xweş li wî nihêrî û got:

---

1 **reza:** 1. riza, daxwaz 2. destûr, reza, îzn \*\*\* **bi reza hişê min:** bi qasî hişê jê min dibire

-Ne hûtê dewrê miriye. Min rast nêta te derz kir, yanê na?

-Erê, welleh, usa ye.

-Bira, ez rojnama dixwînîm, radiyoyê dibihêm, gellek girtiyê “si-yasî”, yên mîna min têne berdanê, kî dizane, belkî hema sibê ez berdâm û em ê tev herine gundê we, paşê herine mal.

Erebê Şemo ev gilî-gotin usa qal dikir, usa şa dibû, te qey digot, ew îdî aza ye.

-Erebê bira, welleh, ev yek nuqtiye dilê min, wê zûtirekê te berdin.

-Van rojana, eva weke bîstekê heye, min jorê ra derheqa xwe da bi hûr-gilî nivîsiye, hela bersiv tune.

Îcar jî Ereb pirseke mayîn anî ser zara û got:

-Di riya Xwedê, pirsê etib tunebe, tu ji kîjan qebîlê yî?

-Ereb, bira, me ra dibên “Şawelîka”.

-Peh, kulê tu mala mêra nekebî, ew î çito mêr bû?

-Ereb, tu derheqa kê da dibêji?

-Naha guh bide min binê te ra çi dibê? Ez î neh deh salî bûm. Wê salê oba me nêzîkî oba Şawelîka bû. Li bereka Çiyayê Agiriyê bi hezaran obe hebûn. Oba Şawelîkan obeke here giran bû.

Ereb hinekî xwe kerr kir, lê dîsa dûmayîn da axaftina xwe:

-Kulê tu mala mêra nekebî, çito mêr bûn! Bejin-bal mîna dara qelemê bû, axaftin şekirê Şamê bû, rabûn-rûniştandina wî mîna Çiyayê Agiriyê giran bû. Siyarekî erhede<sup>1</sup> bû. Jê ra digotin, siyarê qitîtkê<sup>2</sup>. Zîn-busatê hespa wî timê bi pergal bû. Ewî timê koloz dida serê xwe. Di nava salê da ewî du celeb koloz dida serê xwe; yek sipî bû, yek qemer. Rojên oxirmê giran ewî kolozê qemer dida serê xwe, şela qemer e bi rîşî dorê dialand. Kolozê qemer nişana wê yekê bû, wekî dujmin dîsa dixweze dujmintiya xwe bike. Kê ew dûr va bi wî kolozî didît, xwe xwe ra digotin, mij-dûmana dujmin, xofa neyaran ser welêt da girtiyê, gotî her kes ber mixeneta bibe hasêge<sup>3</sup>.

Rojekê ez bavê xwe va çûbûme oba Şawelîkan. Hecî Sadiq bi dest siyaran va wê da hatin. Obe obetî derketine pêşiya wana. Hema ew li ber konê danzdeh stûnê ji hespê peya bûnê, got:

1 **erhede**: 1. tîkûz, birêkûpêk 2. bêşik, teqez

2 **siyare qitîkê** yê ku bersiva ne bi xêr dibe

3 **hasêge**: asêgeh, berbend

-Zû bikin kolozê min î sipî bidin!

Xortekî kolozê wî yî sipî anî da serê wî. Ew kolozê sipî, rîşiyê şel-şe-maqiya sipî rewşeke nedîtî da dêmê wî. Te li bejn-bala wî mêzekirinê, ew mîna çiyakî bi serî berf dihate kivşê. Ev gişk nîşana wê yekê bû, wekî bi serkariya wî dujmin hatiye altkirinê û bi serfinyazî vegeirîne. Hema vê demê rîdansiyaê êlê nezîkî wî bû, hate rûyê wî û got:

-Lawo, Xwedê rûyê te sipî ke, ked-heda dê-bavê li te helal bê! Tu wê da hatinê, kê tu dîtî pêşiyê serê te dinihêrin. Dibên, ka binê Hecî Sadiq kolozê sipî daye serê xwe, yanê yê qemer. Kolozê sipî dîtî dibên, erê, yanê dewat e, yanê şayî, kolozê qemer li serê te dîtî dibên, roja cengê ye. Yên bi xîret çeka hildidin, didine pey te, yê bêxîret dikevî mal, dêrê dê-xuşkê, yanê jî dêrê jinê dikişînine ser serê xwe.

Hecî Sadiq hate destê kalê, kalê dîsa got:

-Lawo, bizanibe meriya berê xwe danê çiyê, pêşiyê serê wî mêze dike. Dixweze bizanibe ew çiya çiqasî bilind e, merî dikare derê serê wî, yanê na? Yek jî dost serê mêriv dinihêre, dujmin piya. Bila kolozê sipî timê li serê te be, dost lê binihêre şa be, dujmin kor be.

Vira Ereba xwe kerr kir, axînikê usa rihaşt, çawa dibên, heft bendê piştî wî qetiya. Bi desmala desta va hêsirên ber çavên xwe paqîş kir, ew kete rojê usa gunê mêriv bi wî dihat. Demeke xurt derbaz bû, paşê dûmayîn da bûyera xwe:

-Bavo, tu dizanî, bextê wî zilamî çawa bû? Dujmin dirav, bertilî<sup>1</sup> da kurdekî xwefiroş û ewî Hecî Sadiq bi nemamî, bi mixenetî kuşt!

Kelo mîna zaro kelogirî bû, got:

-Ez wê qewimandinê rind dizanim, ji ber ku Hecî Sadiq kalikê min bû.

Ewî aha gotinê, her du jî, ji ciyên xwe rabûn, hev hemêz kirin û mîna du xerîba êpêcekî hemêza hev da man.

-Lê Ereba bira, -Kelo got,- nizanim tu dizanî, yanê ne, zivistana dinê ew kurdê xwefiroş li daristanê xalifî, çûn dîtî, gur ew xweriye. Paşê malbeta wî belabela bû. Kevirê wê malê ser kevirê nema.

---

1 bertilî: rişwet

-Na min ew nizanibû, lê belê, gotî usa jî bûbûya! Dawiya mixeneta, dirûzan, welatfiroşan timê mîna kulleka, ku li bajonê dimîne, yanê diz dibe, yan gur duxwe.

-Belê bira, usa ne.

Ewana ewqasî hev ra axifîn, şev ji şevê derbaz bûbû, Erebe Şemo got:

-Bira, rabe em serê xwe daynin, belkî ketine xewê. Hela ez ê xwe ra çîrokekê bêjim, paşê têkevime xewê.

-Çima?

-Bira, gelê me him xwedanê dîroka mezin e, him xwedanê zargotina dewlemend e. Bona ez vira girtîgehê da zimanê kurdî bîr nekim, ez her şev ketinê nava cî, xwe xwe ra çîrok, beyteke gel dibêjim; bi wê yekê va him jî derd-kulê xwe bi wedelî<sup>1</sup> bîr dikim.

Wana bi hesretî rûyê hev nihêrîn, bi dilekî bargiran va serê xwe danîn, wekî têkevime nava dunya sisiya-nava xewê, xewnê.

Berbangê berfê lê nedikir, hewa xweş bû. Mîna her roj li girtîgehê dihate wekilandinê. Ereba rabû roder vekir, nihêrî, wekî girtî li hewşê diwarizin<sup>2</sup>, hewa jî seqirtiyê. Ve gavê Kelo jî rabû. Wana sibexêrî dane hev, Ereba av danî bikele, Kelo rabû, ku xatirê xwe jî birakê xwe bixweze here, lê ewî nehîşt, got:

-Hinekî sebir ke, em kase çay vexwen, paşê here.

-Erebê bira, naha îşev gişk ziravqetî bûn, wê bêjin, gelo, çi hate serê wî?

-Tişt nabe, her bila saxî be.

Hema vê demê yekî derî kuta. Ereba derî vekir, xortê hatî bi dengêkî şa got:

-Profêssor, serkar dibê, bila zû bê, ji Moskvayê emir hatiye, wekî te berdîn.

Ereba ciyê xwe da, Kelo ciyê xwe da bûne risas<sup>3</sup>. Hinekî şûnda Kelo pêş da hat û Ereba hemêz kir, got:

-Ereba bira, çavên me tevayî ron be! Bextê te me, ber xwe bide, zû here belkî tu berdan hema em tev herin.

1 **bi wedelî:** di pêvajoya demê de

2 **warizin:** perwerde bûn

3 **risas:** hesinê herî hişk, pola



Te hew dizanibû Erebe ji xewê hişyar bû û ji odê bi rev derket.

Danê nîvro ereba Kelo ji hewşa girtingehê ra derbaz bû, gihîşte derge, Erebe jî li wir bû. Hineka dora wî birrîbûn, bi şabûn ew pîroz dikirin. Weşek derbaz bû Erebe Şemo li erebe siyar bû û erebe ji dergê girtingehê derket. Rojên reş para va man. Riya ber bi gund her diçû kin dibû. Rê va her du destbiraka her tenê derheqa qewimandina şeva derbazbûyî, ya roja îroyîn da digotin-dibilandin. Hela tu binihêre çî dibe! Kê ra bêjî kesek bawer nakê!

Ewana hê êpêcek mabû bigihîjjine gund, te hew dizanibû, gundî gişk hatine Kelo bigerin. Wana ev yek dîtîne şabûna deng dane dengê hev. Xortekî bi siyarî bersiv bire gund. Kelo wana gihîştîne bintara malê dengê zurnê, diholê erd û esman hilda serê xwe. Govend şên bû, ber piyê Erebe Şemo pez ser jê kirin.

Erebe Şemo kete sergovendê.

## 15

Belê, Stalîn miribû. Qeşa zemîn hêdî hêdî diheliya, ava şolî zela dibû. Îdî heqî û rastî derketibûne meydanê, neheqî û derewî bi rûreşî direvîn, dûr va dûyê wan î bi qetrana salan dihate kivşê.

Dewirê da sal hene mîna lêmiştê<sup>1</sup> ne, sêlava wan hatinê kevir-kuçikan, avayî-qesiran, pê ra jî hezar tiştî ro da dibe. Dewirê da sal hene mîna çiya hilwedişên<sup>2</sup>, ew jî dibe şipûkeke nedîfî.

Sala 1926a boy pareke gelê kurd bû sala revebezê, salên 1928a, 1929a, 1937a, 1947/48a bûne salên nefikirinê. Sala 1926a bi sedan malbetên kurdan ji wî alî Erez, derbazî vî alî bûn, xwe dane ser riya Yekîtiya Sovêtê. Salên 1928/29a ji Ermenîstanê tenê kurdên musulman bi zorê anîn derxistin nehiyên Azerbaycanê, Yêvlaxê, Berdê. Salên 1937a, 1944a. 1947/48a payê pir ji Ermenîstanê, çend gundê ser sînorê Ermenîstanê ji Nexciwanê, ji Gurcistanê kurd nefî kirin. Sala 1947a fermana Stalîn derket, wekî kî hatiye nefikirinê bila vegere. Dîsa koçkoç. Ev gişk çawa zarok bendik dora gizîkê dialîne, paşê serê bendekî dinê destê xwe da xayî dike, gizîkê davê erdê, ew hinekî dora xwe fitil dide, zexim, bayê avîtina gizîkê xilazbûnê, ew ser kêlekê dikeve. Dû ra zarok dîsa gizîkê hildide, bendikê destê xwe dialîne, ewqasî dilîze he-

---

1 **lêmişt:** ava gur a heyamên baranan, sêlav

2 **hilwedişên:** hildiweşin

tanî diweste, dû ra bendik jî, gizîk jî bîrê diçe, sibê tê dinihêre zarokên mayîn ew dizîne, birine. Awa salên derbazbûyî kurd, li dora zemîn alandin. Dewletên zordest jî ewana mîna gizîka destên zaran hildan li dora salan alandin, avîtine nava best-beyaran, nava agir-alafê. Lê dibên, emirê rojên reş kin in, birînê kûr dicebire. Lê birîna neffikirinê çawa cebirî? Ewana him erdê ra xişikîn<sup>1</sup>, ketin, rabûn, revîn, bezîn, sekinîn. Dawiyê da yên mîna Kelo, apê Heso, Sedo Delo yên mîna Geveza bêhevri<sup>2</sup>, Xana belengaz, Seyrana qertel bi hezar hesretî, bi dilbirîn bûne xurê axa sar. Giliyên Kelo, yên ber ruhê mirinê ev bûn: “Hesreta xerîbiyê, axîna welêt ji mirinê girantir e.”

Ev giliyê wî camêrî û gotina Mîro, ya ku li merzel, ser tirba Kelo qal kirîbû, her wede derbaz dibû mîna bûyerekê him ser da dihate zêdekirinê, him kêmkirinê, devko<sup>3</sup> li vî gundî, li wî gundî, li vê komelê, li wê komelê di nava kurdan da digerî, dihate qalkirinê.

Roja defina Kelo ne ku tenê biçûk û mezinê gundê wan, lê usa jî ji gundên der-dor, ji komelên dinê mirov hatibûn. Ewana qelfe-qelfe dora tîrbê sekinîbûn. Ber serkêlka rehmelêbûyî alîkî Mîro, Siyabend di nava herda da Nado sekinîbû. Mîro bi dengê lerizî got:

-Hevalno, porsipî, rîdansipîno, qewm, pismam, wêlî, xûşkên delal! Îro me mirovekî usa sparte axa sar, wekî ew boy gelên xwe di nava tariyê da hey birq vedida, hey vêdiket! Edetê mirov spartinê mala heq dibên: “Birao, yanê jî xûşkê, rehet razê.” Lê ez nikarim ewê yekê apê Kelo ra bêjim, ji ber ku, ez sedî sed bawer im, wekî ew birînê ku ew seranser pê dinaliya di axa xerîbiyê da rehet nabin, lê ewê yekê rind dizanim ciniyazê wî yê li vir be, ruhê wî yê li Bayazîde tevî ruhê Şêx Xanî be!

Peş van giliyan ra çavên wî tijî hêsir bûn, lêv lê hejiyan. Hêsirên xwe paqîş kir, çend çirikan ker-lal sekinî, dîsa dûmayîn da axaftina xwe:

-Dibên apê Kelo evarê serê xwe daniye ser bêlgî, sibê ranebûye. Dibên ew nişkê va miriye, dibên ciyê wî cinetî ye! Her tişt usa ne. Lê

---

1 **xişikîn:** mîna maran bi erdê re kaş bûn

2 **bêhevri:** bêhemta

3 **devko:** devkî

ew nişkê va nemiriye. Hukumdarên telaqreş, dewsa ku xwe efû bahatana, bigotana, wekî kurd hene, ewana ser ciyê bavpîrê xwe nin, me hatiye destdirêjayî kiriye, lê bi hezaran kurdên mîna Kelo dane û îro jî didine ber ba-bager, bahoz-teyrokê dewra xwe, hey divedînîn wana bi carekê va hûr-xaş bikin, lê ew ji heft saliya xwe heta roja mirinê, nerastî, derewî, qelptî, mixenetî, xayîntiya dujminê gelê kurd ra qayîl nebû û van gişka ra destepiçelkî bû, şerkarî kir. Wana timê ew wê da dikişand, ewî xwe ber bi gel dikişand, hetanî Ezraîl hate hewariya mirinê û bû piştovanê wê, hê paşê destê wî ji destê me kir.

Bibihîzin, binihêrin di nava heştê salên jiyanê da apê Kelo çi dît, çi kişand? ... Rev, tîbûn-birçîbûn, girtingeh, salê nefîkirinê, zelûlî, belengazî, zêrezêra dayîk, xûşk, bûkan, derdên xort, mêrên bokeberan, yên ku îro jî kes nizane ku da birin, çima bêserobino unda bûn? Mereza kur, ya sereke bêwelatî, bêxweyî, bêpişt, xerîbî bûne hevalê riya wî ye bi veqer, veqer, bi hasêgeh. Evan kirinên dujmin cêhê cêhê<sup>1</sup>, yeko yeko têkî pêpeling wê bibe pêlekaneke usa ye bilind, ew ê bigihîje erşê esmîn.

Kî destê xwe dirêjî wê pêlekanê bike agir-alaf ê wî bihingivîne, kî piyê xwe bide ser wan pêpelingan, pî yê lê biqerime, tamar ê buqusudin, laş ê bicemide.

Lema gotine: “Dewir bi dor e, ne bi zor e”. Dora wan rehmelêbûya aha hat, aha bobelata zemîn ra derbaz bû çû.

Naha Nado, Mîro, Sano, Xalgerden, Gulîzer, Helîme û yên mayîn ketibûne govenda jiyanê. Her dewranekê miqamekî wî heye. Mirov jî xwe bi wî miqamî digire. Ew ê çawa ber wî miqamî bixingire yekîfî, yek ji kulma giran dizane?

Hema em dûr neçin, bêne ser Nado. Zarotiyê da pêxas, birçî bû, xwe femkirinê nava tengasiyê, paşê nava tirs-xofê da bû, cîwantiyê da bi destên xwe pêşîra wedê girt, çawa erdê veçirî, a usa bi zorê pêpeling, pêpeling bilind bû. Înstîtûtê da xwend, zewicî, çend sala li gundên dûrî rê-dirba dersdarî kir, nivisî, nitirand, lêkolîn kir, çendî çend gotarên wî ye ulmî hatine weşandinê, aspîrantûrayê da xwend,

---

1 cêhê cêhê: cihê cihê

naha jî çawa kurdan digotin, li serbajarê bajara, li Moskvayê amade dibe dîsêrtasiyê<sup>1</sup> xweyî ke.

Nêzîkî mehekê bû ne şeva Nado şev bû, ne roja wî roj bû. Diçerçirî. Lê alîkî dinê da şa bû, wekî destûr dabûn avtorêfêrata<sup>2</sup> wî hati-bû weşandinê. Ewî avtorêfêrata xwe ser navnîşanê pêwîst şandibû, hîviye bû, ka binê ji kê derê çawa nêt têne stendinê. Ew pê hesiya, wekî çend ulumdarên welêt e bi nav-deng nêtê xwe bi qenc nivîsîne û şandine.

Ew bêsebir hîviya roja xweyîkirina dîsêrtasiyê bû. Çend roja berê Helîme jî hatibû. Sibekê gote Nado:

-Delalo, qe ber xwe nekebe, her tişt ê pak be. Ne tu dibêjî, ez stûna mala te me. Îro ez him jî piştovanê te me, qe xema nekişîne.

-Bûka dayîka min, erê usa ne. Tu nîbûyayî ez ê nivê rê da bimama.

-Na, tu ne ew merî yî, wekî nivê rê da bimînî. Bes e tu min bipe-sinî, ezîzo, werê bêje, ka binê îro em çi bikin? Sibê na, dusiba roja xweyîkirina dîsêrtasiya te ye.

Ewana bi hev ra kêfxweş bûn û çend karê, ku we bihata kirinê, çawa dibên, di nava hev da pareve kirin.

-Helîme, -ewî bi nerehet got, - ez bona tişteki jî posîde me. Gelo, pey dîsêrtasiyê ra em ê bikaribin bankêtê<sup>3</sup> çawa pêwîst e bidin.

-Xwedê hîştò, ne ez ji gund hatime, lawikan gotin, em ê rojekê pêş da bên û li Moskvayê sifreke kurdî ye usa vekin, wekî heta hetayê bê gotinê.

-De bila gotina te be!

Ewana ji mêvanxanê derketin, ber şêmîka wê dîsa pev ketin, wekî kî karê xwe kuta ke, vegere vira.

... Barîgeh<sup>4</sup> mirovan va kimkimî bû. Çend endamên Şêwra Ulmî li jorê - dîwanê rûniştibûn, Nado ber kursiyê şirîn şirîn diaxifî, peyîtandin dikir, heldan dida. Hema vê gavê derî hêdîka vebû, yekî bejin-nîvçe, çawa dibên, şûştî-mûştî, paqîş xwekirî, bi dêm nûranî

1 **dîsêrtasiya:** (bi rûsî ye) xwendina piştî masterê; doktora

2 **avtorêfêrata:** (bi rûsî ye) teza doktorayê

3 **bankêt:** xwarina pîrozbahiyê

4 **barîgeh:** salona konferansê

hat, cîkî vala rûnişt. Êpêcek derbaz bû. Xweyîkirina dîsêrtasiyayê bi serfîniyazî ser hev da dihat, xût ew mirovê dawiyê da hatî, rabû çû kaxezek dirêjî serokê Şêwra Ulmî kir û dîsa hat ciyê xwe da rûnişt.

Dawiya enenekirîna dîsêrtasiyayê da serok got:

-Hevalno, Nadoyê Kelo em bi kara xwe va şa kirin! Ulmekî nûh ser ulm da anî! Em wî ra ji vir ha da jî serfîniyaziyê, serbilindayê dixwezin!

Hemûya destê xwe hev xistin, hinek ber bi Nado revîn baqê gulan dane wî. Lê akadêmîkê, kû serokê dîwanê bû, got:

-Hevalno, kerem kin gişk ciyê xwe da rûnên! Hevalek, nivîskarê kurd Erebe Şemo ji Rêspûblika Ermenîstanê, ewqas riya dûr hatiye, em gilî bidine wî.

Hetanî mirovên barîgehê ciyê xwe da rûniştin, ewî çû Nado hemêz kir, hate rûya, paşê selam da hemûyan û got:

-Nado, ez hatime îro pêşberî ewqas mirovî, di vê roja nav-nîşan da bêjim, wekî girtingehê da min nanê bavê te xweriye, rehma Xwedê wî be!

-Ez hatim bêjim, qîreta kurdan ez anîme vira! Şîrê diya te li te helal be!

-Ez hatim bêjim, riya jiyana her kurdekî mîna hev e. Ji destê fîbûn-birçîbûnê, ji destê rev-bezê bavê min destê me zarên sêwî, diya me miribû, girt û ji Tirkiyayê hat derkete welatê Sovêtê. Min bi hezar diwariya va xwend, derbazî rêzên Partiya Kommûnîstê ya Yekîtiya Sovêtê bûm, nava kurdan da kareke hêle kir, lê ciye sekinî ez girtim, çend sala girtingehê da mam. Bavê te Kelo kurdekî nexwendî bû, lê bi kirîna xwe ye helal va xwedanê nav-dengekî bilind bû, sala 1936 mîna min ciyê vala girtin, berdane û sala 1937a bi hezaran malên kurdan ra tevayî hate nefîkirinê. Tu birûskê ew netirsand, ewî ewledê mîna te mezin kir, bû rûsipiye kurdan.

-Ez hatim bêjim, tu ji nava tariyê derketî, tu ser cimcime<sup>1</sup>, herî-reşka sala ra derbaz bûyî û îro li serbajarê Yekîtiya Sovetê da dîsêrtasiyayê xweyî dikî!

---

1 **cimcime:** qaqotkê seriyan

-Ez hatim bêjim, pola di nava êgir da heliyanê qayîm dibe, kurd di nava diwariyê da, ber neheqî, nerastiyê şerkarî kirine, kesek nikare çoka wî dayne erde, ew bilind bilind dibe!

-Ez hatime bêjim, pey ewqas agir-alaf ra, pey ewqas helandinê ra te bi serfîniyazî dîsêrtasiya xweyî kir, tu yê bibî ulumdarekî usa, wekî wê bi tiliya te nîşandin, min jî povêş- teke<sup>1</sup> nûh nivîsî, navê wê danî “Berbang”, ewa da weşandinê. Ewê hê ronahî dîtiye. Destûrê bidin ez “Berbang”ê rewayî ewledê kurd Nadoye Kelo bikim û bêjim: “-Bila dujmin rind bizanibe, wekî kurd tu dema nahêlin govenda Welatê wan paşopêl be! Ew roj ne dûr e, nêzîk e!”

Pey van gotina ra ew pêş da hat, wekî kitêba xwe “Berbang”ê bide Nado. Nado jî rabû ber bi wî gav kir. Wana dîsa hev hemêz kirin, Erebe Şemo kitêb da Nado, dîsa destê xwe hev xistin.

Ulumdarekî li dîwanê rabû, berbirî Erebe Şemo bû:

Nivîskarê birûmet, kerema xwe bêjin hûn ji ku ewqasî rind hîn zimanê rûsî bûne?

-Bîçûktiyê da, -Erebê Şemo dîsa bi lewzekî zelal got,- ez mala malekan-rûsekî da dimam, min xwulamî dikir.

Erebê Şemo awa bersiva ulumdar da û pêş da hat, dîsa kêlimî:

-Dersdareke kîmyayê, keça kurd bihîst, wekî ez ê bême wira, hîvî kir ez nêta wê ye derheqa dîsêrtasiya Nado da bidime we.

Serokê Şêwrê ew kaxez ji destê Erebe Şemo girt, hilda û ber çavên xwe ra derbaz kir û nişkê va rabû, bi şabûneke mezin got:

-Hevalno, evê dersdara mekteba navîn nêteke bi ulmî ye kûr nivîsiye. Ez gişkî naxwînim, hîvî dikim guh bidine çend hevokê wê ye dawiyê: “Min avtorêfêrata ulumdarê ciwan Nadoye Kelo xwend û hatime ser wê nête, wekî mektebên welêt da lêkolînên wî ye ulmî, di emir da miyaser kin, ulme kîmyayê wê bigihîje hêlanen bilind û wê ser gellek sura bê vekirinê.”

Ulumdar ev rêzana xwendinê şûnda got:

-Ez ji dil dibêjim: Eferim, keça kurd!

Dîsa destê xwe hev xistin. Serokê Şêwra Ulmî rabû got:

---

1 povêst: roman

-Ez dinihêrim di barîgehê da kurd êpêcek in. Gelî kurdno, ewledê we pêlekan daniye bigihîje bendava ulm, ew îdî çend pêpelîgan bilind bûye! Bi vî şa bin, bi vî firnax bin! De bi xatirê we!

Hemû rabûne piya, ser hev, ser hev destê xwe hev xistin. Mirov hedî hedî ji barîgehê derketin, Nado destê Erebe Şemo girt got:

-Keko, were ca van xort-bûken kurdan va bibe nas. Lawikên ji Qazaxistanê, Qırqistanê, ji ciyen mayîn hatî dora Erebe Şemo girtin. Ew yeko yeko hemûya ra bû nas, kêfê wan pirsî. Mîro got:

-Kekê Erebe, kerem ke em herine ziyafetê. Ew yek sipartine min.

-Xorto, Xwedê ziyafetê daha mezin bike qismetê me. Lê ez gotî bi ecele herime çend ciya. Kitêba min “Berbang” wê bi zimane rûsî, lê wê bi navê “Şivanê Kurd” bê weşandinê. Sibê danê nîvro jî ez ê vegerim.

Lawika çiqasî kirin-nekirin Erebe Şemo nehate ziyafetê, xatirê xwe xwest, çû.

Nêzîkî înstîtûtê rêstoranek hebû; lawika li wir ziyafet amade kiribûn. Hemû tişt pêş da kar pê hatibû kirinê, Êpêce mirov hatibûne ziyafetê.

Hevalekî Nado, kandîdatê<sup>1</sup> ulmê dîrokê, ewledê gelê Çeçena Rûslan tamadetî<sup>2</sup> li ziyafetê kir. Te tê derdixist, wekî Nado dubare şa ye. Kê radibû diaxifî, dawiyê da digot, min emirê xwe da nan-lewaş, penîr, goşt-qeliya aha, xurekê aha ye bi tehm-lehm<sup>3</sup> nexweriye.

Hey diçû ziyafet bi gur dihate derbazkirinê. Du merî qe rûnediniştin, yek Mîro, yek Helîme bû. Ewana diçûn-dihatin, xwerin-vexwêrîna ser destexanê destê wan da bû. Rûslan beqala bi sirê hilda got:

-Ez hîvî dikim, hinekî seqirtiyê çav ra kin. Helîme, xûşkê, were bal Nado rûnê, cî heye, Mîro bira, tu jî here bal hizkiriya xwe rûnê, ez ê pirseke pîrr ferz bidime Nado. Wekî ew bersivê bide, wekî usa ne rastî jî ew ewledê gele kurd e.

Seqirtiyê rêstoran hilda. Hemûya bi hewas Rûslan nihêrî. Ewî jî çavên xwe li beşteran gerand û bi hemdê xwe kêlimî:

1 **kandîdat:** berendam, namzed

2 **tamadetî:** amadetî, pêşkêşî, koordinasyon

3 **bi tehm-lehm:** bi lezet



-Kî dizane, dizane, kî nizane, bila bizanibin; ez çêçen im. Em jî hatine neffikirinê. Ji sala 1937a hetanî sala 1947a mala me li Qirqistanê cîranê maleke kurda bû. Ez rohilatzan im. Ez gellek welatê Şerqê geriyame, bi ulmî dîroka wan gela ra bûme nas, min xwe jî dest avîte wê dîrokê nivîsî. Ez hatime ser wê nêtê di Rohilata Dûr-Nezîk da tu gelî weke kurdan boy azayê şerkarî nekiriye! Lê hela ew gelê merxas bindest e. Nado, bira, pirsra min eve:

-Bi duneditîna te, ew gel ê bigihîje azaya xwe, yanê na? Ez ewê jî dizanim, wekî îro bi serkariya Melle Mustefa Barzanî, yê ku çend sala li Sovêtê da ma, li Îraqê dîsa şerê kurdan, yê bona azayê gur bûye. Nadoyê bira, kerem ke bersiva pirsra min bide.

Nado qe bawer nedikir li vira pirseke awa bidine wî. Ewî beqala destê xwe danî ser peşxwînê, rabû bi destê rastê va eniya xwe ye kever mizda. Qerçimekê eniya fire ser hev da hatin. Ewî çavên xwe li rûniştîyan gerand, şabûnek hate dilê wî. Sano-Xalgerden, Mîro-Perînaz, Siyabend-Gulîzer û çend delalên mayîn, yên mirazê hev şabûyî rex hev rûniştibûn. Her yek ji malbet-ocaxeke kurdan bûn, bi hezar riyên dijwar ra derbaz bûbûn û îro bi mirazê hev şabibûn, him jî bûbûne piştovanê hev.

Paşê vegerî Helîmê nihêrî. Demeke xurt wî delala xwe mêze kir. Te hew dizanibû, ew dipirse, dibêje, “Lê lê, bûka dayîka min, hinekî berê, gava min bi ulmî bersiva akademîk, ulumdaran danê, ez ewqasî neketime dijwariyê, ez çi bêjim, ez çawa bêjim?” Te hew dizanî ewa jî dibêje, “Xorto, delalo, bersiva pirsê usa bide sibê em şerm nekin, di nava hevalan da serê xwe berjêr nekin! De bila Zerdûşt bê hewariya te!”

Nado çend çirikan dilê xwe ra axaftî û nişkê va bûyerek kete birê, eniya kever, dêmê bedew mîna ronahiya nava tariyê şewq da û got:

-Hevalno, delalno, gelê min ê zû, yanê dereng wê aza be! Wekî îro ez bi dehan ser qewimandinê bûyî bisekinim, bi ulmî wê pirsê şirove kim, hinekê bawer kin, hinekê na. Ez ê bûyereke, ku gelê min efirandiye qal kim, paşê hûn bi xwe hildin, daynin, binêhêrin ew gel ê aza be, yanê na?

Nado careke mayîn li beşterbûya mêze kir, te tirê dixwest lawika ra bêje, metirsin, ez we rûreş nakim. Û awa dûmayîn da nêta xwe:

Şivaneî timê danê nîvro keriyê pezê xwe dadixiste ser çemê bintara golê; dida avdanê û bin dara wê derê ye tenê da dida mexel. Bi xwe dest-piyê xwe, ser-çavên xwe dişûşt, hinekî rûdinişt, bîna xwe distand, paşê du miyên qerd didot, nan diçande tasa weke badîkê, kevçî hildida bi tehm-lehm dixwer. Wê şûnda dihate devê golê, ser kevirê hertimî rûdinişt û li kirinên beqan mêze dikir, şelpeşelp, qurequra wan mîna miqamekî li wî xweş dihat, him jî ewî ew yek îdî xwe ra kiribû mijûlî. Roja ku ew nedihate ser golê wî hew dizanibû ewî tişteki pirr pirr hêja unda kiriye û posîde dibû.

Îro jî ew mîna her ro ser kêvir rûniştibû û bi mijûliya xwe va mijûl bû. Nişkê va nûqî dilê şivîn bû, wekî gelo beq çawa di nava avê da, usa jî di nava şîr da dikare bimeşe, yanê na? Şivîn rabû pezek-dudu dot, hinekî çerçirî du beq girt, avîte tasa şîr. Beqekê qe xwe ba nekir, nava şîr da bêgav ma, hinekî devê xwe vekir, girt, şîr tijî gewriyê bû û êmekê şûnda çavên xwe girt, mir. Şivîn beqa mirî ji tasê derxist wê da avît, lê beqa dinê derekê nesekinî, di nava tasê da vir da, wê da meşiya. Beqê dît û tê derxist, wekî cî-war, dunya wê hatiye guhastinê, şivan jî mîna ruhistînekî ser ra sekiniye. Lê du rê pêşiya wê bû, yek ew bû, wekî mîna hevala xwe bindestiyê, mirinê ra radest bûya, yanê jî bona ji nava tasê derê bigihîje emir-jiyana xwe, gotî çiqas bedenê da hêz, çavan da ronahî heye, miqabilî hal-hewalê destdayî şerkariyê bike. Mirin nêzîk e, azayî dûr.

Xof û tirs nava perdeke da nê, ro-robariya wana mirin e. Kî ji wê perdê natirse digihîje meremê xwe. Te tirê beqê ew perde serê xwe alandibû û lema jî ser hev, ser hev nûqî binê şîr dibû, wekî wêya bigihîne binê tasê, wêya wira bihêle û ser ra derbaz be, pêpes ke. Lê çiqasî nûqî binê tasê dibû, rêke bi şemal wê ra venedibû. Carina dengê beqên gollê, dengê wan î hetaviyê dihate guhdariya wê, ewana nava dunya xwe da bûn, lê ewa di nava dunya tarî, dora wê çarmedoreke bi zincîr bû. Tasa şîr bona wê bibû beroşa qîrê-qetranê, nav da dikeliya-dipijiya. îcar jî beqê di nava şîr da sobekarî kir. Meş da xwe pêş da çû, lê serê wê dora tasê ket, paş da vegeî. Dîsa pêş da, paş da çû, hat, hey şîr çeliqand. Te hew dizanibû bona wê westandin tunebû. Ewa çend cara vir da, wê da çûnê-hatinê êmê çirikekî devê xwe dukuta keviya tasê dikojî. Dîsa dikire çelpeçelp şîr dida

ber çelqan. Demek derbas bû, şîr misqal-misqal hev girt û li keviya tasê bû gilê rûn. Beqê dît ji şîr bilindtir tiştêk li keviya tasê zeliqiye. Ewa ji wêda hat, derkete ser gilêya rûn û ji wur jî banzda erdê. Li erdê ewê dora xwe nihêrî, carekê-duda xwe vir da, wê da bakir, ji şîr dawaşand. Hema li ciyê sekinî bi ecêbeke nedîtî va deng derxist, kire qurequr. Ji gollê hev ra hev ra dengê beqa hate bihîstinê. Te qey digot ewê li heqan dikire hewar, qazî, wekî rabin pişt bukutine pišta hev, min qeyd-zincîra koletiyê, bindestiyê qetandiye, perda tirs-xofê rizandiye, ez aza me, ez têm! Wana dîsa deng da dengê wê.

Belê, beqê dît, wekî ew aza ye, pey hev, pey hev banzda û bi şelpînike giran va xwe avîte gollê; gihîşte dunya xwe.

Şivan bû şehedê ecêbeke mayîn jî. Beq ketinê nava gollê ava wê xeleq xeleq bû, te hew dizanibû beqan binê avê da govenda azayê girtine, direqîsin.

Nado vira xwe kerr kir, li hemûya mêze kir, bîna xwe stend, dîsa kelimî:

-Naha hûn bi xwe bêjin, gelê ku bi sedan bûyerên aha efirandiye, gelên ku welathizî dil da mîna alavê dişewite, mîna koziyê dişuxule, gelê ku şûrê tengasiyê hê nekiriyê kêlîn, gelê ku ruhê xwe bi azayê, serbestiyê va straye, tu dema bin lepa û ber desta namîne!

Nado bûyer ser hev da anî, rûnişt û te qey digot barekî giran ji ser wî hildan. Helîmê beqalê ava berbesî da wî. Ewî bi destekî şidiya va beqal<sup>1</sup> girt, av vexwer. Vê gavê serokê Nado yê di aliyê ulm da rabû û got:

-Nado, ez dîsa te bi dil pîroz dikim, te rojekê da du dîsêrtasiya xweyî kir. Destûra min hebûya min ê du dîplom bida te.

Hemû rabûne piya, destê xwe hev xistin, şa bûn, tamade<sup>2</sup> jî got:

-Ez dizanim, wekî zarogotina kurdan dewlemend e, lê ev bûyer sertaca hemû efirandinan e. Belê, gelê, ku ev bûyer efirandiye, tu gava bindest namîne!

Ewî hê giliyê xwe kuta nekiribû, jineke bejinbilind rabû û got:

-Tamede, destûrê bide min, ez çend giliya bêjim.

Rûslan bi beşereke xweş got:

1 **beqal:** piyale, îskan

2 **tamade:** amadekar, koordînatör

-Ez çi kare me destûrê nedime katiba ulma. Fermo!

Nadêjda Îsayêvna bi binare xwe ba kir, ciyê xwe guhast, berê xwe da hemûya, got:

-Ez jî kêm-zêde haj dîroka kurdan heme. Ez bûyera Nado qalkirî ra him qayîl im, him na. Çima? Kurd şêr e, piling e, lê ne heq! Him-berîhevkirin xweşa min nehat.

Te hew dizanibû Helîmê berê da tê derxistibû, ew ê çi bêje, lema bi culet rabu û bi kurdî gote Nado:

-“Şêr şêr e, çi mêr e, çi jin e.” Naha tu binihêre ez ê ewê çawa zenda zer bialînim.

Dû ra bi rûsîke paqîş got:

-Bila Nadêjda Îsayêvna, min efû ke, ewa çawa pêwîst e, nekte nava filosofiya bûyerê. Rast e, şêr, piling bihêz in, lê ewana gellek cara hema ciyê badilhewa xwînê dirêjin. Gelê min aşîfîhiz, ronahî-hiz e. Bûyerê da filosofiyeke kûr heye. Ew jî av e. Beq avê da dijî. Av emir-jiyan, ronahiya dunê ye. Av nîbe dunya yê têkeve nava tariyê, jîyan ê tunebe! Gelê min bi wê bûyerê va xwestiye bêje, wekî xwe ronahiyê bigirin û ber bi azayê herin!

Nadêjda Îsayêvna bi qure qure ber bi Helîmê çû; gihîşte wê, ew hemêz kir, hate rûyê wê û bi dengê bilind got:

-Bira, xûşkên delal, ez hemû giliyên xwe paş da hildidim! Ber bi ronahiyê!

Vê demê dengê sazbandiyê rêstoran hilda, lê gellekan nizanibû ev çi deng e, ji ku tê?

Tulimlêdayî! Apê Celo ji perda ber dêrî bi gav gav hinekî pêş da hat. Îdî gişka bejina wî, tulim, tiliyên wî ye, ku dengê miqamê digîhande bilindayê rind didîtin. Hinek ser tulimê, ser dengê wê yî bû sur zendegirtî man. Hetanî wan ra şîrove kirin ev çi ye, ev çi sazbandî ye, kurdan govend şên kirin. Apê Celo miqamê “Azayê” lê dida. Lawikan, keç-bûkan giran giran fitil didan, ber miqamê “Azayê” direqisîn.

## DAWÎ

---

1 **tulimlêdayî:** kesê ku li “tulum”ê dixê; tulum di nav gelen Qafkazê de enstrumeke muzikê ye

**Lawo**  
**(Êssê<sup>1</sup>)**

*Rewayî hemû Şehîdên Welêt û bimirazê xwe Nîzamî dikim.*

Agir-alava te min ra vêxistî ser sîngê min dişuxule, lawo! Mirina te ya bêwede û ya bi bobelat dixweze min carekê va bişewitîne, biperitîne, têke sêlê biqelîne, têke beroşê bikelîne, lawo! Gava çav her du ewledê te, bûka terecan dikevîm hêsir rê nadine hev, ricaf min dihingivîne, hindik dimîne erdê kevîm careke dinê ranebim, lawo! Lê mîna bezê helandî kizika min dertê kesek nabîne, mîna tendûra vêxistî kulfik girtî dûyê bedena min qulab qulab dibe, kesek tê dernaxe, donê min dilop dilop dike, kesek nabêje ev çi ye, lawo!

Min bi şîrnayî navê te danî Nîzamî! Kalikê kalikê te Nîzamî gotibû, hetanî dibî papaxdurûkî<sup>2</sup> nivcî, ya qenc ew e bibe palandurûkî hêja.

Riya emirê te ber çavên min ra derbaz dibe nuxurî, nûbarê min. Zarotiyê da tu her tim nexweş diketî. Doxtir neman tu ser negerandî. Wedê tu du salî bûyî ji destê nexweşiye inteinta tebû, tu ber mirinê bûyî. Doxtirê navdar Sehîdê Îbo hate ser te. Ewî bi tiliyên xwe va nexweşiya te eyan kir û got:

-Wekî tu dixwezî lawê te bijî, wî hewaguhestî bike.

Rehme li doxtirê zaran, helbestvan, nivîskarê kurd Sehîdê Îbo bibe! Hema wê rojê min tu ji bajêr birî gund û tu dayî hemêza dayîka xwe. Li bal pîrikê nexweşiya te çawa mûkî ji nav mast bikişînî, a usa te dûr ket. Wê şûnda roj bi roj tu qenc bûyî, te pê avîte emir. Sala xwendinê ber şemîkê birî. Min bi şabûneke mezin va destê te girt û tu birî dersxana yekem. Deh salê xwendinê bûne gewlazê jiyana te.

Ew salana him hêsa, him dijwar, him bi baran, bi şayî, him bi tarî, him bi ronahî hatin derbaz bûn, lawo!

Pey mekteba navîn ra te du sala li Almaniyayê eskerî kişand. Wan du sala şev-roj çavên me li riya hatina te bû. Şevêkê te derî li me kuta. Malbetê şabûna nizanibû çi bikira.

1 **essê:** (bi rûsî ye) miqale, gotar

2 **papaxdurû:** terziyê kuman; kumdirû

Te riya mîlîsiyayê-polîsiyayê xwe ra çawa pêşek bijart. Nava we-dekî kin da tu ketî nava sura emirê polîsiyayê. Welleh, billeh, wê riyê da ne tirsra te hebû, ne xofa te, lawo!

Tu timê mîna çemê baharê yî gur î ji berê xwe derketî, li tu dera hilnedihatî. Te timê mîna ewirê, ku him li vir, him li wir dike guregur, dikire girmegirm. Navê te mîna birûskê nava êl-eşîrê da bela bû. Mala te bibû mala mêvana. Ji Îranê, Tirkiyayê, Qazaxistanê, Gurcistanê, Krasnodarê qewm, lêzim, pizmam, dost, nas, hatî çûyî dibûne mêvanê te. Tu diketî xemxuriya her yekî. Te alî her kesî dikir. Te rêwîk bi firindê<sup>1</sup>, yek bi riya hesinî, yek bi riya behrê verê dikir, wekî zûtirekê destê wan bigihîje delal-ezîzê wana. Lê felekê destê te ji hemûya kir, lawo! Tu mîna her kurdekî bi heşreta Welêt dişewitiyî. Te hesret ji dilê xwe derxist. Te cî-warên kalikê xwe Hilo, Bedo, Hepo ziyaret kir. Li bereka Çiyayê Agiriyê obe obe geriyayî, ava belekiya çiyayê ziyaretî têtetêr vexwer. Tu ji Welêt vegeyriyanê te hey derheqa halê gel, derheqa roja wan e dijwar da qal dikir, posîde dibûyî, derheqa tebiyet, hebûna Welêt da nijandinê, şa dibûyî. Li dîwarê mala te du xalîçe hebûn. Yek xalîça bi destî keç-bûken kurdan hûnayî bû, yek xerîta Kurdistanê bû. Te hatî-çûya ra derheqa nexşê xalîçê da digot-dibiland, lê derheqa her bajar, gund, deşt-zozan, çiya-banî, çem-kanî, gelî-newal, derheqa hebûna sererdê, derheqa dewlemen-diya binerdê Kurdistanê usa bi dilekî beristan<sup>2</sup> şirove dikir, merî he-yir-hejmekar dima. Paşê te bi hukum dipirsî:

Hevalo, naha bêje min binê çima ev Welat bindest e? Naha bêje min binê xalîça bi tilî-pêçiyên keç-bûkên kurdan hûnayî bedew e, yanê xalîça-nexşeya, ku bi qurna kurd ser dijîn?

Şev-roj kê derî li te vekirinê sewta kilamên kurdî digihîşte guhdariya wana. Rêwiyê westiyayî bîn dihate ber, yên bi posîde dêmgeş dibûn, ye bêbîr ser hiş-sewdayê xwe da dihat. Qeytanên<sup>3</sup> kilamên kurdî mala te da ne yek bûn, ne sisê bûn, ne heft bûn, bi deha va

1 **firinde:** balafir

2 **beristan:** çolistan \*\*\* **bi dilekî beristan:** bi dilekî mîna çolistanê fire

3 **qeytan:** plak

bûn, lawo! Naha mifte, kulîta mala te, bişkokên magnîtafona<sup>1</sup> te zeng girtiye, ne deng e, ne hes e, lawo!

Belê, tu welathiz, netewîhiz, mêvanhiz, hevalhiz bûyî, lawo! Rast heftekê berî mirina xwe, te mirina Eloyê Remezani bi şîn-girî bihîst. Bona wî xortê mêrxas tu kewgirîbûyî! Lê te nizanibû rast heftekê şûnda tu yê palê xwe bikutî palê wî comerdî, te nizanibû reşê serê dayîka te, ya dayîka wî, guliyên xûşka te, yên xûşka wî, wê ser hev da bê! Te nizanibû du ewledên te, çar ewledên wî wê hîviya bûkên rû bi xal bimînin, lawo! Dewir-wede yeman xirab hatiye, qewimandin yeman hev piçilikîne. Sala 1994a qe me ra nehat. Vefatbûna te, ya Eloyê Remezani, ya Wezîrê Egît, ya Eliyê Mehmed, ya Paşayê Kinyaz û ya ewledên mayîn e bêwede bû derdê ser derdan, lawo! Dibên mirin heq e, erê! Lê mirina yên mîna te him şewat e, him dilkişibab e, him dax e, him şirîtdar e, lawo!

Derdê yên mîna te ne çiya ye merî têkeve bin bifetise, ne behr e merî têkevê bixeniçe, ne agir-alaf e merî xwe bavêjê û bi carekê va bişewite! Ew ji wan gişka girantir e, mezintir e, bişewat e, lawo!

Ser şînê, wedê dunya ber çavên min bibû weke hêkekê, du mêrên bejinnîvçe, rîdan reş-sipî berdayî nêzîkî min bûn, yekî dest stûyê min ra bir û got:

-Keko, tu rind li me mêze ke. Em her du jî di derdekî da nê. Kurê me herda jî çûne şerê Qerebaxa Çiya.

Eva çend meh in ji wana deng-hes tune. Cî nemaye em lê negerîn, em nizanin ew mirine, yanê xerbend<sup>2</sup> ketine. Çavên me ha li rê-dirban e. Naha em qe nizanin mirin giran e, yanê halê me!

Vê demê min çok kuta erdê û got:

-Ya Rebbî! Tu zûtîrekê destê Îbrahîmê Rostem, Cemalê Elî bigihî-ne dê-bavê! Yek jî, ya Rebbî, tu derdê ewledê bêwede, undabûyî nede dê-bava! Vira dizanî çî kete bîra min, lawo! Helbestvanê Azerbaycanê Memmed Araz dibêje:

---

1 **magnîtafon:** (bi rûsî ye) teyp

2 **xerbend:** dil, hêşir

Dunya ya min,  
Dunya ya te,  
Dunya ya ne tu kesî.

Tu dizanî helbestvanê kurda yî navdar Cegerxwîn çi gotiye, lawo!  
Ewî gotiye:

Karwan li pey hev, em diçin yek ser,  
Çiqas dijwar e, çûyîna bê vejer!

Rêzekê, duda jî bêjim, lawo! Tişteke bûnê te bi laqirtî digot:  
-Hey lo, hey lo!

Naha ez jî dibêjim:

-Hey lo, hey lo! Lê firqîke mezin di nava gotina min û te da heye.  
Te bi ken-henek ew gilî digotin. Lê ez bi şîn-girî, bi şewat-dax, bi  
dilbirîn-dilkul dibêjim:

-Hey lo, hey lo!

Hetanî ez bême bal te, ez ê bêjim: "Hey lo, hey lo, lawo!"

15-16.IX.1994ê salê



## FERHENGOK

### A

**ahil:** mirovê bitemen, kal, pîr, zana  
**akademîk:** zanyar, akademîsyen  
**alt kîrîn:** mexlûb kîrîn  
**Anlamadim:** (bi tirkî ye) ez tê negihiş-  
tîm, min fêm nekîr  
**maşîna av anyî:** erebeya av anînê  
**aran:** cihê ku ne zozan e, sermiyan  
**aravî:** ava qirêj a ku ji ber şuştinê der-  
dikeve  
**aspîrantûra:** xwendina bilind a piştî  
zanîngehê; master  
**avan:** avahî  
**avrûke mirinê/kuştinê:** bi awira kuştinê  
**avtoajo:** ajovan  
**avtorêfêrata:** (bi rûsî ye) teza dokto-  
rayê  
**awîl/awûl:** hemû deverên paşvemayî,  
herêma ku şaristanî neçûyê  
**axlêve:** destpêka biharê  
**azadar:** azadker

### B

**babîşkef:** kulîlka ku bişkova wê vene-  
bûye  
**babizot:** bayê gur ê ku êgir geş dîke  
**-bi babizotî:** wekî agirê ku li ber bayê  
gur her diçe xurt dibe  
**badihewa:** bêsedem, beyhûde, beytu  
**baîs:** sedemkar, kesê ku bûye sedemê  
bûyerekê  
**bajon:** çol  
**bakî:** bayekî  
**bandev:** lûtke, zîrwe  
**bankêt:** xwarina pîrozbahiyê  
**barîgeh:** salona konferansê  
**bazbend:** nivîšta çargoşe qatkirî ya  
diavêjin bazûyan, milan  
**bede:** bedew  
**bedhal:** gelekî nexweş

**begem kîrîn:** ecibandin  
**beleban:** cird, mişkê mezin  
**beletdar:** kesê beled û zana  
**belg:** 1. rûpel 2. belge 3. nîşan  
**beqal:** piyale, îskan  
**beqî:** teqez, helbet  
**beqî serê yekî:** bi sayeya wî, bi sedema wî  
**beqeqomsî (beqeqomsî):** kesê mirovan  
berdide hev, gilf-gotinê derew dîke,  
vizek û durû  
**beqî:** teqez, welhasil  
**berav bûn:** berhev bûn  
**berbirî yekî bûn:** berê xwe dan wî û pê  
re axivîn  
**berbîn:** tiştê ku bêhna mirovan vedike  
**berek:** dever  
**berk:** sext, zexm, xurt, mehkem  
**berpal:** berpişt  
**-ji berpala xwe:** ji ber pişt a xwe  
**berr:** bejahî, erd  
**bersivdar:** berpirsiyar  
**bertilî:** rişwet  
**berzeq:** bêşerm, bêheya, bêar  
**berzîn:** cilika bin zînê hespê  
**best-beyar:** deşt û çiya  
**bestevehûn:** ji xwe re axaftin  
**beşer:** 1. rû, çehre 2. mehde  
**beşerxweş:** rûgeş  
**beşeve hatin:** vebîşirîn  
**beşter:** beşdar, kesên kombûyî  
**bêbîr:** kesê zû tiştan ji bîr dîke; bîroke  
**bêcerkîrîn:** (sewze û mêwe) reşandin  
û çandin  
**bêhevrî:** bêhemta  
**bêhûde:** dijwar û bilind  
**bê sewda:** bê hiş  
**bêxilt:** saf, xas  
**bêxoffî:** bêîrsî, wêrekî  
**bêxweyê:** bêxweyiyê  
**bi cî:** mehkem, qahîm

**bihên:** bêhn  
**bijiqîn:** jê avêtin û derketin derve  
**bijûn:** şûjin  
**bikebe:** bikeve  
**bikirî:** qedr, yadigar, bîranîn  
**bila kizika min derê:** hêrsa min were û bitengijim  
**bilandin:** çend caran li ser hev gotin  
**-gotin-bilandin:** jî gelek aliyên ve nîqaşkirin  
**binelî:** niştecih, gelhe, mirovên li gund, bajerekî dijîn  
**binên:** binêrin  
**binge:** bingeh, war  
**bingekirin:** bicihkirin  
**binrex:** raxistina binî, doşek  
**bistan:** memik, çiçik, ber  
**bişqvedayî:** beloq û derketî  
**bi tehm-lehm:** bi lezet  
**bivînin:** bibînin  
**bixefrînin:** bibexşînin  
**bizîn:** bizdîn, tirsîn, ji hal ketin, reng lê çûn  
**bizûtin:** hereketkirin, dilkirin  
**bîn-buxs:** bêhn û bû  
**bîz:** mehde, qilde \*\*\* **bîzê yekî vehan:** qildeyê wî hilnedan, mehdeyê wî ranekirin  
**bîzbîzî:** (ji bo pirçê) vîzvîzî, rast û hişk  
**bokeberan:** 1. beranê bijarte 2. (me-cazî) xasmêr  
**brîgadir:** (bi rûsî ye) serokê komekê, serkar  
**bûxanke:** (bi rûsî ye) nanê somî yê çargoşe

## C

**ca:** îcar  
**cahal:** ciwan, cahil  
**cake:** careke din  
**canik:** ciwanik  
**cedandin:** 1. hewl dan 2. kudandin, berdewam kirin  
**-bicedîne:** bikudîne, berdewam bike

**cehl:** nîqaş  
**-nava cehlê da:** di nava nîqaşê de  
**celew:** cure  
**cew:** cihoka avê  
**cimcilandî:** dawerivandî, saf  
**cimcime:** qaqotkê seriyan  
**cêhê cêhê:** cihê cihê  
**cizarefî:** ceza, eziyet  
**cîkî:** cihekî  
**ciyê cî:** cihê xwestî û armanckirî  
**ciyê sekinî:** bêsedem, li ser tişteki tunejî  
**cul'etî/cur'etî:** wêrekî, lehengî, cesaret  
**cûn:** cûtin

## Ç

**çalepiya:** çarlepî, çarlepîka  
**çarpê:** ajala çarpê; merkeb  
**çarmedor:** çeper, çît û sûra dorê  
**çarmedor bûn:** li dorê rêz bûn û xelek girtin  
**çavşor:** kesê ku çav berdide jinên xelqê  
**çav ên li te derên:** çavên te yê derkevin  
**çawa xelat kiriye:** wekî diyariyekê standiye  
**çelem:** kelemçe  
**çelo:** çilo, çawa  
**çerçîrîn:** xebitîn, têkoşîn  
**çêkîst:** (bi rûsî ye) karmendên ewlehiyê yê dewletê  
**çirîk:** saniye  
**çirp kirin ser xwe:** bazdan ser û rabûn piyan  
**çirpîke/çirpiyek:** şivika ter  
**çîdar:** zincîra ku pê ajalan girêdidin; kap, tewl  
**çiyayê ziyarefî:** Çiyayê Agiriyê (li cem kurdên vê deverê ev çiya pîroz e)  
**çoxan:** cureyekî çêreya ku ji bo şuştina kincan jî tê bikaranîn

## D

**dadan:** rahiştin  
**-dadane malên giran:** avêtin ser malên mezin û êriş birin ser

**dahênerîn:** pêkanîn, çêkirin û hilberandin

**dalîn:** cihê kolandî yê ji bo xwarin û vexwarina kûçikan; savêr

**dan gava:** gav kirin, zû meşîn

**dapalandî:** parzûnkirî

**daw:** dafik, tele, kemîn

**dayîn nihêrandin:** jê re nivîst dan nîvisandin

**delk-dolav:** dek û dolab, fend û fût

**derem:** reh, damar

**derdan:** çi mezin çi piçûk amana ji bo şilahî û aviyê

**dereke:** 1. ne ji wê herêmê 2. biyanî

**dereve bûn:** 1. (birîn) vebûn û derbûn, xwîn an jî kêr jê kişiyân 2. (axaftin) serê giliyan vekirin

**derik:** deriyek

**deroder kirin:** qewartin, derbider kirin

**dersxana deha:** dibistana amadehiyê

**derziyê qezazî:** derziya stûr a ku pê lihêfan didirûn

**derz kirin:** fehm kirin

**destbilindên fêlkotî:** rayedarên nebaş

**destpeçolkî hev bûn:** bi dest û neynûkan êrişî hev kirin

**destexan:** sifre

**destkêş kirin:** gema hespê girtin û li pey xwe kaş kirin

**devkadîn:** deriyê kadînê

**devko:** devkî

**deyîl yekî kirin:** deng li yekî kirin, hişyar kirin

**deyîndara bersivê:** cewaba mecbûrî, bersiva pêwîst û layiq

**dêmxweş:** rûken û kêfxweş

**dêrizandin:** vala kirin, kavil kirin

**dil Kirk:** yadîgarî, bîranîn

**dinbo:** ceşşê dilsoz û nefehma; dingo

**di riya Xwedê:** bide xatirê Xwedê

**diwa:** dua

**dizbergo:** 1. dizê jêhatî 2. sîxur

**dîdevan kirin:** ji tevgêrê rewş nîrxandin

**dîrêktor:** gerînende, mudîr

**dîsêrtasiya:** (bi rûsî ye) xwendina piştî masterê; doktora

**dubal:** ducanî, giran, hemile

**dunêeyan:** 1. dunyadîtî 2. ji aliyê dunyayê ve naskirî

**dur:** kevirê giranbiha, gewher

**durunga pêz:** cihê ku pez lê tê giyakirin

**duruz:** nebaş

**duriyan:** cihê ku rê ji hev diqetin û li ser çend rîyan pareve dibin; çar-rê

**duwa:** dua

**dû:** derman

**dûajo:** alîkarê şivên

**dûmek:** nesl

## E

**e:** di vê metnê de û di nav kurdên Qeşqazê de ev qertafa ravekî li gor peywendê carna wateya qertafa raveber a nêr “ê/yê”, carna jî ya pirjimar “ên/yên” digre.

**ebabetî:** duakarî

**ecem:** azerî

**edî/edû:** dijmin

**edlayîbîz:** edalethez, dadperwer, heqnas

**efirandarî:** afrandêrî

**elbê ra:** pê re, wê gavê, bêmuhlet

**elbihê ra/elbê ra:** tavilê, hema pê re û bêyî ku paşê

**elêm kirin/elam kirin:** îlan kirin

**Elk:** di mîtolojiya kurdan de cin û periyekê ku dil û hinavên jinên raketî (welidî) direvîne û lewre dimirin; heke jin dema zarokanînc de tiştêkî bixwin elk nikare xwe bigihînê

**eke:** (bi qirqizî) bira

**elegez:** cureyekî çereya wekî ku wekî tirşo û gûlikê tê bikaranîn

**emenî:** cureyekî ferşan e

**enar:** êş û janên zirav ên wekî elektrîkê di laşê mirovan re derbas dibe; tevzî

**enene:** pîrs û pîrsiyar

**-ketin enenê:** bi berfirehî pîrsiyara tiştêkî kirin

**enwa:** cure  
**-enwa bi enwa:** curecureyî  
**erhede:** 1. têkûz, birêkûpêk 2. bêşik, teqez  
**erq:** herq, cihoka mezin  
**erîze:** daxwazname, erzehal  
**esse:** bêgîlî, teqez, mutleq  
**essê:** (bi rûsî ye) miqale, gotar  
**etbû/etbî:** lome, eyb  
**eyan:** aşkera  
**eyan kirin:** aşkera kirin

## Ê

**êgin:** jîr, mêrxas  
**êşalon:** çend selikên hev ve girêdayî; rêzevagonên barbir  
**êvarî:** şevbihêrk

## F

**fanêrke:** (bi rûsî ye) texte  
**fermeş:** cureyekî têrên wekî xalîçeyan raçandî ye û nivînan dikinê; meşref  
**fera-fotik:** qasik-tasik  
**fesal:** 1. awa, şêwe 2. baldarî, dîqat  
**-bi fesal:** bî baldarî û dîqat  
**feйда kirin:** bi kar anîn  
**feydandin:** bi kar anîn  
**firevanî:** firavîn, navroj  
**firinde:** balafir  
**firnax bûn:** şanaz bûn, serbilind bûn  
**firqû:** firqî, ferqiyet  
**firşik:** kîsê ziravkê

## G

**gapêran:** mirovê qerase, kesê wekî gayekî  
**gebezok:** ji gêlî biçûktir e û ne kûr e; gêlî ji gebezokê kûrtir e  
**gêdûk:** çal û kort  
**gep kirin:** axaftin  
**germeşo:** cureyekî darên ku zû bi zû naşikê  
**gewlez/gelwaz/gewlaz:** 1. bendê ku dendikên gêzan, hêjîr û hwd li ser têne raxistin 2. (mecazî) tecrube  
**girêfik:** hişkegilê

**gorbegor:** lehnet li gora wî were  
**gotî:** divê, pêwîst e  
**govek:** 1. çember, xeleq, dayîre 2. bingeh 3. fireh  
**-govendê govek girt:** govend wekî xeleqekê li hev rêz bû  
**gupik:** gulik  
**-bi gupikî:** bi gulik  
**gura yekî kirin:** xebera wî kirin, li ser gotina wî çûn

## H

**harehejî bûn:** dîn û har bûn  
**hasêge:** asêgeh, berbend  
**hatin dest-rûyê hev:** 1. (di nava hev-temenan de) merhebatî dan hev û rûyên hev maç kirin 2. piçûkan destê mezinan û mezinan jî rûyên piçûkan maç kirin  
**hatin rayê:** hatin ser rîyeke hevpar, li hev kirin  
**hatin serî:** pêk hatin, rast derketin  
**-bê serî:** pêk were, bibe rastî  
**hawa:** wisa, wiha  
**hebin:** bendên kon bi singên dorê ve girêdidin  
**hedimandin:** rûxandin, tep kirin  
**hemjiyînxane:** cihê ku xwendekar lê radibin û rûdinin  
**herda:** her duyan  
**herek:** her yek  
**herîreşk:** cihê av û herî  
**hermûş:** hewirmiş  
**her sêk:** her sê  
**hetab:** xweşbext, bêkeder  
**hetabî:** xweşbextî, bêkederî  
**hev:** heb  
**hevanîn:** lihevanîn, hûnandin  
**hevstrandin:** li hev strandin, çêkirin û hasil kirin  
**hewaldan:** axaftin, xeberdan  
**hewapêkeftî:** dîn, cinî  
**hewas:** xwestin  
**hewêrze:** hawarî, gazî û qîjevîj

**hewilîn:** 1. axaftin 2. muhtac bûn  
**heytehol:** qelebalix  
**heytehût:** qelebalix  
**hezek:** cihê avî yê ku erozyon dikeve  
**hezir kirin:** hizir kirin, hesab kirin  
**hê binê:** îcar binêre  
**hêcka:** çend kêlî/xulek berî niha, dem-  
 ke gelekî kurt  
**hêlan:** ast, sewiye  
**hêle:** mezin, gewre, kêrhatî  
**hên:** dem, gav, wext  
**hêvişandin:** kêmasî kirin, teksîr kirin  
**-nehêvşandin:** kêmasî nekirin, teksîr  
 nekirin  
**hêwirandin:** cihkirin, sitirandin  
**hêwirdar:** kesê ku hinê mirov li ci-  
 hekî bi cih kirine  
**hîlberîn:** bilind kirin  
**hîlçandin:** girtin nava  
**hîlşîn:** rijîn  
**-hilşê:** hilweşe  
**hîlxistin-daxistin:** 1. hildan-danîn 2.  
 bilind kirin-nizm kirin  
**hindav:** alî  
**-di hindava xwe da:** ji aliyê xwe de  
**hingavtîn:** girtin nava xwe, dor lê girtin  
**hişkûr:** hişmendê gelekî zana  
**hişkûrî:** hişmendiya kûr  
**hîzhîzî:** 1. ricifî, lerizî 2. temendirêj 3.  
 perifî, kevn  
**hîvî kirin:** tika kirin, lavayî kirin, rica  
 kirin  
**hubir:** boyaxa nivîsandinê, hibir, mu-  
 rekeb  
**hurpizî:** qelew  
**hurujîn:** baraneke xurt reşandin  
**hurmişî:** dengekî stûr î ji qirikê  
**hûrgilî kirin:** bi berfirehî şîrove kirin

## I

**îja:** îcar  
**îjînêr:** endazyar, mihendîz  
**însanêt:** mirovahî  
**înstîtût:** enstîtu

## J

**jan:** êş  
**jehrdadayî:** jehrkirî  
**jenîn:** 1. (dîwar) lê kirin 2. (mijar) lê  
 gerîn, lê pirsîn 3. lê reşandin  
**ji kel ketin:** êdî nekelîn, şîr jê miçiqîn  
**jiqiftîn:** tepisîn hev zor lê ketin

## K

**kabînê:** civat, meclis  
**kaf-kun:** wêran kirin, kevir li ser kêvir  
 nehiştin  
**kalêt:** qurabiye  
**kanfêt:** şîrînahî  
**kare:** awa, şekl  
**-çi kare ye:** çawa ye, çito meriv e/tişt e  
**karkar:** karker, xebatkar  
**kalan** (awayê tewandî yê peyvê **kêlîn**):  
**kandîdat:** berendam  
**kasib:** kesê ku bi qezencea destê xwe  
 debara xwe dike, feqîr  
**kaxet:** kaxetîtk, porselen  
**keça (bi)kezî:** keça xama û bermêr  
**kejî:** cureyekî werisên ku ji mûyê bizi-  
 nan ji du nex an jî sê nexan hûnan-  
 din tê hûnandin; dirêjahiya wê bi  
 qasî 3-5 mêtroyan û berahiya wê bi  
 qasî du tilî an jî sê tiliyan e  
**kelb:** seg, kûçik  
**-kelbo:** sego, kûçiko  
**kelefe:** kavi, xirabe  
**keli:** heywanên ku ji zû ve xwê nexwa-  
 rine  
**kerrekerr:** bêdeng  
**kese:** kesek  
**kesirîn:** 1. hesret kişandin, dil avêtin  
 tiştêkî 2. tî bûn  
**kestek:** bi qasî kerpîçekî heriya hişk;  
 kerseng  
**kesûk:** bêgunch, belengaz, reben  
**keştî:** şkestî  
**kevîrê kewkî:** kevîrê virvirkî  
**kew ketibû sibê:** berê asoyê spîtayî  
 ketibûyê

**kewgirîn:** gelekî giriyan, zû zû bi ber xwe ketin, hundirê xwe xwarin  
**kewran:** karwan  
**kêlimîn:** axivîn, gotin  
**kêlin:** -kâlên (awayê tewandî yê peyva / kalan/- cihê şûr  
**kêwirîşk:** kerguh, kêroşk  
**kimkimî:** mişt tijî  
**kir:** kirin, kar û xebat  
**-kira nekirî:** kirina heta niha nehatiye kirin  
**kirane:** 1. mêrê bijarte 2. mezin, gir, gewre  
**kiraşoyî:** 1. kincşûştin, cilşûştin 2. aman û alavên kincşûştinê  
**kirtîni:** kirtekirt, dengê kotinê  
**kişmiş:** 1. mêwîj 2. rengê reşolekî  
**kişkîrî:** diyarkirî  
**kînor:** kunêr  
**-kînora serteşî:** derdê bêderman, kula giran  
**kînorgirtî:** kunêrgirtî, kê m û birîn girtî  
**kîtêlreş:** kincreş  
**kol:** koma darên diriyê û çêreyê  
**koloz:** cureyekî kumên mêran e  
**kolxoz:** dema Yekîtîya Sovêta berê de koperatîfa gundiyan bû. Gundî dibûne endamê kolxozê, kê kar dikir, dewsa heqê xwe, rojxebat distand. Pêş rojxebatên xwe dawîya salê kolxozê çî direşand û diçand ew distand.  
**Komêndatûra:** (bi rûsî ye) fermandarî, bîryargeha leşkerî  
**Kommerkez:** Komîteya Navendî  
**koz-hoz:** cihê berxan û hevşiyê pêz  
**kulfîk:** kulek, kun, pencereya biçûk  
**-kulfîka tendûrê:** kuneke biçûk a ku di binê tendûrê de tê vekirin da ku hewayê hilde  
**kuta kirin:** xelas kirin, qedandin  
**kutasî:** dawîn  
**kûpê:** (bi rûsî ye) kompartimana trenê  
**kûrekûr:** dengê girînê

**kûrexane:** cihê agir lê vêdikeve  
**kûvî:** ajalê nekedîkirî yê çol û pesaran  
**-xew lê bû kûvî:** xew lê herimî

## L

**lagêr:** (bi rûsî ye) kamp  
**lagêrçî:** serkarrê kampekê  
**lam:** enî  
**lap:** tam, herî, tewrî \*\*\* **lap sereke:** hera sereke, tewrî sereke  
**lehd:** yeşşem  
**leqem ketin tişteki:** livîn, qelş û derz pê ketin  
**hêleçana zara:** landika zarokan  
**hine:** hinek  
**lehd:** yeşşem  
**lewz:** peyv, axaftin, gotin, lefz  
**lê lê bû ...:** hema hema dikir ku ...  
**lêmişt:** ava gur a heyamên baranan, sêlav  
**lipitandin:** lebat, bizav, hereket  
**litimîn:** mîlmîlîn, pîrpitîn, hejîn  
**liva:** hiriya berxa  
**livitîn:** libitîn, hereket kirin, ciyê xwe de nesekinîn **lift:** asansor  
**lîlav:** cihê bi av û herî  
**loqman:** zanayên gelêrî, hekîm  
**lomandin:** lome lê kirin, rexne kirin  
**lûle:** borî

## M

**magnîtafon:** (bi rûsî ye) teyp  
**mak kirin:** piştrast kirin, spartin rastiyeke, îsbat kirin  
**malakan/malekan:** di rûsî de wateya “moloko” “şîr” e; “molokan” jî “şîr-vexwir” e; li gor baweriyeye rûsan lazîm e mirov di heftê de du roj şîr vexwara, lê hin kes rabûn gotin tu asteng nîne ku mirov her roj şîr venxwe; ev kes piştê jî mezhebê ortodoks veqetiyên, dan ser rê û terîfê-ke din û di nav gel de jî bi vî navî hatin naskirin; di şerê osmanî-rûsan

de (1876-1877) jî li derdora Qersê hatin îskankirin; naskirina wan û Erebê Şemo jî rastî vê heyamê tê.

**maldizk:** mitbex

**malger:** gera nava malan

**mal-serbest:** li malê bi awayekî serbest

**marz:** parêzgeh, wilayet

**menekî:** hespê kihêl

**menî:** 1. mehne, wate 2. sedem

**meht:** rîprast û şimşad

**mekrî:** ajalê goşthelal

**menekî:** hespê kihêl

**meqledûz:** miqnatîz

**mer I:** bêra devrast

**mer II:** mirov, merî

**-mera:** mirovan

**merdtayî:** merdî, merdî

**meslehet kirin:** li hev şewirîn û biryar dan

**meşineajo:** şifêr

**meyt:** mirî, cinyaz

**mewicandin:** tê de gevizîn, tê de gut bûn

**mewicîn:** tê de gevizîn

**mexmer:** qedîfe

**mêzer:** cureyekî pêşmalên ku jin bi ser tûmanê xwe de li pêş xwe girê didin

**mift:** mifte, kilîlk

**mîlik:** kêrt, girik, cihên ewqasî ne bilind

**minê bûn:** winda bûn

**miqabilî:** li hemberî

**meqledûz:** miqnatîz

**miriyê gelê xwe:** di ber gelê xwe de serê xwe dide

**mişewêş:** tevlihevî, çîloçepî

**mitale:** fikir û raman

**mixenet/minexet:** xayîntî, xedarî

**mîlîsiya:** bazgeha ewlehiyê, qereqol

**miyaser kirin:** pêk anîn, anîn cih

**monik:** di mirovan, daran de dibe, di tiliyên mirovan sê de monik hene, di sê ciyan de qat dibin, ya daran jî tê de bişkuv hene \*\*\* **monik monik**

**nihêrîn:** yeko yeko/qulik bi qulik nihêrîn

**mormork:** (mecazî) bêhiş, gêj

**mukur hatin:** îtîraf kirin

**-xwe mukur hat:** her tişt rast got, her tişt hilda stûyê xwe, tişteke veneşart

**Muqurezemîn:** di çîrokên kurdî de navê deverekê, wekî Çiyayê Waqilwaqê

## N

**namebir:** posteger

**namilpen:** navmilpehn

**narkom:** (bi rûsî ye: kurtebêjsa “narod-niy komitet”): meclisa gel

**navandin:** şanenav kirin, îmze kirin

**navbirîn:** navbir

**navêje:** nebêje

**navê yekî kişandin:** bi nav gazî kirin, navê wî aşkera kirin

**navnîş:** navnîşan

**ne, axir:** jixwe

**nebîniyayî:** bûyerên ecêb, yên qe nebûyî, yên ku qe kesî nedîtiye, nebîhîstiye

**nedîr dan:** şemal û rewneq dan

**nefî kirin:** koçber kirin, surgûn kirin

**neffwan:** koçber, surgûnkirî

**nemam:** kesê ku gilî-gotinan digêrine, sîxur

**netê:** nedurist, çewt û neyînî

**nevê:** nebêje

**neynûk:** awêne

**nêt:** 1. fikir û raman 2. wate

**niçikandin:** çikilandin, tê de çikandin

**nimixîn:** niximîn, xitimîn

**nitirandin:** neqîşandin

**nîgar:** wêneyê bi dest çêkirî, xêzkirî

**nuqandin:** lê nîşandan, îlham kirin

**nûqî avê an jî tişteki bûn:** ketin kûrahiya wê/wî, noq bûn

**nuxurî:** zarokê/zaroka yekem ê/a dê û bavên

**nuxsantî:** kêmasî

## O

**orxe:** cureyekî beza hespan e

**o, wa:** va ye, aha

**oxirme:** rê, dirb \*\*\* **rojên oxirmên**  
**giran:** rojên dijarî û tengasiyê

## P

**pak:** baş  
**palat:** jûr, ode  
**pal dan:** razan  
**papaxdurû:** terziyê kuman; kumdirû  
**para va:** ji pişt ve  
**paşdemî:** pêşeroj, dema bê  
**pate kirin:** tamîr kirin  
**pelpelî bûn:** wekî keviran bûn  
**penc vedan:** (dar û giya) reh berdan  
xweliyê û xurt bûn  
**penî hildan:** ling hildan, bi piyan rê ketin  
**perç:** 1. werm 2. keser  
**perdî:** darê avakirina serbanê xaniyan  
**peroşî:** heyecan  
**peyîtandin:** îsbat kirin  
**pev ketin:** ketin xeberdan û suhbetê  
**pêberjêr:** ber bi jêrê  
**pêçek:** 1. tiştê di nava kaxez, pîne û  
hwd de pêçayî; paçik 2. zarokê vi-  
ringî yê di nava pîneyan de  
**pêpar/pêpal:** qudoş, yom  
**pêpes kirin:** bînpê kirin, pê lê kirin  
**pêşek:** pişe, meslek, sinaet  
**pêşekzan:** pişekar, xwedî-meslek, si-  
naetkar  
**pêşewît:** kesê ku piyên wî şewitî ne  
**pêşîkar:** pêşeng  
**pêşxane:** ji aliyê hundir û derve ve va-  
lahiya ber û pişt deriyan  
**pêşxwîn:** mase  
**pêxem lê xistin:** feşkilandin, pûç kirin  
**piçepiç:** pistepist  
**piçilikîn:** alîn, geriyar  
**-li hev piçilikîn:** li hev geriyar, li hev  
aliyan  
**pirskar:** kesê ku pirsan ji tawanbaran  
dike  
**pişikîn:** bijînîn, rişîn û lê gerîn  
**pişkorî:** zarok an jî ciwanê ku debara  
malê dike

**pişrûk:** navê xurekekî ye ku bi av, ard û  
rûn tê çêkirin

**piştîkûz:** piştthotik

**pişik:** 1. şîşikên goreyan 2. dilopên  
baranê yên hûrehûr

**pire kirin:** parparî kirin, parçe kirin

**pirepîrtî:** belawelayî

**pirqepîrq:** hîrehîr, cureyekî kenê bi  
deng

**poçte:** poste

**polkovnik:** (bi rûsî) serheng

**posîde bûn:** xemgîn bûn, bi ber xwe ketin

**povêst:** roman

**poyêz:** şimendîfer, trêr

**prokûratûra:** (bi rûsî ye) dozgerî

**pût:** mengiraniyeke bi qasî 16 kiloyî ye

## Q

**qalim:** qalind, stûr

**qamefî:** (tenê ji bo bejnê) dirêj

**qar:** xeyd, berpirsariyî

- **Qara gund ketiye stûyê min:** berpîr-  
siyariya kar û barên gund ketiye ser  
milên min

**qas-quduret:** hêz û karîn

**qed:** pîne

**qeleşçe:** kozika leşkerî; çeper

**qelixa kerma:** qûçê sergînan

**qelfe qelfe:** qafîle qafîle

**qelp:** dilnesax, xayîn, sextekar

**qelûn:** darcixare

**qemilîn:** 1. reng lê qemer bûn 2. kizirîn

- **Sûka min reş biqemile:** bazara min  
hesret be/here devê kulê

**qerd:** ajalên qert, gir, mezin

**qerimîn:** tevizîn

**qerisîn:** cemidîn

**qertel:** 1. cureyekî teyran e 2. belengaz

**Qesra Krêmlê:** Qesra Kremîlînê

**qestbende:** bi derewî

**qeşexane:** qeşaxane, bûzxane

**qetilkarî:** qetliyam, komkuji

**qevz kirin:** bi ser re bazdan

**qewat:** hêz, quwet



**qewat-sihet dayîn:** jê re hêz û tenduris-  
tî xwestin

**qewimandin:** serpêhatî, bûyerên pêk-  
hatî

**qewî:** xurt û zexm

**qewîzî:** bêbextî, xedarî, minexetî

**qewl:** 1. soz, gotin 2. biryar

**qeytan:** plak

**qîloz bûn:** bilind bûn

**qincilîn:** 1. bi ser hev da qat bûn 2.

(wekî ku êşek lê rabûye) destê xwe  
ber hev re birin

**qinêtî:** reha xîretê

**qîfîk kullê:** bela, kareset, ne bi xêr

**qîçîk:** rengê zer ê leymûnê

**qol:** şanênaw, îmze

**qol kirin:** şanênaw kirin, îmze kirin

**qotaz:** gulpîk û gulikên berzîn û sîre-  
bendê

**qubbe:** gewre, mezin

**qûç:** hop, balûle \*\*\* **qûçekî te gotî:**  
hopekî bi dilê te

**qudûm:** taqet, hêz

**qulap:** kişandina bêhnek ji cixare an ji  
qelûnê; bêhnefîşk

**qul-bêjî:** kunên piçûk û mezin

**quncilîn ser hev:** xwe qolinc kirin

**qurne:** sedsal

**qusandin:** 1. qut kirin, birîn 2. kok  
qelandin, ji holê rakirin

**qusidandin:** kok qelandin, ji holê ra-  
kirin

(tiştêk) **raberî yekî kirin:** pêşkêş kirin,  
lê nişan dan, dirêjî yekî kirin

**ra bûn:** ray jê bûn, çareser bûn

## R

**raketin:** (jîna ducanî) hemla xwe danîn,  
zarok anîn

**rawêj:** 1. texmîn 2. zen 3. bîrbirin 4.  
şikbîrin

**ray:** 1. rê 2. çareserî 3. deng (hîlbijartin)

**-hatin rayê:** hatin ser rîyeke hevpar, li  
hev kirin

**raxêre:** raxe, raxîne

**remdar:** remldar; falbêj

**reqandin:** koçber kirin, ji warê eslî  
raqetandin

**reşeve kirin:** bûyereke tarî derxistin ber  
ronahiyê

**revo:** hespê bezê; kihêl

**rewa:** 1. seza, meşrû 2. layîq 3. diyarî

**-rewayî filan kesî:** diyarî û pêşkêş ji bo  
filan kesî

**reza:** 1. rîza, daxwaz 2. destûr, reza, îzn  
\*\*\* **bi reza hişê min:** bi qasî hişê jê  
min dibire

**rêbarî:** bi barê rêwîyan, bêyî kel-melê  
zêde

**rêbiwar:** rêwî

**rêdar:** rêvebir, berpîrsiyar

**rêniş:** kesê rê nişandayî, rênişandêr

**rêspûblîka:** komar, cumhûriyet

**rêzgilî:** hevok

**ridansipî:** rihspî

**rihaştin:** rahiştin, dest pê kirin

**rikêf:** zengû

**-dan rikêfa:** zengû li binzîkê xistin da  
ku bibeze

**risas:** hesinê herî hişk, pola

**rîçal:** reh û rîşiyên rehekan

**-bihêna bi rîçal:** nefeseke xurt

**ro-robarî:** 1. serencam 2. encama hesa-  
bekî matematîkê

**roder:** pace

**ronkayî:** ronahî

**ronik:** ronî

**ron kirin:** ronî kirin, aşkera kirin **roz-  
gar/rojgar:** çerxa demê

**rûniştanok:** rûniştêk

**rûyê nameyê:** kopye û nusxeyeke nameyê

## S

**sabûna reqê:** sabûna ku devê ambalaja  
wê venebûye

**San mehkemeye duşdun mu?:** (bi tirkî  
ye) tu ketiyê derê dadgehan û hatiyê  
darizandin

**San sûda duşdun mu?:** (bi tirkî ye) tu ketiyî nava şîr  
**sar bûn:** sivar bûn  
**satircem:** cureyekî zikêşa giran e ku carinan mirovan dikuje jî  
**sazbend:** koma muzikjenan  
**seba:** ji bo  
**sehetî kirin:** lê xwedî derketin, kontrol kirin  
**seh kirin:** bihîstin û tê ghiştin  
**sekinandinok:** rawestgeh  
**seqirtî:** bêdengî  
**serederî:** çareserî, karîn  
**-serederî jê derxistin:** çareser krin, pê karîn  
**sergerdan:** kesê li çol û pesaran dikeve û êdî venagere  
**ser li yekî birrîn:** pêşî lê girtin  
**serederî ji tişteki derxistin:** pê karîn, çareser kirin  
**serfînyazî:** serfirazî  
**sergirtî:** veşartî, nepen  
**seropiya:** li ser piyan, şîpê  
**serwaxt kirin:** tê gihandin, pê dan fêm kirin  
**sew:** tirs, sehm  
**sewgirtî:** sehmgirtî, tirsîyayî  
**seywan:** fêrgeh, pol  
**sêkunc:** sêgoşe  
**sêlav:** lehî  
**silsilet:** nîfş, nesl  
**sipiçolkî:** rengê spî û gewr tevlihevî  
**sirafetî:** di tenduristiyê de rewşa mirovan a asayî  
**-sirafetiya xwe unda kiriye:** ji ser hişê xwe çûye  
**sivder:** korîdor  
**simt:** lûtke  
**qeydê sirêder:** ji rêzê der, awarte  
**stansiya:** istasyon, rawestgeh (peyveke rûsî ye)  
**stekan:** îskan  
**silikîn:** sil bûn, tengijîn  
**silsilet:** rêzebûyer  
**sivik xwe neke:** kincên zirav û sivik li xwe neke

**sîtê:** sitî, xanim  
**siyanet:** rûmet, şeref  
**siyare qitîkê yê** ku bersiva ne bi xêr dibe  
**sobekarî:** avjenî, melevanî

## Ş

**şebeq:** serê sibê, şefeq  
**şel:** şal  
**şelte:** parçe (ji bo tiştên cemidî)  
**şevkorî/şevakorî:** kesê ku di tarîbanê de baş nabîne  
**şewaq:** şewq, şemal, rewneq  
**şexte:** zîpika gur a ku piranî zirarê dide giya û daran  
**şêkirdarî:** sipasdarî  
**şêwîn:** şibihîn  
**şîpûk:** bobelat, keresat, felaket, belengazî, xirabî  
**şîrîtdar:** giyotîn  
**şîvet:** şubhet, rêbaz, qayde  
**şîle:** şeqam, şîle

## T

**tab:** sebr, hedûr  
**tajan kirin:** eşandin, zêrandin  
**tamade:** amadekar, koordînor  
**tamadetî:** amadetî, pêşkêşî, koordînasyon  
**tat/teht:** kevirê ku rûyê wî rast e  
**tayê tenê:** zarokê tekane  
**telandin:** bi dizîka veşartin û çavdêrî kirin  
**telîn:** 1. sitirîn, êwirîn, lê sekinîn 2. aşt bûn  
**telik-tolav/delk-dolav:** dek û dolab  
**teltetelteyî bûn:** (ji bo tiştê avî) kom bi kom an jî tebeqe bi tebeqe cemidîn û hişk bûn  
**temene bûn:** li ber yekî rêzgirtin  
**temul nekirin:** tehemul nekirin  
**temûl kirin:** tehfir kirin, bi aveke paqij şuştin  
**teng** 1. nefireh 2. kembera zîn

**-teng şidandin:** kembera zîn li binzikê şidandin

**tep:** ji besta axaftina dînan

**- tepe wî bigirin:** cinê wî werin û pê bigirin

**teptepî:** kesê ku ji bestan diaxive

**teribandin:** xera kirin, betal kirin

**tesele bûn:** hatin bihîstin

**-dengê zaran bi hev ra li wî tesele bû:**  
nişkê ve te digot qey dengê zarokan bi hev re hate bihîstinê

**tesequt:** teseduq, xêr \*\*\* **tesequt da:**  
xêr belav kir

**tevzî:** êş û janên zirav ên wekî elektrîkê di canê mirovan re derbas dibin

**tewilandin:** ji bo biçêre ajal li derve girêdan

**tewl:** kap û werisê ku li derva diavêjin stûyê hespan da ku biçêrin û neçin cihekî din

**tew-temûrî:** makyaj û xeml

**tew-temûrî dan bejna xwe:** xwe çêkirin, ser û şûçeyê xwe xemilandin

**tê ra dîtin:** wisa dîtin, wisa hesab kirin

**têxnîkûm:** dibistana amadehiyê, lîseya pişeyî

**tifal:** 1. zarokê viringî 2. reben, belengaz

**tir:** qey, hew

**-te tirê:** te qey digot, te hew dizanibû

**-wî tirê:** qey wî, hew wî

**tîjtîjî kirin:** parçaparçeyî kirin, dirandin, zîvalzîvalî kirin

**tîna xwe dan:** dêhna xwe dan, bala xwe dan

**tîştîştî bûn:** qelişîn, derizîn

**tîtal:** -bejna- rîprast û dirêj

**tîtik:** pêlîstok

**tojen:** ariya tiştê şewitî

**tolaq:** cureyekî bandajên hûnayî ye ku ji gûzekan heta çokan li çîpê tê alandin

**tonik:** girik, bilindahiyên piçûk

**topik:** bilindahiya sivik, ji çiyayî piçûk-tir; gir, kêrt

**tor:** gerdenî, kolye

**torbend:** gerdenî, kolye

**torîvan:** edebiyatzan

**turb/tirb:** gor, merzel

## V

**vayîs/ baîs:** sedemkar, çi erênî çi neyînî be kesê ku bûye sedemê bûyerekê

**vedika sê:** kolika sê

**vehatin:** rast hatin

**-ser belaya xwe va vetê:** rastî encama kirinên xwe yê nebaş tê

**vejandin:** tesele kirin, kontrol kirin

**vemilandin:** maliştin, paqij kirin, ziwa kirin

**verevurt kirin:** 1. berawird kirin 2.

tesele kirin, kontrol kirin, ber çavan re derbas kirin 3. çareser kirin

**verê kirin:** şandin

**versû:** gornebaş

**vêsin:** rehet bûn, rawestîn

## W

**warizîn:** perwerde bûn

**waynîn:** anîn

**wede:** heyam, dem

**-wedê xulîqandinê:** dem û heyama afrandin/nivîsandinê

**-bi wedelf:** di pêvajoya demê de

**wekilandin:** dubarekirin

**welgerand:** wergerandin, zivirandin, fetilandin

**welidandin:** (jina ducanî) zarok anîn

**welîwelf:** wêlewêl

**wer:** war

**warîne:** bîne, werîne

**werge:** wargeh

**werzandî:** perwerdekirî

**weş:** heyama kurt

**-weşekî şevê:** heyameke kurt a şevê

**wexta:** hema piştî çend xulekan

**Wezîriya Dewletê ye Bêqezayabûne:**

Wezareta Ewlehiya Dewletê  
**wêlî:** (jin) dilbirehm, bimerhemet

**X**

**xalîfî:** riya xwe şaşkîrî  
**xanêkirin:** xuyakirin  
**xeracîr:** xirecîr, teşqele  
**xerbend:** dîl, hêsr  
**xesiyet:** xislet, xeyset  
**xewa hingorê:** xewa şîrîn  
**xewle:** cihê talde û kesek lê tuneyî  
**keyrîn:** guherîn  
**xênî ji:** ji bilî, xêncî  
**xingirandin:** xwe di govendê de hejandin  
**xingîrîn:** di govendê de lîstin  
**xirpandin:** mehkem kilîl kirin, kîp girêdan  
**xişikandin:** wekî maran bi erdê re kaş kirin; xijikandin  
**xişikûn:** mîna maran bi erdê re kaş bûn  
**xişîfî:** xişîrên cil û bergan  
**xitim bûn:** qedîn, xelas bûn  
**xof:** tîrs  
**xuliqandin:** afrandin, çêkirin, pêk anîn  
**xuliqîn:** afirîn, çêbûn, pêkhatin  
**xudan:** xwihdan  
**xumar:** 1. xewa giran 2. xewa sermes-tiyê  
**xurekpeht:** aşpêj  
**xurustanî:** cureyekî kulavên ku ji lîva-ya biharê tê jenîn  
**xût:** hema  
**xwebêj:** wate  
**xwekirî:** lixwerkirî  
**xwen:** xwe

**xwerek:** xwarina li ser êgir amadekirî, xurek

**-xwerekêkî avînî:** xurekekî avkî, avsrî  
**xwestî:** keça ku ji bo zewacê tê xwestin

**xwînmêt:** xwînmij

**xwuzula:** xwezila

**Y**

**yabî:** ne kihêl; hesp û mehînen şeveder ên ku xisletên hespan wînda dikin û wekî keran dibin; êdî bi hêsanî tên girtin, siwarbûn û barkirin

**yanê:** an jî

**ye:** ev qertafa raveber, di kurdî ya Qefqazê de carna di wateya yekjimar a mê de wek “ya”, carna jî li gor peywendê di wateya pirjimar de wek “yên” tê bikaranîn.

**Z**

**za:** neşil, hişk

**zar I:** zarok

**zar II:** ziman

**zarincîn:** ji ber êşekê ketin nava nivînan û rabûn pê nebûn

**zax:** zag, zinar

**zelûlî:** mehrûmîyet

**zendegirtî bûn/man:** mehtel man, ecêb man

**zer:** kendal

**zeyîfî:** dab û nêrîta ku keça mêrkîrî diçe serdana malbavana xwe

**zêrandin:** êşandin, eziyetkirin

**zêwezêw:** deng hawar û gaziyan

**ziqîfîn:** êş û jan lê rabûn

**zulmet:** şevereş

**zûr bûn:** 1. bêyî çavê xwe biqirpîne li tişteki nihêrîn 2. demeke dirêj mehtel mehtel li tişteki nihêrîn

“...li wir, li welêt me dibihîst, wekî li Sovêtê hemû tişt aza ye. Keko, ez serê te yî ezîz kim, min ew kurdên li Yêvlaxê, nava axa sipî da dîtine vir da, min hemû derd-kulê xwe ji bîr kiriye. Min digot he-tanî ez sax im du birînê min hene yek ê zû-dereng bicebire, yek ê min ra here tirbê. Yek ew e wekî, weten mîna keça kezî destê neyaran da ye. Yek jî, keko, ez qurban, wexta em çend pêşmerge daketine gundê me, me dît agir bere gund dane, me ji wî gundî her zarek xilaz kir. Me zar hilda paş da vekîşyan, zarokê dikire nalenal, çavên xwe venedikir. Ew li milê min bû. Em gihîştine çiya, îdî me go, şukur me zar xilaz kir. Lê ... Nişkê va me hew zanibû ew xwe da hat, hineka qewat-sihet dane wî. Zarongê çavên xwe vekir, li me gîşka nihêrî, vegeerî dor-berê xwe mêze kir û bi lewzekî şîrîn got:

-Apo, avê bide min.

Bavo, hineka gotin, na avê nedinê, hineka gotin hûn nabînin lêvê wî tî da qerçimîne, tiştêkî wî tune, avê bidinê. Me av dayê. Ewî av vexwerinê şûnda got:

-Ax, çawa şîrîn e ava weten!

Ev giliyên wî yên dawiyê min ra bûne derdê bêderman. Naha halê wan kurdên hêsîr min ra bû derd-kulê sisiyan. Ev çito azayî ye?”

Ahmedê Hepo ji devê Mele Mustefa Barzanî, ku lehengekî vê romanê ye, van gotinan neqil dike û trajedî û “birîn”a salên koçberiyê yên kurdên Qefqazê tîne ziman. Roman ne tenê bi zimanê xwe yê edebî û dewlemend derdikeve pêş, di heman demê de bi lehengên xwe yên “dîrokî” û “çîrokî” jî balkêş e. Ji ber ku li aliyekî Mustefa Barzanî, Erebe Şemo, Rehîmê Qazî, Stalîn, Baxîrov; li aliyê din Kelo, Nado, Rostem, Rihan, Seyran hene. *Birîn*, ji bo kurdên sirgûnbûyî yên dewra Stalîn belge-romanek e.



peywend - roman

**PDF:**

**Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê**

**Web:**

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

**Tel.:**

**+7 918 073 48 79**

